


NÛDEM

An abstract painting with a dark, textured background. The composition is dominated by a large, dark, irregular shape in the center, possibly representing a face or a figure, rendered in shades of grey, black, and brown. This central shape is surrounded by various brushstrokes and splatters of color, including yellow, orange, and white. The edges of the painting are decorated with small, colorful flowers and green leaves, particularly along the top and bottom borders. The overall style is expressive and somewhat somber.

No 21 1997

Kovara Huneri, Edebi û Çandi

ÇINDÊ



NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

◆
Xwedî û berpirsiyarê giştî
Chief Editor

Firat Cewerî

◆
Hejmar 21, sal 6
Bihar: 1997

◆
Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 240 Sek
Skandinaviya 280 Sek
Ewropa 100 DM
Amerîka, Austaralia,
Kanada: 50 \$
Institution 290 Sek

◆
Postgîro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964

◆
Wêneya bergê: Rindê


◆
Pergala bergê û rûpelan:
Nûdem

◆
Adres: NÜDEM
Termov. 52 2tr.
176 77 Järfälla-Sweden
Tel û Fax: 8-58356468

NAVEROK

- 4 Çarsedsaliya Şerefnameyê ◆ **Firat Cewerî**
- 6 Ez û min ◆ **Ergün Şen**
- 8 Şerefname ◆ **Şerefxanê Bedlîsî Weger: Z. Avcî**
- 15 Şerefname hunername ye... ◆ **E. Hejar**
- 22 Şerefname ◆ **Mehemed 'Elî 'Ewnî**
- 26 Şerefname neynika dîroka kurdan e ◆ **Zirnov**
- 33 Şiîrek ji ◆ **Serkan Bîrûsk**
- 34 Stîrana berxwedanê ◆ **Sîdaqî Hîrorî**
- 39 **Eyşe Şan** ◆
- 40 Stîrana kurdî ◆ **Zeynelabîdîn Zinar**
- 47 Ji bo giramiya Mirado ◆ **Suleyman Demir**
- 62 Bûyer, huner û hunermend ◆ **Şerefxan Cîzîrî**
- 71 Mêvandarî ◆ **Mehmet Aktas**
- 72 Sê şîr ji ◆ **Rojen Barnas**
- 76 Corneille û Racine ◆ **Fawaz Husên**
- 90 Keşfkirina kurdan ya Amerîkayê ◆ **Rohat Alakom**
- 101 Dilodîn ◆ **Arjen Arî**
- 102 Prometheus ◆ **Weger: Zinarê Xamo**
- 105 Şair Huseyîn Yetkîn ◆
- 111 Xemê û Xemgîn ◆ **Şefîk Kaya**
- 120 Azad û Bapîrê xwe ◆ **Mihemed Dehsîwar**
- 131 Li ser zimanê R. Hazim ◆ **Laleş Qaso**
- 135 Du şîr ji ◆ **Mustafa Aladag**
- 136 Li ser Bîra Qederê ◆ **Maruf Yilmaz**
- 139 Ji Stenbolê sê kovarên kurdî ◆ **Nûdem**
- 142 Ji çirokên kurdî metirsin ◆ **Jürgen M. Berth**
- 144 Ji nav weşanên nû ◆ **Nûdem**

Çarsedsaliya Şerefnameyê



Fîrat Cewerî

Em bi vê hejmarê pênc salan li dû xwe dihêlin û dikevin sala şeşan. Herçiqas pênc salên Nûdemê mîna bahozê buhurîbin jî, di-san em ê nikaribin zehmetiyên li pêşberî zîmanê kurdî, dîlsariya kurdan ya li hemberî edebiyata wan û guhnedayîna siyasetvanên kurdan ya kultura wan weşêrin. Lê, divê em mikur werin ku di pêvajoya weşana Nûdemê ya pêncsalene de, her ku çû bal û meyleke zêdetir ji edebiyatê re çêbû, her ku çû hejmara weşanên kurdî zêdetir bûn û her ku çû edebiyat aktueltir ma. Ji ber ku em bawer dikin, di aktuelhiştina edebiyata kurdî de pareke Nûdemê heye, em xwe dilşa hîs dikin. Loma, me di dîroka 20.12.1996'an de bi hinceta pîrozkirina pêncsaliya Nûdemê, li paytextê Swêdê, li Stockholmê, şeveke şahiyê çêkir û me xwest

em dilşahiya xwe bi nivîskar, hunermend, rewşenbîr, xwendevan û aboneyên Nûdemê re par ve bikin. Nêzîkê sêsed kesên bijarte ji seranserî Swêdê beşdarî li şahiya Nûdemê kirin û piştgiyariya xwe ji Nûdemê re nîşan dan. Ez careke din, ji bo vê piştgiyariyê û dilsoziya nivîskar û xwendevanên Nûdemê spas dikim û hêvîdar im ew ê di vê maratona pênc salên pêşiya me de jî me bi tenê nehêlin, bi piştgiyariyê û dilsoziya xwe me xurttir bikin.

Ji ber ku em qîma xwe bi xebatên basîd naynin, em dixwazin bi her awayî di pîvana kovarên Ewrûpayî yê edebî de bin. Me gelek caran xwestiyê em li ser mijarên taybetî hejmarên taybetî çêbikin. Di pêşxebata her hejmareke taybetî de komek astengî û kelem derketine pêşiya me, me zehmetiya peydakirina pisporên di şaxên cûda de ditîne, em rêgihîştine ku di warê kultur û edebiyatê, huner û zanyariyê de em çiqasî li paş in; em çiqasî xela pispor û alîman dikişînin. Ji ber ku em bawer dikin di

pêvajoya xebatên berdewam û bi bawerî de mirovên pispor û kesên şareza digihên, em bêhêvî nabin û heta ji me tê, em dixwazin di vê tarîtiyê de ronahiye geş bikin.

Ji bo geşkirina ronahiya zanyarî û edebiyatê, me mîna derweşan xwe avêtiye nava vê xebatê. Di vê xebata pêncsalane de, ji bilî bîst hejmarên Nûdemê, me zêdeyî sî pirtûkên bi kurdî û kovareke wergerê jî derxistîye. Hemû li ser hev zêdeyî pêncî weşanî dîke. Lê di çapemeniya welatên din de, pêncî weşan ne tiştek e. Li welatekî biçûk mîna Swêdê salê zêdeyî deh hezar pirtûk û bi sedan kovarên cihêreng derdikevin. Ji aliyê din ve, gava em rewşa welêt û rewşa kurdan bi giştî didin ber çavan em dibînin ku pêncî weşan hejmareke astronomîk e.

Ger hûn, rewşenbîr û xwendevanên kurd bixwazin em di van pênc salên pêşiya me de pêncî weşanên din jî pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî bikin, bi dehan nivîskarên nû û bi sedan jî xwendevanên nû bigihînin, divê hûn jî hebekî bilivin, hebekî din jî li Nûdemê xwedî derkevin; hinek aboneyên din jî ji Nûdemê re peyda bikin. Hingî wê Nûdem jî ji misyona xwe negere û wê dibistanbûna xwe berdewam bike.

* * *

Me xwest em di vê hejmarê Nûdemê de nêzîkî du mijarên cihê, lê ji bo kurdan gelekî girîng, bibin. Yek jê edebiyata devkî ye, ya din jî Şerefnameya dîroka Kurdistanê ye. Edebiyata devkî, ku heta niha zimanê kurdî, kultura kurdî û bi tevayî hebûna kurdan li ser lîngan hiştiye, hêjayî pêmijûlbûn û lêkolînên pir cidî ye. Nivîskarên Nûdemê yên berdewam Şerefxan Cizîrî, Suleyman Demîr, Sidqî Hirorî û Zeynelabîdîn Zinar her yekî bi nivîsekê dest avêtine vê mijarê û rola stiran û stiranbêjiyê ya di civaka kurdan de tînin zimên.

Heçî nivîsên li ser Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî ne, bi kurmanciya Ziya Avcî hatine amadekirin. Şerefname berî bi çarsed salî jî aliyê Şerefxanê Bedlîsî ve bi farisî hatiye nivîsandin. Şerefname jî du cildan pêk hatiye; cildê pêşî li ser kurdan, cildê dudan jî li ser Osmanîyan e. Şerefname yekemîn pirtûka li ser dîroka kurdan e ku berî bi çarsed salî jî aliyê kurdekî ve hatiye nivîsandin. Di Şerefnameyê de bi firehî li ser dîroka Kurdistanê, li ser cografîya wê, li ser mîrxasiya kurdan û li ser mezin û sultanên kurdan hatiye rawestandî. Ev berhema ku wergeriyaye rûsî, tirkî, fransî, erebî û soranî; niha jî ew jî aliyê Z. Avcî ve wergeriyaye kurmançî. Me di vê hejmarê de beşek jî destpêka Şerefnameyê, - ku bi tirkîya wê nehatibû çapkirin- nivîsên Mam Hejar, Mehemed 'Elî 'Ewnî û Zimov yên li ser Şerefxanê Bedlîsî û qîmeta Şerefnameyê weşandine. Bi vê yekê, me xwest wek kovara Nûdemê em careke din balê bikişînin ser Şerefnameyê û pîrozkirina çarsed saliya wê. Em ê, di hundurê vê salê de, dîsan li ser Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnameya wî rawestin û bi nivîsên cihê wan bi bîr bînin.

Bi hêviya pêşerojê rohnî...

Ez û min

Ergün Şen

Çavên min!
Eger tu diçî
Hîv nikare car din bikene
Ewr şîneke mezin digire
Û dinya di bin deryan de difetise

Ez;
Eger tu diçî
”Li paş xwe tişteki nahêlim
Navê xwe li bin gubê erdê dixim
Malbata xwe yek bi yek dikujim”

Xulam
Eger tu diçî
Ez jî ji xwe diçim
Bejineke vala dihêlim

Tu
Eger tu diçî
Bahsên te bikeve
devê hozanan
Xwe dadiliqînin tenbûr
li daran

Xwedê!

Eger tu diçî
Meleyên li ser minaran
xwe kêr dîkin
Bi qîrîn û hawar
Nimêja xwe li ser navê te dîkin

Mîn
Bihîst ku tu çûyî
Bêkesiya sêwiyekî sed salî
min dîkuje
Dengê min ê dawî
Bila çîyan bibihîzin
– Bo nivê dilê xwe yê din digirim
Î

Destpêka Şerefnameyê

Şerefxanê Bedlîsî

Bi navê Xwedayê mezin û dilovan. Destpêka gotara min bi sipasî ji wî Xwedayî re dest pê dike ku pesnê Wî bi dilekî ronak ve wek roja bi tîrrij erd û asîman ronî dike, ew Xwedan şukir û senayê ku hemû payeberz û serbilind li ber dergahê Wî destpençe û sernizm disekinin.

Ew, karmendek e ku: firaxek nalînê ji bo pena û pêsîrê giyana Adem ji heriyê çêkiriye, bi tîna tîrêja merhemeta xwe hişk kiriye û bi çav li ser gerandinek wisan rêk û pêk kiriye û ewqas rêz lê girtiye ku, layîqê meclisa baregahê pir şukur û sena ya Wî be û li ber pêşkên textê Yezdan de bi qedir û hêja cî jê re veqetandiyê.

Ew, hunermendek e ku: di axa reş a şilekî de xêr û bereketek wisan rijandiye ku bi hezaran hezar barên mirasî û cewher di bazara durrnasan di muqabilê wê de ne riştekin.

Ew, baladestek e ku: ew padişah, xan, beg, serdar û serwerên bi pozbilindî, kibî-

rî û şanzatî xwe bi ser bindestan radigirin û henekan li ha û li wir dikin, li hemberê hêz û desthilata Wî rût, pût û bêser û berin. Ew parsek û bêpenayên ku bi çavên çakî li destê beşînder ê Xwedayê tîk û tenê dinêrin û destên niyazan tenê ber bi baregaha Wî ya şukurdar bilind dikin û ji Wî pê ve karên wan bi tu kesê hel nabe û her tenê Ew e baregaha wan a dawiyê. Ger çendîn bi şiklî û bi dêmen, bê paye, bê ser û ber, şeperze û perîşan in, lê di rastiya xwe de padîşahên serbilind û dilxweş her ew in.

Bi zanatî hinekan wek bi demî bilind dike, bi ser civakan de datîne û ji bo ceribandîna, rîsê wan têrba dike, demek piştî xwe dide wan. Di netîcê de Melekê Mirinê ji wan re dişîne, wan ji meclisa jiyane dertêxe û ber bi gora cihanê ve dişîne û wan dispêre gora tengeber û sar. Di roja pirs û hesabê de qenc û xerabiyên wan ji wan dipirse û li ber dadgeha xwe ya bilind bêşermî û bêkêmasî başî û xerabiyên wan ji wan re dihejmêre, sax û qahîman

dike mêvanê Beheştê û yax û rizîyan ber bi Cehennemê ve dişîne.

Ew, karnexşînek e ku: ji teke coteke nêr û mê gelek qebîle û eşîretên cur bi cur: spî, sor, zer, gewr, reş û esmer ji nesil û regezên beşer çêkiriye, ji bo ku xwe û xwediyan xwe nas bikin. Ji ber kar û barên jîyanê ku ji hemû serekî ve rêk û pêk be, bend û girêdanên jîyannameya mirovayetiye ji berhev neveqete û ji hev cihê nebe, vê dam û dezgeha mezin û giran û ew xanedanên pîrr xîzan û avahî bi awirekî pîrr lertzîn netefe, herkesê li gor pêdawistiyên jîyanê hîne tiştekî kiriye û pala wan daye cure zanistek û erkê fermanek hêja bi wan sipartiye.

Dilê keç û kuran ji tîn û girên evîne tijî kiriye û bi tîrêja hesreta gihîştina hev û du dagirtiye. Derdê janê ji jinan bi hezar rengên dilfirîn rengandiye, acizî û westiyana bê-ser û binî kiriye para mêran. Her ji ber vê ye ku girên agirê kovanên vê jîyanê li ser



Tablo 15: Meclîsa Şerefxanê Bedlîsî (© Jîna Nû)

rûyê vî cîhanî de her geş bibe û tu carî netefe.

"Her hêjayê te ye mezintî kirin
Yadigarên te ne: jiyân û mirin

Nizmkirin û bilindî di destê te de ye
Jiyana bi hêz û bi taqet di destê te de ye."

Pesnê Pêxember

Dirûd û afirandînek ku tu çaxê biniya wê neyê, ser û binê wê diyar nebe, ji bo dîdarê pak ê wî pêxemberê re ronî be ku fermo ye: ez pêxember bûm û hê min di nav av û liçê de hereket dikir.

Ew pêxemberê ku Xwedayê mezin pê re axiftiye û ji bo Wî gotiye: "Min tu ji wan re şandî û ew emanet spartin te ku tu bibî sebebê serwerî, bextewerî û nimunê dadgeriya hemû jîndar û afirandînek."

Pêxember, dema ku ji bo erşê asîman hat bang kirin û bû mêvanê Dîwanxana Yezdanê mezin, di seranserê rê de ji bo xêrhatin û pêşwaziyê, gumbeta bilind û sipehî jê re rast bû û lambe û ronahiyên şewqdar ji bo Wî hilketin. Ferîşteyê Beheştê Xwedê, Bûraq, şiklê hespekî bi bask de, ji bo geştê deşt û berriyên bê toz û ax, ber bi xêweta hêşîn bi zîn kirî li ser erdê amade kir û fermana hereket û rêketinê dayê. Piştasiwarê sivik, nazdar û çeleng, mamze û avzengê lê şidand û bi sebir ber bi armancê ve meşiya. Hespê bi çeng û per, ji bayê şemalê bezatir, gelek ji xeyalan sûret û leztir, di navbera bez û meşê

de wek bayê birûskê da xwe rabû. Bi çarnaliyek wisan dimeşiya, rê li gerîna meh û rojê dibiriya û bi keziyên bijî û bijan-gên xwe, lehiyên rûndikan ji çavê stêrkan dimaliya.

Ewqas çalak û bi kêr bû, Cebrail bi pişthespiyê serî pê re dernexist û di nîvê rê de bişûn de ma û ew ax û keser di dilê wî de ma.

"Di şev û rojek de ku Cebrail bicî ma

Mêrxasiya bîra pişe û kêrhatiya te ji kê re ma?"

Ferîşteyê şox û şeng û ciwan ê ber rikêfa xwoşewîstê Xwedê, paye û pîroziya wî ji hemû caran bi qedirtir û bilintir dibû. Di germiya çûn û hatin û rimbaziyê de şana-ziyê bi xwe dikir û dihat bîrê ku, rojekê bazek xwe li ser dareke pîr datîne û dibêje, eger dar kûrmî û dexezdarî jî be ya girîng ew e ku nazê baz lê biçê. Pîroz bû jî eger bextewer bûya sîya sim bi ser xwe de didît ku sîya 'ezîzê Xwedê bi ser de ye.

Şêresiwarê mêvan, li ber dergahê xanedana mezin zengoyê sist kir, ber bi mal û li ser çeng û perên periyên heres ên taybetî yên Baregaha Yezdan danî û xêrhatînek bi şanazî lê hat kirin û bi gavên sivik gihîşt ciyê jê re hatî diyar kirin. Ew ji tîlê kevanê kêmtir, hetta ji bînahiya çavan jî kêmtir, afiranderê giyanliber û bêgiyan nêzîkî Wî ket. Ew ciyê ev dîtina han rû da, heta dinê dinê ye riya kesekî li wir na-

keve û hetta ne mimkun e kesek di xew-
na xwe de jî wê paye û senayê bibîne.

“Li ber Wî kirin asman û zevî
Li ber Wî mija kufr û çewtî revî

Ji wê demê zanî seviya rêza xwe
Ku pêxemberî girte himbêza xwe

Bilind payetir bû li her serwerê
Bi mezintiya Xwedê meger pektî berê
Heta çerx û axa zemîn û zeman
Bi qasê pelên daran û avên çeman

Bi qasê berf û baran, giya û av û xak
Du’ a ji xwediyê mal ê erkanê pak.”

Pesnê Sultan

Her wiha piştî sipasî ji Xwedê re û meth
û senayê pêxemberê mezin, ez dixwazim
sipasê padîşahê xwe jî bikim. Ew padîşa-
hê ku gumbeta kadêza asîmanê hêşîn, bi
hemû dûrî û bilindahiya xwe ve, bi hemû
rêk û terzê ve, kêmtirîn xeml û xişrê ser-
dera wî ye. Fermanrewayê seywana çaran
ku navê wî, roj û bi beşîna tîşk û tîrêjên
heft reng nexşîna bê dawî û binî ye û he-
ta tu bixwazî, di rêza birêztirînê dergewa-
nan û pasewanan de xurt e. Pak, tekûz û
tîravê helbijartî yê hîm û bingehê sulta-
nan e, ji nesla pak a binemala xanedana
xwe ya herî beşînder û dilovan e.

Pena û pêsîrê wî ciyê rizgariyê ye û ji
qeyseran re ciyê daxwaz û hêviyan e. Ji
padîşahên Çîn û Maçînê desthilat kevin-

tir û paye bilindtir e. Karê sultanen ra-
mûsana şîpane û serderên deriyên wî ne.
Sunnî mezheban diparêze û ji gumrebûn
û gunehan dilê wî dibîz e. Çi tiştî bêje,
kesek ji çarçeveya wan dernakeve. Di rast
û çep de zordar û tawanbaran radipêçe.

Feqîr û xembaran di rê de nehiştiye, si-
ya dadmendiya bejna wî ya bilind gihîşti-
ye hemû koşê û deveran. Serekên dîn û
dinê ye û bexteweriya herdu hêlan e.
Xwediyê du derya û du bejan e: kole û
şerkerê Mekke û Medînan e. Îskenderê
şaxdar e diduyan e û Omerê ji Xwedêtirs
û parêzgar ê sisîyan e.

Di saya wî de dinê hêmin, aram, bê-
derd û bêjan e. Babê bêkes û bêçaran e:
ew Sultanê Mehmed Xan e û Xwedê te-
menê wî dirêj bike û wî her tim serkevtî
bike.

“Çawan ji pita te dûr kevim, ey roja tîrdar?
Xwezî bi wan kesan ku siya te li ser

Xwedê di saya te de şadî ji me re şand
Em gelek pê xweş in, me ji te re sipart.”

Pesnê dîrokê

Ji aliyê wan kesên ku gelek zîrek û jîr in,
dûrbîn û zana ne, gelek êşkere ye ku he-
mû nivîskarên xurt, hemû zanayên zêde-
zan û paqij, hemû agahdariyên ji serpe-
hatiyên borîn, li ba wan wisan e: dîrok-
nasî li ser hemû huneran de ye. Dîrok, ti-
jî ji ders û tecrûbên bi feyde û rênîşanda-
nên bi kêrhatî û bi qazanc in. Serpehati-

yên me yên borî bibîra me dixê, rojên me yên kevnare yên dûr nêzî me dike û bala me dikişîne ser emekdariyên berî me hatine kirin. Ji xwe, bi taybetî eger ew serpêhatî û bûyerên han ji dem û lêkolînên xweş pêk bîn û xwendewanên destpak û qelemrengîn rûpelên kitêban pê binexşînin.

Di derheqê van cure dîrokên de, Mihemedê kurê Xwand (Hand) Şah kurê Mehmûd ku bi navê Mîr Xwand bi nav û deng e û xwediyê tarîxa Rewdetu'l-Sefa ye, di pêşgotina kitêba xwe ya hêja û bi qîmet de wiha dibêje: "Xwendina dîrokê di deh waran de feyde digihîne mirov:

1- Ji bo naskirina însanan e.

2- Zewq û dilxweşiya ji hînbûna ew mijarên ku di derheqên wan de kêmtên zanîn e.

3- Zanyariya dîrokê, tiştektî wisan e ku bêyî zehmetî û kulfetek mezin mirov xerc bike, dikare ji derûdora xwe ya nêzîk bi hêsanî bidest bixe û zanyariyek e ku li ser taqeta zîhîniyê hatiye danîn.

4- Rast û derew ji hev cihê dike û nerewayan ji nav rewayan dibijêre.

5- Gelek pîvan û daneliberhev tê de hene. Zanayan gotine: 'tecrube însanan zana dike', ji ber vê, tecrube şaxek ji wan deh şaxên zanistiyê hesibandine. Mirov bi xwendina dîrokê hîne gelek fikirandin, nêrîn û tecruban dibe.

6- Dîrokan, ji bo pirsîna tiştan kêmtir karê wî dikeve li ha û li wir. Çunkê mebesta wî ji bo ku li ber destê wî ye, bi xwe

lê dinêre û dizane.

7- Mirovên mezin ên li gel karên giran û dijwar rûbirû dibin, bi xwendina dîrokê agirê kula dilê wan ditefe û dikevin nav aramî û bêhnfirehiyê.

8- Dîroknasî, jîrî û hişyariya mirov zêde dike û arastê lêkolîn, fikirandin û bîrên rast dike.

9- Kesên agahdariya wan ji dîrokê heye, hemû bêhnfireh û hişyar in.

10- Serdar û zordar, ji serpêhatiyên borî, desthilardariya Xwedayê mezin tê bibîra wan û bi hêz û qudreta xwe pozbilind nabin û ji ser xwe naçin, baş tê digihin ku heta xweşî li ser be û nexweşî her tenê ji bo wê mebestê ye ku Padîşahê hemû Padîşahan di Qur'ana pîroz de emir kiriye: "Bi rastî jî, di çîrokên wan de ji bo kesên xwedî aqil, nesîhet hene".

Ez û ev kitêba han

Ez, ku nivîskarê van rûpelan im, navê min Şerefê kurê Şemseddîn e. Çavê min bi mezintiya Xwedê ye û ez hevîdar im ku alîkarvanê min be û min di vê dinê de serfiraz bike û ji asteng û giriyên wê dinê jî rizgar bike. Di kemilîna ciwanî û gulvedan û ajardana bihara jiyana xwe de, piştî ku min destê xwe yê rast û çepê nas kir, min di xwendewariyê de hêz û taqet bi dest xist û ez bi hezaran milên zanistiyê zahirî û batîni hînbûm. Çi tiştên ji bo dînan û dinyaya min pêwîst e, min ji her tiştî gelek zanî û bi sererastî û meharetî ketim ser kar û barên Dîwanê û wê çaxê

heta niha hemû bi hêz û mecalên xwe ve ez bi xwendina serpêhatî û dîrokên mijûl im.

Çiqas tem û mija xem û keseran bi ser min de dihatin, min ew bi hejebayê serpêhatiyên borî didan milekî û direvandin. Her çendin hejebayê sar û sir ê bêhêviyê, armanca wî ew bû bigihîje min û ji min derbaz bibe. Lê têdaketin û pêdaçûna serpêhatiyên mîr û mezinên berî min, serê min germ kirin û heta wisan li min hat, di vê hunera ciwan de ez bûm pehlewaneke û lêkolîn û lêgerîna vê zanistiya han a taybetî û helbijartî de bûm bijarte û xwedî meharetek wisan ku min han da û anî li ser wê bîr û baweriyê ku li gor taqeta xwe ez jî çend xelean têxim ser vê zincîra han.

Bi vî awayî min xeyala tamahkariyê kir ku, di vê zanistiya hêja û pîrr biha de, nivîsandînek ewqas bi qîmet û serbixwe raxim ber çavan ku tu çaxê ji xeynê min destê dîroknivîsên berî min pê neketibin û yên ez rayxim ber çavan, ji min pê ve kesek wisan tê negihîstibe.

Lê, ji ber sebebên asteng û kuspên diwar û bûyerên nelibar û demên nazik; ev daxwaz û armanca min her daxwazî ma û bûka di nav perdeya armanca min poşiyê li ser çavên xwe neda alikî.

Ji hemû milan ve her tenê bayê berevajî hebû; keleka daxwaz û armanca ber bi paş de vedigeriya û ji hemû koşan de tenê ba û bahozên gêjiyê yên êrîşkar bûn ku serî li zanayan gêj dikir û diêşand. Wek

şair gotiye:

“Dinya wekî pirçê yar şeperze bû
Dêmen li hemû milê dêw û efrût bû

Têkelhevîyên cîhanê ewqas asê û girê bû
Xweşiya ser û berî û hêminî genî bû

Hewardîna şer û ger rezîl bû
Çepel cigîr û abro hilo bû.”

Heşameta feqîr û bêçaran di berriyên perîşaniyê de gêj mabûn, dêw û efrûtên derd û eziyetan lingên xwe yên kul û keseran bi ser de berda bûn. Di wê dema şûm û tal de kesek nedihat hawara kesî û ji ax, fixan û nalînê pê ve tişteke ji dest nedihat.

Çavên xwe yên sor û ter dikirin astîman, destên xwe yên kêmhêz û sitoyên xwe yên lertzokî pan dikirin û ji Xwedê hêvî û lava dikirin: “Xwedê tu karsazê bêçaran î û dergahê hêviya bêhêviyan î. Hilgirtina vî barê giran ji taqet û mecala me der e. Xwedê, tu li me giran nekî, bê alîkarî û hawara me, bi destê taqet û qudrêta xwe, vê erka milşikestî û ew eziyeta dilşikestî û ew dax û derdê bêwêne li ber me birevînî û ji ser me rakî.”

Tîrêjên merhemeta Xwedayê tîk û tenê lepitîn, hejebayê xweşî û şadiyê hejandin, tarîtiya zordarî û hewrên reşên tarî yên nalebariyê wisan tar û mar bûn ku rêç û şûnên wan jî neman.

Piştî ew Padîşahê dadmend û hejarper-

wer hat alîkariya me, wek tasek ava sar li ser dil bê kirin, xweşî û şadiya hêviyan ketin hindurê me. Saya wî Şahê pîroz dilxurtî û nerehetî ji bîra hemû kesê çûn, agirdana avêtina dilan û perîşanî ji carekê rabûn û feqîr, belengaz, reben û derdejar, hemû têr û tesel bûn û bi dilê xweş û çavên ronî jiyana xwe bi rê ve dibin.

Kund û bombên fitne û şûman firîn, deng û hawara wan a bê pîr û bereket ji qêrînê ket. Bayên gotinên xweş dest bi hejînê kirin, ji dev û lêvên wan şekir dibarîn. Bulbul, kincên perîşanî û melûliyê ji xwe kir, perda bédengiyê dirand û gelek vekirî û eşkere li hemberê gulê dest bi gotina dilxwaziyên xwe kirin, ji wê re xwend û çirikand.

Vêca ew kesên di bazara nivîsandinê de cewherfiroş û durmas in, ew dîrokzanên ku lehengên nav şekerîstana serpêhatî, çîrok, deng û behsan in, heta niha rîya xwe ber bi Kurdistanê ve nekirine, behs û dengên gernas û sernasên kurdan nekirine bin devê pênûsê, ew dîroka gelek bi şanazî û xweşiyê ku di tam û bîhna xwe de wek hingvîn (hingiv) û gezoyê ne, gelek mixabin ji aliyê wan ve nayê nas kirin û ketiye bin piyan û bi tu awayî dest û devên xwe lê nêzîk nekirine. Ez î jar, bêtaqet, bêdest û ziman ketim ser wê xeyalê ku vê mijara han a ji taqet û qudrera min gelek der; behs û serpêhatiyên mirovên mezin, kesên bi nav û deng, serdar û فرمانrewayên kurd û Kurdistanê berhev bikim, ên di dîrokên 'ecem de min bi

xwe dîtine û yên min ji mirovên bi hiş û zîrek û ji derewan dûr, raste rast bi xwe seh kirine, binivîsim û navê wê bikim: ŞEREFNAME. Hemû armanc û daxwaza min jî ev e ku, xanedanên mezin ên Kurdistanê navê wan di nav navan de binivîsîne û ji bîr neçe.

Ez, ji kesên zana yên dilpak û çak rîca dikim ku gelek bi hûrî û kûrî li ser nivîsandinên min bisekin, eger kêmasiyek li ber çavên wan bikeve, bi awakî merdane binivîsin, lêbikolin û rast bikin. Eger şaşî û jibîrçûnek min tê de bibînin, bila bi henek pê kirin û tinazan nehêlin bi he-wa de. Camêrî û mêranîyê bi min re bikin û bi perçeyek baştir û tazetir ji min re pîne bikin. Wek şair gotiye:

"Şaşiyên bigre dema ku te dît, li xwediyê wê nexe

Çunkê afirandina însan ne bêberî ye ji şaşiyên

Binêre rojê, bi wan ronahiyên xwe yên taybetmendî ve jî

Derbaz nabe raste rast bi ser ekvatorê re."(*)

Kurmanciya wê: Ziya Avcî

(*) Ev qismê han ji destpêkî heta li vir ji wergera Mam Hejar a ji zaravayê soranî hatiye wergerin. Ev qisim di wergera tirkî de tune -Z. Avcî.

Şerefname hunername ye

E. Hejar

Ez zarok bûm û hê temenê min ji bihara xwe ya çardehan derbaz nebibû. Di xwendinê de jî hê min gavên mezin ên xurt neavêtibûn, ku cara yekê li ser refên dîwanxaneyê Qerenî Axa yê Mameş kitêbek li ber çavê min ket û li ser piştê wê hatibû nivîsandin: "Şerefname". Min çend rûpelan jê zivirand û li vî milî û li wî milî nêrî, tenê ez têgihîştim ku dîroke, min tiştekek jê dernexist.

Sal hatin û sal çûn, car û caran min li ha û li wir seh dikir ku Şeref Xan li ser filan bûyerê wiha gotiye û Şerefnameyê bi vî awayî behsa vê serpêhatiyê kiriye. Li ser vê, ez nû pê hesiyam ew Şerefnameya ku min tiştekek jê fehm nekiribû, ew dîroka kurd û Kurdistanê ye û kurdekî gelperwer û xwedî huner bi zimanê farisî nivîsandiye. Hatiye wergerandin bi ser gelek zimanan û du caran jî ji aliyê doktorê zana û dilsoz ve erebiya wê hatiye çêkirin. Yanî ew dîroka kurd a herî hêja, zimanê kurdî nebe bi hemû zimanan dest dikeve...

Ji ber vê yekê, piştî van serpêhatiyên

xwe, min xwe baş li bera xweş kir û biryar da ku ez li gora daxwaza dilê xwe bimeşim û mecal û îmkânên xwe li hemberê vî karê giran têxim kar. Lê, asîman dût, 'erd sext û asê bû. Ez î pêşmergeyê gerok ê çiya û berriyan, bêcî û bêwar, herçar aliyên min rapêçayî, riya bajar û avahiyan li ber min girtî, ez ê Şerefnameyê li ku bibînim, çawan bixwînim û wergerînim? Ez ê kîjan kitêbê wek çavkanî bigrim berçav û ji bo muqayesekirina rast û şaşiyên li kîjan nuxxayê û li kîjan nivîsandinê binêrim? Ez di vî halî de li derûdora xwe digeriyam, sitar û tebar bi min nedibû û min xwe dixwar. Van tevan deyne ciyekî, heta rê û rêbaran jî rê nedidan min, asteng û girêyan radixistin li ber min. Belê, ez demekê di vî halî de mam û heta ez rastê Kek Salih Mehmûd ê Barzanî hatim. Wî birayê binirx û hêja li wan berrî û deştan li min bû melek, Şerefnameya farisî, wergerên erebî yê Mehmed 'Elî 'Ewnî Beg û Mele Cemîl Rojbeyanî ji min re anîn û bi van diyariyên hêja min ji wan girê û astengan riz-

gar kir û wî derdê min ê giran çareser kir. Min jî bêyî lam û cîm dest dan ber xwe û di pêdeçûna Şerefnameyê de bi ser ewqas tiştên seyr û 'ecêbmayî re derbaz bûm ku, tu wextê ew tiştên ku ez tê de lê rast hatim, ber hiş û aqilê min re jî derbaz nebi-bûn.

Emekdarî

Wekî em dizanin, dema ku Îslamîyet di nav kurdan de belav bû, gelek zana û nivîskarên mezin û birêz ji nav me peyda bûn û gelek nivîsandin di derheqê dîrok û edebîyata gelê xwe de nivîsandin. Lê tu wextê yek ji wan gelê xwe û eşîreta xwe dernexist pêş, pismam û kesên xwe bi bîra xwe neanî, xwe nêzikî behs û bûyerên kurd û Kurdistanê nekir. Lê çi heye, ji hemû deman zêdetir di sedsala 11an a koçî de, du kes ji nav me rabûne ku gunehê wan bi gelê wan ê lêqewimî hatiye û nan, av û himbêza gerim a kurdan ji bîra xwe nebirine. Bi nivîsandin, hawar û dadmendî kurd bi bîra xwe anîne û ew du kes jî: Şeref Xan û Ehmedê Xanî ne. Tiştê seyr û 'ecêb ev e ku: piştî van herdu dilsozan cardin ew derî hatine girtin û nêzikî 400 salan qifilkirî mane. Car û caran hinek kesan xwestine vê jengara han paqij bikin. Navek re Hacî Qadir bangêk derxistiye, lê kesekî xwe nêzikî wî nekiriye, dema ku ew jî miriye, kesekî din heta van nêzikahiyên han xwe nêzikî tixûbê vê meseleyê nekiriye.

Di van dawiyana de jî ji Huseyîn Huznî

û Ernîn Zekî re li hev hatiye ku her yek ji wan li gor taqeta xwe têkoşîne ku berhemên me yên wendabûyî berhev bikin. Ji wan pê ve kesekî bi xwe re nedîtiye serî li vê meseleyê bide û serûberiyekê raxe meydanê.

Gelo di wê demê de çawan bûye, ku bi taybetî ew herdu kes ji hemû kurdan zêdetir ruhê kurdîtiyê di hindurê wan de dest bi ger û meşê kiriye? Min di derheqê Xanî de, di esnayê lêkolîna Mem û Zînê ya Mukrîyanî de bîr û fikra xwe ya di wî warî de gotiye.

Şeref Xan jî ku roja ji dayîka xwe bûye şûn de, bi zanistî re rabûye. Di seraya Şahê Iranê de hatiye perwerde kirin, bi şehzadeyan re xwendîye, wekî wan muamele dîtiye, beşdarê hemû huneran bûye, jêhatî û kêrhatî bûye.

Wekî bi xwe jî ji me re neqil dike, di mesele û bûyerên borî de û di hunera dîroknasî de gelek serkevtî bûye û ewqas hogirê wê babeta xwendewariyê bûye ku hemû dem û seetên xwe bi serpêhatiyên borî re derbaz kiriye. Xwestiye ku di dîroknivîstî û dîroknasî de cîyekî bilind bigire û bi nav û deng be. Ji ber vê li hemû deriyan xistiye û ji bo serkevtinê li ber wan deriyan sekiniye. Dîtiye ku çend kesên pêşîya wî di vê riyê re derbaz bûne û gelek bi karmendî xebat kirine, lê tu mijarek peyda nekirine ku tê de bi tenê û bi serê xwe siwarê wê meydanê bin û bi kêfa dilê xwe hespê hunera xwe tê de bibeznin. Heta ji nişkave melekê bext û talihe

wî nêrînek xêrê bi ser de gerandiye ku ew mêrxwasî, azayetî, merdî û başiya xwe bibîr bîne. Wê çaxê gotiye ku: ez dikarim bi tîrekê çend nîşanan bidim.

1) Tu kesekî destê xwe nedaye dîroka Kurdistanê, eger ew wê binivîse û derxe pêş, di vî karê de nav û dengê wî yê dahênerî belav dibe.

2) Navên navdarên kurd wenda nabin, bi ber wê re jî navên bab û bapîrên wî jî ku Mîrên Bedlîsê ne bi jîndarî bimînin û zarokên wan ên di pê wan de bîn behsa şan û şohreta wê binemala mezin bixwînin.

3) Bi xwe, her wekî di seranserê jiyana xwe de mîr û hukumdar e, bi vî karê han di rojên bîn de jî di nav kurdan de bi payedarî dimîne û li ser rûpelên rengîn ên nivîsan wî bi serbilindî bibîr tînin û huner û kirinên xwe digihîne wan kurdên reşenbîr ên di pê wî de bîn.

Têr û tesel bûye, hez nekiriye di muqabilê nivîsandinên wî de ji aliyê Dîwana tirkî ve bexşîşek jê re bê dan. Tenê xwestiye kurdan bi xwe û nivîskarên hevçerxên xwe bi hunermendiya xwe têbigihîne û ji vê pê ve jî çavên wî bi tişteki zêde nebûye. Ev yeka han jî bi rastî jê re dest daye û jê re bûye alîkar û her bi xwe çawan xwestiye bi wî awayî bicî aniyê. Dîroka kurdan nivîsandiye û yên ku mirî bûne daye jiyandin, karek wisan kiriye ku tu wextê namire. Sipas ji Mîr Şeref Xan ê mezin re ku tovên jiyane di nav rûpelên Şerefnameyê de daye jiyandin. Ni-

ha em dixwazin serî hildin, bijîn, bi eşkere û şanazî wî mîrê şêr û serfiraz bibîr bînin û heta dinê ava ye jibîr nekin. Ez dixwazim vê jî bêjim ku, dê gelê kurd heta hetayê, çi dewlemend û çi feqîr hemû wext minnetar û sipasdarê wî bin.

Şerefname, mêrxwasname ye. Eger em hinekî di nav rêz û rûpelên Şerefnameyê de dest bi gerê bikin, hûr hûr li ser bisekinin û lêbikolin, piraniya bûyerên tê de, ku dilkul û li berçav in, ya herî zêde diqeta mirov dikêşe, mêrxwasiya nedîtî ya gelê kurd e. Ji serî heta biniya Şerefnameyê kurdekî tirsonek nakeve berçav, hemû kesên mêrxwas, gernas û bêemsal in...

...

Eger Mîr Şeref Xan û Seydayê Xanî, tawanê yeknegirtin û ji hev dûrbûyina me dikin sitoyê serhişkî, guhgiranî û demarsitoriya me, divê li min biborin, li gor baweriya min, perwerdekirina me ya bi hezaran sal me devvekirî hiştiye û wisan bi me kiriye ku em duçarê çavlêgirtina fêlbaziya zalim û zordaran bibin.

Ew, ji bo têgihîştinî û nezanîya me qasê gir û çiyayên me yên asê û bilind û çemên me yên bornedayî bûne girê û asteng li pêşiya me. Bi sedan car, heta bi hezaran car ji vê zêdetir jî me bi riya hîle, gotinên fêlbazî yên birayetî û dostayetiye ve xapandine û bi van gotinan ewqas mejiyê me tijî kirine ku heta niha jî em dîl, hejar û belengaz mane.

Dema ku Sultan Murad gotiye: "Kurd, ji bilî yekîtiya li ser gotina Kelîmeyê Şe-

hadet pê ve, li ser tu tiştê yekîtiyek wan tune”, ne mimkun e ku nezanîbe “xeta xwar di bin gayê pîr de ye”, tiliya Sultan û yên bab û bapîrên wî jî di vê de heye.

Sultan Selîm jî wiha gotiye: “Mêş, ji bo ku bikare têr rakeve, di nav kevlê însan de nerehetiyê derdixe”. Belê, wî zaniye ku kevlê xezê û kîsên lîreyên elmasan Mamoste Mele Idrîs tê bine rê û jê hevî û lavayan bike: tirkekî bike Mîrêmîran ê Kurdistanê, wê çaxê dê kurd jê re Qizilbaşan ji Kurdistanê derêxin. Ne dût e, wê demê filoriyan kiribe nav kevlê xezê û berdabe bin bêrika wî û gotibe: “Bila berîka min şêrîn bar be, para kurdan jî jehr û mar be”.

Ew Mele Idrîs ku hemû kurdên hevde-mên wî, wî mirovekî pîroz û payebilind zanîne, eger bi şîrê koleyan nehatibaya perwerde kirin, qasê misqalek, qasê serê derziyê ruhê kurdayetiyê tê de hebûya, dê kurdan têbigihandiya ku: dema hûn ‘eceman ji Kurdistanê derêxin, nebin xulam û nanxwerên Osmaniyan û werin bi xwe bibin xwediyê welatê xwe. Eger xan ji xan re û beg ji beg re serî natewînin, bila ez bibim hukumdar û rîsipîyê we û bi karê xwe ve rabim, mamosteyekî bi nav û deng ê Kurdistanê ji dergevanekî tirkan û biyaniyan baştir e. Lê, wî wiha nekiriye, heta ku em bêjin ka gelo dê bikira?

Çirokek bi vî awayî ‘ecêb û seyr jî di derheqê Kerîm Xan ê Zend de heye. Li gor vî fermanrewayê desthilatdar û mezin ê Îranê, lênayê ku navê şahîtiyê bi kurde-

kî ve hebe. Ji ber vê jî ji xwe re gotiye: “Wekîl El-Re’ya” (Berdevkê Miskînan).

Mele Xerî, alîkarê Mîrê Rewandîzê bûye û li milê jorê fermanrewayên Kurdistanê rûniştiye. Lê, ji bo ku nanê mîr nanê cî bûye, xweşa mela neçûye. Ew hînê maaş û nanê biyaniyan e. Bi fetwayek dewleteke kurdî ya serbixwe sernixom dike û heta xwe nake nanxwerê dagirkeran sebr û tebata wî nayê.

Em qet dût neçin, her di dema me bi xwe de, di nîvê diduyan a çerxa bîstan de, gelek xwendewarên di nav kurdîzman de, di çarçeveya Kurdistanê niştîman de bûn asteng û kusp li pêşiya kurdên azadîxwaz û ji bo ji holêrakerina navê Kurdistanê yê pîroz bi dil û can têdikoşîn.

Min bi çavê serê xwe dîtî, di şerê xwînavî yê Barzanî de, ku bi hezaran lawên kurd ên nexwenda, hejar û derbeder ruhê wan li ser destê wan û destê wan jî li ser xenceran li dijî dagirkerê regezperest û bêmerhemet serî hildidan, ew xwendewarên me di pêşiya leşkerên dijmin û çek li milê wan dihatin gundên welatê xwe Kurdistanê dişewitandin, kurdan dikuştî, bax û baxçeyên bêçareyan kokbir dikirin, malên kurdan talan dikirin, zarokên sava yên dergûşan de dikirin nav girên agirên sor û pişt re rê nîşanê firokên dijmin dikirin ku çawan bombeyan bi ser wan de bibarînin, çawan wan bêdeng û bêhîs bikin... Ji bo çî?

Çunkê ew aîleya ku ew di nav de hati-

ne perwerde kirin, nezanîne ji bilî bindestî û bîyanîperestiyê pê ve rewş û jiyaneke din jî heye. Di dibistanan de jî her eynê van tiştan hîn bûne.

...

Li gor baweriya min, gunchê hînbûna me ya ji bo xulamtiyê û xwe kêmtanîna xwe, makeda hemû derd û belayên me ne. Çi çaxê bîr û baweriya piraniya kurdan bigihîje wê qonexê ku bêjin mafê wan ê jiyaneke yê wekî hemû xelkên din heye, ew ji tu kesê kêmtir nîn in û koletî tişteki şerm û sernizmî ye, wê çaxê ne xayînen me yê xwendewar, ne ceşên me yê nexwendewar û ne jî yê wekî Mele Xerî yê ji rê derketî di nav me de peyda dibin.

Carekê, mirovekî Mukrîyanî yê navê wî Hemed Axa, ji xulamekî xwe yê kal û emekdar re dibêje: "Tu mirovekî rîspî yî, ez şerim dikim tu xwarinên bermayên min bixwî. Li dîwanxaneyê rûne û bila sîniya xwarina te jî bi ya min re bînin." Mam Xidirê xulam ji axa re dibêje: "Axa, ez ji te hêvî û rîca dikim, ez ê şanzdeh teneke rûn bidim te, lê tu jiyana min a ewqas sal in ez hîn bûme neguherînî. Eger tu tişteki wisan bikî, ez naçar im ku bar bikim û biçim û li ber deriyê axayekî din bijîm. Wer e, piştî van salên min şûn de destê min ji xwarinên min ên bermayî neke."

Qasê ku ez dizanim, ev çîroka han çîroka hemû kurdan e, xulamti û bermayîxwarin neyê guhertin, nabe bibe rûnişt-

tiyê dîwanxaneyê û guhertina wê jî karekî zehmet e. Dema ku ev yek biguhere, bêşik jiyana jî dê ber bi başiyê ve biguhere.

Şerefname hunername ye

Ew kesên şarezayê edebîyata farisî ya nû û kevî in, piştê wê eserê dixwînin û li ser diaxivin, di netîceyê de ji wan re ronî dibin ku di dema Sefewîyan de di Îranê de - ku Mîr Şeref Xan di wê demê de jiyaneke yê edebîyata farisî, ketiye nav rengêki taybetî û cilûbergek fiş, sik û nexweş lê bûye. Gotin û rêzên ne pêwîst ên hişk û req ên derwêşane ketine nav û ketiye nav rewş û haleki pejmûrde. Farisî bi xwe jî wê demê meydana şer a herî nexweş a edebîyata xwe hesêb dikin. Li gor wan, edebîyata wan ji geşekirinê sekiniye, hetta em wê daynin milekî, ber bi çilmisîne ve çûye. Eger em wan nivîsandinên farisî yê wê demê hatine nivîsandin bi farisiya Şerefnameyê re muqayese bikin, tu şik tê de tune ku Şerefname serkopa hemû nivîsandinên wê çaxê yê bi farisî hatine nivîsandine. Materyalên ziman ên ji bo nivîsandina Şerefnameyê hatine bikar anîn, ji xulaseyên zimanê farisî yê wê çaxê hatine helbijartin û nimûneyên edebîyata farisî ya wê serdemê nîşanê xelkê dinê daye.

Wekê me jî got: wî xwestiye di nivîsandina dîrokê de jî kareki wisan bike ku ji hemû dîroknivîsên hevçerx bibore û kesek bi xwe re nebîne ku dev bavêje wî. Yanê bi tîrekê li du armancan xistiye. Ye-



Tablo: 6: Meclîsa Mîrê Botan (© Jîna Nû)

kem, dîroka kurdan nivîsandiye û diduyan jî di edebîyara farîst de jî şaraneke mîmarî û cewhereke sîpehî vehûnandiye.

Min Hejarê feqîr jî xwest bi wergerandina karê wî Fermantewayî şêresîwarê bi nav û deng, bi berekî li du armancan bidim: Yekem, bûyerên dîrokî wekî di Şerefnameyê de hene bi zîmanê kurdî pêşkêş bikim. Diduyan jî, hewl bidim ku destkevtiyên edebîyata kurdî yê nîro tê de bicî bikim. Vêca ger min karî ez van cîbicî bikim, ji bo hejarekî wekî min serbilindî û rûspîtiye. Qet nebe bi vî karê qevdek gul ji edebîyata kurdî re tê dîyarî kirin.

Min Şerefname çawan wergerand?

Wergera Xeyam di destê min de bû. Mamostekî bi qedir û bi qîmet ji min pirsî: "te filan bêjeya farîst bi kurdî çawan bikar anîye?" Min jê re got: ezbenî, daxwaza min ew nîn e ku ez farîst hîne kurdan bikim. Ez tenê bîr û bawerîya Xeyam pêşkêşê kurdan bikim.

Di wergera Şerefnameyê de jî ez her li ser vê rîya han meşiyam. Min kurtiya bûyerên dîrokê bi kurdî raxistiye ber destê kurdan. Di wan cîyên ku Şeref Xan ji bo xweşkirin û xemlandina bendan û raxistina meydana şeran li ber çav û methên mîr û mezinan, bi edîbane bi farîst dest hildaye û xwe pê aciz kiriye. Min jî di şûna wê de bi

kurdane zend û baskên xwe rapêçan û qasê ku şûrê min karî bibre ez pê de daketim ku ez bikarim kurdiyek edebî yan edebek kurdî rayêxim ber çavê hevzimanên xwe. Min helbestên farîst, erebî û tirkî jî kirin kurdî û min piraniya wan jî li ser kêşa berî rêkxistin û di bîçimên wan de vehunandin.

Helbijartinek

Xwendewanên jîr û xwînşêrîn, em niha di nivê diduyan ê sed sala bîstan de dijîn, bentadem li ser pişt a hîvê (heyîvê) pal daye û destê xwe dihejîne ku stêrkên kadizê jî têxe bin pençeyên xwe û istifadeyê jê bike.

Demek dirêj e li ber ronahiya elektrîkê xew li cin û dêwan herimîye û bi dinê de raqewirîne. Çiyayê Qaf jî, ji bo ku Çiyayê Qafqasyayê ye, ewqas kargerîniya Sovyetê tê de heye û ewqas muhîya ye, êdî ciyê lêpirsinên evsaneyî tê de nemane.

Çarsed salî berî niha, li ba gelek kesan wisan bû ku ew awa nezelaîyên han destbikar û desthilatdar in. Lê îro behsa pîrhevok û şevên tarî henekên zarokan e, kesek êdî berbeyanan napîve û bi miriyan re xeber nade. Di ciyê van de êdî zanistên nû yên cihê cî girtine. Tif û du'ayên derwêş û pîran jî ji kar ketine û nezelaî di ortê de nemaye. Hemû tiştên heyî ber çavan e û çavlêgirtinî serî li zanistê naêşîne.

Mîr Şeref Xan, di dema xwe de, bêtî destlêdan û guhertin, tiştên sehkirine y-nî bi wî awayî neqil kirine. Tê dîtî ku

gelek ji wan bi dilê wî bi xwe jî nebûne. Belgeya vê jî ev e ku, dema behsa hinek cure mijaran kiriye, pîneya "Xwedê çêtir dizane" pê ve daniye. Ji bilî vê, di pêşgotina xwe ya bi qîmet û hêja de daxwaza lêborîna şaşiyên kiriye.

Ez jî bi vê mebestê, naçar mam xwe bigehînim hawara wî. Min hinek bûyerên dînrî wekê yên Buxduz ê xwînteht û neşêrîn, ji naveroka wê dîrxistin û kêşa nav pêşgotina xwe. Ez hêvîdarim ku ruhê pak yê wî mîrê nazdar ji van bijartinên min ê hejarî geş û şah be û ji min aciz nebe.

Ez xwe gelek bextewer dizanim ku çî ji destê min hatiye min ji bo wergera wê teksîr nekiriye û her ewqas ji destê min hatiye. Çî kesê qasê ku taqeta wî/wê digîhîjê ewqas bike, bêşik e ku wê çaxê dê karê me gelek pêş de biçê. Bersivdana pîrsa ka gelo ez di vî karê xwe de bi ser ketim an ne, bi rastî gelek zehmet e û ez nizanîm. Xwendewanên jîr û bibîr dizanin û teqdîr a wan e. Tenê ev ji destê min tê ku ez ji wan re bêjim û rîcadar bim ku bi çavekî bêteref, bi hêminî û bi hûr û kûrî li kirinên min binêrin.

Ez dîsan dibêjim; min gelek bêjeyên kurdî kirin ser kaxezê. Êdî kakil û behra wan a din hebe yan ne, ez nizanîm. Lê ez ji kirinên xwe ne poşman im. □

20/07/1970

Kurmanciya wê: Ziya Avci

Ev nivîs kurtaya pêşgotina Mam Hejar a wergera soranî ye.

Pêşgotina çapa erebî ya Şerefnameyê

Mehemed 'Elî 'Ewnî

Ew kesên wijdana xwe bikin rehberê xwe û bi awakî hûr û kûr rojên borî yên gelê kurd bikolin, gelek baş têdigihin ku ev gel di hemû deman de -pêşya Îslamîyetê û piştê Îslamîyetê- dîroka wê tijî ji serbilindîya ne û di karên baş û merdane de destekî wî yê bilind jî heye.

Di xurtkirina bingehê Îslamîyetê û bilindkirina koşka rewşenbiriya ereb de, bêtexsîratî beşdarî kiriye. Tu li kîjan koşeyê û li kîjan deverê hunera Îslamîyetê bigerî, destkariya kurdan tê de hebûye û di warê nexş û nîgarên cure cure de xebat kiriye.

Lê dîroknivîsên vê rojhilata han her di destpêkî de, bi taybetî di van sedsalên dawiyê de, bîra gelperestîya xwe kirine û hemû edîbên li ser regezên din ji xwe re henek hesabandine, tu wextê pêwîst nezanaîne li kurdên hevûdin û hevdemên xwe binêrin û hawarek ji bo wan bikin.

Gelek zanayên jîr û şairên kurdan jî bi zimanê erebî, farisî, tirkî, fransîzî û inglîzî gelek kitêb nivîsandine, lê tu carê hiş û

aqilê wan neketiye ku bîra xwe û zimanê xwe jî bikin û nêrîn û çavêkî bi ser regez û qewmê xwe de jî bigerînin. Êdî di çarçeveya vê terkexemiyê de kurdan her çi tiştî ji bo Îslamîyetê kirin û çi serbilindiyên wan li ser rûpelên dîrokê hebûn, şik jê hatin kirin û ev kirinên han hem ji bîra kurdan û hem ji yên biyaniyan çûn. Zimanê şêrîn û rewa yê kurd jî di piraniya bajarên mezin ên Kurdistanê yên wekê: Mûsil, Diyarbekir, Sine û Mêrdînê de berê xwe da ber jarî û qelsiyê, zimanên biyanî bi awakî wisan li wan deran cî bûn ku, eger rêwiyek ne şereza û ne zîrek li wan cîyan re derbaz be û lê binêre, dikare bêje ku tu peywendiyek van çîyan bi Kurdistanê ve nemaye. Li gel vê jî, piraniya herî zêde rûniştîyên van bajarên mezin, bi xwîn, bi ziman û bi orf û adetên xwe kurdên baş in. Lê wisan lê hatiye kirin, wexte erebî, tirkî û farisî zimanê wan dabelîne.

Li gelek cîyan tenê ji gundî û koçeran re kurd dibêjin, kesên rûniştîyên bajarên

kurd nayên hesibandin.

Vêca dema ku min ew dîtin, dilê min serî hilda û min ji xwe re got: ez ê li pê coxrafya û dîroka kurd û Kurdistanê bikevim, çî koşe û koncek kitêbxaneyên Qahîre û Asîtaneyê (Stenbol) hene ez ê bigerim û ew destnivîsên behsa kurdan dikin, toza li ser wan bimalim, wan bi-dest bixim û têxim ber destan.

Rojekê, dema ku ez ji bo vê mebestê çûm Keşfû'l-Zûnûn, min navê hinek kitêbên dîrokê yên wekî: Mefreû'l-Kerûb fi Exbar Benî Eyyub, Dîroka Şeref Xan ê Bedlîsî, El-Rewdeteyn fi Exbar El-Dewleteyn: El-Nuriyye wel Eyyubîyye û Sîretû'l-Selahîyye û çend kitêbên din jî ku behsa eynê mebestê dikirin û di çerxa navîn de bi zimanê erebî û farisî hatibûn nivîsandin, dîtin.

Pişt re nasekî min ji min re got: Şerefname di sala 1860ê zayînî de, yanê 70 sal berê (bêguman li gora nivîsandina vê pêşgotina han 70 sal- Z. Avci) niha li Rûsyayê bi farisî hatiye çap kirin û wergerandine bi zimanê fransîzî jî û di vê sayeyê de di nav rojhilatnasan de belav bûye û çî kesê bixwaze bi dîrok û coxrafya Rojhilata Navîn ve mijûl bibe, gelek pêwîstê wê kitêbê ye. Çunkê, Şerefname her çendîn dîroka kurdan e, lê bûye ferhengeke mezin a dîrok û coxrafyayê ji bo wan herdu melbendan ku bûyerên girîng li ser qewimîne. Yanê wekê êrîşên teter û tirkmenan ên wêrankerî û rûxandina rol û testîra 'Ebbasiyan û serhildana gelek dewlet û

paşayên biçûk ku ji bin baskên teter û se-leşûkiyan derketibûn, yanê yên wekê akkoyunî û qerekoyunîyan.

Di havîna sala 1922an de, rîya min bi Helebê ket. Min û dostekî min ê zana û kurdperwer me li ser vê meseleyê diaxift, wê navê re Şerefname bi bîra min ket û min jê re got ku, li Rûsyayê hatiye çap kirin.

Belê, her di eynê wextê de wî jî mizgîniyek da min û ji min re got, nusxeyek wê li Helebê di Kitêbxaneya Mekteba Osmanî de heye. Li ser vê, êdî min xwe lê negirt û bêsekin min berê xwe da wê kitêbxaneyê. Min kitêb jî wan xwest û dest bi nivîsandina wê beşa ku piraniya wê behsa kurd û Kurdistanê dike, kir. Min beşa wê ya kêma hecim jî di cî de hişt, ku nivîskar di derheqê Osmanîyan û fermanrewayên Îranê de nivîsandibû û navê wê danîbû "Kûtayî".

Bi vê yekê ji min re ronî bû ku Şerefname yek ji wan kitêbên bêemsal û herî baş e ku di destpêka Îslamiyê de li ser kurdan, dewlet, mîr û mezinên wan hatiye nivîsandin û dîroka wan bûyeran heta sala 1005ê koçî (1597ê zayînî) aniye.

Dawiya salê bû û ez vegeftiyam Misrê. Ez çûm ba mamostayê zana Şêx Fereculah Zekî Kurdî û min mizgînî dayê û jê re got, min tişteki hêja aniye. Çunkê min dizanîbû ku ew mirovê pak û dilsoz, di çapkirina kitêbên biqîmet de çiqas destsivik e. Ji bo vê, min jê daxwaz kir ku Şerefnameyê jî çap bike. Piştî hinek sohbet

û mijûliyan, ji min re got ku: "Ez jî zû de ye bi vî karî mijûl im, min nusxayek ji çapa Rusî û destnivîsa Sureyya Bedirxan jî peyda kiriye û ez dixwazim van çap bikim." Bi vî awayî me bi hemû karînen xwe mil da ber vê xebata han.

Di ber çav re derbaskirin û danberhevî

Ew hersê nusxe li ber destê me bûn. Mamosteyê zana û birêz Şêx Muhyeddîn Sebrî Kurdî(*) ku di zimanê farisî de gelek mahir bû û li ser edebiyata kevin û nû gelek şareza bû, bi mêranî xwe da ber vî karî, hat alîkariya me û mil da ber vê xebatê. Daneberheviya hersê nusxeyan girt ser xwe, ku eger tiştêkî zêde di nusxeyên destnivîs de didît ew dikirin ser çapa rusî. Şêx Ferecullah Zekî, ji bîlî çapkirinê, rastkirina şaşiyên çapê jî girt ser xwe. Min jî, ji bo ku şarezatiya min di derheqê coxrafya û dîroka Asya û Tirkîyê û bi taybetî wilayetên rojhilatê de hebû, karê min jî ew bû ku ez li navan binêrim û ger şaşiyek hebe rast bikim.

Ev xebata me ram salekê ajot û em bi daneberhevî, lêkolîn û lêgerînê mijûl bûn. Destpêka hemû hefteyan em li mala Şêx Ferecullah berhev dibûn û herkesê xebata xwe ya di wê hefteyê de pêşkêş dikir.

Me nusxeya çapa rusî kir bingeş. Çi tiştên di destnivîsan de zêde hebûn û me pêwîst dîtîn, me ew kirin nav naverokê û yên gelek girîng nebûn jî me di jênotan

de bicî kirin. Me da nîşan jî ka di kîjan ciyan de ferq di navbera wan nusxeyan de heye.

Şeref Xan, di pêşgotina xwe de nabêje ez ê behsa Gelbaxiyên bikim. Lê dema ku ew di destnivîsan de ber çavê me ket, me baştir zanî ku em têkin nav naverokê û çap bikin.

Emekdarî

Hemû kurd, hewcene qencî û başiya V. Vilyanov Zirnov hemû wextê bibîr bînin û wî rojhilatnasê birêz û hêja jibîr nekin, ku cara yekê di sala 1860an de, Şerefnameyê çap kiriye û li rojava daye belav kirin. Xwedê jê razî be, wî nemirê fransîzî pêşgotineke gelek bi qîmet li ser Şerefnameyê nivîsandiye. Em jî bi navê emekdarîyê wêrdigerînin, tenê ew ne tê de, ku serpêhatiya Şeref Xan dubare kiriye, ji bo ku ew di dawîya kitêbê de heye, ji bîlî wê çî tiştên nivîsandiye em ê pêşkêşê xwendevanan bikin. Heta herkes bizane ku ew zanayê payebilind û rojhilatnasê rojavayî, heta çî dereceyê ji bo peydakirina nusxeyên bidestnivîs ên Şerefnameyê hewil daye. Li çend paytextên rojhilat û rojavayê geraye û di riya danejiyandina wê de çendîn derd û cefa kêşaye. Bi vê mebestê, ez dibêjim ku, zana û nivîskarên hişyar û zîrek ên rojhilatê jî têbigehin ku, di danejiyandina eser û afirandinên kevin ên bab û bapîrên hevvelatîyên min ên kurd de behrek wan a zêde heye. Bi taybetî ez bangê endamên "Yaneyî Serkewtin" a li

Bexdayê dikim ku dest bidin ber xwe û ji bo parastina şûnewarên kevin ên gelê kurd ê çareş, bixebitin.

Gelek mixabin, heta niha zana û nivîskarên kurd, di axaftin, name û nivîsandina kitêban de zimanê xwe yê bab û kalan daye milekî û zimanê wan gelan di devê wan de ye ku hetta mafê jiyane jî ji bo wan û gelê wan rewa nabînin.

Xwezî çapkirina vê kitêbê kurdayetî di hindurê wan kurdên gir û mezin de bidaya jiyandin û wan han bidaya ku Şerefnameyê bikirina kurdî û têkirina ser wî zimanî ku rewşenbîrên kurd fehm dikirin.

Ez hêvîdar im ew komeleya navê wê derbaz bû, vê xebata han a fransîzî bikin eynika têkoşîna xwe û bi hemû taqet û mecalên xwe ve hewil bidin ku, edebiyata kurdî bidin jiyandin, zimanê xwe di nav xwendevanan de pêş de bibin, di axaftin, di nivîsandin û di çapemeniyên xwe de her zimanê kurdî bikar bînin. Xebat bikin ku zaravayê ji hev cihê yê bakûr, başûr, rojava û heta yê lorî bikin yek û ew destnivîsên hene û li ser kurd û Kurdistanê hatine nivîsandin, di rojhilat û rojavayê di koşeyên bêkesî de hatine ragirtin, ew peyda bikin, tozên li ser wan dakutin û jê îstîfade bikin.

Ez jî bi beşa halê xwe, eger bizanim zanayên kurd ên erebîzan û erebên dostên kurdan, alîkariya min bikin, ez amade me vê kitêba han a biqîmet bikim erebî û heta kesên ku farisî nizanin jî bizanin ka gelo tê de çi heye. Lê eger endamên birêz

ên Yaneyî Serkewtin bixwazin bi xwe wê bikin erebî, em ku di pêdaçûnî, di daneberhevî û di peydakirina navên rast ên coxrafi û dîrokê de xwedî tecrube ne, di werger û çapkirina wê de li gor taqet û mecala xwe amade ne ku di hemû cure warê zanistî û edebî de alîkariya wan bikin.

Ez dixwazim xalek din jî li vir bidim xuya kirin ku, navê 170 kitêbên ji aliyê Mîr Sureyya Bedîrxan ve ji me re hatibûn dan û hemû jî li ser kurd û Kurdistanê bûn, cî û salên çapkirina wan jî ku hatibûn diyar kirin û du heb jî fihrist ji wan re hatibûn çêkirin, gelek mixabin, di dema dawîn de me nekarî em bi vê çapa farisî re biweşînin.

Em gelek sipasê Mîr Sureyya Bedîrxan dikin û her wiha qenciya Celadet Bedîrxan ê birayê me jî li ser me heye ku di havîna sala 1926an de, navek re alîkariya me kir. □

Kurmanciya wê: Ziya Avcî

Şerefname neynika dîroka kurdan e

F. Vilyaminov Zimov

Şerefname, kitêbek e ku ji dema kev-
nare ve heta sala 1005ê koçî (1597ê za-
yînî) behsa eşîret û binemalên kurdan di-
ke. Nivîskarê wê Şeref Xanê kurê Şem-
seddîn ê Mîrê welatê Bedlîsê ye. Bedlîs, li
gel biçûktiya xwe jî ji hemû cîyê mezin-
nişînên Kurdistanê girîngtir û rûmetir
e. (*)

Lê gelek dijwar e em bêjin ku ka gelo
wî kengî dest bi nivîsandina vê kitêbê ki-
riye. Eger em li ser pêşgotina wê hinekî
bisekinin û lê hûr bibin, wisan tê xuya
kirin ku, gelek salên dirêj daxwaza nivî-
sandinê di mejiyê wî de hebûye. Çunkê,
gelek li ser dîrokê sekiniye û biryar daye
ku dîrokek wisan binivîse ku riya kesekî
din li wî warî neketibe û li ser kar nekiri-
be.

Lê ji ber kar û barên xwe yê zêde, jê re
li hev nehatiye ku ew daxwazên wî pêk
bên. Di dawiyê de, dema ku ketiye nav
aramî û rehetiyê, wê çaxê dest pê kiriye
dîroka gelê xwe ya kurd raxistiye ser rû-
pelan.

Li gor baweriya min û ya Mr. Volkov

jî, piştî Sultan Murad, Şeref Xan aniye
ser cîyê bab û bapîrên wî, wê çaxê wî dest
bi nivîsandina kitêba xwe kiriye.

Materyalên Şerefnameyê ji belgeyên
hemû awayê yê rojhilat, wergirtinên ji
devên kal û pîrên bawerî pê kirî û ji bîra-
nên xwe pêk aniye.

Tu şik û asteng di qîmeta zanistîya vê
dîroka kurd de tune. Li gel bi ser de der-
bazbûna 300 salan (*), hê di rojhilat de
karekî bi vî awayî nehatiye kirin ku bi Şe-
refnameyê re bê muqayese kirin.

Bi rastî jî, ji bilî Şerefnameyê, di derhe-
qê kurdan de çend pîneyên li ha û li wir
û çend perçeyên kêmanebin, ku ketine
nav kitêban, di vî warî de ji vê çêtir ber-
hem bi dest nakevin. Ew çend perçe jî
her çiqas zêde jî bin, lê tiştekî wisan na-
din dest ku mirov pê bêdeng be. Em bi
wan nikarin bigihin avakirina dîrokek ji
gelê kurd re, ku gelek şax jê derdikevin û
her şaxek xwediyê dîroka xwe ya serbixwe
ye.

Şeref, ji bilî wan bûyerên ji dîroka ere-
bî, farisî û tirkî berhev kirine, beşek zêde

jî ji serpêhatiyên nû û girîng ên wisan xistiye ser ku, bi karekî zêde eşîret bi rêk û pêkî bi hev ve girêdane û bi vî karî valatiyên gelek zêde yên dîroka gelên Asyayê tijî kiriye. Di vir de jî başî û qenciyekek gelek mezin kiriye.

Di derheqê coğrafya, karakter û rewşa wan de xwediyê zanyarî bûye, tiştên wan ên baş û qenc helbijartîye û di dîroka xwe de bicî kiriye. Bi vê jî bihayê edebî ya nivîsandina xwe gelek bilind kiriye.

Ew rexneyên ku em bikarin li Şeref bikin, ev herdu xalên han in:

Yek ji wan: awayê nivîsandina kitêbê ye û ya din jî awayê rêzkirina wê ye.

Dibû hemû bûyerên dîroka kurd bikira du beş û beşek ji ya din gelek cihêtir bûya: Ew milên ku gelek dîqçet dikişînin, ew in ku, di pêş de nehatine nivîsandin û dîroka wan a borî ji kurdan sehkirîye, hinekan jî bi çavên xwe dîtine û bi xwe bûne şahid. Kitêb, di vî warî de çavkanîyeke wisan e ku, tu wextê ziwa nabe û di vê kitêbê de ew çavkanî ji hişkbûnê rizgar bûne. Lê yên ji kitêbên din wergirtine, di wergirtina bûyeran de gelek hişê xwe nedaye ser û xwe ji şaşîyan neparastiye.

Hinek caran di wergirtina bûyeran de ketiye nav aloziyê, navên wan şaş nivîsandiye û rastê bêserûberîyek wisan hatiye ku mirov nikare çavê xwe lê bigre.

Di warê awayê nivîsandinê de jî, eger ew şîirên hejmarên wan zêde û ew çend bûyerên hêlma wan a sawmgiran yên kêr nebin, ku rojhilatî jê hez dikin û li

gor me jî ne baş e, nivîsa wê bi giştî hêsan û rewan e. Tê de çend bûyerên ji rastiye dûr jî li ber çav dikevin.

Di çapê de, min nişana pirsê li ber wan gotinên ku ez li ser wan dudil bûm danî. Di dawiya kitêbê de ez bi dirêjî li ser wan xalên ku min îşareta pirsê li ber danîye disekinim, behsa wan dikim û wan "nivîsandinên xwe" dihesibînim.

Li gel van tevan jî, nabe rexneyên min girîng bînin girtin, çûnkê ne tenê Şeref Xan, hemû nivîskarên rojhilatî guhên xwe nadin van cure awayên han ku dibê mirov di lêkolînên zanyarî de lê hişyar be. Piraniya rojhilatîyan li gor bîr û bawerîya xwe dîroknivîsin û li gor wan ev awa baştir e.

Di warê awayê rêzkirinê de jî dibê mirov ji yekî wekî Şeref Xan re çavên xwe bigre. Çûnkê, piraniya jiyana xwe di fermana dîwan, di şer û sergêjiyan re derbaz kiriye.

Şerefname, di welatên rojhilat de gelek kêr belav bûye û sebebê wê jî gelek hêsan e:

Roleke girîng a gelê kurd di Asyayê de tunebûye û dîroka wan jî ji bo xelkê rojhilatê gelek nehatiye bikaranîn. Lê car-din, bi ser vê de jî, di ferhenga huner û kitêban de, ku Hacî Xelîfe (Katib Çelebî) nivîsandiye, ji navê Şerefnameyê re cîyekî baş amade kiriye. (Binêre: Keşfu'l-Zunûn, çapa Filorchil, hejmar: 2135-2144). Wî nivîskarê mezin, di derheqê coğrafyayê de kitêba Cihannûma nivîsandiye.

Her wiha eger em Zeynelabidîn yê ku kitêba Riyadu'l-Seyyahe nivîsandiye jî bi-hesibînin, van herdukan jî di derheqê kurdan de gelek tişt ji Şerefnameyê wergirtine. Di Asyayê de du caran jî wergera Şerefnameyê bi zimanê tirkî hatiye kirin. Yek ji wan, yekê navê wî Samî ji bo mîrekî kurd ê navê wî Mustefa Beg wergerandiye (Binêre: Murlî, Fihrista Destnivîsên erebî û farisî yên kevin ku di Kitêbxaneyaya Asya ya Qraltiya Brîtanya Mezin û Irlandayê de heye).

Hacî Xelîfe, kitêbê bi navê "Tarîxa Şeref Xanê Bedlîsî" bi nav kiriye. Di Ewropayê de cara yekem, Derbilo ev behsa han vekiriyê û di du maqaleyên ku li ser kitêbxaneyên rojhilat nivîsandine, behsa wê kiriye. Carekê jê re dibêje: "Dîroka Şeref Xanê Bedlîsî" û careke din jî bi navê "Dîroka Kurdan" binav kiriye. (Binêre: Mr. Kut. Ev herdu maqaleyên han jî ne kêr û ne zêde ji ferhenga Hacî Xelîfe hatine wergirtin. Wisan dixuyê J. Malcolm li pêşîya hemû Ewropiyan nusxayek Şerefnameyê bi dest xistiye, ew jî ji aliyê serokê Eşîreta Muheyzî (Mehîzî, Mihîzî) ya kurd jê re hatiye dan. Li ser nivîsandiye: "Kurdîna Kurunîk" hê "Fun Şeref". Ev nusxeya han di Kitêbxaneyaya Asya ya Qraltiya Brîtanya Mezin û Irlandayê de ye. (Binêre: Fihrist).

Gelek jî ecêb e ku, Tarîxa Fermanrewayên Erdelan jî behs kiriye. Tê de hatiye gotin ku di sala 1225ê koçî (1810ê zayîni) de hatiye nivîsandin. (Binêre: Kataloga

Murlî û Morilo.

J. Malcolm, di dîroka xwe ya farisî de, ku di sala 1815an de weşandiye, gelek caran behsa Şerefnameyê dike û hetta çend kurte bûyerek jî jê werdigre. Lê, gelek bi giringî negirtiye û bi dirêjahî li ser nave-roka wê nesekiniye.

Em dikarin bêjin ku heta sala 1826an, Ewropiyan qîmeta Şerefnameyê nezanîne. Çunkê, dîqqeta rewşenbîrên wê rane-kêşaye. Ez li vir bi xwe re dibînim vê rastiya han rayxim ber çavan ku, di saya zanayên rusî ev diyariya han a hêja pêşkêşî zanistî hatiye kirin (Binêre: Durn, Meko-yî Asyayî, beşa diduyan).

Mr. Frach, kesê yekem bû ku di sala 1826an de, bangek ji bo vê dîroka kurdan derxist û kurtelêkolîn û şilovekirinek li ser nivîsand û di dawiyê de daxwaz kir ku ev dîroka han a giring a Asyayî bê wergerandin. Ew wiha dibêje: "Wergerandina vê afirandina han a bi qîmet dê bibe pencereyek û dîroka Asyayê ji me re ronî bike." Di eynê salê de, Mr. Volkov, bîranînek li ser dîroka fars belav kiriyê û tê de behsa navê Şerefnameyê û hinek jî ya Şeref Xan bi xwe kiriyê. (Rojnameya Asya, beş: 8, sal: 1826, rûpel: 291-298).

Qasek piştê wî jî, Mr. F. B. Charmoy ku li St. Petersburgê mamosteyê zimanê rojhilat bû, li ser pêşniyara Mr. Frach dest bi wergera Şerefnameyê kir (Binêre: Frahc, Jiyana Şêx Sefî Erdewîlî), eger nexweştî nebûya, wî rojhilatnasê hêja dê xebatek wisan bixistaya ber dest ku dîq-

qeta hemû zanayan bikêşaya. Di dema me de jî, ku di saya têkoşîna zana û gero-kan, lêkolîn li ser ziman, dîrok û coğrafya Kurdistanê di halek gelek geşesirandinî de ye, Şerefname, ji bo vê mebesta taybetî gelek bi kêr û feyde ye û hejmara kesên jê îstîfade dikin, roj bi roj zêde dibe.

Mr. Etienne Marc Quatremère Katir-mir, di Dîroka Moxol û Fars a çapa Parîsê û di rûpela 319-329an de, çend perçeyek ji Şerefnameyê wergirtiye. Eger em li fihrista "Destnivîsên Rojhilat Di Kitêbxaneyaya Qeyser de", St. Petersburg, sal: 1852, rûpel: 295an binêrin, bi serê xwe maqaleyek ji vê dîrokê re amade kiriye. Dr. Barb, di de, ku di derheqê felsefeya dîrokê de nivîsandiye û behsa Tirkîyê û Fars dike, di du maqaleyan de kurtiya Şerefnameyê bi serî heta binî bicî kiriye û li ser sekiniye.

Her wiha wî nivîskarê maqaleya sêyan li ser pênc binemalên kurd nivîsandiye ku mirov dikare bêje, beşa yekê pê remam kiriye. Mr. Morey jî di fihrista Şerefnameyê de navê wan eşîret û serokên bi şaşî hatine nivîsandin, daye ber du wergerên tirkî, ku ev herdu wergerên han di Muzexaneyaya Brîtanayê de nin, ew rast kirine.

Mr. Larsen, di behsa kurdan de kurte maqaleyek wî li ser dîroka kurdan heye û çend bûyerên 'ecêb neqil dike ku ji Şerefnameyê wergirtiye. Lê di dawiyê de Mr. Kotik rastiya wê gotîye û nivîsandina di vî warî de daye weşandin û heta bi tehl û

tirşiya çendîn salan pêwistiyek pêk anîye.

Ez fikirîm û di dawiyê de têgihîştîm ku çapkirina Şerefnameyê, ji bilî feydeyê wê ya mezin a piralî ya ji bo zanyariya dîroka di derheqê kurdan de, gelek û gelek pêwist e. Ji ber vê, min biryar da ku ez nusxeya farisî bi wergera wê ve belav bikim û çend meseleyên felsefî, dîrokî û coğrafî jî têkim ser wê beşa ku ez ê biweşînim, ji bilî kutayîyê, ku dawî bi Şerefnameyê tîne, ew jî ku ez ê çap bikim, ji bo dîroka kurdan gelek girîng e, çunkê:

Behsa her eşîretê cihê cihê tê de ye û ez bi behsa serpêhatiya jiyana nivîskar dawî lê tînim û kutayîya wê jî dikeve ser cilda diduyan. Vêca va ez ê bi çend bêjeyan ronî bikim ku ji bo belavkirina farisiya wê ya eslî, ka gelo min çi kiriye:

Min li çend destnivîsan nihêriye

1) Destnivîsa Kitêbxaneyaya Qeyser a li St. Petersburg, ku di sala 1007ê koçî (1599ê zayînî) de -piştê nivîsandina kitêbê du sal- hatiye nivîsandin û ji aliyê nivîskar ve jî hatiye redakte kirin(*). Mr. Frach, ev destnivîsa bi qîmet dîtiye (binêre: Durn. Navê wê di nav fihrista destnivîsan de nivîsandiye, lê gelek kêmasiyên wê hene. Ji nivê behsa Eşîreta Mehmûdî dest pê dike û di behsa Eşîreta Sîyamen-sorî de qut dibe (binêre: Beşa Yekem, çapa min a farisî, rûpel: 304-327).

2) Destnivîsa Mr. Xanikov. Vî zanayê han ê rojhilatnas, di sala 1854an de, li Pî-

ranê konsolosê giştî yê Rusyayê bûye. Vê nusxeya han li Dîleman a li ba Salmasê sitandîye û destnivîsên din jî ji Kitêbxaneyaya Yehya Xan ê Xanî yê Fermanrewayê Azerbaycanê wergirtiye.

Birêz Xanikov, ku hemû kes dizane di riya zanistî de mirovekî çawan e, heta roja ez ji çapkirina wê xelas bûm, destnivîsên xwe raxistin ber destên min.

Destnivîsa Xanikov, di 19yê meha şe'banê ya sala 1252yê koçî (1837ê zayîni) de mirovekî navê wî Mehmûd Riza yê kurê Sabir 'Elî Kerbelayî (Qerbelayî), li ser fermana Rewşen Efendî yê ji gundê Dîlmekan, li ber destnivîsek Şerefnameyê nivîsandiye, ku dîroka wê nusxayê digihîje sala 1007ê koçî û di dawiya wê de jî wiha nivîsandiye:

Nivîskar dibêje: "Nivîskarê vê kitêba han ê muhtacê merhemeta Xwedê, Şerefê kurê Şemseddîn Rojî Kesrayî, di dawiya meha Muhherrem a sala 1007an a koça pêxember -silavên Xwedê li ser bin- li bajarê Bedlîsê -Xwedê ji qeza û belayan biparêz e- ji rastkirin û bijartina şaşiyên xelas bû."

Xwediyê vê destnivîsê jî di dawiyê de wiha nivîsandiye: "Bi alîkarî û himmeta Xwedayê bexşînder, jartirîn koleyê ber destê te, Mehmûd Riza yê kurê Sabir 'Elî yê Kerbelayî û ji gundê Dîlmekan (Dîlemekan), di roja sêşembê nêzîkî taştê ya 19yê meha şe'banê, nivîsandina vê kitêbê temam kir."

Di destnivîsê de, li gelek ciyan şûna

muhra Rewşen Efendî tê dîtin. Li ser muhra wî bi farisî ev îbareya han hatiye kolandin: ".....(Xwedê xwe gelek zû di-de nîşan, lê dilekî hişyarî jê re lazim e). Di nîvê wê de jî navê Rewşen û sala 1251tan tînin dîtin.

Destnivîsa Xanikov 250 rûpel e, hemû bi hubra kesk hatiye nivîsandin, nivîsandin gelek rewan e û rêzên wê jî nêzîkî hev in.

3) Destnivîsa li Muzeya Asyayê ya Unîversîteya Qeyser a li St. Petersburg, di bin reqema 756an û li ser ciyê berî yê Rosso ye. Ev destnivîsa han 605 rûpel e û bi xetek nexweş hatiye nivîsandin. Lê baş tê xwendin. Bi diyarî jî birêz Rosso re hatiye. Ew kesê xwediyê wê, li ser rûpela yekem wiha nivîsandiye: "Ji Badaxanê Hakimê Sawicbulax ve". Lê ne tarîxa nivîsandina wê li ser e û ne jî navê nivîskar. Çar xetên destnivîsê ên dawiyê jî nemane. Ev nusxeya han a Rosso ji birêz Volkov re hatiye dan û wî jî maqaleyek li ser nivîsandiye û di rojnameya Asya de hatiye weşandin.

4) Destnivîsa Muzeya Asya ya di bin reqema 576an de, Baron Bond ji Iranê aniye û tenê 100 rûpel e. Bi hevoka: "Keywan keywan ba wucud 'aluşmekan" a ku di pêşgotina farisî de ye, dest pê dike û bi behsa Fermanrewayên Suwêdiyan a Subhan Beg û Sultan Ehmed Beg dawî pê tê. Destnivîs, bi xetê gelek sipehî hatiye nivîsandin. Wisan dixuyê kevn e û qet agahdariyek jî li ser nedaye. Di dest-

pêk û dawiyê de çend rêz nivîs jî di derheqê Xwedê û dîn de li ser zêde kiriye.

Bendek gelek xweşik jî li ser dîroka Erdelan nivîsandiyê û ev û destnivîs bi hev re cild kiriye. Du kêmasiyên mezin di vê destnivîsê de hene: Yekem, ji rista Mihemedî Xan El-Şehir dest pê dike û heta tê digihîje gotinên “weşayisteyî refet an kesaset”. (Binêre: çapa Şerefnameyê ya yekem, rûpel: 127-159an ya beşa yekem). Şaşiya diduyan jî, van du bêjeyan: “asar şeca’ets” dest pê dike û heta tê digihîje gotinên “wa penc pisirdaşt”. Binêre: çapa farisî ya Rusya, beşa yekem, rûpel: 189-197an. Tiştên din jî tê de tên dîtîn û rûpelên wê jî tev di ciyê xwe yên eslî de nînin.

Li gor baweriya min, ji van çar destnivîsan, diduyên wê temamin: ew jî nusxeya birêz Xanikov û ya Muzeya Asyayê ya di bin reqema 576an de nin. Her çendî ew herçar bendên behsa Zerza, Estûnî, Dasnî û Terza dikin kêm bin jî. Vêca ez dibêjim ku mimkun e nivîskar bi xwe behsa van herçar bendan nekiriye. Ji xeyrê vê ihtîmalê, mirov dikare vê jî bêje: yan tiştêkî di vî warî de nezaniye, yan jî muhlet neketiyê yan pê re negihîştîye yan jî bi xwe dev jê berdaye. Herçî nivîsandina van navane jî, cardin mimkun e ku wî ev nav nivîsandine û di firseteke destkevtî de cardin lê vegere, lê ev firseta han jî jê re li hev nehatiye. Ev bîr û raya han ji tevan zêdetir nêzikî rastiyê ye. Çunkê, Şeref Xan, bi gelemperî guhê xwe nedaye

fihrista navên ku di pêşgorinê de rêz kiriye û li gor fihrista çêkirîye behsa mijaran nekiriye. Ev rêk û pêkiya ku îro tê de tê dîtîn, di saya ew fihrista ku min bi xwe jê re çêkiriye. Di destnivîsa Muzeya Asya ya di bin reqema 576an de, di beşa diduyan Sefheya Sisiyan (Rûpela Sêhem) de, ku dibû di navbera Fermanrewayên Mahîdeşt û Baneyê de Behsa Terza bê kirin û Behsa Terza ji hemû destnivîsan ketiye, behsek bi serê xwe ya Gelbaxiyan tê. (Binêre: Nusxeya J. Malcolm, Fihrista Munrly, rûpel: 149).

Min, ji ber vê yekê behsa vê rewşa han û ew guhertinên tê de hatine kirin, kir ku, dilê mirov rehet nabe û çavê mirov bi hêsanî ba hîlnade ku mirov bêje: gelek nusxeyên din ên Şerefnameyê dest nakevin. Ez, ku ew herçar nusxeyên kerin ber destê min, naçar im ku cihêtiyên di navbera herçar nusxeyan de hene, di dawiya beşa diduyan a kitêbê de bidim nîşandan û ji vir şûn de, dema ku ew maqaleyên di derheqê van destnivîsan de bînin nivîsandin, dê qîmeta tevan bidin xuya kirin. Ji bo liberçavgirtina çapkirina kitêbên bi destnivîs ên Kitêbxaneyê Qeyser ên belavbûyî baştir bû. Çunkê, Şeref Xan bi destê xwe redakte kiriye. Ez dixwazim bêjim ku, karkerên kitêbxaneyê gelek rûyekî xweş nîşanî min dan, rê dan min ku ez îstîfade ji wan destnivîsan bikim. Ji bo ku di destûra kitêbxaneyê de kitêb ji derve re nedihatînin dan. Ji ber vê ez mecbûr mam ku li wir, nusxeyên din bi nusxeya

destnivîs a Xanikov re bidim berhev. Ji ber vê, di vî warî de sergêjî ji bo çapkirina wê derket. Çi kil û kêmasiyên ku di nusxeyên kitêbxaneyê de hebûn, min ew bi yên Xanikov re çap kirin. Ji wir şûn de êdî tu şik ji min re nema ku kitêba min gelek ji destnivîsên di nav Muzeya Asya-yê de nin, baştir derketiye. Ji biltî vê, bi taybetî min careke din jî ew di bin çav re derbaz kirin û pişt re min ew ji çapê re şand. Min tu destkariyek ji ber xwe ve li ser naveroka wê nekiriye(*). Eger car û caran, ew jî gelek kêr, min valatîyek tijî kiribe, ew jî ew nivîsên wan kesên ku piraniya wan Şeref Xan ji kitêban wergirti-ne û îstîfade ji wan kirine ye. Wekî, Ibn Xelekan, 'Ebdurrezzaq û yên din. Çunkê wekî min got, rastkirina şaşîyan û belge-yên wan ez dikim dawiyê û ez dûr û dirêj li ser disekinim.

Ji ber vê, berî ku ez dawî bi vê pêşgoti-na xwe binim, ku min bi vê xwest xwendevan bizanin ji bo çap û weşandina vê afirandina han, ez li ser riyek çawan me-şîya me, ez pêwîst dibînim ku hinek zan-yarî jî di derheqê Şerefnameyên bi dest-nivîs ên li Ewropayê hene -qasî ku ez di-zanim- li vir bidim xuya kirin.

Ji biltî van çar nusxeyên li Rusyayê yên ku min kitêba xwe li ber wan amade kir û weşand, sê destnivîsên din li Avustur-yayê li ba Dr. Bors hene. Li Londrayê di destê J. Malcolm de nusxeyek heye ku niha di Kitêbxaneyê Asya ya Qraltiya Brîtanya Mezin û Irladayê de ye. (Bi-

nêre: Kataloga Morly, rûpel: 151).

Li Parîsê destnivîsek heye û beşek ji ko-mek kitêban e. Bi destpêkek gelek sipehî hatiye nivîsandin. (Binêre: Maqaleyên Rojnameya Azmank, sal: 1826, beşa 8an, rûpel: 291. Maqaleya: Tarîxa Moxol û Farsan; E. M. Quatremère, rûpel: 301).

Ez dizanim ku di Muzeya Brîtanyayê de nusxeya birêz Rich jî heye ku li Kur-distanê bi dest xistiye. Çunkê, wî hemû destnivîsên di destan de hebûn, dabû wê muzexaneyê navê wê derbaz bû. (Binêre: Bîranînên Rich ên Di Kurdistanê de, be-şa yekem, rûpel: 247, nota binî ya Barb, rûpel: 5).

Her wekê me behs kir, du wergerên bi zimanê tirkî jî di Muzexaneyê Brîtanyayê de hene. Birêz Riw agahdariyek kurt li ser nivîsandiye. (Binêre: Kataloga Morly, rûpel:145 û nota binî: 3). □

Pêşgotina çapa fransî; St. Petersburg, Kanuna Pêşî (January)() 1860*

Kurmanciya wê: Ziya Avci

Di hejmara bê de "Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de"

Sanciyên zayînê têne welatê me

Serkan Birûsk

Em
di kolîna şevê de
germahiya azadiyê his dikin
Em
Ji şevê
şîrê wêrekiyê dimijin
Remz û nîşana me ne
şevên têr teqînî
Em şevînên azadiyê
di van şevan de
Guleyan di bedena xwe ya ter de
sar dikin

Bêyî hewar û waweylê
Em di van şevan de
li axa xwe vedigerin
Di van şevan de
hevalan li ser kabokên hev
tembiyên azadiyê li hev kirin
Çekên ketî di van şevan de
hatin hilanîn

Û di van şevan de
sanciyên zayînê têne
Welatê me.

Stirana berxwedanê



Sidqî Hîrorî

Eger em li gor teoriyên cuda yên komunikasyonê temaşayî stiranê bikin, em dê bi encamekê derbikewin ku; stiran sîgnalek e, şander û wergirên wê hene. Ew sîgnal jî bi vî awayê jêrîn digehe wergirî ku guhdar e:

Şander → sîgnal → navgîn → wergir

Di warê stiranê de, şander dikare yek be û dikarin pirr bin. Ev pirrhejmariya şanderî jî ji wê çendê dihêt, ku stiran ji gelek elementan pêk dihêt; deng, tekst, awaz û amûrên mûstîqî. Her ji ber vê jî, yên stiranê (sîgnalê) durist dikin dê dengbêj, helbestvan, awazdaner û awazjen bin. Lê carna jî çêker û şanderê stiranê (sîgnalê) dikare yek kes be. Ev jî wê çaxê rû dide, dema ku stiranbêj bi xwe bi wan hemû

funksyonan radibe; tekstê dinivîse, awazê jê re diafirîne û ew bi xwe bi dengê xwe distirîne û li amûrekê mûstîqî jî mîna tembûrê dixe, weku Mehemed Arif Cizîrî. Carnan şevaheng dibê navgîn (kanal) û stiran tê de dîrekt ji aliyê stiranbêjî bi xwe ve bo guhdaran dihêt pêşkêşkirin. Lê bi giştî massmedya; radyo, TV., kasêr, qewan, CD., û multimedya hene, ji stiranê re dibin navgînan veguhestina wê bo guhdarî.

Ez naxwazim, li vir, li ser beşên cuda yên stiranê, bi taybetî awaz û amûrên mûstîqî rabiwestim, ji ber ku ez ne pisporê wî warî me. Lê ez hez dikim bi kurtî jî be li ser teksta stiranê ku beşeka sîgnalê ye rabiwestim.

Diyar e ku teksta stirana kurdî li gor naveroka wê dikare bibe gelek cor; mîna: lavje, heyranok, lawik, dîlok, zêmar, payîzok. Lê mirov dikare ji wan stirana berxwedanê (stirana siyasî) cuda bike. Ev cudakirin jî hindê dihêt ku di stirana berxwedanê de canê siyasî zaldar e. Bi min stirana berxwedanê ew stiran e ya ku bi bihîstina wê kar li ser hest û nestên guhdarê kurd di berxwedanê de li dijî

çewşêner û dagîrkeran dihêt kirin û heza azadiyê li cem wî dihêt arandin û şarandin. Vê stiranê rola xwe ya baş dîtiye di bilndkirina morala mirovî di xebatê de li dijî serdariya dagîrkerî, li dijî perçebûna welatî û neyekgirtina milletî û ji bo azadiya mirovî û gel û welatî. Dagîrkerî jî hest bi vî çekê hêzdar kir, lewma jî şerê wê dikir û dike, qedexa kir û kesên guhdariya wan stirana dikirin û wan pê dizanî, tûşî belayan dikirin.

Di destpêka salên heştêyan de, ez bo cara duyem ji aliyê desthilatdarên Îraqê ve li bajarê Mûsilê hatim girtin. Piştî çend rojên lêdan û êşandineka dijwar di zîndaneka mîten leşkerî ve, rojekê du serbaz hatin û ez ji serdava ez tê de girtî raxîşandim derve û birim ber derê odeyekê. Yekî ji wan der quta, dengê ji nav de hat, got: were jor. Serbazekî dergeh vekir û ez di dergehê vekirî de rawestandim. Di jor ve çend efsêrên pilebilind rûniştibûn. Yê ji hemûyan pilemezintir serê xwe ji yekî re hijand. Wî yekî kasêtek ji ser mêzê rakir û xiste teypê û destê xwe li kapka vekirinê xist. Dengê Şivan Perwerî bilnd bû, ode û guh û dilê min pirr kirin. Ez di cihê xwe de guhişim. Ez pirr tirsîyam, lê herweha, di wan gavan de, baweriyeka mezin bi xwe li ba min çêbû û min hest bi xwe kir yê serbilind û xwera-gir im. Efsêrê mezin ji min pirsî ka min çend kasêtên wî li mal hene. Dema min bersiv dayî ku ne min kasêtên ji vî rengî hene û ne jî vî stiranbêjî û vî dengî ez nas dikim, ew efsêr di cihê xwe de bê qam xeyidî û got " ma kurdek heye ku çend

kasêtekên Şivanî li mala wî nebin, nê evî mala me xerab kir". Her eynî efsêrî, bi tengijîn, got wan herdu serbazên ez di dest wan de bûm, ku min bibin. Wan ez bi şeqam û pehînan rahavêjtim bo nav erebeyekê û berê min da zîndaneka leşkerî li Kerkûkê.

Ez vî mînakî dixim ber çavên we, bona ku diyar bikim ku stiranbêjê kurd û stirana kurdî hertim û nemaze ji destpêka salên heftêyan yek bû ji amrazên hişyarkirina hest û nestên netewî û teyarkirina xelkê Kurdistanê di çeperê berxwedanê de li dijî dagîrkeran û siyaseta wan ya ku armanca xwe kirî nehiştina pênasnameya netewî ya kurdî. Vê stiranê rola xwe ya pîroz dît.

Di civaka me de nexwîndewarî mişe û zal e, millet bindest û bê mafên xwe yên netewî ye, dezgehên ragehandinê (mass-meya) ji rojname û kovar û pirtûk û radyo û televizyon û yên din di destên hukumeta Bexdayê de bûn, ne azad bûn û sensur li ser her tiştekî hebû. Di cihê weha de, kasêta stiranê (mebest jê stirana siyasî) wekî dezgehekê ragehandinê qadeka berfireh digirt û qenc bi rola xwe ya komunikasyonê radibû. Evca mirov dikare bibêje ku kasêta stirana kurdî û nexasme ya siyasî jê, yek ji massmedyayên kurdî yên dengdar û xurt bû. Bi arîkariya kasêta stirana berxwedanê û digel hokari-ne din rayeke giştî li cem xelkê Kurdistanê dihat avakirin. Kasêr bi xwe jî dikaribû bi hêsanî bikeve nav destan û nav her malekê û her li malan bête kopîkirin û zû û bi berfirehî belav bibe. Tiştê din yê ku

kartêkirina wê pirrtir lê dikir ew e ku hêzeka mezintir ji peyvên nivîskî di peyvên gotî de ye û deng û awaz û musîqa xweş kartêkirina wan peyvên di guhdaran de ku wergir in hêj pirrtir û bi hêztir lê dike.

Stirana berxwedanê jî dikare li gor cihê stiranbêjê lê stiranê dibêje, bibe du beş; ya li deverên li bin desthilata dagîrkerî ve û ya li derveyî wan deveran.

Bo nimûne Şivan ku li Swêdê ye, yan stiranbêjekê din ku li deverên li bin kontrola pêşmergeyan de bû, dikaribûn teksrên bi naverokên xwe yê azadîxwaz û dijî dagîrkerî vekirîtir ji tekstên bo nimûne yê Tehsîn Tahayî ku hertim li deverên li bin desthilata Îraqê de bûn dijiya, hîlbijêrin. Lê stirana Tehsîn Tahayî dikaribû li hundirê welatî bêtir ji ya ku ji derve dihat belav bibe. Ew jî ji ber ku hem stiranbêj bi xwe amadebû û hem jî stiranên wî sembolîk in, ji aliyê dagîrkerî ve ne hind qedexekirî bûn û bê tirs dikaribûn bihên guhdarîkirin.

Helbestvanên welatparêz yê hundir nikaribûn ji ber sensur û sîtema dijwar ya dagîrkerî, bi awayekê vekirî û azad bîr û bawer û dîtin û hestên xwe di helbestên xwe de derbasî xwendevanî bikin. Evca neçar dibûn sembolan (nîşanan) bo evîna gel û welat û serhildan û azadiyê bikarbin. Herwisa hunermendên mîna sergevazê stirana nû ya bi kurdiya kurmanciyê Tehsîn Tahayî jî ew sembol di stiranên xwe de bikaranîn. Bi vî awayî stirana berxwedanê li hundir avabû û guhdar û stiranbêj baş di hevûdu digehîştin. Signalê şanderî ya armançber bû û guhdarî ew

fêhim dikir.

Tu hizir bike piştî setimîna 1975ê ye û tu li başûra welatî yan li Bexdayê yî û dengê Tehsînî dihêt guhên te dibêje:

*Dê hême ve yarê dê hêm
Yêt vî dilî hemya dê bêm*

*Lezê neke nuke neşêm
Belê ya may demekê kêm*

*Dê hême ve bixelata ve
Ew xelat bo hewe nav e*

*Nêzik e dê hêt ew gav e
Şahî bziwrîtev dila ve*

Bêguman di wê demê û wê rewşa başûra Kurdistanê û şikestina serhildana çekdar de, ji bo guhdarekê kurd, ku ez jî yek bûm ji wan, diyar bû ku “yar” millet e û yê ku bi yarê jî re dipeyive “pêşmerge” ne. Di stirana “Bêrîvanê” de gazî serhildayiyên çekdar dike û jê dixwaze ku milletî hişyar bikin û yekgirtinê peyda bikin û Sembolên “şivan, bêrîvan û pez” bo rêber û pêşmerge û milletî bikardîne:

*Bêrîvanê malwêranê
Şirînê wey bê xudanê*

*Zerka te bo çî vala ye
Meşka te bo çî qetyaye*

*Pezê te bo çî yê mit e
Belav e evro kit kit e*

Bêriyê bêje şivanî
Guh bidet pezê xudanî
Bêriyê qêrke stirana
Da tenakeyn êş û jana

Em ji bîrsê qatmtîrîn
Em ji tîrsê qet namîrîn

Di Stirana "Birêse" de milletî dike dilber û dibêjeyê:

Birêse dilberê dava birêse
Birêse jçerg û hinava birêse

Birêse jrewşa hetavê
Omêda jîneka ava

Dilberê min davek dvêt
Bizivirtîin biçît û bêt

Da bizanîn tuxîbêt xu
Sinêr û kevr û çiyayêt xu

Hindî stirana "Ey Felek" e, ya vekirîtir e:

Ey Felek bo te dinalim
Ew çima nêrgizêt me çîrmîstî

Xelk û 'alemê van milletan
Dost û yarê xu girtibûn
Ew çima em bê dost û bê kesîn

Ew çima bextê me ho ye
Em bê dost û bê kesîn

Qet dê hêt ew roja me dvêt
Kanîka warî bizêt

Jê vexwîn bdesta helînîn
Jê vexwîn çend me bivêt

Agirê sar û vemirî
Çav me lê ye geş bibît

Ew bihara têhnê kuştî
Hîvûdar î n geş bibît

Kew dujminê serê xu ye
Me j mezîna gulê bibî
Jaro kewo

Dar bi darî hat birînê
Destkê bivî her ji me bî
Ji darê bî

Guhdarên vê stiranê, ku Tehsînî bi xwe ji wan re digot, bi bihîstina malka "Kew dujminê serê xu ye" dişariyan û destên xwe diqutan. Ev jî, bi dîtina min, wê xuya dike ka xelk çend ji wê neyartiya navxwe bêzar in û ew çepelêdan hest derbirîn bû li ser hindê.

Her di eynî stiranê de diçe ser şoreşê û bi distarî binav dike:

Dengê distarî girîn û nalên e
Ax û fîcan û hewar in

Distaro danî tu hwîrke
Xem û dengê te heval in

Paşt dibêje:

Kurd ne êk in û ne sed in û ne hizar in
û ne hizar hizar in. Kurd hejde car hizar

hizar in, ye'nî hejde milyon in. Belê ez dibêm yê dibîne pêtir.

*Ne êk e distar ne êk e
Hejde car hizar hizar in*

*Belê pa reben çî bikîn
Lçar welata em belavîn
Lçar cîha em belavîn*

Û li cîhekê din di stiranê de dibêje:

*Dengê şoreşê girîn û nalên e
Ax û fîxan û hewar in*

Xwe hindî ji destên Tehsîn Tahayî hati-bû wî hewildabû, heta eger bi peyvekê bi tenê jî bûya, dîtina xwe jî bixe di nav helbesta stiranê de. Wekî li jor dema gotî "Belê ez dbêm yê dibîne pêtir". Yan jî dema carekê dibêje "lçar welata" û careka din "lçar cîha", yan "dengê distarî" û "dengê şoreşê".

Xwe Tehsîn stirana bi tekstên vekirîtir jî gotiye; mîna:

*Evro kanê lmin wê rojê
Pirr ji xuşî û renga reng*

*Vebguhêzin bwîka kurda
Ew delala şox û şeng*

*Da bheîtnin jkurda ala
Lser çiyayê pirr ji xwîn*

*Da hewar jdîlek sotî
Her bijî serbestî û jîn*

Yan di stirana Karwanê me de ku dibêje:

*Karwanê me yê brêvedçît
Qet çî cara paşnakevît*

*Her dê barmanca ra gehît
Şîrê me dotî dê mehît*

Yan jî stirana Lawê kurda û banga wî bo wan:

*Lawê kurda çeperê xu bernede
Mîsteka axê nede
Ebed nede
Çî car nede*

Yan jî dema dibêje:

*Kurdînya me agirekê her hel e
Agirdana dilê me tijî pel e*

Ev û gelek stiranên din nimûneyên ber bi çav in li ser stirana berxwedanê di hundirê welatî de, li başûra Kurdistanê, li wan deverên li jêr desthilata Îraqê. Xwe bêguman stiranbêjên din jî hene ku ev rengê stiranê pêşkêşî guhdarê kurdi kiriye, lê min ji ber nebûna meteryalên pêwîst û têr bo lêkolîneka ciddî û berfireh û ji ber bertengiya wextê nivîsînê, min hindek ji berhemên Tehsîn Tahayî wekî mînakek li ser stirana berxwedanê, di vê nivîsa xwe de bikaranî. Eger mirov li ser stirana berxwedanê bi giştî li başûra Kurdistanê rabiweste, bêguman dê stirana bi kurdiya soraniyê pêşeng be. Lê ev babetekê bi serê xwe û pirr mezin û berfireh e. □



Tam dema ku kovara me di çapê de bû, me bihîst ku hunermenda me Eyşe Şan wefat kiriye. Li gorî agahdariyên Müslüm Yücel, Eyşe Şan di nava bédengî û renêtiyê de, ji welatê xwe dûr, li Îzmîrê wefat kiriye.

Eyşe Şan li asmanê welatê me yê tarî stêrkeke geş bû. Deng û awazên wê, hîsên kurdayetiyê û hezkirina ji stran û kilamên kurdî re her tim zindî hiştiye.

Em ê di hejmarên pêş de bi firehî li ser jiyana Eyşe Şanê, li ser hunera wê û li ser zehmetiyên ku derketine pêşberî wê rawestin.

Stirana kurdî û pêvajoya wê ya dîrokî



Z. Zinar

Bêguman e ku Stirana Kurdî cihêkî xwe yê taybetî di nêv çanda Kurdî de heye û pir rind jî cih vegirtiye, bi giraniyeke pir zêde li ser bingehêke wisan fireh hatiye danîştandin ku ew mişt kiriye û tê de her û her diîse. Lewra mirov çî cûre babetên cihê bixwaze, bi hêsanî mirov dikare di Stirana Kurdî de bibîne. Ji mirovatîyê bigir heta xirabiyê, tiştên weke mêrantîyê, newêrektî, camêrtî, dek û dolab, dilovanî, neyartî, kuştina mêran, dana xwîna kuştîyan, qirf û henek, pesinbêje, pesindayîna bêdil, azarkirin û piçûkxistin, talan û rajan, dizî û pizî, wêrankirina malbatan û gundan, ya koz û waran, evîn û evîndarî, revandina keç û ya jinên bi mêr, zewaca bêdil, ya ji du olên cihê, aştî û lê-

borîn, behsa 72 milerên li dinyayê, şexantî û axatî, bîst û şeş mîrekiyên Kurdistanê, Şerê Azadiyê, dabeşbûyîna axa Kurdistanê. Herweha oldarî û olperestî, sondên pir mezin, sonda bi sê olan (filehtî, sonda bi sê keviran (jinberdan), sonda mezin (ku ne diyar e ka çî ye), bisilmantî û cihûtî), sonda bi hersê pirtûkên Xwedê yê menşûr (Quran, Tewrat, Incîl), xêrdayîn, xwendin, perwerdekirin û gwd.

Eger ez li vir xwe zêde bera nêv Stirana Kurdî bidim, dê tiştine wisan mezin û qirase derkevin holê ku rûpel têr nakin û divê ku hejmareke *Nûdemê* xwerû ji nivîsa min re be, ev yek jî xiş nake û niheqî jî çêdibe. Lê wek agahdarî ez ê bi kurtî vê meselê pêşkêşê xwendevanên *Nûdemê* bikim.

Berî ku em têkevin behsa *Stirana Kurdî û Pêvajoya wê ya Dîrokî*, divê ku hinekî li ser bêjeya "stiran"ê bisekinim ka ev peyvik çî ye, çewan tê bilêvkirin, berê çewan bûye û niha jî çewa tê gotin.

Erê di van duwazdeh-sêzdeh salên ku ez li ser berhevkirina Folklorê Kurdî di-sixulim de, ez pêrgê gelek tiştên hêja bûme; min jê gelek tiştên giranbiha ji xwe re wergirtine, dersine nixdar girtine, fêrbûyîneke pir zêde di Toreya Kurdî de gihandime xwe ku ew tişt bi bihayan re nayêne hemberkirin. Herweha ez pêrgê gelek bûyeran jî bûme ku mixabin ew bûyer di Dîroka Kurdî ya nivîskî de cihê xwe yê rengîn venegirtine, lê ew di nava xelkê de tenê bi stiranî têne gotin. Eger çend kesên zîrek an komikeke fedekar hebe û ku alîkariya diravî ji wan re hebe û li ser Stirana Kurdî lêkolîn bikin, wê bi encama karê wan re mêjûyêke kurdî ya nûjen derkeve holê ku ji nîfşên nûhartî re bibe sermîyanekî bêdawîn.

Îro bêjeya "stiran" li piraniya herêmenê Kurdistanê bi hawayê ku me nivîsîye wek "stiran" têne gotin. *Stiran* ew tişt e ku bûyerek ji aliyê dengbêjan ve bi kêş û nîkl, bi dengêkî qalind ê dirêj û tewîndar têne gotin. Stiranên bi vî babetî bê mûzîk in, lê di şûna mûzîkê de gelek tewîn têne kişandin, herweha guhdar jî bi dengbêjî re wê tewînê dibêjin, dûredûr dirêj û dubare dikin, bi kêrt û teql xwe jî pê re dikin ortaxê wê zewqê, mezeyê yan jî derd û êşê.

Bêjeya "stiran" di nava gel de bi çar awayan têne gotin, weke: *Sitiran*, *stiran*, *stran* û *istiran*. Lê Ehmedê Xanî di *Nûbihara Biçûkan* de ev hawê bikar aniye:

Istiran. Îcar me nepeyîrand ku ev bêje berê mîna Xaniyê nemir dihate gotin, yan Xanî ji bo kêş û qafiyeya pirtûka xwe "î"yekê li pêşiya wê zêde kiriye!

Ev rengê ku Xanî bi "istiran" nivîsiye, ne tenê di vê bêjeyê de, lê wî di hin bêjeyên din de jî yên ku du tîpên dengdêr li pêşî hebin eynî tişt nivîsiye, wek bêjeya "stû" bi "istû", bêjeya "ziman" bi "ezman" û "hevirmîş/hermûş" bi "ermûş" nivîsîne û gwd.

Kesê ku stiranan dibêje, navê wî dengbêj e. Bêjeya "dengbêj" li hin deveran bi hawayê "dengvêj" jî têne gotin. Dengbêj bi piranî zilam in, lê yekcaran pir hindik jin jî hene ku dengbêjiyê dîkin.

Ji vî hawayê gotinê re çewa ku "stiran" têne gotin, li hin deveran "kilam" û "klam" jî têne gotin. Îcar hin kes hene, xasma kurdên bakûr dibêjim ango bêjeya "kilam" ji "kelîme"ya (bêje) erebî hatiye. Lê baweriya min ev e ku "kilam" an "klam" ji bêjeya "kilm" a kurdî afirî ye ku (kilm) bi gelek maneyan têne, weke: *Awalhawê, tewr, rewş, livak, tevger, rabûn û rûniştin, xuy/karakter, danûstendin, têkilî, hevberiya rikdar.*

Bêguman çaxê ku bûyerek li Kurdistanê rûdide, pêre pêre stiranek ji aliyê dengbêjekî ve li ser wê bûyerê têne afirandin. Îcar ji bilî stiranên siyasî çî stirana ku derdikeve, herwekî ku dengbêj ji devê jinekê yan mêrekî ku di bûyerê de pir xisarê mezin gihayê yan pir êşiyaye

dibêje. Mesela, eger zilamek bê kuştin, dengbêj ji devê diya yê kuştî, yan xwişk-a wî, yan jina wî stiranekê diafirîne. Û belkî dibe ku haya wan ji dengbêj û stiranê tune be jî. Erê hin kes jî hene ku ew ji dengbêjekî hevî dikin an heq jî didinê ku li ser bûyera wan stiranekê biafirîne. Hin caran bûyereke balkêş gava ku li derveyê Kurdistanê jî rû dide, dîsa dengbêjên Kurd li serê stiranekê diafirînin. Wek stirana ku li ser Melik Hiseynê Urdunê, di 1967an de çaxê wan û Israîlê şer kiribûn derxistine. Herweha di salên çîlt de li ser Şerê Qoreyê jî stiran hatine afirandin.

Gelek caran stiran li ser bûyerên siyasî û şerê azadiyê jî têne afirandin. Weke serhildana Kurdan a bi serokatiya nemir Şêx Mehmûdê Berzencî ku bi dengê Kawus Axa li dinyayê dengvedêr bûye: *...xalo ez girtî me li xerîbiyê! Hewara Kurdan ji me re nayê!..* û li ser Komara Kurd a Mihabatê, li ser serhildana başûr a bi serokatiya serokê nemir Mistefa Berzanî ku em ê li pêş çend malikên wê wek nimûne binivîsînin, li ser şerê Mala Seydo, serhildana Mala Eliyê Ûnis, serhildana neteweyê Kurd a bi serokatiya Şêx Seîd, di vê dawîyê de jî li ser şerê serhildana Partiya Karkerên Kurdistanê ku li gundekî ji yên herêma Botanê serbazekî dijmin direve û diçe xwe di axurekê de vedişêre. Belam çaxê ku gundî dibînin, pişt re veşartina serbazî ya di axurê de îcar ne wek stiran, li serê bi

rengê dilokên folklorî yên dawetan dibêjin, ew dilok li nava xelkê belav dibe û di dawetan de tê gotin. Wek nimûne: *Ha serbazoo, tu newêrî! xwe li axuran, vedişêrî!..*

Di stirana kurdî de hin caran tişt ji sînorên xwe zêdetir (mûbalexe) têne gotin. Eger pesindayîneke mêrantiyê hebe, wî zilamî kifş dikim mîna Rostemê Zal. Eger camêrî be, dikim mîna Slêman Pêxember. Eger beramberî be, dikin mîna Noşirewanê Adil. Lê eger li ser zanatiyê be, dikim mîna Eflatûnê Yûnanî. Eger li ser oldartiyê be, ji pêxemberan dibihurînin. Eger li ser qurefî û mezinarîyê be, dikim mîna Nemrûdê Kurd û Firewnê Qibtî. Eger li ser navnoçkiya xirabî û gelactiyê be, dikin mîna Bekoyê Ewan û gwd. Lê eger li ser delaltî û bedewiya keçan be, qîzikê dikin mîna Zîna Zeydan û Xecêya Şikakî.

Stirana Kurdî ji aliyekî ve wek romaneke rastî jî hatiye bikaranîn. Mesela eger stiran li ser bûyereke balkêş an şerekî giran hatibe gotin, tê de devera ku bûyer lê rû daye weke navê herêman; çiya, deşt, newal, gelî, best û gund, bajar, tax, xanî, kanî, çem, gol û hwd herweha çaxê rojê yan şevê weke "bi derketina roja Xwedê re...", "bi zeraqiyên tavê re...", "bi avabûna rojê re..." yan "danê nîvro" û şeva nîvê şevê" û gwd bi zimanekî vekirî têne gotin ku niha jî ew dever bi eynî navan têne naskirin.

Dengbêjî di dema xwe de li Kurdistana-

nê pîşeyeke pir bi nirx, giranbiha û bi rûmet bûye. Pir kes hebûne ku debara malbara xwe bi dengbêjiya xwe dikirin û wekî din tu kar nedikirin. Herweha gelek dengbêjên xuyanî yê menşûrên navdar hebûne ku çaxê behsa navê wan dihate kirin av disekinî. Di van çend salên dawîn de, li bakûrê Kurdistanê zêdetir navên van dengbêjan dihate bihîztin û behsa wan dihate kirin, weke: Hoko, Mirado, Salihê Beynatî, Demir Elî, Kerem, Farûq, Evdîrehîmê Têrkî, Şakîrê Mûştî, Kazim, Mele Smayîl, Fariso, Helîmo, Hiseynê Farê, Rifhetê Darê, û gwd.

Heta salên şêstî ku ez jî gihabûmê, min bi xwe jî li pir herêman dîtiye ku her axeyek, maqûlek, dewlemendek, şêxek û begek dengbêjên xwe yê taybetî hebûn. Gava ku civat li odayên wan digerrîya, dengbêj destê xwe yê rastê (tiliya eşedê) dixist kerrika (qulika) guhê xwe yê rastê û dev pê dikir stiran digot. Hin caran du dengbêjan diavêtine ber hevûdu, ji êvarê digotin heta ku dibû sibeh. Hin caran jî ji du dengbêjan zêdetir diavêtin ber hevûdu, heta ku yekî yê din bindest dikir û ji ber direviya.

Li hin odayên kesên navdar ên hinekî sirtî hêzdar, destûra dengbêjê taybetî nebû ku rûne û bistirê, hema ew li ber dêrî sernig disekinî û qîr dida stiranê, digot heta ku axayê wî bigota bes.

Di Stîrana Kurdî de ji bûyerên dîrokî zêdetir, tê de gelek peyvikên kurdî yê

kevnare jî hene ku niha li nava xelkê nayêne bikaranîn, lê ew tenê di stiran û çîrokan de têne bikaranîn. Herweha tê de gelek peyvik jî hene ku mirov nikare hevbera (sinonim) wan di zimanekî din de bibîne, wek nimûne: "Nînim nîna-yê, melî-melî, tew-tew, waweylê, hahû, hoyoyo, liyan e, tilîlî, wêlî-wêrî, watê..." û gelek bêjeyên weha yê din.

Di lêkolîna min ya li ser folklorê kurdî de, tiştê herî ku zêdetir bala min kişandîye stîrana *Medoka Melê û Brayîmê Hîna* û stîrana *Serhildana Mala Eliyê Ūnis e*. Medo keça meleyekî Bisilmanan bûye û Brayîmê Hîna jî kurê pîrejîneke Filehan bûye. Lê keçik dil ketiyê û zorî daye bavê xwe ku destûrekê (fetwa) jê re li gora Bisilmantiyê bibîne. Di stîrana *Serhildana Mala Eliyê Ūnis* de jî serrokê şervanan ferman daye ku ew eskeran mekujin, tenê amiran û rutbedaran bikujin. Ev e li jêrê xalek ji stiranê ku ji dengê degbêjê nemir Mirado hatiye girtin:

...

Ū bira!

Em ê tu cara destê xwe nakin destê van bêbavê Tîrkan e!

Ū bira, bira!

Heçiyê ew in;

ew gîsasê serê me Kurda ne!

Ū bira!

Bîra we nayê

wextê ku Şêx Seîd li devê Olecamiya
Diyarbekrê xeniqandin û situyê wî avêtî-
ne şertûê!?

Medoka Melê û Birahîmê Hina

Lêlê nabeeee...

Hêe, hêe, hêe, hêe, hêe..

Hû nabeee.

Wele min ê digo:

- Lawo,

Medo, Medîna

mara me lê nabe.

Hû nabeee.

De azbata Brayîmê mala Hina,

zîlamikî xwe File ye,

misilmaan nabe.

Medo ne dogo:

- Yabo,

malikxerabo,

sewala dilê şênî ji mi neke,

ma ne dilê şênî zor e,

ji mirinê xirabtir e,

nabeey, nabe.

Êmanê, digo:

- Lawo,

Medo, naaabe û nabe.

Belê dînê me w dînê Fila

a dînikî baaşqe ye.

Wele tiştê tu bêjê

berxa min ê, lawo

mera qîme ye,

naabe, nabe, nabeee.

Nabe.

Dibê:

- Yabo,

ma wê çilo be,

wê çawa be zewaca mêrê misilman li
canê min heram be.

Gelek stiran li ser Şerê Azadiya Kurdis-
tanê jî hatine gotin. Çewa me li jorê go-
tiye ku Mêjuya Kurd zêdetir giraniya
xwe daxistiye nêv Stirana Kurdî û nifş
bi nifş sparteyê Kurdan bûye, ta roja îro
jî her wisan didomîne. Ha beşek ji Mê-
juya Kurd a siyasî jî ev Stirana bi serna-
vê ŞERÊ QAZÎ MIHEMED Û XWÎ-
NA ŞÊX SEÎD e ku bi nîkl e û bi rengê
xwe mîna yên folklorî tê gotin, ketiye
şerîdan û li nava xelkê belav bûye. Lê
em nizanin ku ev Stiran ji aliyê kê ve û
di çi tarîxê de hatiye gotin, tenê ev şerî-
da di destên me de diyar dike ku ji aliyê
dengbêjê hêja Helîmo ve hatiye gotin,
lê dîsan jî tarîxa gotina wê ne diyar e.
Stiran bi giraniya xwe li ser ŞOREŞA
BAŞÛRÊ KURDISTANÊ hatiye gotin
ku di 1975'an de gava rûxiyabû û ku
Kurd careke din belengaz û perîşan bû-
bûn. Herweha tê de gelek pesnê Miste-
fa Berzanî jî hatiye dayîn. Stiran çendî
ku pir dirêj e, lê me jê çend malik wek
nimûne ji aliyê destpêkê ve nivîsîn:

Şerê Qazî Mihemed û xwîna Şêx Seîd

Hooo de lolooo...

hakimo ferman e

reyîso ferman e
û bego ferman e
bavê Kurda, bi Xwedê rabe, fermaaan

e.
Fermana xortê Kurda fermaneke giran

e.
Geli eşîrê Kurdistanê
hûn ê belav bikin
li nava cimîê Kurda;
ji Sûrya heya Eraqê, Eyranê, Tirkiyê
welatê serheda
heçyê Kurd e
bêjin wan, bêjin "ferman" e!

Fermana xortê Kurda
fermaneke giran e.
Li jorê hewara me Xweda ye,
li xwarê hewara me
ma Çiyayê Berzan bavê Luqmaaan e.

Kula Xwedê sada bi kul bê
ji topa, lê xin mala xayîna.
Ji êvara Xwedê ser serê egîdê Kurdistanê
bavê Luqman, bexcê Berzan girêdane.

Ji pozê pêşiya Gulê heya bi Zaxoyê
evdal!
tê turrînê tirimbêla,
şiqînê bêxwediyê klaşînkofa,
li ezmana tê gîrrînê teyaran e.

Mi dî di qerekubarekê sibê de,
li ser serê egîdê Kurdistanê
bavê Luqman, bexcê Berzan
vê sibê dikişiyane.

Mi dî
bavê Luqman
bexcê Berzan
egîdê Kurdistanê
qîrê xwe li pêşmerga dane.
Pêşmergê bavê Luqman
ji Gelala heya Zaxo û Sersingê
hêz-hêz dikişiyane.
Bera Berzanê,
Xwedê teala ava bikeee,
xweş Berzan e.
Hakimo!
Reyîso!
Înşela wê be asima Kurdistaaaanê.
Haa, habîîî...

*

Stirana Hemdîn û Şemdîn jî, hem beşek
ji xayîntiya mîrekên Kurd a xwe bi xwe
re aniye zimên, hem jî bûyereke sergîtî
ye ku zêde agehiya xelkê pê çênebûye,
derxistiye holê.

Ev stirana ku ji devê dengbêjê hêja
Rifhetê Darê hatiye gotin û ku di
Xwençe Cild 9 de ye gelekî dirêj e, ji
rûpela 13an dest pê kiriye û li ya 74an jî
qediyaye. Lê me tenê çend malik ji serî
ve girtin û pêşkêşê xwendevanên Nûde-
mê kirin.

Hemdîn û Şemdîn

Hêêhêê, ê, ê, ê...

Hisên Axa ba dike:

– *Gelî mîrekan,*
ez bi Zozanê Jorîn diketim, bi çîman
û bi simaq e.

Ema bi eniya bavê xwe kim,
ez zanim, ev şewra we şewr bêguman e.

We soz û telaq bi hevdu ra danîne û we
bi hevdu re bûne tifaq e.

Hûn hatine ge hun dibêjin:

“Em axetiya Ahmed Begê bavê Şemdîn
Axayê delodîn ser serê xwe qebûl nakin.”

Gelî mîrekan!

Ez bi Zozanê Jorîn ketim, bi çîman û
bi simaq e.

Bi sê telaqê ge jin dere mala bava,
veger û galgal û fitû betal nake.

Galgal û gotinik dî hûn ji nava dev û
lêvên xwe peyakin.

Ez ê serê we bîst û pênc mîrekê zozên,
li zozên,

dîsanê bi qurban û xulam kim.

Paşayê min hey loloo...

Axayê min hey wayêêê...

Hakimo hey wayêêê...

Paşayê bavê min hey loloo...

.....

Berî ku ez dawî li nivîsa xwe bînim, dixwazin vê yekê bibêjim ku Stirana Kurdî îro li ber mirinê ye. Lê mixabin û sed carî mixabin, ew stiranbêjîya bi şaneşîn niha li bakûrê Kurdistanê ketiye ber xirxira mirinê û dengbêj nema karin dengbêjîtiya xwe bikin, ne kes êdî hewesa xwe ji wan re tîne û ne jî ew şewbêrik

mane. Ji ber ku asimilasyona dijmin bêpêrtav di van çend salên dawîn de tê meşandin; ji hezar û sêsedî bêtir radyo û televizyonên bi zimanê tirkî daketine holê, her roj bi sedan jî kovar û rojname têne belavkirin. Ji van zêdetir û tiştê herî bi sosret jî ev e ku niha çar Kurd nikarin li ba hevûdu şewbêrkekê bikin, lewra civata ji du kesan zêdetir hatiye qedexekirin!

Îcar ray û tevdîra vê yekê ev e ku hemû rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd xwe seferber bikin; çiqaş stiranên ku hene bicivînin û têxin şerîd, sêlik û belgeyan ew ji mirinê rizgar bikin. □

Ji bo giramiya Mirado



Suleyman Demir

*Karwanê mala bavê Sêva min hemû hesp in
ji tixûbê Îranê, dora Wanê hatin Sêvê xwestin
wextê ku ji min re gotin çogên min çûn û hatin,
geremên min şkestin
eman eman eman lo ji derdê Sêvê.*

*Karwanê mala bavê Sêva min tev hêstir in
ser barên wan xurme ne, nav barên wan şekir in
xwedêhebîna hûn ê ciwabekê bidin lawikê min
dêrana Xwedê
bibêjin wellehî ji tixûbê Îranê hatin Sêvê birin.*

*were Sêvê were Sêvê, ax ji derdê Sêvê
lê lê gidyanê tama memikên te xweş in
wek dîmsa mezrone lê li nav û li ser lêvê.
Eman eman eman lo ji derdê Sêvê,
ax lê lê gidyanê li te xewxweşê li nav lihêfê.*

...

Ez baş nizanîm bê ji ber çî ye, lê ev îsal bîst-bîst û pênc sal in ku dengê vê klamê ji ber guhên min nakeve û peyvên wê ji bîra min naçin. Ji xwe min Mirado bi Sêvê nas kiribû. Sêvê her demê klama min bû û hîna jî a min e. Ji ber ku Mirado, bi Sêvê, êşa xweşiyêke nedîtî dide dilê min. Ji ber ku xweş dibêje, rast dibêje û bi kurdî dibêje. Niha jî, wek hemû çaxên ku ez lê guhdarî dikim, wê xweşiyê dide min. Ez ji bo vê yekê, ji dil spasî wî dikim. Ne carekê tenê, lê sed hezar caran.

Û ez niha jî wek hemû çaxan wî bi bîr tînim, giramiya wî bilind radigirim û dixwazim wî hinekî, bi qasî ku dikarim bi kurdên ku hîna wî nas nakin, bidim naskirin.

Ji bo giramiya Mirado, ji bo danasîna wî bi kurdan, mirov çî bibêje hindik e û kêr e. Ji ber ku mixabin em "hindik tiştan" di derheqa wî de dizanin. Lê gava ku mirov li klamên wî guhdarî dike, mirov di derheqa wî de fêrî gellek tiştan dibe. A girîng ku mirov pirr bi hêsanî di xurtbûna hêza hunermendiya wî digihije. Mirov tê digihije ku yek ji klambêjên ku li cîhekî bilind nûnertiya demeke klambêjiya me kurdan a qet nebe herêmeke Kurdistanê dikir.

Klambêj hene, hew hunermendên gotina klamên heyî ne. Hin jî hene, hew hunermendên lihevduanîna klaman in; xweş dibêjin, lê qet xweş nakin. Hin jê, di klambêjiyê de, hew hêla wan a helbestvanî xurt e û hin jê jî a wan a gotinê tenê xurt e. Hin jê hew dengê wan tenê xweş e û hin jê hew baş li tembûrê ya jî li ribabê dixin. Lê heçê Mirado bû, ev tişt û taybetî hemû lê hebûn. Klambêjekî pirhêl û kamil bû.

Yekî wilo, Mirado, bi salan ji me kurdan re got, lê mixabin dîsa jî dengê wî ji xelkê herêma Nisêbînê, Midyadê, Hezexê, Stewrê, Kercewsê, Batmanê û Qamîşlokkê pê ve, nedîçû tu kesan. Ji ber ku dema wî, demeke kamax û bêsiûd bû.

Mirado, muzîka kurdan a ji her babet tesîra biyan dîr û pak digot. Muzîka bav û kalan digot. Lê li gor mantiqê siyasî û dîrokî yê dema wî, hemû tiştên kevn, "kevnar û ne baş û paşverû" bûn. Rewşa demê wilo bû. Dem, dema kuştina tiştên "paşverû bû". Mixabin muzîka Mirado jî diket ber wê riswakirin û wê kuştinê.

Ez bahsa salên heftêyî dikim. Rast e, dema destpêka gellek serketinan e, lê mixabin bi hêleke xwe, ji bo hin hêjayiyên neteweyî, bûn salên kamaxiyê. Muzîka kurdan, hêjayiyeke ku wê demê gellekî tade lê hatibû. Li bakurê welêt, bûn salên hilweşandina muzîka kurdan a kevn.

Bi baweriya min, divê tercuma vê yekê û wê demê, rast bê kirin. Ji ber ku bûyer duhêlî bû, salên heftêyî, bi hêla xwe ya din, bêyî ku em tê derxin bê me çî dikir,

mixabin bûn salên hewardina asîmîlasyona ku ji nû ve bi hêzeke xurttir dihat we-latê me. Di warê muzîkê de pirr zû bi ser ket. Ji ber ku nîfşê nû, bi helwesta xwe ya nîhîlîst, destûra hilweşandinê dida dijminan û asîmîlasyona wan a bi pîlan. Nîfşê nû, ji dana destûrê bêtir, bi wê helwesta nîhîlîst alîkarî bi wan dikir.

Ev yek ji ber gellek sedeman wilo bû. Nîfşê ku wê demê mezin dibû û darê siyasetê digirt destê xwe, bi xeyal û hêviyên bi xeletî, rê dida kuştin û talankirina muzîka xwe û dîlan li dora serê wê dikir. Ji ber ku "paşverû bû", gava ku dijminan êrîş dibirin ser, li ser nedişiya û nedixeyidî. Ez xwe ji nav dernaxim. Ji ber ku ez yekî ji wî nîfşê ku di vê derheqê de gunehkar e me.

Dewleta zalim, dengbêjên ku klamên me digotin, digirtin û diavêtin bin daran, dest û nig li wan dikirin heban û nedihîşt ku bibêjin û nîfşê me yê wê demê jî, ji klamên wan re, "klamên kevna in, paşverû ne" digot û nedihîşt ku bibêjin, ya jî li wan bê guhdarkirin.

Dewleta zalim, ji bo ku bi kurdî digotin, carê dengbêjên herêma me bi xwe digirtin, ew bi lêdanê reş û şîn dikirin, simbêlên wan ta bi ta hildikirin, lê em li ser wan nedişyan. Tiştê ku ez dizanim, li her deverê kêr zêde wilo bû. Xortan ev yek ji ber xwe ve dikir û dengbêj ji dewletê re dixistin.

Piştî wê helwesta negatîv, êdî muzîka me kurdan a kevna li tu deveran nema dihat gotin û guhdarkirin. Hew li ba hin gundiyan tenê ma. Li ba wan bi şermokî lê dihat guhdarkirin. Lê li topa gund û bajarên me, sloganên wek "de lêxin lêxin, birano lêxin... em şerker in" ketin cîhê huner, mîlîtarîzm û şerxwazî ketin cîhê hunermendiya hezkirina mirovane û evîne, û tirkî jî ket cîhê kurdî. (Mixabin xetereke bi rengokî wilo, îro jî bi xurtî tê muzîka kurdan. Buhayê muzîkê, ji bedêla bê çawa tê gotin bê birrîn ve, li gor bê çî tê gotin tê birrîn. Ev yek, ji bo berjewendiyên siyasî, kuştina huner e û hunermendan jî dike xulam. Lê divê bê gotin ku ne klambêj tenê hunermend in). Ji ber vê yekê jî mixabin ew dem, ji bo dengbêjên wek Mirado, bû dema talankirina hunerê wan û jiqîmetxistina wan bi xwe.

Gava ez vê yekê weha dibêjim, ne ku ez dixwazim hunermendên me yên ku wê demê radibûn, sûcdar bikim. Wan, karê ku demê dida ber wan dikirin. Ez bawer im ku hunermendên me yên wê demê, çirûskên serbilindiya me ya bi awayekî din in. Em dikarin ji hêlekê ve jî dilê xwe xweş bikin ku demê yekî wek Şivan Perwer ji me re derxist û diyarî me kir. Bi dengê xwe yê xweş muzîka me bi awayekî din radigihand me.

Tiştê ku ez dixwazim di derheqê wê demê de bibêjim, ku em wek netewe ketibûn ser rêya bêsiûdiyê. Mixabin me her tiştên xwe di rêya pêşketinê û sosyalîzmê

de asteng didîtin, me red dikirin û dikuştin.

Şaşiya me di wir de bû. Lê ez îro jî him bi qasî wî çaxî sosyalîst im û him jî dikarim ji çanda xwe hez bikim, pê serbilind bim û di rêya xwe û pêşketinê û sosyalîzme de nebînim. Divê ev yek wilo be. Şaşıyek di vê yekê de tune ye. Ev yek, wek kesekî kurd heqê min e, berpirsariya min e û mecala serbilindî û kubariya min e.

Lê mixabin a ku bû, ne ev bû.

Mirado wî çaxî di buhara jîna xwe û hunerê xwe de bû, lê klamên wek ên wî ji qada jîna nîşê nû, ji nav civata ciwanan û rewşenbîran hîlatibûn. Ji ber ku klamên wî, ên demeke "kevnar bûn, ên çandeke feodal bûn" ev yek wilo bû. Diviyabû şer li hemberî "paşverûtiyên wilo" bihata kirin û dihat kirin.

Ji ber vê yekê jî, ew giramiya ku wî û ên wek wî heq kiribûn, mixabin qet nedîtin. Dîsa jî mixabin ku ji ber vê yekê, Mirado bi xwe ma klambêjê axan, gundiyan û kêfçiyên nîvbajarî.

Ax çi tofan bû... çi talanî û zalimî û bextreşî bû... çi êş û şermezarî bû... pîraniya tiştên ku digotin, di civatên biçûk de ji kêfçî û mereqdarên re digotin û li wir dihatin jibîrakirin û diçûn. Lê îro gava mirov bi dil û çav û guhên kurdan li klamên wî guhdarî dîke û lê hûr dibe, mirov berî hemû tiştan dibîne ku ji hêla hunermendiya helbestvanî û muzîkî ve, dewlemendiyeke nedîti ne. Lê ji bo gellek tiştan îro dereng e. Piştî ku camêr îro ne sax e, em ji nû ve pê dihisin ku klamên wî berhemên serbilindiya me ne.

Lê li gor ku em kurd, him ji ber ku em ew qasî di derheqa hunermendên xwe de bêûjdan in û ji hêla din ve jî ew qasî bêmecal in, gellek tiştên wî îro dîsa jî di destan de hene. Ev gellek tişt, çi qase ji hemû tiştên wî ne? Tu kes vê yekê bi esehî nizane.

Mirado bi xwe, berî ku mirovên bikaribin dengê wî û hemû klamên wî bi pûteyî bigirin û hilînin derkevin, ji dinya me koç kir û çû. Hezar rehmet lê bin.

Ez hêvîdar im ku wê kurd rojekê peykerê wî çêbikin, herin mala wî peyde bikin, ji nû ve jê re bi dilê wî raxin û bi tabloyên gund û bajarên ku wî ji wan hez dikir bixemilînin, wî lê deynin û bikin muzeya wî. Bila piştî wê, îcar heta dawî mîrê serbilind ê mala xwe be, li pêşberî mêvan û dildar û her babet hezkirên xwe be. Bila wî çaxî Sêv û Meyremên welêt tevî, buharê, havînê, payîzê û sê mehên çilê, dozdeh mehên salê, sibehê, nîro û êvarê herin serdana wî, pê re bikenin, xwe bihejînin û di ber re herin û bîn.

Kîjan milletê din be, wê wilo bike. Ez bawer im ku wê kurd jî rojekê bikin. Ez bawer im ku wê gundê wî, Kerborana xopan bikin paytextê hunerê wî.

Lê tirsê min ji wê tirsê ye ku wê emrê gellek kurdan negihije heta wan rojan û wê nemînin heta wî çaxî. Û ez bawer im ku divê em giramiya hunermendên xwe ji ûjdanê dîrokê re nehêlin. Gellek caran zalim û xaîn e.

Dîroka me kurdan bi xwe, di derheqa hunermendên me de, ji a gellek mileran zalimtir e. Heta ku hunermendên me sax in, em belaş li wan guhdarî dikin, kêfa xwe li ber wan dikin, gellek caran bi gotinan û bi destan li nav guhên wan dixin û piştî ku dimirin jî, em wan zû ji bîra dikin.

Lê heçê hunermend in, gulên civatê ne, lawên millet yên herî bijarte ne, neqş û pêserên rêzên qesra dîrokê ne. Civata ku hunermendên wê bênav û ketî bin, bê qedir û qîmet û cîh bin, wek bexçê ku gulên wî peritîbin e. Wek qesra ku ji kevîrên devê bestan, ên bê rû û ber hatiye lêkirin e. Qesir weha nabin. Qesir bi neqşan spehî ne, bexçe bi gulên geş in, civat û jîn herdu jî bi hunermendan xweş in.

Ji ber vê yekê jî divê mirov di wext de û her demê rûmetê bide wan û giramiya wan bigire. Divê miletek (ji bo ku bikaribe çand û hunerê baştir biafirîne, bikaribe pê kubar û serbilind be) bikaribe hunermendên xwe di ser serê nîşekî re bibe û bide nîşê xwe yê din. Divê dilê nîşekî, hunermendên xwe hilgire û bibe bide dilê nîşekî din. Him em kurd bi xwe hewcedarî vê yekê ne û him jî hewcedariya hunermendên me kurdan ji a hunermendên hemû milletan bêtir bi vê yekê heye. Em deyndarên ên xwe ne.

Ji hêla din a vê rewşê ve jî, em kurdên ku bi nivîsandinê û xwendinê dizanin, ji ên hemû milletên din bêtir di bin berpirsariya kirina vê yekê de ne.

Ez bi vê baweriyê, aniha Mirado bibîr tînim û nîrxekî buha li wî û hunerê wî dikim. Mixabin ez nikarim peykerê wî çêbikim, mala wî peyde bikim, jê re bixemilînim û wî lê deynim, ref û rêzên Gul û Sêv û Meyreman di ber re bibim û bînim, lê tiştê ku niha ji dilê min tê ku ez jê re bikim û ez dikarim bikim, ev e: heger ku min bizanîba hinekî wek wî li ribabê bixista û bizanîba hinekî jî bigota, ji bo ku kurdan bikarîbana ew baştir nas bikirana, ez ê mal bi mal li ser kurdan bigeriyama, min ê ji wan re lêbixista û klamên wî bigotina...

*lo lo siwaro heyran, ez çûme Dêrikê lo li keviya xetê
ji xêra mala xwedê re ez bûbûma çar zêrên nav kaxetê
û ez biketima bêrika Simaîlê Eyo bavê Mahmûd heta roja qiyametê
lo lo siwaro heyran
ez ne li vir im, ne li wê me
ez baraneke hûr im, tev li bê me*

*ez ewrekî reş û tarî me, li ser bahrê me
ez li dewsa Simailê Eyo bavê Mahmûd
maqûlê mala bavê min, lawikê ser hespê şê me*

...

Heger min bizanîba û bikarîba, min ê lêxista û min ê bigota gelî kurdan aha Mirado wilo digot û lê dixist, lê îcar hezar caran ji wilo xwestir lê dixist û digot. Lê mixabin ez nikarim vê yekê bikim, ne gengaz e, lew ez nizanim bibêjim û lêbixim. Lê ez dikarim wî bi awayekî din hinekî bi kurdan bidim naskirin û berhemeke ku wî digot, çîroka-klama Sêva Heccî binivîsim, "bikim çar zêrên nav kaxetê" û pêşkêşî Kurdan bikim.

Berî vê yekê bi xwe, ez dixwazim hinekî din jî bahsa hunermendiya wî û hunermendiya klaman bikim. Hin ên din jî ev çîrok-klam gotine û bi awayekî din gotine. Melodiya wê çawa bû ez nizanim, lê Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan, salên 1943-44-an, di ROJA Nû, hejmarên 36, 38, 40, 42, 43, 44, 45-an de weşandiyê jî. Naveroka wê çîrokê û a Mirado, kêm zêde wek hev in, lê di awayê gotina çîrokê de newekheviyên mezin hene. (Di herduyan de jî çîroka Mem û Zînê tînê bîra mirov.) Lê ev yek ne şaşiyek e. Ne ku yek rast e û a din şaş e. Bi baweriya min herdu jî rast in. Ji ber ku piraniya klamên me, wilo dihatin gotin.

Ji ber ku her klambêjî, li ba xwe hin guhertin di klamê de dikirin û ji nû ve digot. Klam wek hev nedihat gotin, lê me bi xwe jî tiştekî ji wilo zêdetir ji wan nedixwest. Ji ber ku tu zaniyariya teknîk û estetîk tune bû, xwestineke wilo jî nikarîbû hebûya. Me hew dixwest ku xweş bibêjin. Lê ji bo ku "xweş" bihata gotin, bi her awan dihat gotin. Gellek caran dixwestin tiştekî bibêjin, lê tiştekî din digotin.

Numûne, Mirado, di klama Lêma de, "qusûrek ji wê bejin û bala zirav ne kême" dibêje. Lê di eslê xwe de, dixwaze bibêje tu qusûr di wê bejin û bala zirav de tune ne. Îro, gava em bi bêhnfirehî rûdinin û ji nû ve dinivîsin, em bêtirs dikarin qusûrên wilo rast bikin û bi dû re pêşkêş bikin. Ji ber ku di vê derheqê de xwendeghiyeke me ya zaniyarî ne li dar bû, teoriyeke me ya zaniyarî tune bû û teknîka afirandinê li gor normên zaniyarî nedihat zanîn û klamên me bi piranî li ser çîrokekê, bûyerekê dihatin avakirin û gotin û ji devan dihatin bihîstin, şiklekî klaman ê mutleq û nivîsandî tune bû, klambêjî wilo bû.

Klambêj, di xweşgotina klamê de, xwediyên destûra xweşkirinê bûn. Berî ku klaman bibêjin, carekê duduyan tenê li klaman guhdarî dikirin û dû re gava wan bi xwe digotin, bi piranî bi awayekî guhertî, li gor xwe digotin. Lê usûl weha bû, rê weha bû, klambêjî weha bû.

Biserketin ya jî biserneketin, di şarezetî ya jî “bikêrnehatina” kirina vê kirinê û dengê xweş û ya jî “nexweş” de bû. Ji bo ku bikaribin bi ser bikevin, diviyabû xweş li hev bînin û xweş bibêjin. Kirina guhertinan ne karekî bêrê bû, bêşik rewa bû. Du klambêjan, klamek wek hev nedigotin. Klambêjekî bi xwe jî du caran klamek wek hev nedigot. Klameke ku Mirado bi xwe digot, di du demên cuda de, cuda digot. Tiştên ku îro li ber destên me hene, vê yekê didin zanîn. Lê dîsa jî kêm zêde wek hev dihatin gotin.

Numûne, Cîrana ku Mirado dibêje, li gor tiştê jêr, baş guhertî ye. Lê heger mirov bixwaze gotinên Cîranekê, ji ên ku tên gotin tevan tekûz bike, serê wê, tiştêkî wilo ye:

Lê lê cîranê

bila mala me hê jî nêzîktirê mala we ba

bila hersê mehên buharê û hersêkên havînê

û bila hersêkên çile û sisîyên payîzê

mala me cîranê mala we ba

bila şibaka we raserî deriyê me ba

bila fitlên şahr û temaziyan îşareta min û te ba

bila taştêya me heba

firavîna me tuneba...

Piraniya klamên kurdan li ser çîrokekê, serpêhatiyekê ne. Klambêj ew çîrok fam dikir û klama xwe li gor wê ji nû ve ava dikir.

Çîroka Cîranê çi ye?

Yekî ku dildarê cîrana xwe ye heye. Hingî wilo jê hez dike, dixwaze her timî û hîn bêtir nêzîkî wê be. Gava dor tê bê dixwaze kengî cîranên hev bin, sal, bi demsalan tê dabeşkirin û dixwaze ku her çar demsalan be. Dixwaze ku paca wê, raserî deriyê wan be. Ji bo ku bikaribin hevdu bibînin, îcar hewcedariya wan bi îşareteke civanan heye. Dixwaze ku ew jî fitlên şahr û temaziyan be. Bila ev bûbana rastî, bila wî çaxî taştê hebûya, firavîn tune bûya.

Her klambêjê ku bixwesta Cîranê bigora, çîrok kêr zêde wilo dizanîbû, helbesta klamê, li ser vê ava dikir û digot. Gellek rêzên klamê hevbeş bûn, ji hevdu fêr dibûn, lê gellek jê jî dû re, li gor xwe ava dikirin.

Edebiyata kurdan bi pirranî bi devkî bû. Klambêjî hemû bi devkî bû. Li ser kaxetan tunebûn. Ji ber vê yekê jî gellek caran klam û çîrok jî tev hev bûne. Deverin ji çîrokan bi maqam tên gotin, di ber muzîkê re tên gotin.

Hunermendî ew bû ku mêrikê klambêj xweş bibêje û bike ku guhdar bi baldarî lê guhdar bikin. Mirado di vê yekê de pirr bi serketî bû. Xweş digot û bi klam û çîrokên xwe, civat xweş digerandin.

Mirado gellek klam digotin. Gava digotin, yek ji a din xweştir digot. Gellek ji wan îro li malên kurdan hene. Lê mirov nikare bi eshî bibêje ku ew klam hemû ên wî ne. Bi gumana mezin, piraniya wan, gelerî ne. Ji ber ku hin hunermendên din jî wan dibêjin. Lê bêyî ku ez giramîgirtina ji ên din re ji bîra bikim, ez dixwazim bibêjim ku bi baweriya min, Mirado, gellekan ji wan klaman, ji hemû kesan xweştir dibêje. Gava Mihemedê Axê, Lêma, Kewê, Meyremê, Mévano, Tu çîqa sor û kej î lê lê û bi sedan lawikên din dibêje û ribabê di ber wan re lal dike û dinalîne, wek ku kevanê ribaba xwe di ser têlên dilê mirov re dibe û tîne, lerza xweşiyê û a jana bêrîkirinê, di ber hev re hêdî hêdî didin dilê mirov. Wî çaxî, hêsirên dilê mirov, ji bo hemû tiştên wendabûyî û ên xweş ku hîna jî li dinyê hene, zû diniqutin nava mirov û dikelin. Di ber lerza dengê wî yê nostalgîk re, êşa tahm û rengê xweşî û rebeniya evîndarî û jîna wan çaxan dide dilê mirov û wêneyên jîna wan çaxan wek filmekî sînemê di ber çavên mirov re diherikin.

Hewar li minê...

ez çûme Amûda bavê Mihemed...

dên û bala xwe didimê lo...

lo bi çem e lo lo, lo min lo, lo gidî lo...

lê lê belê welleh şexxana destê Mihemedê axê

dên û bala xwe didimê

ji wan ecemiyên kêm derhem e lo, lo li min lo, gidî lo

Mihemed axa tu dê rabî bazbidî serê banê qesrê

tu ê tivingekê biavêjî wê kevoka ser hereman

û bi dengê êlî bang bike gundî û cîranan

û bibêje gelî gundî û cîranan ez li bextê we me

hûn ê li min fena, ez î kilê çavê Zergaya xwe me

welleh min soz daye li ber destê xwedê tu sê jinan bînî,

a çaran, bi soz be ez a te me lo,

lo gidî lo, lo lo li min lo, lo bes e lo...

Zergayê ji ber êş û şêraniya dilketina Mihemedê Axê nexweş dikeve... dikeve nav nivînan... tê ber halê mirinê. Bav û birayên wê, wê bi texsiyekê digihînin Qamîşlo-

kê ser doktoran. Çar textor tèn ser. Her aliyekî wê dudu disekinîn. Heftêûpênc derziyan lê dixin heta ku bêhna wê hinekî tê ber, êş ji bedena wê derdikeve û dikeve xewê. Gava di ser xewna Mihemedê axê de ye, terqîn ji derî tê... vediciniqê û hêvî dike ku Mihemedê axê, lawikê Deqorî, delalê dilê ye ji Amûdê hatiye serekî dide wê. Lê dinere ku qeşmerê mêrê wê ye. Wek ku mar pê vedin, dîsa hema zû xwêsiya mirinê dikeve qirika wê. Dike hewar:

...
*min gazî bav û birayên xwe kirî
û min got hey xaniyê we bi ser we de ketino...
ne hewcî ku hûn perên xwe bidin van textoran,
bi derzî û dermanên van ezexanan...
hûn ê bişînin pey Mihemedê axê, siwarê cêbê, kekê Terfa,
bila were xestexanê, li ser nivînên min bisekine
were serekî bide min e...
wellehî bi wê quranê
ew ji heftêûpênc derziyên êşa tîfo,
wermê û kansêrê çêtir e lo lo...
lo li min lo, bes e lo...*

Gava klama vê çîroka wê ya wir dibêje, kul û êş û kovana nava wê hemû bi lerza dengê wî re tèn û xwe berdidin nav goştê canê mirov. Wêneyên wan dilketinên wan çaxan, bi hesanî tîne ber çavên mirov.

Gava Mirado Lêma dibêje, pêlên wê xortaniya ku nû ji a teze derdikeve û distewe... a wê xortaniya ku di nav êşên xizaniya jînê de xweşiyên erotîk nû bi dest di-xe û pê geş dibe, tîne û di nava mirov bi xwe de jî radike... bayê bêrîkirina hemû tiştên delal ku di binê bîrên hiş û dîrokê de mane, di nava mirov de dibe tofaneke kamax û radibe. Dilê mirov di sênga mirov de, wek meşka bi sêpiyan ve diavêje û dadikeve. Ji ber ku rêz, ên helbestvaniyeke bi serketî ne, gellekî delal û xweş in... bi kurdiyeke xas û xweş in... û muzîk jî, ji kombînasyona lerezên dengên delal in... ew jî bi kurdiya xas in... îcar herdu bi hev re kombînasyoneke din a delal ava dikin û tèn mirov û mirov digirin û bi xwe re dibin wan çaxan, ba wan dilketinan:

*Were Lêma, were Lêma...
ez xulamê wan çavên reş î belek,
wê bejin û bala zirav,*

*lê lê gichyanê dev û lêvan...
sêng û berê gula min xweş e
wek bexçê dewleta Elî Osman
bexçê gul û sêvan,
vaye serê çile û kanûnê ye
zalimê wê xweş bibe ji îro pê ve
were Lêma, were Lêma...
dên û bala xwe didimê
tiştêk ji wê bejin û bala zirav ne kême.*

*Were Lêma, delalê dilê min o...
ez ji bajaran çûm bajarê Diyarbekira şewitî
ez dên û bala xwe didimê waye bi beden e
ez ê rabîm bigerim li dikanên ... qesaban,
...dikanên van berberan
ez ê rahîjim kêreke şuxlê Sîwasê, bînim,
biavêjim ser dilê xwe rebena xwedê
û bigelêjim
ez ê bibêjim lawiko delalê dilê min o were darî,
ev hemû kul û kederên te ne...
Were Lêma, were Lêma...
ez aşiqê çavên belek,
ax wê bejinê me...*

...ya jî gava ku klama Kewê dibêje:

*serê vê sibê ciwab hatiye
dibêjin ezîza ber dilê te nexweş ketiye,
bi îfî û kolêrayê, bi wê êşa hecciyana ketiye
hatiye ber haletê mirinê, hewarê gundîno, wê çawa çêbibe...*

... ez bawer im ku pêlên bêrîkirinê, ên wê dilketina xortaniya zû, di dilê hemû kesên de radibin û di nava wan de bi dîntî di ser hev re diqulipin, ji xwe re dikilin û dihejînin. Ji xwe xurtiya balkêş a di klamên wî de, ev yek bi xwe ye.

Mirado wê babet tofanê bi hesanî di nava mirov de radike. Lawikan ji hemû tiş-

tên din xweştir dibêje.

Keçê rebenê

*ma çîqa tu wê sor î lê lê,
lê sor û kej î
dilê min rebenê xwedê
bûye wek sîtîla savarê,
were dêna xwe bîdyê bê çaq dikele lê lê,
lê dikelijî
ma çîqa kul û axîn û mereq û derdên
dilê min kurî zalimî gellek in
hêviya min ji Xwedê hinek ji wan kulên min bibin lê lê,
lê para te jî
eman eman tu sebeb î hey lê lê...*

Tofanê bi hesanî radike. Heger mirov Restemê Zal jî be, mirov xwe li ber nagire. Heger dilê mirov, kevirekî malwêran ê di devê besteke lehîlêketî de be jî, mirov xwe dîsa li ber nagire. Mirov bi xwe re dibe dera ku ew dixwaze.

Lê gava ku klamên reqsê dibêje, îcar mirov xwe di cîhê xwe de nagire. Li gor ku tê zanîn, Mîrado kêfçiyekî yeman bû. Dîlan xweş digerlandin, şev û şahî xweş dikirin, dil geş dikirin. Lê, ne lawik û klamên reqsê tenê digotin. Camêr dengbêjekî jîr û pirhêl bû. Ew kurdekî xas bû, dengbêjekî kurd ê xas bû. Her babet klam digotin. Mantiq û melodiya hemû klamên wî, ji sedî sed bi kurdî bûn.

Lê tiştê helî balkêş ew e ku di klambêjiyê de wek bazekî ser û nav çiyar û newalan azad bû û bi xwe bawer bû. Çi dera ku dilê wî dixwest, diçû li wir datanî. Ne ji ber tîrsa dîn û diyanetê, ne ji ber “şerma dinyê” û ne jî ji ber zordariya “dewleta tirkî” sansur nas dikir; tîrs lê tune bû. Peyv û rêzên di derheqa heps û şer û serîhildanên kurdan de, ên di derheqa dîn û erotîzmê de ji klamê dernedixistin. Klambêjekî xas bû, tiştên ku di klamê de bûn û dihatin ser zimanê wî, wek ku dilê wî dixwest û hewce bû, digotin.

Li gor ku mirov tê derdixê, hew xwestineke wî ya bi tenê di vê derheqê de hebû: diviyabû li klamê bê, diviyabû klam pê nexweş nebe. Her dixwest klaman xweş bibêje. Hingî wilo xweş û bi şewatî digotin, ji kasêtên wî jî tê famkirin ku guhdarên wî hemû piştgirên wî û naveroka klamên wî bûn. Di şerê mala Eliyê Ūnis de, ev yek û egîtiya wî eşkere xuya dibe.

Wek ku li jêr dixuyê, sansur nas nedikir:

...sûnd xwarine...

*jin û namûs û pîrekên xwe bi sê telaqan berdane
gotine em serê xwe naxin şevqan e
û em destên xwe naxin kelemçan e
û em berê xwe nadin tu hepsên giran e
û bira em ê tu caran destên xwe
nekin destên wan bêbavên tirkan e,
bira binere heçê ew in,
ew qesasên serê me bi xwe ne
ma di bira we nayê wextê ku Şêx Seîd
li devê Ûlû camiya Diyarbekirê xeniqandin
stûyê wî avêtin şerîtê û bûkên serbizêr
bi ser mala bavê xwe de veqeriyên e
bira hûn ê wê rojê di bira xwe binin...*

Ya jî gava Sînem digot: mêrê Sînemê ne li malê e, diçe heccê. Tolazê mellê gund diçe bi xaîntî dest diavêjyê. Sînem xwe bi destên wî ve bernade û wî bi şwînikê kincan di nav xwînê de dihêle. Lê gava mêrê wê tê, mellê bêbext giliyê wê bi awayekî din dike. "Heccî, yek ji mala te diçû ê din dihat" dibêje.

Mêrik, radibe ji ber ku gellekî ji Sînemê hez dike, wê nakuje, wê berdide. Sîne-ma reben radibe terk û dinya dibe û bi deriyan dikeve. Piştî ku "heft salan" li xerî-biyê dimîne, derdê xizaniyê dikişîne, birçî û tazî û şerpeze dibe, rojekê radibe di şiklê yekî gurrî de, serekî tê malê. Mêrik ji kerbên wê re di nav nivînan de ye û nexweş e. Dişînin dû mellê bêbext jî. Sînemê ji wan re klamekê dibêje:

Ax Sînem...

*yadê rebenê, di dilê min rebenê de ku havîn e
waye kewan li ser qesir û qusûrên mala bavê min danîne
nikilên wan heywanan sor in, çeng û per û baskên wan `şîn e`
ne li ser bextê me bê, lê li ser bextê kûçikê melle Etman be
dibêje ku yarên Sînemê cendirme û efendî û Romî ne
lo lo... û de lo lo lo.... hey lo lo...
de rabe bêûjdano mellao hey lo lo...*

....

Ax Sînem...

*yadê dilê min rebena xwedê bi kul û derd û birîn e
seyda, min divê ku tu ji min re bibêjî, bê ka yarên Sînemê kî û kî ne
geh tu dibêjî cendirme ne, geh dibejî keleşên nava gundê me ne
geh jî dibêjî tolaz û efendî û Romî ne...*

*dên û bala xwe bidin van xeberên Sînemê bê çi `buhalî`ne
kuro hecciyo rebeno heger tu bawer nakî
bawer bik hê piştayê melle Etman bi xwîn e
wey lo lo, lo wey lo lo...*

de rabe bêtîjdano mellao hey lo lo...

Ax wey lê lê...

*Sînemê bang dikir digot ya melle Etman
dinya di dilê min û te de, ez nizanîm bê çi dem e
dilê min rebena xwedê bûye bahra kul û derd û xeman...
li darê vê dinyayê, ez rebena xwedê xwedîya şîrhelaliya xwe me
feqîro hecciyo, rebeno, heger tu bawer nakî, ez Sînemê bi xwe me
hey lo wey lo lo lo... wey lo lo...
de rabe bêbexto mellao hey lo lo...*

...gava Meyremê dibêje, dîsa sansurê nas nake:

...

de lê lê Meyremê...

*min got, tu dê pala xwe nedî wê axê, wî kendalî
tu dê berê xwe nedî wî softî, wî apî, wî extiyarî
tu dê berê xwe bidî xortekî sêzdeh, çardeh, pazdeh salî
gava şev bikeve nîvê şevê
bikeve ser sêng û ber û bedena te ya kal a boz a deqandî
wek pezeke ku bîmîne li serê çiyayê sîpên, çiyaye mala
ji xema dilê min û te re pezeke guran xwarî,
dilo yar yar...*

de rabe awirşewata min ê Meyremê hey lê lê...

...lê lê Meyremê...

tu ne keça mala Faro ye

ku ez te bînim ji tivingê û nîşanê, ji bedefê re,

...

*lê heger xelkê dinyayê alemê got,
kuro rûreş o ma tu dê çi bikî ji Meyremê,
ez ê bibêjim min Meyrema xwe aniye
ji kêf û geleşek û sinetên nivê şevê re hey lê...*

Gava Mirado şer digotin, her daîm sê motivên bingehîn derdixistin pêş: 1- “nan û xwêya tirkan li ser kaba wan e, kor î xaîn in, mirov nikare destê xwe bide destê wan”; 2- em kurd in, ew jî tirk in...” ma di bîra we nayê wextê ku Şêx Seîd li devê Ûlû camiya Diyarbekirê xeniqandin”; 3- û gava kuştî dihejmartin, “heyf û mixabin ku wê rojê 25 (ya jî ...?) mêrên me kurdan dan erdê” digot.

Lê îro... heyf e ku Mirado, wek ku stêrikek birije nav ezmanê bê serî û bê binî, çû, êdî nema li ber çavan e û nema dibêje. Ax, kî dizane bê gava ku digot, xwe çawa wek bazekî ku ji serê çiyayên bilind berde, bi nermî û azad lê berdida û diçû, xwe çawa di ber re dihejand û çiqaşî xweş digot:


*Ay delal, ay ay delal...
Ez çûm Diyarbekira şewitî
yadê waye ber bi ba ye
radara keleha Mêrdînê bilind e,
raserî berriya Hiseynê Qenco,
Qiziltepe,
lo gidyano hewale ye.
Ax delalê dilê min o
henek û yariyan li min neke
waye xopanê gundê mala bavê min xuya ye.
Wextê tu hatî tewafa sêng û berên min rebenê
tu êdî roja paşî pirs nakî, halê keleş gewra min çawa ye.
Ay delal... ax roja ez bimirim, tu sebebê min î lo...
Ay delal... te ez helandim gidi....*

Ax!... xwezî bi dilê ên ku ew dîtin û lê guhdarî kirin. Kî dizane bê gava digot, çi qasî spehî dibû!... Gava ez wî di vê klamê bi xwe de xeyal dikim, wek ribatekî ku li ser tahteke bilind dixwîne tê ber çavê min.

Dibêjin ku salên heştêyê em kurd bêyê dewlemendiyêke wek xwe hiştin û di temenkî ciwan de ji jînê koç kir. Mixabin ez bi esehî nizamim bê çawa û kengî mir, lê li gor ku tê gotin, 1985-an tê girtin, demekê girtî dimîne û piştî ku tê berdan ne bi gellekî, ji ber lêdana ku lê hatibû kirin, ji dinyê koç dike. Dîsa hezar rehmet lê bin. Dijminan ew jî wek hemû tiştên din ji me stendin.

Gelo wê hinên din ên wek wî bikaribin ji me derkevin û bikaribin wilo xweş ji me re bibêjin, ez nizamim. Lê tiştê ez dizanim, Mirado hunermendekî hêja bû. Ji ber vê yekê jî, li ber dilê me ên ku em lê guhdarî dikin û hunerê wî nas dikin, pîr ezîz e. Çar wextên rojan bi wî dengê xwe yê xweş û bi wê ribaba xwe ya ku lerza wê Tofana Nûh li kamaxê dilê mirov radike, li malên me ye. Şev û rojên me bi klamên wî xweş dibin û bi wî re geş dibin. □

Bûyer, hunermend û huner



Şerefxan Cizîrî

Di hunera klasîk de tevgerêda neke pîrr xurt di navbera bûyeran, hunermend û hunerê de heye. Di civata kevna-re de bûyerên sosyal, jiyana civatî û nakokiyên îdeolojîk hergav

bûne bingeh ji bo huner û hunermendiyê. Huner bêyî bûyer nedihate afirandin. Di civatên berî kapîtalîstî de, di hunerê de "fikşîn", ango bûyerên xeyalî hema hema tunene. Huner li ser hîmê realîzma civatî ava dibe. Bingeh realîzmê lê belê ev yeka nayê wê mana ku, di hunera klasîk de xeyal tune ye. Fantaziya ku di hunera klasîk de heye, tucara nikare herk û bingehên bûyeran bide guherandin. Lê belê bingeh dikare bi fantaziyan were xemilandin, dewle-

mendkirin û xurtkirin. Di hunera klasîk ya xelkê kurd de, fantazî tucara nebûye bingehê hunerê. Bi taybetî di dema civata eşîrtiyê de, hunermend, bûyerên girîng ji nava jiyana eşîrê dineqîne û vana li gora zanabûn û qabiliyeta xwe, ji nû da diafirîne. Hunera ku hunermend diafirîne ne tenê bûyerên civatî bi xwe ne. Lê belê ew bûyer, bûyerên xemilandinê, bûyerên ku di rastiya xwe de, him bûyer in û him jî bûyerên ku bûne huner. Ew ne tenê huner in û ne jî tenê bûyer in. Ev huner tenê avantî û bingehê xwe ji bûyeran distîne. Ziman û mînakên ku di hunerê de heye, dibe mohra hunermendan. Bi stîleke şexsî hunermend bûyeran dihûne, ji aliye ziman de jî bûyeran li bêjîngê dixîne û berhemeke berbiçav derdixîne meydanê. Mîrov dikare bêje ku, hunermendê civata eşîrtî, di eslê xwe de lêkolînavan in, dîrokvan in û civatnas in... Ew nivîskarê dema xwe bûn.

Bûyer ji bo hunermendan weke nav û

avê pêwîst bû. Ne tenê ji bo hunermendan lê belê ji bo îdeolojiya eşîrtî jî, praktîk afirandin ango bûyer lidarxistin encama hebûna eşîran bû. Eşîrek dikarîbû an problemên hundurî an jî problemên derveyî, ji xwe re bike navenda aktîvîta civatê. Bûyerên neqandî derxîne pêş. Ev bûyerên neqandî roleke pedagojîk di jiyana eşîrê de dileyîstîn. Bala endamê eşîrê hemûyan komî ser van bûyerên navandê dibû. Ev bûyer ji bo eşîrê malzemên îdeolojîk pêkranîn. Hunermend jî divabû vê aktîvîta berbiçav, weke beşeke girîng bîne ziman. Yan na ew hunermend nikarîbû bibûya hunermendê eşîrê, an jî yê mîrekiyê.

Hemû eşîrê xuyayî li Kurdistanê xwedî hunermend bûn. Hemû mîrek an jî serokên eşîrên kurdan xwediyê hunermendan, ango mitirban bûn. Van mitirban ne tenê bûyerên eşîrekê dikirin huner lê belê bûyerên hemû eşîrên ciran jî di nav îdeolojiya eşîrtî de dihilandin. Helbet ev îdeolojiya eşîrtî ne tenê îdeolojiya eşîrekê bû lê belê ew îdeolojiya eşîran bû. Di nava eşîran de hiyerarşiyê xurt hebû. Ev hiyerarşî li ser hêz û mezinbûna eşîran ava dibû. Eşîrên mezin bi hev re Mîrekî ava dikirin û vê Mîrekiyê jî bingehê xwe ji îdeolojiya eşîrtî digirt. Ev îdeolojî jî bi taybetî dibû îdeolojiya arîstokratên eşîran. Aqilakî eşîrtî jî li ser hîmê vê îdeolojiyê ava dibû. Ji ber vê yekê jî arîstokratên kurdan her gav qîmetê mezin didan kesên hunermend. Bi riya huner û hunermen-

dan arîstokratên kurdan xwe nas dikirin, eşîra xwe û îdeolojiya eşîrtiyê fêr dibûn û desthilatdariya xwe jî, bi vî awayî berdewam dikirin. Ji ber wilo jî serokên eşîran û Mîrekan pirr guh didan hunermendan. Hergav xelaten baş didan wan û dilê wan geş dikirin. Ya na ewê hunermendan li odê ciwamêran navê wan bi xesîstî û pîsîfî li nava civatan belav bikirana. Bi kurtî mirov dikare bêje ku, prestîj û navê serokêşîran û mîrekên kurdan di nava her du lêvên hunermendan de bû. Hunermend xwediyê desthilatdariyê îdeolojîk bû...

Hilbet danûstandinên di navbera bûyer, huner û hunermendan de, ne tenê yekalî dimeşîya. Di hîlbijartina bûyeran de rola helî mezin dikere ser milê hunermendan. Ji bo hunerekî biserketî, divabû hunermend bûyeran baş raxîne, zimanekî dewlemend bikar bîne, mînakên hunerî pirr bike, hevokên bi mane bikar bîne û îdeolojiya eşîrê bi zimanekî nû biafirîne. Civata eşîrtî divabû weke hemû civatan, xwe ji nû ve li ser lingan bihişt. Eşîr divabû her gav zindî bûya. Eşîrên ku zindîbûna xwe wînda dikirin, ew carake din zû bi zû bi ser xwe nedihatîn. Ji ber vê rastiyê jî, eşîran her gav dixwestin ku hîmên civata xwe ya sosyal û kulturî xurtir û kurtir bikin. Endamên eşîra xwe bîstewînin û wan bikin yek ji civata xwe. Huner û hunermendan, bi gelek awayî mirovê civata xwe sosyalîze dikirin. Bi kurtî huner û hunermendan roleke sosyal û îdeolojîk di civatê de dileyîstîn. Ji ber wi-



Reşîte Omerî bi deng û awazê xwe navdarekî herêma Mêrdînê bû

lo jî bûyer û huner ji hev ne dihatin cudakirin. Praktîka sosyal û hunerê bi hev-dû re pêşdiker. Di vê tevgirêdana kulturî de bûyer û huner hevdu temam dikirin...

Di civata eşîrî de navnîşana hunermendan tunebû. Hunermend him hunermendên eşîra xwe bûn û him ji hunermendên eşîrên cîran bû. Herçiqaş hunermendek bi navê gundê xwe, eşîra xwe an jî malbata xwe dihate naskirin jî, ew pêşî hunermendê herêma xwe bû. Weke mînak ez dikarim Reşîte Omerî bidim. Reşît, hunermendê navçeya Omeriya bû û li nava Eşîra Omeriya dijiya. Bi taybetî li Serê Kaniyê û li Kurka Stilîlê konê xwe vedigirt. Reşît, hergav ji xwe re li xelatan digeriya. Ew mecbûr bû ku îdara malbata xwe bike. Ji ber vê yekê jî çî

cara ku wexta benderan, tirî, miştaxa, tûtîne an jî cejnên musulmanan dihatin, Reşît diçû cem malbatên xuyayî li Omeriya û li derdora Omeriya. Reşît, tucara ji tixûbê Mêrdînê dernediker derve. Wî bi taybetî di vê navçeyê de dawa xelatên xwe li maqûl û malbatên xuyayî dikir. Ev yeka heqê wî bû û weke peymaneke nenivîsandî dihate pejirandin. Gund tunebûn ku Reşîte Omerî lê mêvandarî nedikir. Xelkên gundan gelek caran bêriya mêvanê xwe dikirin. Roja ku Reşît li gundekî dibû mêvan, wê rojê li gund bi rastî şahî hebû. Zarok, kal, pîr, xort, keç, jin, erê hemû kes li oda gund dicivayan û li hunermendê xwe guhdarî dikirin. Di civatê de hunermend hergav diçû cem guhdarê xwe. Bi kurtî huner diçû cem

xelkê û ji xwe re li guhdaran digeriya. Di civata kevnare de komunîkasyona di navbera hunermendan û guhdaran de, dibû weke deryayeke bêbinî. Hetta mirov bixwaze ew komunîkasyon fireh, kûr, piralî û mirovî bû. Di demên wiha de hunermend û civat di nav hevdu de dihiliyan û di navbera wan de danûstandineke gerdûnî pêk dihat. Di vir de huner dibû heyvanê vê komunîkasyonê...

Wexta ku hunermend di civatê de dest bi xebata xwe dikir, gelek fotografên balkêş derdiketin meydana. Bi taybetî wexta ku di stranekê de hinek kes dihatin kuştin, an jî hinek kesên ku sempatiya civatê ji wan re hebû diketin rewşek xerab, guhdaran ji hunermend daxwaz dikirin ku wî beşê stranê nebêje. Guhdaran nedxwestin bûyerên nexweş bibihîzin. An jî wexta ku kesekî xerab, qirêj, xayîn an jî bêbext di devereke stranê de dihatê kuştin, civatê hemûyan bi hev re nalet li wî kesî dîanîn. Kes û kirinên xerab hergav dihatin ricimandin. Qîmetên civatê yên exlaqî di vir de baş derdiketin pêş. Reş û spî ji hevdu cuda dibû. Bi kurtî qencî û xerabî di vir de ji hevdu baş dihatê qetandin. Tixûbên exlaqî ava dibûn. Beşdariya civatê bi hev re di vê ricimandina kes û kirinên xerab de, weke deklerasyoneke îdeolojîk dihatê pejirandin. Civatê bi awayekî kollektîvî bi hev re, helwest li himberî xeraban digirt. Mirov dikare bi-bêje ku, ev bûyer weke katarsîseke (xwe paqijkirineke, xwe şuştineke) hissî û exla-

qî di nav mirovan de belav dibû. Mirovên ku beşdarî vê komunîkasyonê dibûn xwe ji xerabiyên dawdişandin. Di vê pêşveçûnê de jî hunermend tucara dilê civata xwe nedihîşt. Daxwaziyên civatê û xelkê hunermendan hergav bi cîh dîanîn. Ez bi xwe pirr caran bûme şahidê vê yekê. Reşîte Omerî, pirr caran form û herkên stranên xwe, li gora daxwaziyên beşdar û guhdaran diguherandin. Bi kurtî komunîkasyona ku di navbera hunermendan û guhdaran de hebû, ne yekalî lê belê dîalî bû. Him guhdar û him jî hunermend bi hev re aktîf bûn...

Reşîte Omerî xwediyê reperetuareke pirr fireh bû. Wî bi sedan epop, lawce û stranên xelkê zanibûn. Di nav epopê ku di reperetuara Reşît de hebûn şer û serpehatiyên eşîrtî cihekî mezin digirtin. Hilbet mirov bi carekê re nikare behsa hemû berhemên Reşîte Omerî bike. Ew tişteki ne mumkun e. Ez di vê nivîsarê de dixwazim li ser şerê Sadûn Axayê Omerî bi-sekinim. Di pêşda em ê behsa berhemên Reşîte Omerî yên din jî bikin...

Wexta ku Reşît li civatan dest bi karê xwe dikir, beriya hemû tiştî wiha digot;

"Ez Reşît im Bavê Kinê me
Gurçika gê me,
Şairê dinyê me
Ewê ku min nehewîne mala xwe
Ez bi zorê mêvanê wê mala me!"

Reşît bi zorê tucara nebû mêvanê tu kesî.

Deriyê hemû maqûl û serekên eşîrên derdora Mêrdînê ji Bavê Kinê re vekirî bû. Kêf û sohbeta Bavê Kinê bi destê hemû kesan nediket. Bavê Kinê mêvanekî ezîz û neqandî bû. Di rastiya xwe de ew rêzên ku me li jor nivîsandin, bûbûn weke nasnameyekê ji Reşîr re. Herçiqasî Reşîr di vê nasnameya xwe de behsa zorê jî dike, ew zor zoreke nermê, zoreke ku tê de xweşî û mirovanî heye. Armanca Reşîr li vir stranbêjî ye. Ew dixwaze ku bi zorê stranên ji xelkê re bibêje û kêf û şalixiyê li civatê bike...

Di strana Sadûn Axayê Omerî de navê diwanzdeh kesên xuyayî derbas dibe. Li derveyî van diwanzdeh kesên xuyayî kesên anonîm û bênav jî di stranê de derbas dibin. Kesên ku navê wan xuyayî ne ev in; Brahîmê Atman Axa, Sadûnê Mihemed Cizîrî, Ezîma Mihemed Cizîrî, Hopo, pismam û zavayê Sadûn Axa, sê xulamên Sadûnê Mihemed Cizîrî; Usîv, Keleşê Keleşa û Brahîm, Remmê Şindî ku maqûlê gundê Mahsertê ye, Keleşê Keleş ku maqûlê gundê Golê ye, Temmê Qaso ku ji eşîra Bûblana ye û zavayê Sadûn Axa ye, Eliyê Ebbasê Kurtanker ku li gundê Fafê rûdinê, Emerê Zernoqê ku maqûlê gundê Zernoqê ye û him jî şopgerêkî bi nav û deng e. Li aliyê din behsa jina Eliyê Ebbas û jina Emerê Zernoqê jî tê kirin. Li Oda Çalê jî civara Sadûn û Brahîmê Axê runîştîye û şewr û mişewrê xwe datînin...

Heger mirov di stranê de hemû kesên

xuyayî û hemû kesên anonîm bîne cem hevdu, ew ê portra bîst kesan derkeve pêş. Ez bawer nakim ku romanake modern, fireh û pêşketî karibe ewqasî portreyên cihê cihê di xwe de bicivîne. Romanên ku pîrr kesan di xwe de dicivînin, weke xebatên Honorê De Balzac jî, an jî Yaşar Kemal dîsa kêman dikarin, ewqas kesan di romanekê de komî ser hev bikin. Heger romanên wilo hebin jî, ew ne norm im lê belê îstîsna ne. Ez dixwazim bi kurtî li vir bêjim ku, pîrr epopên ku Reşîr û hunermendên din yên ku klasîk dibêjin, ji aliyê hûnandin, dewlemen-diya kesan, psîkolojiya mirovan, herk û rewşa civatî, ziman û xemilandina bûyeran, ne kêman huner û avaniya edebiyata modern in. Hetta ez dikarim gaveke din jî pêş de herim û bibêjim ku; ew epopên kurdî ku em li vir behsa wan dikin, ji pîrr aliyên de jî, ji pîrr beşên edebiyata modern jî pêşketîtirin. Ji xwe di nav edebiyata kurdî ya nivîskî de kêman berhem hene ku bikaribin xwe bigihînin mustewa epopên kurdî yên klasîk...

Strana Sadûnê Mihemed Cizîrî wiha dest pê dike: Di zivistanekê de hinek kes bi dizî têne derdora oda Çalê. Li erdê berf heye. Gundê Çalê paytextê eşîra Omeriya ye. Yên ku bi dizî hatine derdora oda Çalê, ne ji bo xêrê hatine. Niyeta van kesan xerab e. Ev bûyer û rewş Sadûnê Mihemed Cizîrî û apê wî Brahîmê Atman Axa pîrr dide fikirandin. Ji bo ku şopa van mirovan nas bikin hemû maqûl

û rîspiyên Çalê didin hevdu û Sadûn Axa meselê ji wan re dibêje...

Sadûn ji gundiyan xwe re pîrr vekirî dixavê û dibêje; Ji bo ku dîsa baweriya me bi hevdu were, divê em van kesên ku bi dizî hatine derdora oda Çalê derxînin meydanê û wan ceze bikin. Yan na ewê şik bikeve nava eşîra Omeriya. Wê çaxê tifaqa me Omeriya namîne. Civata Sadûn û Brahîmê Axê dighêjin wê qanaetê ku, divê kesên şopger werin û van kesên ku bi dizî hatine derdora Çalê êşkere bikin. Sadûn bi xurtî li ser vê yekê disekine. Psikolojiya Sadûn di vir de pîrr balkeş e. Ev bûyer jê re bûye weke kurmekî û laşê wî dixwe. Eşîrtî li ser baweriyê ava dibû û bi vî awayî jî bi rê ve diçû. Wexta ku baweriya eşîrê xera bibûya, wê çaxê eşîra Omeriya ji hevdu hildiweşiya. Wê gavê yekîti nedima. Ji ber wilo jî Sadûn dixwaze ku, ew kesên ku bi dizî hatine derdora gundê Çalê bêne êşkerekirin. Ew kesên han divabû bihatana cezekirin. Civata Sadûn û Brahîm raya xwe di vir de dikin yek û dişînin dû Emerê Zernoqê. Emer maqûlê gundê Zernoqê ye. Zernoqê gundekî Omeriya ye. Di şopgeriyê de şad û şûdê Emerê Zernoqê gelek hene. Di derheqa Emer de dibêjin ku; heger berf heta kabokê li erdê be, fikîniya bayê kur jî li ser be, Emerê Zernoqê dikare şopa mêşa hingiv bimeşîne heta ku here ser hêlîna wê! Tu şop nikarin ji ber destê Emerê Zernoqê xelas bibin...

Sadûn sê xulamên xwe yên holî zîrek

dineqîne û wan dişîneê ser gundê Zernoqê. Xulamê Sadûn ku navên van Ûsiv, Brahîm û Keleşê Keleşa ne, emir ji Sadûn girtine ku Emerê Zernoqê sax an jî mirî bînin oda Çalê. Wexta ku xulamê Sadûn xwe digîhin gundê Zernoqê, Emerê Zernoqê xwe li mirîtiyê datîne û naxwaze were oda Çalê. Ew ji Sadûnê axê ditirse. Lê xulamên Sadûn axa şewirkirîne ku, sax an jî mirî Emerê Zernoqê bînin oda Çalê. Xulamê Sadûn destê Emerê Zernoqê dikin kelemqê, lingên wî dixin qeydê û serê wî jî dixin darê leylê û li ser darbastekê siwar dikin û wî tînin oda Çalê...

Sadûn pêşî bi xweşkayî nêzikî Emerê Zernoqê dibe. Jê re bûyerê dibêje û jê dixwaza ku şopa van kesên ku bi dizî hatine derdora oda Çalê derxîne. Sadûn ji Emer re dibêje ku, heger tu ji min re şopa van kesan rast bibêjî, ezê hespekî şînoz bidim te, pêncî (50) zêrê Reşadî û beranekî dermalê, na heger tu derewa li min bikî, ezê wê gavê serê te jê bikim...

Emerê Zernoqê li hewşê diçe ser şopê. Xwe bi ser şopê de daqûl dike û bi carakê re dibêje; ev şopa pêşî ya Remmê Şindî maqûlê Mahsertê ye, eva din ya Keleşê Keleşa maqûlê Golê ye, eva din ya Temmê Qaso ku zavayê te ye û di mala te de altaxî li te kiriye. Ev şopa din ez nasnakim...Lê di rastiya xwe de Emerê Zernoqê wê şopê jî nas dike. Lê ew newêre rastiye bibêje. Ev şop ya Hopo ye ku li gundê Qurdîsê dijî, ew pismamê Sadûn e û di eynî wextê de jî zavayê wî ye. Emerê

Zernoqê ditirse ku navê pismamê Sadûn jê re bibêje. Emerê Zernoqê di dilê xwe de dibêje ku, heger ez navê wî bibêjim, ew jî zalimekî weke Sadûn e û dikare min sibehê li deverekê bikuje...

Li nava eşîra Omeriya ji Sadûn re digotin "Xwedêkê Çalê" û navê apê wî Brahmî jî kiribûn "Siltanê Omeriya". Xwedê û Siltan jî ji rewşa ku derketibû meydane, pirt aciz bûn. Hizûra eşîra Omeriya xerab bibû. Kela dilê Sadûn bi bersiva Emerê Zernoqê hênik nebibû. Sadûn sozdayî û sondxwarî bû. Ev kesên ku bi dizî hatibûn derdora gunde Çalê, divabû ku eşkere bibin. Sadûn careke din civata xwe dide hev, şewirmend, rîspî û maqûl dîsa li oda Çalê dicivin. Sadûn meselê ji serî heta binî ji wan re dibêje û ji wan daxwaz dike ku çareyekê ji vê meselê re bibînin... Divê baweriya eşîra Omeriya çareke din bi hevdu were. Di odê de di destê Sadûn de şivek hêzeran heye. Ew ji seriyê vî aliyê odê diçe seriyê din. Herdu çavên Sadûn yên şîn sor bûne. Xezeb ji çavên wî dibare. Hizûra wî xerab bûye. Hedana wî nema ye.

Ji qorziya odê kalek behsa Eliyê Ebbas dike. Eliyê Ebbas mirovekî kurtanker e. Bi eslê xwe ji Kurka Metîna ye. Lê li gundê Fafê rudine. Şopgerandina wî ne kêmtî ya Emerê Zernoqê ye... Civat biryara xwe dike yek û Sadûn jî emir dide xulamê xwe ku, ew herin gundê Fafê Eliyê Ebbas sax an jî mirî bînin oda Çalê. Ûstiv, Keleşê Keleşa û Brahmî xwe tavilê kar di-

kin û berê xwe didin gunde Fafê. Eliyê Ebbas jî weke Emerê Zernoqê xwe li mirinê û reşqelan datîne, lê dîsa jî ew ji lep-pên xulamê Sadûn xelas nebe. Bi taybetî Keleşê Keleşa weke ku Reşît dibêje "Pîç ewladê zinê bû". Tu kesî nikarî bû fen li wî bikira. Keleşê Keleşa mirovekî zîrek û çavvekirî bû. Gotina "pîç ewladê zinê" herçiqas manayeke negatîf jî bida, ew ji bo mirovê zîrek û çalak dihate bikaranîn. Keleşê Keleşa bi rastî mirovekî zîrek bû. Ji xwe ji ber vê yekê jî Sadûn ew kiribû serokê xulamê xwe.

Xulamê Sadûn destê Eliyê Ebbas dixin kelemçê, lingên wî dixin qeydê û serê wî dixin darê leylê. Eliyê Ebbas li derbastekê siwar dikin û wî tînin oda Çalê. Sadûn ji Eliyê Ebbas re navên xelatên ku ewê bide dihejmêre; hesp, zêrê Reşadî, beranê dermale...Eliyê Ebbas ji Sadûn re navê şopa kesê çaran jî derdixe û eşkere dike. Kesê çaran ku Hopo bû û li gundê Qurdîsê dijiya, pismam û zavayê Sadûn bi xwe bû.

Piştî ku her tişt eşkere dibe, bêhna Sadûn tê ber wî. Hema wê bîstikê çekên şer li xwe dike, koma xulaman dide ser hev û berê xwe dide gundê Qurdîsê. Sadûn zilamekî leşker bû, nedixwest meselê zêde dûvdîrêj bike û gotinan li hevdu bizivîrîne. Sadûn fêr bibû ku hesin di germaya xwe de divabû bihata kuttan. Her fêkî di wexta xwe de xweş bû. Hîna bi fereca sibehê re Sadûn digire ser Oda Qurdîsê. Hopo bi tena kiras, serqot û bi çalepîka

tê ber lingên Sadûn axa. Hopo efûya xwe ji Sadûn dixwaze. Lê Sadûn bi carekê re dest davêje atfiya Misrî ku serê Hopo jê bike. Lê di wê demê de xwişka wî Ezîmê li Sadûn dike qêrîn û dibêje; "Kekê mino wî kir tu neke, zarokên min li ber dîwaran sêwî nehêle". Sadûnê çavsor û zalim ji bo xatir û rica pîrekekê Hopo efû dike. Ji vir û pêde Sadûn, ya Ellah ya Xwedê berê xwe dide gundê Mahsertê. Xulamê wî bangî Remmê Şindî dike û Sadûn bi kurtî meselê jê re dibêje. Remmê Şindî mikur nayê û dibêje; "Sadûn axa ma çi heddê me ye ku em bi dizî bêne derdora oda Çalê. Xelkê fesadî kiriye". Remmê Şindî derewa dike. Sadûn hema bi carekê re çavê xwe li xulamê xwe dike, xulam Remmê Şindî girê didin û tenekeyek dohnê gazê bi xwe re hiltîne. Li nêzîkî Golê dareke rizyayî û kevnare hebû. Sadûnê Mihemed Cizîrî û xulamên wî Remmê Şindî bi saxî dixin qula darê, dohnê gazê berdidin ser û kirin ku virrîna agir di ezmana re derkeve. Hema hîna ku agir digihîya ezmana, Sadûn û xulamê xwe têne gundê Golê û bangî Keleşê Keleş dikin. Mehkemeya Keleş pîrr kin da-jo. Keleşê Keleş rastiye ji Sadûn axa re dibêje; "Axayê min bi Xwedê em diçûn mala kîjan mêrkê Omerî, kesî weke adetên dinyayê gepek nan nedidan me, merşik nedixistin bin me. Me got belkî qey em serê te an jî yê apê te Brahîm axa jê bikin ku li nava Omeriya deng bi me ke-ve. Me dixwest ku em sava xwe bixin dilê

xelkê". Wexta ku Sadûn van gotinan dibihîze ew dikene û dibêje ku rastî rastiya Xwedê ye. Ji Keleş re dibêje; here, min tu efû kir. Keleşê Keleş ji ber ku rastiye ji Sadûn axa re dibêje tê efûkirin...

Sadûn hema ji wê derê rast vedigere oda Çalê. Hema wê gavê bi carekê bangî Temmê Qaso dike: "Lawo ma ji hemû kesa te bi min re xayintî kir. Tu zavayê min î û tu di mala min de yî. Tu çawa di mala min de altaxiyê li min dikî?". Sadûn ji Temmê Qaso pîrr hêrs dibe. Hema wê bîstîkê Sadûn çav li xulamê xwe dike, xulamên wî dest û lingên Temmê zeft dikin û wî dibin ser serê qesra oda Çalê. Sadûn li ser serê qesrê atfiyê davêje serê Temmê û serê wî jê dike. Xulamên Sadûn bi laşê Temmê digirin, heta ku xwîn diherike binê qesrê...

Heger mirov baş bala xwe bide vê bûyer û hunerê, ew ê pîrr tişt di derheqa desthilatî, serokatî û sistema eşîrî de derkevin holê. Ji aliyekî de mirov tirs, tîrsa ji mirinê, xayintî û plankirina kompoyên siyasî dibîne. Ji aliyê din ve, Sadûn li vê derê weke kesekî xwedî desthilatdar tevger dike. Ewê ku xayintî û komplo li Sadûnê Mihemed Cizîrî dikin, hinek kesên mirovên wî ne, hinek ji wan maqûlên eşîrê ne û hinek jî mezinên bavikên xwe ne. Yanî bi kurtî xayintî di hundirê eşîrê de ye. Van kesên ku xwestine kompoyê çêbikin û desthilatdariya eşîrê bikine destê xwe, metodên çewt hîlbijartine. Heger mirov di nav eşîrê de, dilê xwe bibijîne

desthilatdariyê û axatiyê, divê wê çaxê mirov metodên meşrû û eşkere bikarbîne. Metodên meşrû di nava eşîrê de jî ev bû; şerê ku di nava eşîrê de bihata kirin, divabû eşkere bihatina kirin. Em hemû baş dizanin ku, di nav sîstema eşîrtî de rê û xebarên demokratîk tunebûn. Axatiya eşîran hergav ji hinek malbatên xuyayî re bûn. Serokatiya eşîrê di destê vê malbatê de bû. Kesên serokê eşîrê ji nav vê malbatê derdiketin. Sîstema eşîrtî wiha ava bûbû. Lê kesê ku li vê derê dilê xwe bijandine axatiya eşîrê, şerê xwe bi serokatiya eşîrê re eşkere nekirine. Ji ber wilo jî Sadûn axa weke desthilatdarekî eşîrê van kesên ku ne meşrû tevger kirine ceze dike. Bi vî awayî Sadûn dixwaze cerake din rêzana eşîrê, li ser eslê xwe bide runîştandin.

Tiştêkî din yê balkêş di vê bûyer û stranê de ev e; Eşkere ye ku Sadûn zalim û çavsor e, lê belê ew kesê zalim û çavsor, dikare ji aliyekî de jî, ji bo xatirê xwişka xwe, kesekî sûcdar efû bike. Hetta hetta Sadûn ewê ku rastiye dibêje jî, yanî Keleşê Keleş jî efû dike. Li ba kesên zalim û çavsor, heger mirov li bûyerên dîrokî û civatî binêre, wê gavê mirov dikare hergav misqalekî merhametê û diltenikiyekê jî, li ba van kesan bibîne. Bi kurtî tu mirov di civatê de mutlaq ne zalim in, ne çavsor in, ne xerab in û hwd. Di mirovekî berbiçav de sixletên başî û xerabiyê bi hev re hene. Wexta ku sixletên xerabiyê li cem mirovekî bi pirranî bi ser dikevin,

wê çaxê mirov dibe kesekî xerab. Na heger sixletên başiyê bi ser bikevin, wê çaxê mirov dibe kesekî baş. Ew sixletê başî û xerabiyê, ku em li vir behsa wan dikin, ne di ser civat û dîrokê re ne, lê belê di nav civat û dîrokê de ne. Sixlet ancax di dîrok û civatan de, dikarin formên xwe yê berbiçav bigrin. Li gora civatên berbiçav, pîvanên başî û xerabiyê dikarin werin guherandin. Wek mînak mirov dikare wiha bibêje; Di civata eşîrtiyê de, li herêma Omeriya Sadûn axa kesên ku dixwastin bi riyên ne meşrû bibin serokê eşîrê, bi mirinê didane cezekirin. Ev tedbîr weke tiştêkî normal, di nava eşîrê de dihate pejirandin. Di rastiya xwe de jî, heger Sadûn axa ew cezaya dijwar nedabûya van kesên sûcdar, wê çaxê jî axatiya Sadûnê Mihemed Cizîrî dihate pênc peran. Sadûn divabû axatiya xwe bida nîşandan. Ji xwe axatiya eşîrê ew ceze li ser serê axayê eşîrê ferz dikirin. Lê di civateke kapîtalîst û modern de sêceki wiha, belkî dikaribe bi tenê bi hinek cezayên zîndanê were xelaskirin. Bi kurtî divê mirov ji hêla sosyolojîk de, kesan li gora danûstandin, norm û pîvanên exlaqî di civateke berbiçav de analîz bike, bixwaze tevger û kiryarên vana bi awayekî zanyarî jî fahm bike. Wê gavê tîpên mirovan, di civateke xuyayî û berbiçav de, dikare bala mirovan bikişîne û di huner û civatê de karakterên cuda cuda derxîne pêş. Kultur û edebiyat ancax wê gavê dikare alîkariya mirovan bike, huner ancax bi wî awayî

dikare alîkariya mirovan bike ku, mirov, weke mirov xwe ji hemû aliyan de fahm bikin. Mirov divê karibe xwe weke mirov fahm bike. Ji ber wilo jî wexta ku Marks û Engels behsa edebiyata realîst dikirin, wan digotin ku edebiyata realîst divê behsa; "karakterên tîpîk di civatên tîpîk de bike". Sadûnê Mihemed Cizîrî di civata eşîrî de, karakterekî tîpîk ê eşîrtiyê ye.

Lê ma ku civatek an jî organîzasyoneke ku xwe weke neteweperest an jî sosyalîstan dide nîşandan, di rastiya civatî de kes û serokên weke Sadûn derxîne meydanê, wê çaxê mirov ê çawa karibe ji nav mese lan derkeve? Ez bawer im ku di dema me ya îro de, pirr tîpên civatên kapîtalîstî û sosyalîstî hene ku, ew di rastiya xwe de weke Sadûn axayê Omerî ne. Sadûn di civateke eşîrî de axatiya eşîrê dikir, çerxa civatê jî li gora normên eşîrî dimeşiya. Lê ma axayên ku îro siyasî ne, li gora kîjan normên îdeolojîk û exlaqî civatên xwe bi rê ve dibin? □

Mêvandarî

Ji porê te yê zêrîn
Bagerek Serhedê da rûyê min
Ew kula li ser dilê min
Bihareke windabûyî de mayî
Tîrêjan çavê te geş kir

Piştî ewrên tarî
Tu Bûka Baranê
Mêvana emrê eşiyayî
Zeriyê, li van kolanên sar
Sîng û berê te
Ji min re mêrg û zevî ye
Bawer ke
Îşev tu yî welatê min

Mehmet Aktaş

Emîr-ul qatilîn

Rojen Barnas

Li derek, deverek a cîhana me
-Ez bêjim seray, tu bêje eywan-
Civiyan giregirên deverê:
Şêr, piling, gur, eylo
Rûviyên xasûk ên j' dema berê

Gişt di eywanê tekmîl
Gişt li hêviya xwedanê
çaqotê hestî

Berdevkê protokolê, qasid
Bang kir bi dengê bilind
Bi dengê fermangiha yê gurr
Got:
"Kana jiyana cawîdan,
Pêşewayê azadîbexş,
Xweşiya dîna çavan,
Geşiya riyê zemîn,
'El-el-hezret
Emîr-ul-mu'mînîn!."

Xurmîn bi dîwanê ket
Erdhej bi eywanê.
Emîr-ul qatilîn
Ji derî
Ket zibilxanê.
Mêze kir li rast û çep, li dûr û nêz

Bişîrî nîv bigef, çaryek razî
Derbasî ciyê xwe bû
Li seriya civatê
Li cihek bilind
Rûnişt
Û dengê kuxiya bi nazî.

Emîr-ul qatîlîn kete eywanê
Li rexek bûmê reng-Bermekî
Li yê dî selax keftar efendî
Radiwestan rast û çep
Ji bona parastina
wî ya
ji vê garanê

Emîr-ul qatîlîn kete eywanê
Şêr û piling
Û gur û rûvî
Di hizûrê de xwe ji bîr vekirin
Bûn mîna kerê qol ê di xanê.

Emîr-ul qatîlîn hate dîwanê
Qefil li aqilê gîştê ket
Zana bûn nezan, nezan nezantir
Pîrbêj bûn lalê ji zikmakî
Kes nema ku nehate îmanê

Vê Leglegê

Vê leglegê baş dinasim, ji mêj va
Vê ya li ser kuleka Topkapiyê
Wer xuya ye ji leqleqê xêr diye
Ta ji berî Tenzîmatê bi vê da

Ji ber zîrçê êdî hawîr hedimî
Ji wê bihna genî û leqelegê
Mirovahî paqij mabû l' kenarek
Ew jî kete ber zîrça wê, herimî

Vê leglegê dinasim, ta ji mêj va
Ne li şerqê stirî bû Asyayî
Bi leqleqê xweste bighîje xerbê
Bi leqleqê kî giha Ewropayê?

Vê leglegê b' leqe-leqê dem buhart
Nebû meriv, nehişt serê me aş be

Hê li ser sêra berê

Em dîndar in ji berê da, hê j' berî
Ku dîn bişê bi çalepka bigere
Dîndarê rût
sofiyê hişk
murîdê rengserserî.

Em soft ne: Sofiyê hişk î ziwa
Ne j' zanîn û fêmkirina j' bawerî.
Giya çawa hêşîn dibe di erdê
Baran çawa dibare j' asîmana
Yê me jî
bi wî
tehrî.

Me carek gotiye "e!", nabe "na!"
Me carek gotiye "na!", nabe "erê"
Te divê bêje j' berî "qalû belê"
An jî hê wek berî "çûna seferê"
Belê!
Em
Hê li ser
sêra
berê.

Rojen Barnas

Ji edebiyata fransî Corneille û Racine



Fawaz Husên

Pierre Corneille (navê Corneille bi kurdî Kornêy tê bilêv kirin) li bajarê Rouenê, bajarê çap û weşanan di sala 1606an de ji diya xwe dibe. Malbata wî ji burciwaziya biçûk e. Sê xweh û birayê hene. Corneille li vî bajarî biçûkaniyeke bê serêş dijî. Ew di nehsaliya xwe de dikeve dibistaneke oldarî û di wergerandina rûpêlên berhemên latînî de bala mamostê xwe dikişîne. Ew qanûnê di nav salên 1622 û 1624an de dixwîne û di hîjdehsaliya xwe de dibe parêzgerê Parlemana bajarê xwe.

Di 1625an de ew helbestên xwe ên pêşîn li ser evîna xwe dinivîsîne. Edebiyat û bi taybetî şano bala wî bi xurtî dikişînin. Ta ku bêkar nemîne, ew ji bêgaviyê karê xwe yê parêzgeriyê berdewam

dike. Di sala 1629an de ew *Mélite* dinivîsîne. Bazîgerên şanoya Marais-ê li Parisê wê dilîzin û di cih de nav bi Corneille dikeve. Piştî vê biserketinê Corneille şanoyê li dû şanoyê dinivîsîne. Di sala 1633an de ew Richelieu dibîne. Richelieu *Komela pênc nivîskaran* saz dike û ji Corneille dixwaze ku ew bi her çar nivîskarên din re şanoyan li gor nêrînên wî binivîstn. Corneille bêtir bi tenha xwe ye û li gor dilê xwe kar dike. Richelieu bêhtengiya xwe eşkere nake, lê gava doza şanoya *Le Cid* dest pê dike, ew piştgiirtiya dijminên Corneille dike.

Bi şanoya *Le Cid* (1637), nav û dengê Corneille difire ber perê asmanan. Corneille di vê berhemê de evîn û siyasetê tevlihev dike û hîs û diltenikiya serdema xwe diyar dike. Ew bi vê berhemê navdar dibe û dilgermiya gelê Parisê bi alî wî û nivîsên wê tê. Rêya biserketinê li ber wî pehntir dibe lê rexne li navero-ka vê şanoyê dibin. Xêrnexwazên Corneille dibêjin ku ew tiştektî nû ji bal xwe



Pierre Corneille mîna bavê trajediyê tê dîtin

nikare biaferîne. Ew dinivîstînin ku Corneille mijara dastaneke spanî hinekî diguherîne û wê dike berhema xwe. Rast e ku Corneille naveroka şanoya xwe ji edebiyata spanî distîne ji ber ku

di sedsala hivdehan de hemû nivîskar wek wî dikin, ji xezînen kevin mijarên berhemên xwe dikişînin. Nivîskarên vê sedsalê bûyerên berhemên xwe ji Renaissansê, ji efsanên Yûnanî an ji dîroka

Romayê derdixin. Bi rastî rexne bêtir li Corneille tên kirin ji ber ew bi azadiyê ke mezin dinivîsîne û zêde guh nade pîvan û yekatiyên şanoyê.

Ji ber van rexne û êrîşan, Corneille dêşe û sê-çar salan dev ji nivîsandinê berdide. Paşê gava vedigerê, ew dest bi trajediyê dike. Ew di nav salên 1640î û 1642an de risteke trajediyan dinivîse. Berhemên wî *Horace*, *Cinna* û *Polyeucte* gelekî bi ser dikevin. Di çil û yek saliya xwe de Corneille dibe endamê Akademiya fransî.

Di nav salên 1648 û 1653an de, şerekî gelêrî li Fransayê bi navê şerê "La Fronde"-yê gûr dibe. Ji aliyekî gel li azadiya xwe digere, dil dike ji cengên bêserî û bêbinî azad bibe. Ji aliyekî din jî xanedarên mezin dixwazin dîsa xwe nêzikî desthilatîyê bikin û hêz û tawana key û wezîrê wî qels bikin. Di van salên diwar de, hemû tevgerên girêdayî bi hunera şanoyê sar dibin. Corneille piştgirtiya desthilata qiraliyê dike; ew dijt daxwazên gel û xandaran e. Ev cenga gelêrî bi ser nakeve û destgeha qiralî li Fransayê bêtir ber bi qiraliya mutleq diçe. Corneille dibe dadyarê herêma Normandiyê. Lê bi buhurîna salan ve, nav û dengê wî di warê şanogeriyê de kêm dibe û zora wî diçe. Corneille qels dibe ji ber ku Racinê xort bi trajediyên granbuha serê xwe bilind dike. Ew bi nivîsên xwe şûna Coreilleyê kal di dilê Fransiyayê de bi hêsanî di nivê duduyan

yê sedsalê digire.

Behemên dawîn ên Corneille deng nadin. Dem bêguman nema dema wî ye. Corneille di sala 1864an de li Parîsê dimire. Ew çil û çar salan dinivîsîne û sî û sê piyesan li dû xwe dihêle.

Le Cid

Cîh: Seviliya, başûrî Spaniyayê.

Dem: Demên Navîn, bêguman sedsalayanzdehan. Dema şerê di navbera fi-lên Spaniyayê û muslimanan de.

Bûyer: Rodrig xort e. Ta ku ew tola bavê xwe hilîne, ew bêgav e bavê dilbera xwe bikuje. Paşê, ji ber ku ew welatê xwe ji dijminan azad dike, keyê Spaniyayê di gunehê wî de dibuhure. Ew ji her alî de, ji aliyê qehremaniyê û ji aliyê evîne pîroz dibe.

Perdeya pêşîn

Rodrig û Şîmên ji hev hez dikin. Keça qirêl jî ji Rodrig hez dike lê ji ber bilindbûna ciyê xwe, ew nikare evîna xwe jê re diyar bike û rê li Şîmênê bigire. Qiral dixwaze Diyeg, bavê Rodrig, bike mamostê lawê xwe. Lê Gomêz, bavê Şîmênê, ji çavnebariyê gotinên pîs ji Diyeg re dike û sîlakê jî dadweşîna wî. Diyeg kal bûye. Ew nikare tola xwe bi destê xwe hilîne. Ew ji lawê xwe Rodrig dixwaze. Rodrigê belengaz dikeve heyreke mezin. Ew nikare tola bavê xwe nestîne û naxwaze jî bavê dilbera xwe şîmênê bikuje û dilê wê ji xwe sar bike.

Ew, hinekî, dudilî dibe lê zû Corneille biryarekê dixê dilê wî. Rodrîg qehremanekî Kornêlî ye, ango lehengekî ku namûsê di ser dengê dil re dibîne. Çi dibe bila bibe ew ê tola bavê xwe hilîne.

Perdeya dudyan

Rodrîg Gomês sor dike û di cenga tenbiten de wî dukuje. Keça qirêl di vê navberê de hêvî dike ku navbera Rodrîg û Şîmênê bişike. Şîmena perîşan berê xwe dide qirêl, jê doza kuştina kuşdarê bavê xwe dike. Gerek xwîna bavê li erdê nekeve.

Perdeya sisiyan

Dilê siwarekî bi navê Sanş di Şîmênê de heye. Ew jê dixwaze ku ew destûrê bide wî ta ku ew bi destê xwe tola bavê wê ji Rodrîg bistîne. Şîmên bi hîsên dilê xwe nikare û hezkirina wê ji Rodrîg re, ji kuşdarê bavê wê re herdem di hinava wê de agirekî boş e. Kuşdarê bavê wê gerek bê kuştin lê dilberê wî Rodrîg gerek sax bimîne. Musilmanên Merakişê êrîşî qiraliyê dikin. Diyeg pêşniyariyekê li lawê xwe Rodrîg dike. Ew wî bi gazî û hawara qiraliyê dişîne cengê. Eger ew peyrûzmend derkeve, dilê qirêk wê bêguman hênik bibe û wê di gunehê wî de bibuhure. Ew ê bikaribe paşê çareyekê ji derdê Şîmênê re jî peyda bike.

Perdeya çaran

Rodrîg qehremanê aqilane ye. Hişê wî

herdem di serê wî de ye. Ew bi gotina bavê xwe dike û dikeve nava cengeke xwîntije. Ew peyrûzmend dibe, êrîşên musilmanan dişikîne. Ew du *Cid-ên* wan, du Seyid, ango du serokên wan, dil dike. Qiral di xwîna Gomês de dibihure. Lê Şîmên ji malmezinan e û bi xwe jî mezin e. Ew nikare di xwîna bavê xwe de bibihure. Ew gerek hergav tola bavê xwe bixwaze. Her kes razî dibê ku Sanş, piştgirê Şîmênê, bi Rodrîg re bikeve cenga tenbiten. Şîmên ê bibe jina yê ku biser bikeve û sax bimîne.

Perdeya pêncan

Rodrîg dixwaze pêşt xwe bide kuştin ta ku dilê Şîmênê lê hênik bibe. Lê Şîmên hêvî dike ku evîndarê wê, kûşdarê bavê wê, zora Sanş bibe. Ew ê bibe jina Rodrîg û ne jina tu kesî din. Rodrîg zora Sanş dibe lê wî nakuje. Sanş tê ji Şîmên re, li gor daxwaza Rodrîg, dibêje ku dilberê Rodrîg hatiye kuştin. Şîmên nikare li rûyê kuşdarê şêrîne ber dilê xwe bine-re. Qiral rastiya rastîn belav dike. Piştî biserketina aqilmendiyê, evîn jî dikare pîroz bibe. Qiral biryara xwe ya dawîn dide: Rodrîg û Şîmên, piştî salekê, ê bin jin û mêtê hev. Rodrîg ji hemû qîm û reza xwe stûyê xwe li ber qiralê xwe xwar bike. Ew dide ser rêya pêkanînen nû.

Temaşegeheke qehremanî û siyasî

Trajedî mijarên navdar û cidî dixwaze.

Dawiya wê hergav di nav xwîn û kuştinê de ye. Corneille naveroka berhema xwe, mirjara *Le Cid* ji edebiyata kevin ya Spaniyayê derdixe. Di berhemên Corneille de, gelek caran bûyerên weha mezin nakevin seriyên lê ji ber ku ew ji afsanên kevnare hatine standin, kesek nikare bêje: ev nerast e. Di şanoya *Le Cid* de, wek nimûne, di şev û rojekê de Rodrig bavê dilbera xwe dakuje, bi çend leşkeran di şevê de ew hêzên muslimanên pir rîştîşî dike, du serokên wan dîl dike û tê ber destê qiralê xwe dîroka biserhatiyên xwe jê re, bi dirêjayî, rave û binav dike. Ji serê çîrokê ta dawiya wê, Rodrig hergav qehreman e. Eger ew dudilî dibe, ev dudiliya hanê tenê demeke pir kurt distîne. Paşê rehên mêraniyê di eniya wî de radibin û dilê wî bi dengê namûsê û welatparêziyê hergav hel dide. Corneille di berhemên xwe de bûyeran tevlihev dike ta ku ew bikaribe bi xurtî bala temaşegeran bikişîne û li wan kêr bike.

Di nêrîna Corneille de, şano divê di bin xismeta desthilatiya qiraliyê de be, piştgiirtiya wê bike. Di berhemên wî de erê evîn xurt e lê namûs, siyaseta qirêl û serfiraziya dewletê girîngtir in. Gava Rodrig ji bavê xwe dibihîze ku bavê Şîmênê ew pîs kiriye, ew tenê çend kêlîkên hindik dudilî dibe. Ew tolê radike ji ber ku namûsa bavê wî ji evîna wî girîngtir e. Paşê ew di serê xwe de tevnê sinc û exlaqekî bilind dirêse. Ew dibîne

ku eger ew tola bavê xwe hilneyne, ew ê di çavên her kesî de, û nemaze di yê dilbera xwe de, bênamûs û biçûk bibe. Corneille van dîtinan dixê serê Şîmênê jî, ji ber ku ew hergav du tiştên tersî hev dike: ji aliyekî ew dixwaze ku Rodrig tola bavê xwe hilîne ta di çavê wê de ew biçûk nebe, ji aliyekî din jî ew digere ku Rodrig bê kuştin ji ber ku wî bavê wê kuştîye. Ev doz tê ji bîr kirin gava dijmîn êrîşên xwe berdidin ser dîwarên welêt. Rodrig evîne li paş xwe dihêle û bi gaziya qiraliyê dilezîne. Şîmên jî tola bavê xwe li paş xwe dihêle. Parastina qiraliyê di ser her hîsê re ye. Bav divê rêya qehremanî û welatparîziyê nîşanî lawê xwe bide.

Naveroka trajediyê li bal Corneille qels e ji ber ku qehremanên wî bêtir guhên xwe didin dengê namûs û mezinbûnê. Qehremanên Corneille dibin xwediyên qedera û çarenûsa xwe. Dengê evîne an bayê rîqê mejiyê wan nanixumînin. Lehengên wî wîqas mezin û xurt in ku ew kêfa dilê temaşegeran ji xwe re tînin. Eger dilşewitandin û tirsandin du bingeşên şanoya klasîk in, mirov xweş dibîne ku ew herdu daxwaz li bal Corneille ciyekî mezin peyda nakin. Rodrig bi tevger û afirandinên xwe gerek dilê mirovan bilind bike. Ew divê rûmeta hestên wek welatparêziyê, tola bavê, hezkirina qirêl di dilê wan de boştir bike.

Dudiliya Rodrig erê dirêj nake, lê ew

di vê şanoyê de ciyekî mezin digire. Di hinava Rodrîg de hestên têkel û tersî hev li bin guhên hev dikevin:

Bav, yar, namûs, evîn,

Wacibê mezin û zehmet,

Stemkariya şîrîn.

An hemû xweşiyên min mirî,

An jî navê min tarî.

Yek min perîşan dîke,

Yê din min dîke ne erbabê ronahiya rojê.

....

Ey şûrê ku sedema êşa min î

Ma tu di destê min de yî

ji bo parastina şerefa min?

An jî bo wêrankirina Şîmêna min?

Ya baş ew e ku ez xwe bikujim.

Wek ku ez mecbûrê bavê xwe me,

ez mecbûrê yara xwe me jî.

Eger ez tolê hilînim,

Ez kîn û rîqa wê bi alî xwe de dikişînim.

Eger ez nekîm, ez xwe di çavên wê de pîs dikim.

Rodrîg li gor Corneille hişê xwe dixê serê xwe û bi rakirina tola bavê, bi şuştina namûsê bang dîke. Eger ew xwe bikuje ew ne tola bavê xwe hiltîne, ne di çavên yara xwe de mezin dibe. Ew biryarê dide ku bi kêmanî şerefê biparêze ji ber ku gava şeref wînda dibe, tiştêkî mirovan namîne.

Destê min, rabe em bi kêmanî şerefê xelas kin.

Her Şîmên ê ji destê min here.

Erê, min gavekê xwe şaş kir.

Berî ku ez mecbûrê yara xwe bim, ez bi giştî mecbûrê bavê xwe me:

Eger ez di şer de an jî ber xemgîniyê bimirim,

Ez ê berî her tiştî xwîna xwe paqij bikim, wek ku ew wilo paqij

Gihaşte min.

Ez dibînim min gelek sersarî kiriye?

Heydê em bi lez, tolê hilînin.

Mijara çend şanoyên Corneille:

Horace. Du bajarên nêzîkî hev: Albe û Roma di cengê de ne. Ta ku xwîn bêtir nerije, herdu bajar li hev dikin ku her yek sê qehremanan helbijêre û kîjan alî bi ser keve ji xwe biserketin ê ji wî bajarî re be. Bajarê Albê sê lawên Curiace hildibijêre, Bajarê Romayê sê lawên Horace. Lê belê xwîna van herdu malan di rêya zewacê re ketiye nav hev. Lawekî Horace Sabîne, keça Curiace anîye. Lawekî Curiace jî dergîstiyê Camillê, keça Horace ye. Her sê lawên Horace xwe bi dilgermî amade dikin lê lawên Curiace ji bêgavî diçin şer. Agahî belav dibe ku du lawên Horace hatine kuştin û yê sisiyan ji tirsê nava xwe revîya ye. Gava agahî digihêje kalê Horace ew li ber kuştina du lawên xwe nakeve, ew tenê li ber reva yê sisiyan dîkeve. Ew ê wî lawê bizdok bi destê xwe bikuje. Paşê tê nasîn ku ev law ji qazî direve. Gava her sê birayên Curiace didine pey wî, ew wan yeko yeko dikuje. Camille li

ber mirina dergîstiyê xwe dikeve û nifiran li Romayê dibarîne. Hingî birayê wê, wê bi destê xwe dikuje. Ji ber ku lawê Horace xwişka xwe dikuje gerek ew bê kuştin. Lê navê qehremaniyê giranbuha ye û kuştina egîdekî wek wî ji bo qiraliyê ê ne hêsan be. Ji bo bexşînê, qirral şertine mezin li ber lawê Horace datîne. Law biser dikeve û dikeve ber dilovaniya qirêl.

Wek Rodrigê berhema *Le Cid* Horace jî qehremanê welatparêziyê ye. Di perdeya duduyan de lawekî Curiace bi birayê dergîstiya xwe re diaxife, di nav gotinên xwe de êşkere dike ku ew ji ber vê cengê xemgîn e. Ew naxwaze ku xwîn di navbera malbata wî û ya dergîstiya wî de birije.

Ez dibînim ku şeref ji bo te di rijandina xwîna min de ye.

Hemû mezinahî ji bo min di rakirina şûr di kêleka te de ye.

Ji aliyekî ez nêzik im xwehê bînim, ji aliyekî din gerek e ez birayê wê bikujim.

....

Dilê min bi min dişewite.

Ez dixwazim di şûna miriyên vê cenga me de bim.

Lawên Horace bi van çavên xortê evîndar li bûyeran nanere. Ew bi kêf e. Bi saya vê cengê, ew ê bajarê xwe biparêze. Ew ê bikaribe navê xwe bilintir bike. Ew qehreman e. Hîsên tenik nabin di

nava wî de peyda bibin.

Ez guh li tişteki nakim, ez bi şadî vê şerefa mezin qebûl dikim.

...

Romayê bazûbendê min hilbijartiyê, ez nema guh li tu tiştî dikim.

Bi eynî kêfxweşî û rastiya ku ez ê xwehê bînim, ez ê wilo jî şerê birayê wê bikim.

Ta ku ez rê ji gotinên pûç re nehêlim, ez ji te re dibêjim ku Albeyê te hilbijartiyê.

Ez nema te nas dikim.

Berhemên Corneille di nîvê pêşîn yê sedsala hivdehan de deng didin. Ev berhemên hanê şeweyekî qehremanî û mezinahiyê pêşkêş dikin. Sedsala Louisê Çardehan, ji aliyê civakî û siyasî, vê mezinahî û qehremaniyê dixwaze. Lehen-gên Corneille bi saya xurtbûna îrada xwe û bilindbûna daxwazên xwe difirin ber perên asmanan.

Jean Racine (1639-1699)

Racine (bi kurdî Rasîn) li gundekî biçûk di malbateke biçûk de ji diya xwe dibe. Diya wî di dusaliya wî de û bavê wî jî di çarsaliya wî de dimirin. Racinê sêwî li bal dapîr û bavpîrê xwe mezin dibe. Gava bavpîrê wî dimire, dapîra wî dikeve Port-Royalê û Jeanê dehsalî bi saya wê belaş diçe vê dibistana oldarên jansênîstan. Ew di vê rehibangeha bi nav û deng de mezin dibe û edebiyata



Tiyatroya fransî ya klasîk bi trajediyên Jean Racine gihîşt radexya herî bilind

Kevin li ber destên mamostên xurt dixwîne. Racine hînî zimanê latînî û yûnanî dibe. Di sala 1653an de ew diçe bajarê Beauvaisê û herdem di xwendegehên

Jansênîstan xwendina xwe berdewam dike. Piştî du salan ew vedigere Port-Royalê û latînî û yûnaniya xwe xurtir dike. Mamostên vê dibistanê bi jîrbûna

xwe di warê ferheng û zimanê yûnanî de dengdar in. Ew çavên Racinê biçûk bi ser giranbuhayiya berhemên klasîk vedikin û dewlemendiya berhemên trajediyên bi vî zimanî li ber dilê wî şîrîn dikin. Bi saya wan Racin Bîblê dixwîne. Ew Saint-Augustin, Virgile û nemaze nivîkarên trajediyên ên Yûnansitanê dinase. Ew bi hêsanî berhemên Sophocle û Eurîpide ezber dike. Di 1659an de Racine bîstsalî ye. Ew li Parîsê bi cîh dibe û hin bi hin dikeve nav komên rewşenbîrî û civatên xandar û malmezinan. Ew pêwendiyên xwe berfireh dike, dixwaze biser keve û zîvariya rojên biçûkaniyê bi ghişîfî li paş xwe bihêle. Ew bi çend helbestan pesn û salixdana Louise Çardehan dide. Hevaliya Molière dike û bêtir bi saya Boileau derbasî dîwana qiralî dibe.

Di sala 1664an Racine berhema xwe ya pêşîn Thêbaîde an Birayên dijmin derdixîne ser sehnê. Ew biser nakeve û di 1665an de bi saya piyesa Alexandre nav jê re çêdibe. Corneille dibêje ku Racine " ne ji bo şanoyê çêbûyê". Ji ber vê gotinê, şerê di navbera van herdu nivîskaran û piştgrên van de pêdikeve û nema vedimire. Nêzikî deh salan li ser hev, Racine dinivîsîne. Ew li Fransaya sedsala hivdehan û di serdema Louise Çardehan de dibe bavê şanoyê bi ghişîfî û trajediyê, bi taybetî. Andromaque di 1667an de Racine ber bi perên asmanan dibe. Britanicus (1669), Bérénice (1670)

hemû dîwana qiralî li Versailles-ê bi girî vedike, Bajazet (1672), Mithridate (1673), Iphigénie (1674) û dawîya dawîn, berhema Phèdre (1677) ya ku tê naskirin wek şahkarê berhemên hunermendiya Racine.

Derketina Phèdrê gelek dijmin û gelek hevalan ji Racine re peyda dike. Nêzikî duwanzdeh salan piştî vê berhemê, Racine dûrî nivîsandinê û hunerê şanogeriyê dikeve. Ew dibe jînenigarê Louise Çardehan, bûyerên jiyana wî dinivîsîne. Ew li kêleka qirêl e û rewşa wî ya diravî û civakî xweş dibe. Lawikê ku di çarsaliya xwe de ji dê û bavî sêwî dibe di bin siya qiralê Fransayê yê herî mezin de dijî. Ew li destgeha jansênistên pir oldar, hin bi hin, vedigere. Hîsên oldarî di berhemên wî ên dawîn de, bi tersî yê pêşîn, xurt dibe. Racine di sala 1689an de şanoyekê bi navê Estherê dinivîse, paşê di sala 1691ê de ew şanoya dawîn Athalieyê diafirîne. Bi Xwedê bawer û dîndar, Racine di sala 1699an de dimire. Li gor daxwaza wî ew li dibistana xwe ya kevin, li Port-Royalê, li kêleka mamosteyên xwe, tê binaxkirin.

Mijar û naveroka Phèdrê

Perdeya yekemîn: Hippolyte ji Thérèmène re dibêje ku ew ê biçê li bavê xwe Thésée bigere. Ew bi rastî ji Aricieyê hez dike û ji ber vê evîna veşartî dûr bikeve. Phèdre herdem li mirina xwe digere ji ber ku ew jî hez dike û nikare

evîna xwe diyar bike. Dadoka wê Oenone wê bêgav dike tiştê nava xwe jê re bêje. Erê, Phèdre ne ji mêrê xwe, lê ji lawê wî, ji Hyppolite, hez dike. Di vê naberê de agahiya mirina Théséeyê qiral li bajêr belav dibe. Bi mirina Thésée, yek ji lawên wî gerek şûna wî bigire: Hippolytê ji jina wî ya pêşîn, an yek ji lawên ên jina anuha: Phèdre. Mafê Aricieyê jî heye ku ew bikeve şûna "apê xwe. Oenone ji Phèdrê re rave dike ku, piştî mirina Thésée, ew dikare evîna xwe ji Hippolyte re eşkere bike û wî bike. hezkirina ku di dilê wê de nema guneh e ji ber ku Hyppolite ne lawê wê ye. Ew lawê mêrê wê ye. Dadok ji Phèdrê re rave dike ku bi vê zewacê ciyê lawê wê li ser textê qiraliyê misoger e.

Perda duduyan: Aricie ji dadoka xwe re evîna xwe ji bo Hyppolite diyar dike. Hyppolite ji Aricieyê dixwaze ku ew li ciyê bavê wî rûnê. Ew agirê nava xwe jê re vê gavê diyar dike. Phèdre tê Hyppolite bi tenê dibîne. Ew jê re dibêje ku ew jê hez dike. Hyppolite gelekî bêhn-teng dibe û wê diqewirîne. Phèdre dike xwe bikuje lê Oenone nahêle. Di wê navberê de agahî li Atênayê belav dibe ku Thésée sax e, ne mirî ye.

Perda sisiyan: Phèdre wê qiraliyê ji Hyppolite re bihêle lê Oenone agahiya vegera mêrê wê diguhêze wê. Phèdre di-sa ê xwe bikuje lê Oenone pêşniyariyekê lê dike. Ew ji Phèdrê dixwaze ku ew bêbextiyan li Hyppolite bike û wilo jî

xwe di çavên mêrê xwe de paqij bike.

Gava Thésée derdikeve ser sehneyê, Phèdre xwe dide alî û Hyppolite jê re dibêje ku ew dixwaze biçê.

Perda çaran: Oenone ji Thésée re dibêje ku Hyppolite li dor jinbava xwe Phèdrê geriyaye. Hyppolite xwe diparêze, hewl dide Phèdrê derewîn derxîne. Ew ji bavê xwe re dibêje ku ew bi rastî ji Aricieyê hez dike. Bav bawer nake û ji jina xwe re behs dike ku Hyppolite jî Ariciyê hez dike. Phèdre bi bihîstina vê agahiyê pir dêşe û nema rastiye dibêje. Ew nema Hyppolite diparêze. Bav nifiran li lawê xwe dike. Ew dizane ku nifirên wî ê bi cîh bibin.

Perda pêncan: Hyppolite û Aricie biryarê digirin ku ji Atênayê birevin û bibin jin û mêrê hev. Gelek şik dikeve nava Thésée ku wî zû nifirên xwe kirine. Ew bang Oenonê dike, ta ku rastiya rastî bizanibe. Oenone xwe davêje deryayê, xwe dikuje ta ku derewa wê dernekeve. Agahiya mirina Hyppolite digihêje bavê wî. Phèdre jehrê dixwe û berî mirina xwe rastiya tiştan eşkere dike. Thésée bi tenha xwe kalekî xemgîn dimîne. Ew wesiyeta lawê xwe bi cîh dike. Ew Ariciyê dike wek keça xwe.

Dezgeha dramayê li ba Racine

Dezgeha şanoya klasîk ji sala 1620an ta 1660î bi pêş ve diçe. Ew bi hemû hêz û bedewbûna xwe di berhemên Racine de bi gewde dibe. Racine bi hêsanîyeke

yekta bingeh û daxwazên vê destgehê bi cîh dike. Wêk ku ew pîvan ji bo wî hatibine sazîkirin, ew bi şeweyekî sade berhemên xwe ên giranbuha ancama dide. Di piraniya pêşgotinên xwe de, ew qerfê xwe bi Corneille dike. Ew dinivîstîne ku Corneille nikare daxwazên şanoya klasiîk bi cîh bîne. Di pêşgotina Britannicus de, ew tenazê xwe bi wî dike. Di nêrîna wî de, Corneille hergav behsa bûyerên pir dike û ev bûyer bêtirî meheke sax dixwazin ta ku bi rastî bi cîh bibin. Di şanoyên Racine de perde bi destpêka rojê bilind dibe û berî ketina êvarê ew tê xwarê. Bûyera ku di yekaniya demê û cîh de dibihure gerek bûyereke sivik be. Daxwaza Racine herdem şanoyeke sade ye.

Di berhemên Racine de, gava dil bi ser war û pêtên evînê ve dibin, jiyana rojane bi giştîya xwe tê guhertin. Gava qehremanên wî, çî jin çî mêr, evînê nas dikin, ew ji desthîlanîn dikevin. Dê weledê xwe davêje, xwîn dikare bi awakî boş birîje. Phèdre bi mêr e, xwedî zarok e, jina qirêl e û ji malbata Xwedayên asmanan e. Lê gava ew cara yekemîn çav li Hyppolite, li lawê mêrê xwe, dikeve, hemû jiyana wê serobînî hev dibe, hiş û totik di serî de namîne. Ew bi hîsên xwe nikare. Rojên wê, yê mayî, ber bi dawîyeke kembax diçin.

Min ew dît, ez sor bûm, ez bi dîtina wî zer bûm;

Perîşaniyeke di şewatana canê min de gûr bû.

Çavên min nema didîtin, min nema dikarîbû dengê xwe bikim

Û hemû canê min her lerizî, her qijqijî.

Phèdre fêma dike paşê ku Hyppolite jê hez nake. Lê belê ew dike nake hêvî herdem, bêyî daxwaza wê, xwe berdide dilê wê. Evîna trajediyê dijwar e ji ber ku ew bi gunehê ve girêdayî ye: Phèdra bi mêr ji lawê mêrê xwe hez dike. Paşê ev evîn ji aliyekî tenê ye: yek hez dike û yê din direve an jî yekî din an jî yeke din hez dike. Kesê evîndar bi roj û şevan li dijî evîna xwe şer dike lê ew tucarî biser nakeve, ew tu dermanî ji kulên xwe re nabîne. Li bal Racine gava hîs di nava mirovan de peyda dibe, ne aramî, ne hiş, ne serî dimînin. Hestên xurt pencên xwe di hinavê de belav dikin û jiyana bi gihiştî diguherînin. Tu çare li sernivîstê nabe û hemû kesên ku hez dikin bi agirê hezkirinê gerek bişewitin, di nava tengezariyê de xwe gerek winda bikin.

Phèdre:

Mirov peravên mirinê du caran bi ç a v ê n xwe nabîne, Thésée qiraxên tarî dîtine

û tu bi derewana hêvî dikî ku Xwedayek wî li te vegeirîne

Mirîna çikûs nêçîra xwe tucarî bernade.

Tu çî dibêjî? Rast e ku ew nemiriye.

Ew ne miriye ji ber ku ew di canê te de dijt.
Ez herdem bawer dikim ku ez mîrê xwe li
ber çavên xwe dibînim.

Ez wî dibînim, bi wî re deng dikim.

Dilo, an dilo...Ax, ez xwe winda dikim.
Agirê nava min bêyî daxwaza min derdikeve.

Hyppolite :

Ez di hezkirina te de tişteki seyr û bilind di-
bînim. Li gel ku Thésée miriye, ew di çavên
te de herdem jîndar e.

Agirê hezkirina wî di canê te de herdem gur
e.

Phèdre:

Erê, mîrê min, ez diçilmisim û bi agirê evî-
na Thésée dişewitim.

Ez jê hez dikim lê ne wek Théséeyê ku do-
geh çav li rûyê wî ketiye.

Ne wek şehwetperestê bi hezarên jinan,

Ne wek wî Théséeyê ku destê xwe, dirêji ta
namûsa Xwedayê mirinê, kiriye;

Lê ez jê hez dikim wefadar, serbilind û bi
ser de ji hinekî dilhişk.

Xweşik, ciwan û dilrevîn wek çawa salixda-
na Xwedayên me tînin kirin an wek çawa ez
anuha te dibînim.

Şikilê wî yê te bû, çavên wî yê te bûn, şîrîn-
zimana wî ya te bû.

Ev şerma mezin li ser rûyê te li ser rûyê wî
bû.

Gava ew di ser pêlên Creteya me re gihast,

Daxwaza dilê keçên Mînos mîrêki wek wî
bû.

Wê gavê te çi dikir? Çima bêyî Hyppolite
qehremanên Yûnanistanê xurtên xwe helbi-
jartin?

Çima, gava hêna tu zaro bûyî, tu ne di
hundirê keştiyê de bûyî? Ew keştiya ku ew li
ser peravên me danî?

Dêwê Creteyê li gel pîrbûna dalanên cîh û
warê xwe ê bi destê te bihata kuştin.

Xwişka min ê tayê xwe yê giring bixista
destê te û te ji nav gumanên dijwar û rêyên
şaş derxista.

Lê na, min ê, ji bo alîkirinê, berî wê xwe
bigihanda te.

Ji destpêkê de hezkirinê ê ez bi gaziye bi-
şandama.

Min ê, mîrê min, min ê bi alîkariya xwe te
hîni çareserkirina aloziyên rêyên Labîrentê bi-
kira.

Ji bo wî rûyê xweşik, min ê çiqasî xwe bê-
şanda!

Min ê qîma xwe tenê bi dana wî tayî neani-
ya.

Di dijwariya rêya te de, ez ê ji te re bibûma
hevalrê. Min ê bida pêşiya te.

Û Phèdreya ku bi te re ê tîketa Labîrentê

An bi te re vegeiriya an beyî te bihata kuş-
tin.

Hyppolite:

Xwedayên min, ez çi dibihîzim? Xanim, ma
tu

ji bîr dikî ku Thésée bavê min e û ku ew
mîrê te ye?

Phèdre:

Û bi çi rengî tu dikarî bawer bikî ku ez ji
bîr dikim, mîrê min? Ma min mezinbûna ci-
yê xwe ji bîr kiriye?

Hyppolite dilê Phèdreya dişkîne û wê

diqewrîne. Ew dibêje ku ji ber gotinên wê rûyê wî dikeve bin nigên wî. Lê Phèdre wî li ber dixîne ku sûc ne sûcê wê ye, guneh ne gunehê wê ye. Wê bi şev û rojan li dijî vê evîna gunehbar di ber xwe de daye. Sûc sûcê Afrodîtê, Venusê, Xwedaya mê ya Evîne ye. Wê ev evîna kambax berdaye dilê wê ta tola xwe ji Hyppoliteyê hilîne.

Phèdre li mirina xwe digere, lê mêrê wê di wê navberê de vedigere. Phèdre ji mêrê xwe dibihîze ku dilê Hyppolite di jineke din, di Aricieyê de heye. Wê gavê, ew bi agirekî din, agirekî nû, dikizire: ew derdê dilxirabiyê nas dike. Ji bo kesê evîndar, êş ji êşa dilxirabiyê dijwartir tune. Di perda çaran de, di sehneya şeşan de, di malikên 1231-1245 de, Phèdre dibêje:

Ew ji hevudu hez dikin! Bi kîjan sihrê wan çavên min xapandin?

Çawa wan hevudu ditin? Ji kengî ve? Li kuderan?

Te dizanîbû: Na xwe çima te dihişt ku dilê min ji min bê standin?

Ma te nikarîbû agahiya evîna wan biguhesta min?

Gelo mirovan ew dtîne çawa bi hevudu re dipeyivîn? Li hevudu digeriyan?

Ma wan xwe di nava daristanan de vedişartin!

Mixabin na! Wan bi azadiyek mezin hevudu diditin.

Asmanan bi dilovanî li keserên wan dinêri.

Wan bêyî tirs û bêyî poşimant daxwazên dilên xwe bigewde dikirin.

Rojên ku derdiketin ji bo wan giş xweş û rohnî bûn.

Û ez, pepûka ku duniya giş min davêje.

Rojê min xwe vedişart, ez ji ronahiyê direviam.

Ji hemû Xwedayan tenê min diwêrbû gazî Xwedayê mirinê bikira.

Ez li bendeyî mirina xwe bûm.

Qiriktalî xwarina min bû, hêsir ava min bûn.

Phèdra dilê xwe bi xwe dişewitîne. Gava ew dibihîze ku dilê Hyppolite di jineke din de û ne di wê de heye, dinya li ber çavên wê tarî dibe. Hezkirin di dilê wê de qels nabe, lê bi pizotên kîne dişewite. Ew dildarê xwe berbat dike, mala wî wêran dike. Evîna û hîsên xurt mal-kambaxiyê bi xwe re peyda dikin. Hyppolite tê kuştin, dadok xwe davêje nava pêlên deryayê, Phèdre jehrê vedixwe ji ber ku tu rêyên din ji bilî rêya mirinê li ber wê namînin. Ew tê ber destê mêrê xwe, rastiye dibêje. Ew bi gihiştî ne gunehkar e. Wê xwest ji vê evîna malwêran dût bûya lê tiştê ku li ser eniya wê bû tiştêkî din bû, daxwaza çarenûsê payanake din bû. Sûc bêtir sûcê seraniyê, Xwedayên xêrnexwaz bû. Di perdeya dawîn de, Phèdre dibêje:

Na Thésée, gerek bêdengiyê ne adilane bê şikestin.

Gerek lawê tê yê bêguneh bêri derkeve.

Ew ne gunehkar bû.

....

Kêlikên li ber min giranbûha ne, Thésée,
guhê xwe bide min.

Ne wî lê min ceger kir û bi çavên napak û
zinakar li lawikê dilpak û birêz nêrî.

Asmanan agireke malwêran xistin sînga
min

Û Oenoneya genî bi hemû karên mayî ra-
bû.

Xwedayên asmanan ji xwe re bi serni-
višta mirovên belengaz dilîzin. Qehre-
manê Racine wek mirovekî azad û ser-
best di ber xwe de dide lê ew ne azad û
ne serbest e. Ew xwe berpirsyarê karên
xwe dibîne. Ew ji ber sernivîšta xwe na-
reve. Ew bi vê hustûxwariya xwe dilê
me bi biserhatiya xwe dişewitîne. Dilê
temaşegeran bi hemû kesên li ser şano-
yê dişewite ji ber ku ew hemû bê sûc û
bê sedem dişewitin. Lehengê Racine li
ber çavên me reş nabe. Kesekî bi kêf di
trajediyê de tune, tenê xwedayên dilke-
virî lîstikên xwe berdewam dikin, mala
mirovan wêran dikin.

Nêrîna Racine li ser mirov û mirova-
niyê nêrîneke reş û bedbîn e. Di dîtina
wî de gava hest û hîsên evîne xwe ber-
didin sînga mirovekî, ew mirov berbat
dibe, ber bi dawiyeye kambax diçe.
Evîn ne hîseke şîrîn e; ew malwêrankir
e, ew destpêka biserhatiyeke dijwar e.
Bedbîniya Racine ya ber çav bêguman

bi zarokîtiya wî, bi sêwîtiya wî, û bi fel-
sefa Jansênistan ve girêdayî ye. Li gor
Jansênistan, şano, hîs û hest, kêfxweşi-
yên jiyanê mirovan dûrî dilovaniya
Xwedê dibin. Bêyî Xwedê tu xelasiya
mirovan tune. Mamosteyên Racine li
Port-Royalê di hîsên mirovan de nîşana
malwêraniya wan dibînin. Bi hêza destê
xwe mirov nagihêje tu tiştî, tenê dilova-
niya Xwedê dikare wî reha bike, rêya
aramiyê di rûyê wî de veke.

Piştî vê şanoyê Racine bêtir dibe mi-
rovekî oldar. Li gor daxwaza wî, ew li
Port-Royalê, li kêleka mamosteyên xwe,
tê veşartin.

Berhemên Racine di dîroka edebiyata
fransî de herdem ciyekî taybetî digirin.
Zimanê Racine gelekî xurt û xweş e.
Ew tê nasîn wek yek ji helbestvanên he-
rî mezin ên sedsala xwe û ên edebiyata
fransî. □

Ji aliyê kurdan de keşfkirina Amerîkayê (1915-1930)



Rohat Alakom

Kurd çi wextî çûne welatên biyanî? Çi qas Kurd? Kurdên kîderê? Kîjan Kurd? Çawa çûne? Çûne kîjan welatan? Bersîva van pirsan îro beşekî kurdnasiyê yê modern pêk tînin. Dîroka koçberiya (emigra-

tion) Kurdan îro baş nayê zanîn. Ne tenê dîrok, derheqa vê kîtle yê de îstatîskên ku mirov bawerîya xwe pêk tîne jî, îro li ber destê me tune nin. Çawa em dibînin, bi hezaran, bi sedhezaran mirov ji ber gelek sedemên cihêreng koç kirine, çûne welatên biyanî. Ev tevgera koçberiyê hîn jî berdewam e. Kurdan bar kirine, çûne hemû rêşahî, welat û quncikên cîhanê. Ji ber gelek faktorên, îro çawa em dibînin koçberî bûye, perçekî jiyana Kurdan. Ji bo vê jî lêkolînên li ser dîroka koçberiyê

ji bo Kurdan gelek giring in. Bi taybetî dîroka Kurdên ku çûne welatên Ewropê, Amerîkayê, Lubnan, Urdirin, Misir û welatên Sovyeta kevn îro baş nayên zanîn. Koçberiya Kurdan ya ber bi her welatekî bi serê xwe hêjayî lêkolînekê ye.

Ev xebar û lêkolînen waha ne ji bo dîroka polîtîk bin jî, ji bo dîroka civakî gelek kêrhatî û giring in. Ev beşê dîrokê gelek caran ji aliyê me de tê jîbîrkirin. Zêdebûn, germbûn û aktûelbûna bûyerên polîtîk, di dawiyê de bala xwendevanan, lêkolîner û nivîskarên hertim li ser dîroka polîtîk dihêle. Bi vî tehrî dîroka civakî wek dîsîplînekê pêşda naçe.

Amerîka ji aliyê Kurdan de gelo çi wextî hatiye keşf kirin? Kurdên ku cara pêşîn çûne Amerîkayê kî ne? Çûne kîjan deveran? Li wir çi kirine? û ji ber van seferên dîr-dirêj îro ji me re çi mane? Wek van pirsan, bersîven gelek pirsên mayîn jî derheqa Kurdên Amerîkayê de heta îro lê nehatine dayîn. Di vê nivîsê de bersîva van pirsan ne bi tema-

mî be jî, emê hewl bidin qet nebe bersîva hin pîrsan ronahî bikin

Çend kontaktên kurd û amerîkîyan yê pêşî

Gelo Kurdê ku cara pêşîn lingê wî bi erdê Amerîkayê ketiye, kî ye? Bersîva vê pîrsê îro ji aliyê me de nayê zanîn. Lêkolînerê Tirk, Oya Sencer di xebareke xwe de dide kîvêşê ku, cara pêşîn piştî salên 1860'yî Kurdên Xerpût û Diyarbekirê koçî Amerîkayê kirine⁽¹⁾. Lê belê emê çawa paşê jî bibînin ne tenê ji van navçan, ji çend deverên mayîn yê Kurdistanê jî Kurd çûne Amerîkayê. Di dawiya sedsala 19'an de dema bûyerên salên 1894-1896'an li serê Ermenîyan qewimîn, gelek Ermenî çûne Amerîkayê. Bi baweriya min, ev Ermeniyên ku di vê demê çûne Amerîkayê, ji Ermeniyên mayîn û ji Kurdan re riya Amerîkayê vekirine an jî nîşan dane. Di van pêwendîyan de, çawa em dibînin nameyan, hatin-çûyînan roleke mezin listiye.

Di destpêka sedsala 20'an de ne tenê karkerên Kurd, wusan jî bi serê xwe xwendevan, ronakbîr û siyasethanên Kurd jî çûne Amerîkayê. Riya mirovên sade jî bi Amerîkayê ketiye. Dema kongra duwemîn ya Îttîhat û Terakkîyê di sala 1907'an de li Parîsê dicive, çawa di çavkanîkê de cîh digre, Kurd û Tirken ku li Amerîkayê dijîyan jî tevî vê kongreyê bûne, weşaneke wan ya siyasî bi navê "La Yara" jî hebûye⁽²⁾. Di dest-

pêka sedsala me de gelek xwendevanên Kurd li Îstebolê diman, di sala 1912'an de bi navê *Hêvî*, komeleke xwendevanan jî hatiye saz kirin. Yek ji pêşengên tevgera xwendevanan, Kurdekî Dersîmê bûye, navê wî Necîp e û li Xarpûtê mezin bûye. Necîp paşê li Îstebolê tip (hekîmî) dixwîne, piştî xwendina xwe ya bilind, ew diçe Amerîkayê û li bajarê Philadelphia dimîne⁽³⁾. Necîp, paşê vedigere welatê xwe an na? em pê nizanin. Nuri Dersîmî, di eynî berhema xwe de behsa "*Kurdên Dersîmê li Amerîkayê*" jî dike. Piştî van zaniyariyan, mirov dikare bêje ku di destpêka sedsala me de li Amerîkayê komeke Kurdên Dersîmê hebûye.

Di dawiya sedsala 19'an û di destpêka sedsala 20'an de ne tenê çend Kurd çûne Amerîkayê, wusan jî Amerîkayê hatine Kurdistanê, nasiya xwe dane Kurdan. Bi vî tehrî pêwendî û kontaktên Amerîkayî û Kurdan yê bi cihêreng pêkhatine. Di dawiyê de hêdî - hêdî riya Amerîkayê ji Kurdan re vebûye. Bi raybetî gelek mîsyonerên Amerîkayî hatine Kurdistanê û çend navçeyên Kurdistanê îstasyonên xwe yê mîsyoneriyê ava kirine. Wan, Xerpût, Bitlîs, Diyarbekir, Mêrdîn, Wan, Mûş û çend cîhên mayîn dest bi xebatê kirine. Hedefa wan ya pêşîn nîfûsê Ermenî bû. Lê belê rewşa Kurdan jî teqîp dikirin. Li bajarê Entepê çapxaneke wan hebûye, bi Kurdî 600 pirtûkên Îlahîyan li wira çap ki-

rine⁽⁴⁾. Di sala 1878 li bajarê Xerpûtê bi navê “*Koleja Fîratê*” dibistanek vebûye. Di vê dibistanê de tenê xwendevanên Ermenî hebûne. Di sala 1908’an de îdara dibistanê biryar girtiye ku zarokên Kurdan jî hildin dibistanê, lê belê Ermeniyên qebûl nekiriye⁽⁵⁾. Li bajarê Tarsûsê bi navê Enstituya Azîz Pavlos dibistanek vedibe, di xwendina sala 1902-1903’an de xwendevanekî Kurd jî tê vê dibistanê⁽⁶⁾. Ne tenê mîsyoner, gerokên sade, dîplomat û kesên mayîn jî hatine Kurdistanê, Kurd jî nêzik ve nas kirine. Bi saya van hatin-çûyînan, Kurd jî derheqa Amerîkayê de bûne xwediyê zaniyarî û agahdariyên fireh.

Ne tenê di nav Kurdên Osmanî de, wusan jî mîsyonerên Amerîkî li Kurdistanê Iranê aktif bûn, bi vê munasebetê li Minnesotayê kovareke bi navê *The Kurdistan Missionary* derxistine. Di sala 1920’an de dema Simko, êrişî Mahabatê kir çend bûyerên nexweş pêşta hatin, mîsyonerên Amerîkî revîn, çûne Tebrîzê. Ev cara pêşîn bû Kurdan mirovên Amerîkayê nas dikirin, van kontaktên nû, keşkirina Amerîkayê hêsantir dikir û di vî warî de bandûreke mezin nîşan didan. Bi kurtî di destpêka sedsala me de navê Amerîkayê di nav Kurdan de bibû nîşana xêr û berekerê, nîşana azadî û xelasiyê. Amerîka jî aliyê hin kesan de wek “*welatê ku mirov di çend rojan de li wir dewlemend dibe*” dihate nasandin. Ji ber van gîft-gotinên hin mirov bi

xem-xeyalê Amerîkayê ve dijiyan. Yek ji van kesan jî nivîskarê Kurdê Sovyeta kevn, Erebe Şemo ye. Dema ew li Urîserê li bal malbatekê xulamtiyê dike, yek ji neferên vê malbatê Ivan Gurêv diçe Amerîkayê, birayê wî Vasîlv Gurêv dimîne. Dema Vasîlv Gurêv dibêje: “*Ereb dema ez herim, ezê te jî bi xwe re bibim*” û behsa Amerîkayê li ber guhê Erebe Şemo dixê, E. Şemo şabûna xwe wek zarok di romana xwe ya bi navê *Berbang* de waha îfade dike: “*Rastî jî ez di dilê xwe de şa dibûm*”. Lê belê dema Erebe Şemo mezin dibe, romana xwe ya *Berbang* dinivîse, baweriyên wî yê li ser Amerîkayê jî binî ve diguhirin, angorî wî Amerîka “*cenneteke derewîn*” e⁽⁷⁾.

Destpêka maceraya kurdan ya Amerîkayê

Em dikarin bêjin ku Kurd bi kîtevî cara pêşîn di salên Şerê Cihanê yê Yekeymîn (1914-1918) de çûne Amerîkayê û di van salan de Amerîka keşf kirine. Di dawiyê cîmaeteke Kurdan li Amerîkayê pêk hatiye. Bi raybetî di vî şerê mezin de çawa tê zanîn belayeke mezin hate serê Ermeniyên û piraniya wan li Tirkîyê tevayî hatine kuştin. Tevkuştina sala 1915’an li cihanê gelek deng da, him çavê Ermeniyên, him jî çavê Kurdan gelek ji bûyerên van salan tîrsiya. Ne tenê bûyerên polîtîk û leşkerî, di van salan de belengazî, tûnebûn û xizanîke mezin

li van deveran hebû ji ber van bûyeran çawa dibêjin: “*dê ewledê xwe davît*”, rewşa welêt wusan xirab bû. Piştî vê qirra mezin ya 1915’an, beşek ji wan Ermeniyên ku xelas bûn, li cîhanê belav-belav bûn û beşek ji wan çû Amerîkayê. Ew çûne li bal nas, dost û hevalên xwe star bûn. Ew Ermeniyên ku di vê demê de çûne Amerîkayê, rewşa wan ya aborî û civakî gelek gihurî. Ji alîkî de ew nûçeyên ku ji Amerîkayê diçûn Kurdistanê, ji aliyê din bi riya naman û nasan, vê carê hin Kurdan jî dest pê kir, koçî Amerîkayê kirin. Yek ji van Ermeniyên ku di sala 1915’an de koçî Amerîkayê kirine, nivîskarê Ermenî yê navdar Wilyam Saroyan e (1908-1981), ew bi xwe li bajarê Bîtlîsê hatiye dinê, malbata wî û Kurdan cînantîke gelek qenc bi hevra derbas kirine, dostên hev bûne. Wilyam Saroyan, di sala 1960’yî de, dema cara duwem ji bo gerê tê welatê kal-bavên xwe, him diçe bajarê Bîtlîsê ziyaret dike, him jî diçe Ermenîstanê li wira Ermenî û Kurdan dibîne⁽⁹⁾.

Dema Şerî Cîhanê yê Yekemîn gelek Kurd ji welatê xwe bi darê zorê hatibûn dûrxistinê, hejmara wan digihîste 700 hezar kesî. Ev koçerên Kurd li dorberên bajarên Edenê, Enqerê û Qonyayê perîşan bûbûn. Cîh û welatekî lê bimana, tune bû, tenê Amerîka hebû, navê Amerîkayê derketibû. Rojnameyên bi 12.8.1918 terîxî didin kifşê ku, *Komîsyona Lêkolînê ya Amerîkayê* li Îstebolê bi

heyeteke Kurd re rûniştîye û li daxwazên Kurdan guhdar kiriye. Heyeta Kurdan çawa rojname didin kifşê, bala Komîsyona Amerîkayê kişandiye ser perîşaniya 700 hezar Kurdên koçer û derberder⁽⁹⁾. Wusan tê xuyan ku ji van Kurdên koçer hinek çûne Amerîkayê.

Divê em li vir bidin diyar kirin ku di van salan de di nav rewşenbîrên Kurd de li Îstebolê sêmpatîke mezin li hemberî Amerîkayê û bi taybetî li hemberî Serokkomarê Amerîkayê Woodrow Wilson (1856-1924) peyda bibû, ew wek “*xelaskarê gelên bindest*” dihate dîtin. Di van salan de ew “*Prensîpên Wilson*” ku ji 14 xalan pêk hatibûn, hêvîke mezin dida rewşenbîrên Kurdan. Gelek nivîskar û rewşenbîrên Kurd di kovara *Jînê* de li ser vê pirsê sekinîne. Serokê Serhildana Agiriyê, Ihsan Nuri Paşa jî bi navê “*Prensîpên Wilson û Kurd*” nivîsek di kovara *Jîn* de weşandiye⁽¹⁰⁾. Prensîpên Wilson, ji bo gelên bindest wek manifestoyekê, pêwîstiya xelasiya van milletan dianî ziman.

Di van salan de Kurdên ku çûne Amerîkayê bi taybetî li bajarên Detroit, New York, Philadelphia û çend bajarên mayîn cîwar bûne. Li taxên van bajarên yên here paşketî de diman û di karên here giran de dixebitin. Fabrika ku zêde Kurdan lê kar kiriye, fabrika Fordê ya bajarê Detroitê ye. Çiqas Kurd di van salan de li Amerîkayê dijiyan, em pê nizanîn. Zekerîya Sertel, di bîranînên xwe

de, ji bo hejmara Tirk û Kurdan, vê îfade bi kar tîne: “*hejmara wan ji çend hezaran derbas nedibû*”⁽¹³⁾. Jina wî Sabîha Sertel jî hejmara kesên ku ji Tirkiyê hatine Amerîkayê, çî Kurd çî Tirk bi tevayî qasî neh hezaran pêşkêş dîke (12). Bi raybetî ji bajarê Xerpûtê gelek Kurd çûne Amerîkayê. Angorî hin çavkaniyan ji nifûsê Xerpûtê (Elazîzê) qasî sedî bîst bar kiriye, çûye Amerîkayê. Piştî demekê, hin “*Amerîkayiyên nû*”, wek dewlemendan vegeriyanê Kurdistanê. Vegera hin kesan bûye babeta şanoyekê jî, nivîskarê Tirk Cevat Fehmi Başkut bi navê “*Amerîkayîk li Xerpûtê*” şanoyek amade kir. Di vê şanoyê de serpêhatiya Ibrahim Mûderris heye, ew li Amerîkayê bûye milyoner û hatiye Tirkiyê pey rêç û şopa birayê xwe ketiye, diçe Xerpûtê wekî birayê xwe bibîne, lê belê her tişt angorî dilê wî nameşe⁽¹³⁾. Ji der bajarên Dersîm û Xerpûtê, ji bajarên Wan, Erzirom û Sêwasê jî gelek kes çûne Amerîkayê⁽¹⁴⁾.

Di dawiyê de Kurdên Amerîkayê li bajarê Detroitê bi navê *Hilali Ahmer* (Hîva Sor) komelekê saz dikin. Cîhekî wan yê fireh hebûye. Serokê komelê Rumî Efendî bûye: “*Kesekî bejn bilind, beden mezin, kesekî wek çiya bû. Simêlên wî yê dirêj heta gulên guhê wî dirêj dibûn*”⁽¹⁵⁾. Rumî Efendî di maleke modern de maye, lê belê tiştên malê, tiştên Asyayî bûne. Ev komela Kurd ya li Amerîkayê cara pêşîn kîjan salê saz bû-

ye, em pê nizanin.

Di navbera salên 1919-1923’an de komeleke Tirk ya bi navê *Türk Teavûn Cemiyeti* jî li Detroitê hebûye. Kurdan û Arnavudan îtiraz kirine, xwestine navê wê bibê *Osmanlı Teavûn Cemiyeti*. Ji ber vê yekê di navbera Kurdan û Tirkan de, angorî Sabîha Sertelê sarbûn û dubendî peyda dibûn.

Di van salan de şerê rizgariyê li Tirkiyê heye. Mirovên ku li Amerîkayê diman, di nav xwe de pere berev dikirin û wek alîkariya însanî dişandin Tirkiyê. Ev alîkarî ji bo *Himaye-i Etfal Cemiyeti* (Komela Parastina Zarokan) bûye. Ew avahiya vê komelê ya ku paşê li Enqerê hatiye çêkirin, angorî Zekeriya Sertel bi pereyên karkerên Tirk û Kurd ve hatiye avakirin. Bi vê munasebetê di sala 1923’an de li bajarê New Yorkê civînekê amade kirin û Kurdên New Yorkê jî tevî vê civînê dibin û ji wan yek jî Usiv Gulav e, ew xwe waha dide nasîn: “*Ez 27 sal in li Amerîkayê kar dikim. Li madenan de min kar kir, fabriqeyên otomobilan, li bakurê baxçeyên fêkiyan yên “Fruit Company” de min kar kir. Ez li garajan û li parkan razam...*”⁽¹⁶⁾. Mirov ji îfadeyên wî derdixê ku ew di dawiya sedsala 19’an de hatiye Amerîkayê. Piştî evqas salan Usiv Gulavî di sala 1923’an de xatirê xwe ji Amerîkayê dixwaze û vedigere welatê xwe. Ew Kurdên ku cara pêşîn hatine Amerîkayê gelek dijarî û tengasiyên mezin kişandine: “*Mercên*

xebatê yê n karkeran gelek xirab bû. Ji ber ku zimanê Îngîlîzî nizanibûn û karkerên hosta nîn bûn, di karên giran de dixebitîn. Bi taybetî, jiyana karkerên Kurd û Tirk yê n ku li Detroitê di fabrîqeyên otomobîlan yê n Fordê de kar dikirin, cihennemek bû. Li Amerîkayê ji bo ku ew pêşketina teknîkî ya îroyîn tune bû, ew karkerê ku dikete ocaxa polayê, li ber êgir ji deqeyekê zêdetir nikaribû bisekinin ya..."⁽¹⁷⁾.

Him Zekeriya Sertel, him jî jina wî Sabîha Sertel di bîranînên xwe de derheqa Kurdên Amerîkayê de çend zaniyariyên kêrhatî pêşkêş dikin. Ev malbata di navbera 1919-1923'an de li Amerîkayê maye. Piştî 12 salan Sabîha Sertel dema ji bo dîtina keça xwe - Sevgî Sertelê di sala 1937'an careke din diçe Amerîkayê, dibîne ku ji salên berê tu tiştêk di cîhê xwe nemaye.

Seferberbûna etnîkî

Piştî ku Serhildana Şêx Seîd (1925) hate perçiqandin û vemirandin, di nav karkerên Kurd de tevgera nasiyonal zêdetir bandûra xwe nîşan da. Di nav wan de proseseke polîtîzasyonê ya nû dest pê kir. Dema Serhildana Agiriyê (1927-1930) berdewam bûye, Kurdên ku li Amerîkayê diman, ji bo pêşketina vê serhildanê hewldayîneke mezin nîşan dane. Di van salan de li bajarê Detroitê şubeyeke Xoybûnê jî hatiye vekirin. Di dokumenteke Fransî de tê diyar ki-

rin ku di îdara vê şubeya Xoybûnê de ji der Surêya Bedirxan, du endamên mayîn bi navê Nacî Beg û Cemal Beg jî cîh girtine⁽¹⁸⁾. Çawa em ji weşaneke Xoybûnê fêr dibin, şubeya Xoybûnê ya Amerîkayê li bajarê Detroitê bi şahiyekê ve hatiye vekirin û xwarinek hatiye xwarin, qasî 25-30 kes tevî vê civînê bûne. Sûreteki ku di vê şahiya vekirinê de hatiye kişandin, nîşan dide ku sê jin jî di vê civînê de beşdar bûne.

Weşaneke Xoybûnê ya bi navê "*The Case of Kurdistan Against Turkey*" vê demê, di sala 1928'an li bajarê Philadelphia hatiye çap kirin⁽¹⁹⁾. Ji bo vê pirtûkê nûçegîhanê rojnameya *New York Herald*, Adams Gibbons pêşgotinek nivîsiye. Wusan tê xuyan ku pêwendiyên Xoybûnê û Surêya Bedirxan bi Kurdên Amerîkayê re berî vekirina vê şubeyê jî hebûne.

Bi kurtî di navbera salên 1928-1930'an de Kurdên Amerîkayê piştigirtîke mezin ji bo Serhildana Agiriyê nîşan dane. Piştî binketina serhildanê çî tê serê vê şubeya Xoybûnê, em nizanin. Çawa em ji çavkaniyeke din fêr dibin, vê carê di van salan de li Detroitê, komîteyeke Kurd tê saz kirin. Angorî rojnameya *Zarya Vastoka* ku li Tiflîs der çûye, li Amerîkayê di sala 1929'an de bajarê Detroitê "*Komîta pêşîn ya Kurd*" hatiye saz kirin. Ev komîta ji bo organîzekirina karkerên Kurd li Amerîkayê saz bûye. Angorî vê nûçeyê Surêya Bedirxan



Şahiya Xoybûnê

çûye Amerîkayê, ji bo alîkariya Xoybûnê qasî 4000 dolar ji aliyê karkerên Kurd de hatiye berev kirin⁽²⁰⁾.

Di sala 1930'an de dema Serhildana Agiriyê zêdetir mezin dibe, vê carê Kurdekî bi navê Zaro Axa Amerîkayê ziyaret dike. Bi vapûreke Almanî bi navê "Bremen" diçe Amerîkayî û li wira çend mehan dimîne. Zaro Axa çawa tê zanîn, di medya cîhanê de mirovê herî kal di hate nas kirin, di sala 1774'an de li bajarê Birlsê hatiye dinê. Navê wî gelekî li dinyayê belav dibe, qasî 160 salan jiyaye. Çawa em di hejmareke rojnameya *New York Times* de dibînin, pasaporta

wî di dêst de, poz daye rojnameyê, di pasaportê de terîxa rojbûyîna wî wek 16.2.1774 tê cîh girtiye⁽²¹⁾. Medya cîhanê û ya Amerîkayê cîhekî fireh daye vê gera wî. Zaro Axa dema li Amerîkayê maye, angorî rojnameya *New York Times* ya bi 23.7.1930 terîxî, wî ji Amerîkayê hez kiriye: "Ez ji Amerîkayê hez dikim çimkî ew şer naxwazê" (I like America because it does not like war).

Xwendekarên kurd yên pêşin li Amerîkayê

Piştî ku êdî Amerîka, di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de ji aliyê Kurdan de tê keşf

kirin, gelek Kurd diçine Amerîkayê. Bi taybetî hejmarê xwendekarên Kurd li wir her diçe zêdetir dibe, wusan zêde dibe ku êdî di salên 1964'an de *Komela Xwendekarên Kurd Li Amerîkayê* (The Kurdish Student Organization in the United States) tê saz kirin⁽²²⁾. Serokê komelê M. Şefîk Qazzaz bûye. Bi berpirsiyariya wî kovareke bi navê *The Kurdish Journal* jî der çûye.



Zaro Axa


Yek ji van xwendekarên Kurd yên ku cara pêşîn çûne Amerîkayê jî, kûrê Şêx Mehmed e, navê wî Şêx Baba Elî bûye, di salên 1930'yî de diçe Amerîkayê, li wir ekonomî dixwîne. Keça Refîk Hîlmî, Pakîze Hîlmî di salên 1950'yî de ji bo xwendina xwe diçe Amerîkayê. Yek ji van xwendekarên Kurd ku di van salan de çûne Amerîkayê, Azîme Kutlay e, ew bi xwe ji Kurdên dorberê Anadolîya Navîn e û niha li Enqerê dimîne. Azîme Kutlay di sala 1952 de bi 24 hevalên xwe ve tevayî diçe Eyalera Florîdayê. Di sala 1953'an de ji bo zaniyariyên xwe pêşta bibe û pratîkê bike, ew diçe Eyalayeta Michiganê. Azîme Kutlay dema diçe wir, ji aliyê Prof. Dorati Lee de fêr dibe ku hin mirovên

ji Tirkiyê wek karker hatine Amerîkayê, niha li bajarê Detroitê dimînin û di nav wan de Kurd jî hene. Azîme Kutlay, paşê diçe wan Kurdên ku Şerê Cîhanê yê Yekemîn de hatine Amerîkayê, dibîne: "*...Ji jo piştgirtiyê di nav xwe de Komela Kizilayê saz kiribûn. Nêzîkî wê komelê "Qawexana Hesên Axa" hebû, dişibande qawexanên ku min li Tirkiyê dîtibûn. Piraniya wan karkeran li fabrîkayên Fordê de dixebitîn, salên wan li ser pêncçeyî bûn. Gelek li min xweyî derketin û min jî dest pê kir dawîya heftiyên xwe li bal wan derbas kir. Xwarinên Tirkiyê îkramî min dikirin, bi piranî em bi Tirkî dipeyîvin, lê me car-car jî bi Kurdî deng dikir. Ji deverên Xerpût, Dersim û Bîngolê hatibûn...*"⁽²³⁾. Angorî îfadeyên van


karkeran, ew berî çil salî hatine Amerîkayê. Dema ew hatine Amerîkayê, wan di embarên geştî û botan de xwe veşartine û perîşanîke mezin dîtine. Ji van îfadeyan jî mirov derdixê ku, ev karkerên ku Azîme Kutlayê di salên 1950'yî de li Amerîkayê dîtine, ew di dema Şerê Cihanê yê Yekemîn hatine Amerîkayê. Bi vî tehrî du nişên Kurd yêncuda li Amerîkayê rastî hev hatine.

Koça karkerên Kurd ya Amerîkayê di navbera salên 1940-1960'yî de jî berdewam kiriye heta ku karkerên Kurd di salên 1960'yî de dest pê dikin, diçine welatên Ewrûpayê. Vê carê neferên du nişên din li Amerîkayê rastî hev dibin. Nivîskar Ferhat Şakelî û Vera Beaudin Saedpour di sala 1989'an, dema dixwazin li New Yorkê bi teksiyê ji cîhekî herin cîhekî din, mêze dikin ku xweyê teksiyê Kurd e, dema jê dipirsin wekî ew çî wextî hatiye Amerîkayê, ew dibêje berî çil salî ango dora salên 1950'yî hatiye Amerîkayê⁽²⁴⁾. Ev nimûna piçûk jî nîşan dide ku, koçberiya Kurdan ya Amerîkayê di sedsala me de hertim berdewam kiriye û heta rojên me yêncuda jî hatiye.

Ne tenê xwendekarên Kurd, di salên 1950'yî de çend ronakbîrên Kurd jî çûne Amerîkayê, li ser rewşa Kurdan Raya giştî ya Amerîkayê agahdar kirine, wek Kamuran Bedirxan (1895-1978) û Mustafa Remzi Bucak (1912-1985). Kamuran Bedirxan di sala 1950'yî de bi nûçegîha-



M. Remzî Bucak



Azîme Kutlay



Pakîze

nê *New York Times*ê, Edgar Ansel Mowrer re li ser rewşa Kurdan peyiviye û ev heypeyvîn di hejmarê bi 7.1.1950 terîxî de hatiye weşandin. Mustafa Remzi Bucak ji Serokkomarê Tirkîyê Îsmet İnönü û hîn kesên mayîn re ji Amerîkayê çend nameyên dîrokî şandin. Mustafa Remzi Bucak ji sala 1959'an heta sala 1985'an li Amerîkayê jiyaye⁽²⁵⁾.

Amerîkayî li Kurdistana Îranê

Berî ku Kurd Amerîkayê keşf bikin, Amerîkayîyan ji zû ve Kurdistana keşf kiribûn û rewşa Kurdan bi çavên xwe dîtibûn. Misyoner, diplomat û gerokên Amerîkî çawa me berê jî gotibû, ne tenê hatine Kurdistana Tirkîye, wusan jî bi salan di nav Kurdên Îranê de mane. Di vî warî de serpêhatiya Dr. Seîd gelek balkêş e. Dr. Seîd wek Kurdekî bi salan li Îranê bi mîsyonerên Amerîkî ve kar kiriye. Pratîka xwe ya pêşîn li ber destê doktorên Amerîkayî dîtiye. Dr. Seîd li çend welatan geriyaye, çûye Swêd û Îngîlterê jî. Gelek bûyer li serê vî doktorê Kurd re derbas bûne. Dema di sala 1937'an de tê girtin, heval û dostê wî yê Amerîkayê vala namînin, ji bo berdana wî bi serokkomarê Amerîkayê Roosevelt re pêwendîyan datînin. Kurê wî salên 1942'an de bar dîke, diçe Amerîkayê. Bûka wî keçeke Amerîkayî bûye. Yek ji xarziyên Dr. Seîd, bi navê Jay M. Resûl heta salên 1960'yî jî li Californiyayê wek doktor kar kiriye û paşê li

ser jiyana apê xwe Dr. Seîd pirtûkek nivîsiye⁽²⁶⁾.

Di dawîya sedsala 19'an de mîsyonerên Amerîkî dest pê kirine bi Kurdan re re ketine pêwendîyan. Ji nav wan hîn dostên Kurdan jî derketine. Yek ji wan jî L.O. Fossum bû, gazî Amerîkayîyan dikir ku alîkariya Kurdên belengaz bikin û wek adres jî li Minneapolisê adrêsa profesorekî bi navê M.O. Wee dabû⁽²⁷⁾. Fossum di sala 1919'an de angorî materiyalên zaravê Mukrî, rêzmaneke Kurdî jî amade kir û li Amerîkayê weşand⁽²⁸⁾. Dema em dîroka pêwendiyên Amerîkayî û Kurdan raçav dikin, em dibînin ku di warê pêşketina van pêwendîyan de L.O. Fossum roleke gelek mezin listiye. Ew heyranê Kurdên Mahabatê bû. Vê "*heyranîya Amerîkanîyan ya Mahabatê*" piştî Şerê Cihanê yê Duwem jî ajot. Vê carê du dîplomatên Amerîkanî, dîroka Mahabatê nivîsin. Yek ji wan Archie Roosevelt bû, di sala 1947'an de lêkolîneke baş li ser Komara Mahabatê amade kir û li Amerîkayê di kovarekê de weşand⁽²⁹⁾. Piştî 15 salan vî carê William Eagleton li ser Kurdên Mahabatê bi navê *Komara Kurd ya 1946'an* pirtûkek nivîst⁽³⁰⁾. Ev berhemên van herdu diplomatên Amerîkî rûpelekî dîroka Kurd ya nû ronahî kirin. Eagleton, di navbera salên 1959-1961'an li Tebrîzê wek konsolosê Amerîkayê kar kiriye. Eagleton bi vî pirtûkê ve nema, di sala 1988'an de li ser ementî, ber, xalf-

çeyên Kurdî bi wêneyên rengîn berhe-
meke gelek giranbiha amade kir û wek
pirtûkeke mezin weşand⁽⁶⁾. Bi vî tehrî
kêm û hindik be jî, rengên teze, tonên
teze di dîroka pêwendiyên Amerîkayî û
Kurdî de cîh girtin. □

Not û çavkanî

- 1) Oya Sencer, *Türkiye'de İşçi Sınıfı*, 1969, İst-
enbol, rûp. 93
- 2) Celîlê Celîl, *Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya*
Kurdan, Stockholm, 1985, rûp.71
- 3) Nuri Dersimi, *Hatiratım, Çapa duwem*, En-
qere, 1997, rûp.27.
- 4) Dr. Uygur Koçabaşoğlu, *Anadolu'daki Ame-
rika*, Enqere, 1989, rûp.149.
- 5) Eynî berhem, rûp.192.
- 6) Eynî berhem, rûp.202.
- 7) Erebe Şemo, *Nama ji Amerîkayê : Berbang*,
Stockholm, 1989, rûp.35-45.
- 8) Babayê Keleş, *Wilyam Saroyan Derheqa*
Kurdan de, Riya Teze, 26.12.1981.
- 9) *Günlük Gazetelerden*, Jin, hejmar: 23, 1918-
1919, Wergêr ji tîpên Erebi bo ûpên Latîni: M.
Emin Bozarlan, Uppsala.
- 10) Ihsan Nuri, *Wilson Prensipleri ve Kürtler*,
Jin, hejmar:15,
- 11) Zekerîya Sertel, *Hatırladıklarım, çapa du-
wem*, İstanbul, 1977, rûp.107.
- 12) Sabiha Sertel, *Bir Roman Gibi*, 1987,
rûp.47.
- 13) Cevat Fehmi Başkut, *Harput'ta Bir Ameri-
kacı: Behçet Necatigil, Edebiyatımızda Eserler*
Sözlüğü, İstanbul, 1971, rûp. 215.
- 14) Sabiha Sertel, *Bir Roman Gibi*, rûp.46
- 15) Eynî berhem, rûp.51.
- 16) Eynî berhem, rûp.57.
- 17) Eynî berhem, rûp.47.
- 18) *Note Confidentielle - Au Sujet de L'Acti-
vite Kurde*, raporeke weşartî bi 15 Aout 1931 terîxî

ku ji Helebê hatiye şandin.

19) *The Case of Kurdistan Against Turkey*,
Philadelphia USA, 1928.

20) *Zarja Vastoka* 14.4.1929, hejmar:84.

21) *156 - Year Old Turk Comes to Visit Us*,
New York Times 19.7.1930 (Çawa di vê nûçeyê de
ji tê ditin, Zaro Axa bi zanetî, herîm wek "*Türk*"
hatiye nişan dayîn. Ew bi xwe Kurd e û li bajerekî
Kurdistanê, Bitlisê hatiye dinê. Binêre: Rohat Ala-
kom, *Cimaeta Hemalên Kurd li Constantinope-
lê*, Çira, hejmar:7, rûp. 3-21, Stockholm, 1996. Li
ser rêwitiya Zaro Axa ya Amerîkayê, wusan jî binê-
re: Vera Beaudin Saecdpour, *The Resurrection of*
Zero Agha, *Kurdish Times*, vol.1.No:2,1986.

22) Israil T. Naamani, *The Kurdish Drive for*
Self-Determination, *The Middle East Journal*,
Washington, Number:3,1966.

23) *Nameya Azîme Kutlayê ya bi 24.1.1997 terî-
xi*.

24) *Ev zanyarî li Stocholmê ji Ferhad Şakeli hati-
ne girtin*.

25) *Mustafa Remzi Bucak, Bir Kürt Aydın-
dan İsmet İnönü'ye Mektup*, İstanbul, 1991.

26) *Jay Rasooli, Dr. Sa'eed of Iran (Grand Ra-
pids)*, 1957 (Çapeke kurtkirî ya vê pirtûkê bi zima-
nê Swêdî ji der çûye: *Vittnesbörd från Kurdistan*,
Göteborg, 1987).

27) *Amir Hassanpour, "Kurdistan Missionary"*,
Svensk-Kurdisk Journal, No:8, 1987.

28) *L.O. Fossum, A Practical Kurdish Gram-
mar*, Minneapolis, 1919.

29) *Archie Roosevelt, The Kurdish Republic of*
Mahabat, *The Middle East Journal*, Washington,
No:1, s.249-266, 1947.

30) *William Eagleton, The Kurdish Republic*
of 1946, London, 1963.

31) *William Eagleton, An Introduction to*
Kurdish Rugs An Other Weavings, 1988.

Dilodîn

Arjen Arî

Nivîstekê çêbikim, devgirêdanekê?
xwe biavêjim kîjan dergehê?
ka ji min re bibêje bedewê,
dilodîn im, dilodîn!

Berzûrî kê nebûm, kî nehisiya?...
Zeynelabidînê Nisêbînê ma?
Sultan Şêxmûsê Mêrdînê?...
hepriyên rengîn ji merqedên evînê
ma min neanîn,
ji ber destên Xanî,
ji textê Mem û Zînê!...

Nivîstekê çêbikim, devgirêdanekê?
xwe biavêjim kîjan dergehê?
ka ji min re bibêje bedewê,
dilodîn im, dilodîn!

Dilodîn im bedewê!
mîna keleşan bigirim ser te,
te rakim çîyan,
dû re kîjan mîr, kîjan axa
me dihawîne?
çi dizanim çi evîn e,
dilekî du felqe,
alîyek Qamîşlo ye,
alîyek Nisêbînê...

Gava Prometheus agir ji Xwedayan dizî

Li gor mîtolojiyê Prometheus û Zeus bi hev re însan xuluqandin. Însanan ne kanîbûn xanî lêkirana ku ji xwe re tê de bisitiriyana, ne kanîbûn bi hawakî xweşik nêçîr bikirina û ne jî xwendin û nivîsandina wan hebû. Û Zeus jî bi tu hawî nedixwest însan ji vê perîşaniyê, ji vê paşdemayiyê rizgar bibin û bibin xwedî jiyaneke hîn rehetir. Ji ber ku ew ji pêşketin û şiyarbûna însanan ditirsiya. Wî dgot gava însan bi pêş kevin û fêrî gelek tiştan bibin ewê li hember min serî hildin û Îlahîtiya min nas nekin. Li hember vê tirs û zalimiya Zeus, Prometheus dixwest agir bide însên û wan ji vê jiyana premîtîv rizgar bike; bike xwedî jiyaneke hîn xweştir û hîn rehetir. Çimkî agir sîmbola pêşketin û hiş e. Lema jî Prometheus rabû agir dizî û da însên û bi wî hawî jî însan bi pêş ketin.

Li hember vê taserufa Prometheus, Zeus ew bi hawakî pir giran ceza kir. Ew bi

zincîrê bi zinarekî ve girê da û sî hezar salî, her roj ezabekî mezin pê da kişandin. Vê îşkenca han dom kir, heta ku rojekê riya Herakles bi wir ket û rabû Prometheus rizgar kir.

Li gor Zeus, Prometheus bavekî hîn bi şefqet e. Baweriya Prometheus ew e ku agahdarî û baweriya bi însan ewê însan biguherîne û baş bike. Lê Zeus terefdarê zulm û zorê ye, li gor wî însan ancax bi cezakirinê dikanin mutuh bibin.

Jinikê got li Yûnanîstanê çiyayek heye navê wî Olîmpos e û dûre jî bi serê xwe çiyayê hember îşaret kir:

– Olîmpos hewqas bilinde ku hema hema serê wî digihîje asîmanan.

Berê înanan bawer dikirin ku li ser qotê Olîmpos gelek Xuda(Îlah) dijiyan. Di nav Xudayan de şah Zeus bû. Zeus û Prometheusê mezin însanên pêşîn xuluqandin. Prometheus ew ji heriyê çêkirin

û Zeus jî ruh da wan.

Jiyana însanan pîrr zahmet bû. Pîrr dixebitîn. Nêçîrvanî dikirin ji bo ku kani-bin jiyana xwe bidomînin. Ew heywanên ku nêçîr dikirin goştê wan bi xavî dixwarin û postê wan jî li xwe dikirin.

Li gor Zeus wiha baş bû. Heger însan zêde fêr bibûna, wê gavê ewê ji seltene-ta wî re bibûna talûke. Lê Prometheus ji însanan hez dikir û dixwest alîkariya wan bike. Wî ji xwe re digot, heger însan bi-bin xwediyê agir, ewê kanibin goştê xwe bibrêjin, nanê xwe bipêjin û ji xwe re ji heriyê dîzikan çêkin û di firnan de bişewitînin.

Prometheus ji Zeus re got:

– Divê em agir bidin însanan, ji bo ku kanibin hîn rehetir bijîn.

Zeus got:

– Na.

Lê li gel vê jî Prometheus dixwest agir bide însanan. Prometheus şevêkê bi dizî derket, çû serê çiyayê Olîmpos. Li wê derê agîrek bi şev û roj wer vêketibû. Bi alîkariya êgir êzingek vêxist. Û ew seriyê êzingê vêxistî kir bin paltoyê xwe û xwe bera jêr da ba însanan.

Bi vî hawî Prometheus însan fêrî vêxistina êgir kirin. Her wisa wî însan fêrî qurbankirina bi şiklekî nuh jî kirin. Gava qurban didan, ji goştê ga perçên herî baş didan Xudayan û yê xerab jî ji xwe re

dihîştin. Prometheus ew fêr kirin ku divê eksê vê bikin.

Însan fêrî bikaranîna agir bûn û vê yekê jî jiyana wan rehetir kir. Ji xwe re xanî lêkirin, bûn xwediyê kincên hîn baştir û dest bi çêkirina hacetan kirin, hetta ya silehan jî.

Rojekê gava Zeus li jêr li însanan nêrî, dît ku waye li ber xaniyên wan agir vêdikeve. Prometheus bang kir huzûra xwe:

– Min ji te re negot divê tu agir nedî însanan?! Ew dikanin ji bo me bibin talûke. Nuha tew di ser de waye silehên wan jî hene.

– Prometheus got na, heger însan têra xwe şefqetê bibînin û em tiştên cihê ji wan re îzah bikin, ewê êrîşê neynin ser me.

Lê Zeus guh nedayê. Ew pîrr zalim bû û lema jî Prometheus gelekî bi hovîtî ceza kir. Wî ji bo girtina Prometheus emir da. Ew li rojhilata dûr, dûr bi zincîrê bi zinarekî ve girê dan. Her roj qertelek hat kezêba Prometheus perçe kir û xwar. Kezeb her şev ji nuh ve çê bû û qertel jî her sibe paş de hat û ew ji nuh ve xwar. Dibêjin berî Prometheus were rizgarkirin, sî hezar salî ezîyet kişandiye.

Yê Prometheus rizgar kir Herakles bû. Herakles yekî gir û pîrr bi qewet bû û qehremanekî rastîn bû. Rojekê ew çû ser wî zinarê rojhilata dûr. Bala xwe dayê

waye yekî kal bi zinêr ve zincîrkirîye û qertelek jî xwe bera ser dide.

Herakles got:

– Tu kî'yî ey benderuh ?

– Ez Prometheus im. Wextekê zûde min alîkariya Zeus kir însan xuluqandin. Lê gava min agir ji Xudayan dizî û ew da însanan, Zeus rabû ez bi vî hawî ceza kirim. Ev sî hezar sal in ku ez bi vira ve girêdayî me û ezîyete dikşînim.

Herakles got:

– Ji nuha û pê ve qediya.

Herakles kivanê xwe pêht kir û xist sepe qertelê ji hember de dihat. Prometheus qîriya, got:

Navêjê! Zeusê te ceza bike.

Herakles got:

– Ê ezê jî cezayê wî qebûl bikim û tîr rast avêt ji sînga qertel de. Dûre jî zincîr ji zinêr verşand û Prometheus êdî merivekî azad bû.

Prometheus got:

– Tu kî'yî, ku tu diwêrî li hember Zeus rabî ?

– Ez Herakles im.

Ewrên di ser wan re reş bûn û li çiyayên çarhawêlî wan bû gurrîna tavan. Zeus bû.

Prometheus destên xwe ber bi asîmanan ve vekir û qîriya:

– Zeus, min bikuje, lê Herakles efû bike, ku ez rizgar kirim !

Brûskeke Prometheus li erdê kir çit.

Herakles got:

– Tu dijî, û bi ser Prometheus ve xwar bû.

Prometheus got:

– Erê, ez dijîm.

Herduyan jî li jor, li asîmanan nêrîn. Komek stêrk nuh diçirîsîn. Kentaurek bû, nivî însan û nivî jî hesp bû.

Herakles got:

– Zeus qebûl kir ku kentaur di dêl te ve bimre.

Prometheus lê vegerand:

– Ev tê wê manê ku Zeus ez efû kirim... □

Ji rojnameya PLS, hejmar 41

Wergera ji swêdî: Zinarê Xamo

Huseyîn Yetkîn: Bi riya nivîsandinê min xwest ez li xwe û li ezîtiya xwe bigerim

Huseyîn Yetkîn di sala 1948'an de li Semsûrê (Adiyemanê) hatiye dinyayê. Ew di sala 1968'an de ji bo xwendinê diçe Çekoslovakayê, lê zêde li Çekoslovakayê namîne, di eynî salê de tê Swêdê û li Swêdê bi cih dibe. Ew li Ûnîversîteya Stockholmê dixwîne û dibe sosyonom. Wî heta niha bi swêdî du pirtûkên şîran "Bläs min flöjt" (1994) û "Metamorfos" (1996) weşandine. Ji bilî pirtûkan şîrên wî bi spanî û tirkî jî di kovarên spanî û tirkî de hatine weşandin. Herweha Huseyîn yetkîn şîrên xwe di kovarên swêdîyan de jî weşandine û di antolojiyan de cih girtiye. Me ji bo xwendevanên Nûdemê li ser şairî û jiyana wî pê re sokbetek kir.

Nûdem: *Di şîrên te de bêrikirina zaroktiya te heye. Lê mirov di bêrikirina zaroktiya te de, bêrikirina welêt, bêrikirina cih û deverên ku tu jê hatiyê, dibîne. Ew cih û dever ku ne? Tu dikarî hinekî behs bikî?*

Huseyîn Yetkîn: Ez li Semsûrê hatime dinyayê û zaroktiya min jî her li Semsûrê derbas bûye. Semsûr cihêkî xweş e, bi dar û ber, bi av û çiya ye. Ez di nava wê xweşahiya Semsûrê, di nava wê xwezaya wê ya mîna tabloyeke hunerî de mezin bûme. Tesîreke mezin ya xwezaya Semsûrê li ser jiyana min heye. Gava ez dibêjim Kurdistan, gava ez dibêjim welat, zaroktiya min ya Semsûrê tê bîra min. Bîranînên min yên zaroktiyê jî xweş in. Loma, gava ez şîran dinivîsînim, bîranînên min yên zaroktiyê dibin çavkaniya nivîsandina min. Ew çiyayên welêt, ew xwezaya welêt, ew mirovên welêt, ew av û hewa welêt mîna tabloyekê têne ber çavên min. Ez wan hîsên xwe dirijînim ser kaxezê.

– *Xuyaye tu heta xortaniya xwe her li Semsûrê bûyî, te li wir xwendina xwe jî xelas kiriye?...*

– Belê, min li wir lîse xelas kir.

– *Pîştî temamkirina lîseyê jî tu derketî derveyî welêt. Gelo sebeba derketina te ya*

derveyî welêt çi bû?

– Sebeba derketina min ne siyasî bû. Ji bo xwendinê bû. Di sala 1968'an de, bi alîkariya "KDP"ê ji bo Çekoslovak-yayê ji min re bûrs derket. Ez jî di wê salê de ji bo xwendinê çûme Çekoslo-vakyayê.

– *Tu çend salan li Çekoslovak-yayê ma-yî?*

– Ez ji bo xwendinê çûbûm Çekoslo-vakyayê, lê belê ez tenê heyşt mehan li wir mam. Ji ber ku zêde kêfa min ji Çe-koslovak-yayê re nehat. Hingî birayê min li Swêdê bû, ez bi alîkariya wî ha-tim Swêdê.

– *Tu di xortaniya xwe de hatî Swêdê û tu beta niha jî her li Swêdê dijî, ne wilo?*

– Belê. Ez di bîst saliya xwe de hatim Swêdê. Sal 1971 bû. Hingî hem eskeriya min hatibû, hem jî ji bo piştgiriya De-nîz Gezmîş, ez û Mahmûd Baksî û hi-nek hevalên tirk li Swêdê ketibûn greva birçibûnê. Wê çaxê, resimên me di roj-nameyên Tirkiyeyê de derketin. Di roj-nameyên Tirkiyeyê de nivîsandin ku te-rorîstên profesyonel li dijî Tirkiyeyê di-xebitin. Di sala 1972'an de dewleta Tir-kiyeyê ez ji hevvelatiya xwe avêtim. Ez nêzikî deh salan bê hevvelatî mam. Ez li Swêdê jî nebûbûm hevvelatî. Tenê paseporta min ya "biyanîtiyê" hebû. Min nihêrî êdî xêr di hevvelatiya Tirki-yeyê de nemaye. Min mureceetî hevwe-latiya Swêdê kir û niha ez bi tenê hev-velatiyê Swêdê me.

– *Wan salên ku tu hatî Swêdê zêde*

kurd tunebûn. Gava mirov niha û berê dide ber hev; hem di warê komûnkasiyo-nê û hem jî di warê teknîkê de dinya bi-çûk bûye, Swêd êdî ne ewqas ji kurdan dûr e, ew nêzikî Kurdistanê bûye. An jî bi alîkariya kurdên ku li Swêdê ne meri-vên wan dikarin di derheqa Swêdê de bi-bin xwediyên agahdariyan. Gelo wê çaxê Swêdê ji bo te çawan bû? Ev welatê bi cografya xwe û bi kultura xwe ewqasî ji welêt dûr, ji bo te çawan bû? Tu çawan ketî nava vê civatê?

– Piştî ku ez hatim Swêdê bi sê me-han, min diya zarokên xwe nas kir. Bi alîkariya wê ez dîrek ketim nava kultura Swêdê. Bi têkiliyên bi malbar û hevalên wê re, ez zû fêrî kultur û zimanê swêdi-yan bûm. Ji ber ku min wê çaxê baş bi îngilîzî jî nizanibû, zimanê min yê biya-nî tenê bû swêdî. Ez mecbûr bûm ku baş fêrî swêdî bibim da ku min bikariba têkiliyeke baş bi civata Swêdê re daniya. Ez zû fêrî gotinên hîsî û evînî jî bûm. Cara pêşî bû ku min li Swêdê ji jinekê re digot, ez ji te hez dikim. Ez bi vî awayî zû ketim nava civatê. Lê înadek bi min re hebû, diviyabû ez baş fêrî zi-mên bim, da ku ez bikaribim baş kultu-ra jina xwe nas bikim. Paşê gava zaro-kên min jî çêbûn, ez bêtir bi vir ve ha-tim girêdan, zimanê swêdî bêtir bû zi-manê min yê hezkirinê. Êdî gotinên xweş û tijî evîn ku min di zaroktiya xwe de bi kurdî bihîstibûn, min ew ji zaro-kên xwe re bi swêdî digotin.

– *Xuyaye bi riya wan gotinên xweş yê*



Huseyîn Yetkîn: "Erê ez bi swêdî dinivîsînim, lê Kurdistan di dilê min de ye"

romantîk û evînî, tesîra şairîyê jî li te bû. Gelo ew bû ya ku tu ajotî ser nivîsandina şîran?

– Ez demeke dirêj hew çûme welêt. Gava mirov nikaribe here welatê xwe, mirov dûrî welêt be; her tiştên li welêt mezintir dibin. Çiyayên welêt mezintir dibin, xweşiya welêt xweştir dibe, hezkirina welêt jî zêdetir dibe. Hesret û bêrîkirin bêtir dibe. Berê, gava kurd ji cihê xwe derdiketin, xwînî dibûn, an koçber dibûn, wan bi riya stran û kilaman hîsên xwe dianîn ziman. Yê min jî min xwest ez bi riya şîrê hîsên xwe, bêrîkirina xwe, hezkirina xwe bînim ziman. Bi riya vê nivîsandinê min xwest ez li xwe, li ezîtiya xwe bigerim. Gelo ez kî me? Erê, ez kurd im, welatê min Kurdistan e. Ez gelek caran dixwazim di şîrên xwe de vê hîsê bînim ziman.

– *Em dizanin ku şairîya te li Swêdê dest pê kiriye. Gava em bipirsin, bibêjin çima te şîrên xwe bi kurdî nenivîsand, dibe ku wê demê nivîsandina bi kurdî zehmet bû. Lê mîna tu jî dizanî, piraniya şîrên kurdan yên li Tirkîyê, şîrên xwe bi tirkî dinivîsînin. Çima te ne bi tirkî, lê bi swêdî nivîsand?*

– Rast e, ez baş bi tirkî dizanim, lê tu carî zimanê tirkî nebûye zimanê min yê hisî. Gava ez dixwazim tiştêkî bi hîsan ve girêdayî bibêjim an jî taswîr bikim, ez bi awayekî tebîî an bi zimanê xwe yê kurdî difikirim an jî bi swêdî difikirim. Swêdê jî bûye zimanê min yê duwemîn. Ji bo min pir xwezayî bû, ku min bi swêdî dest bi nivîsandinê kir. Paşê divê em li tesîra zimanê tirkî ya li ser şexsiyete rawestin. Zimanê tirkî tesîreke neyînî li ser şexsiyeta kurd dike. Wekî din jî

em ne tirk in, ji bo çi em ê bi tirkî bini-vîsînin. Ji xwe tirk jî dixwazin em kurd bi tirkî binivîsînin û ji şexsiyet û ezîtiya xwe bi dûr bikevin û ew jî bibêjin kurd tunene. Niha gava ez bi swêdî dinivîsînim, kes kurdîtiya min înkâr nakin, kes bi şexsiyet û ezîtiya min nalîzin. Heta ew ji paşeroja min, ji kultura min, ji koka min re hurmetê nîşan didin. Ew dizanin ez bi eslê xwe kurd im û ji bo ku ez jî eslê xwe veşêrim tu sebeb tune-ye. Lê tirkî ne wilo ye. Kurdên ku bi tirkî dinivîsînin, piştî demekê ew jî di-bin mîna tirkan û ew jî mîna tirkan zimanê kurdî, kultura kurdî û edebiyata kurdî biçûk dibînin.

– *Şairên kurd ku li Tirkîyeyê bi tirkî dinivîsînin, piranî wek şairên tirk têne hesabandin. Di antolojiyên şîira tirkî de jî navên gelek şairên esilkurd tê de hene. Ew ne wek şairên kurd, lê wek şairên tirk têne pêşkêşkirin. Gelo nivîsandina te ya bi swêdî testîrekê li îdentîteta de dike?*

– Tesîra ku dike jî bi a min tesîreke erînî ye. Ji ber ku gava ez bi swêdî dinivîsînim, swêdî dizanin ez kurd im û ji Kurdistanê hatime. Ev yeka han hem di nava rêzên şîrên min de xuya dibin, hem jî di danasîna min ya pişt pirtûkê de tê nivîsandin. Herçiqa ez bi swêdî dinivîsînim jî şair û xwendevanên swêdî dikarin bi hêsanî bibînin ku hîsên min, hezkirina min, bêhîkirina min, evîna min ji çavkaniya kultur û zimanê kurdî dizê.

– *Şîir bêtir zimanê hîs û sembolan e.*

Yanî şîir bi hindik gotin, gotina pir tiş-tan e. Gelo ev ji bo şairekî ku bi zimanê dudan dinivîsîne ne zehmet e?

– Rast e, di destpêkê de zehmet bû. Deh salên pêşt zehmet bû. Lê ev bûn bîst û pênc salên min ku ez li Swêdê me. Êdî Swêdê bûye perçeyek ji min û ez bûme perçeyek ji Swêdê. Herçî zimanê swêdî ye, bûye mîna zimanê min. Min bîst û pênc salan aktîv ev ziman bi kar aniye. Jina min swêdî bûye, zarokên min swêdî ne, niha xort in. Loma, bi qasî zimanê kurdî zimanê swêdî jî keti-ye jiyana min, bûye zimanê min yê hî-san.

– *Tu niha bêtir bi kîjan zimanê difiki-rî? Tu bêtir bi kurdî an jî bi swêdî difiki-rî û xewnan dibîni?*

– Gava ez bi kurdekî re rûdinim, ez bi kurdî difikirim, lê gava ez bi swêdi-yekî re rûdinim, ez hingî bi swêdî difi-kirim. Herçî xewn in, ez hem bi kurdî hem jî bi swêdî xewnan dibînin. Yanî ji bo min, kultura kurdî û ya swêdî bûne yek û di min de civiyan e.

– *Digel motîvên kurdî yên di şîrên te de, mirov cih bi cih pêrgî zehmetiyên koçberî û sirgunê jî tê. Gelo têkiliyên te bi kurdan û civaka kurdî re çawa ne?*

– Ez her çiqaşt ketim nava civaka Swêdê jî, dîsan min têkiliyên xwe ji ci-vaka kurdan nebiriye. Bêtir ez li kar di nava civaka swêdiyan de me, lê ez di ji-yana xwe ya şexsî de gelekî di nava civa-ka kurdan de me. Ji xwe herçî proble-mên welêt e, ez di nav de me. Ez bûye-

rên ku li welatê me dibe, bi riya kovar û rojnameyan, bi riya televizyon û telefonan taqîb dikim. Gava ez nûçeyeke xweş ji welêt dibihîzim mîna zarokê kîfa min tê, lê gava ez nûçeyeke nexweş dibihîzim ez bêhawe xemgîn dibim. Ez bawer dikim, her ku mirov di nava salan de diçe, mirov hê bêtir bi welatê xwe û bi welatîyên xwe ve tê girêdan.



Huseyin Yetkin
Metamorfos
Weşanên Apec

– *Gelo têkiliyên te bi edebiyata kurdî re çawa ye?*

– Divê ez mikur werim ku ez nikarim baş bi kurdî binivîsînim. Lê heta ji min tê ez bi kurdî dixwînim. Niha, ez Nûdemê bi kêfxweşî dixwînim. Herweha ez pirtûkên hevalên din jî dixwînim. Min bêtir pirtûkên ku li ser kurdan lê bi tirkî hatine nivîsandin gelekî xwendine. Ez niha bêtir xwe didim kurdî, ez dibînim ku her ku diçe kurdiya min jî baştir dibe. Ez bawer dikim êdî bi zimanê kurdî jî hêdî hêdî tiştên cidî têne nivîsandin. Ev yeka han jî hewesa xwendina kurdî zêdetir dike.

– *Gava tu şîrên xwe bi swêdî dinivîsîni, tu xîtabî civaka swêdiyan dikî. Şîrên te ji aliyê swêdiyan ve çawa tên dîtin? Reaksiyona wan çi ye?*

– Pirtûkên min krîtîkên baş girtine. Di nameyên xwendevanan de gotinên

gelekî xweş hene. Bertî bi demekê jinekê ji weşanxaneyê re nameyek şandibû û şîrên min gelekî pesinandibû. Wê goribû ku şîrên min jiyana koçberiyê, bêrîkirinê, hezkirinê baş tînin ziman. Wê ronahiya di pişt tarîtiya min de dîtibû. Yanî tiştê ku heta niha min bihîstine, erîni ne, min tiştê neyîni nebihîstiyê.

– *Mîna tu dizanî li Swêdê şîr hindik têne nivîsandin.*

Herweha xwendevanên şîran jî kêm e. Tiraja pirtûkên şîran di navbera 300 û 500 libî de ye. Lê te di vê civaka ku şîr lê kêmpopuler de, ne çîrok û roman, lê te şîr nivîsand.

– Şîr zimanê min yê hîstî ye. Ez bi hîsan re di têkiliyê de me. Niha ku ez rabim roman û çîrokan binivîsînim, ez bawer nakim ku ez ê bikaribim mîna şîran bi ser bikevim. Ew ne şaxên min in. Mîna genre min ji xwe re şîr hilbijartiyê û ez bawer im ez bi şîrê û şîr jî bi min têr dibe. Ji bo min ne promlem e ku 300 lib an jî 500 lib belav dibin an jî xwendevan kêm in. Ya girîng ew e ku gava xwendevanan xwendin, ew jê hez bikin, ew fêhm bikin, ew xwe tê de bibînin. Ez bawer nakim pîrbûna xwendevanan kalîteya berhemê diguherîne. □

Xwişka min a biçûk

Xwişka min a biçûk
niha mezin bûye
ez kirime xal
gava ez diçim welêt
ew li ber derf
li benda min e
xwe davêje stûyê min
em digirîn

Xwişka min a biçûk
tê bira wê
gava ew biçûk bû
Û xemgîn dibû
hingî birayê wê
xwe dikir hesp
ew li piştê hespê siwar dibû
Û em bi çargavî ji xeman
bi dûr diketin

Tevger

Li welatê miriyan
bêdengi hukum dike
Û tarîfî
li her cihî
û ne li tu cihî ye

Carekê bêdengiyê
gavek avêt
tarîfîyê
xwest bide dû wê
Sî liviyan

Ji livandinên dansa tarî
ji nişka ve
ronahî derket
ronahî bû
bervajiya mirinê

Huseyîn Yetkîn

Xemê û Xemgîn

Beş: 2

Şefik Kaya

Meheke din jî derbas bû, serê meheka nû hat. Dermanê xwe girtin, rahiştin hevsarê mehîna xwe û bi aliyê Girêmiradan ve çûn, gihane serê gir, li wir rûniştin. Mehîna xwe jî bi kemeka gûniyê ve girêdan, da li giyyayê paqij û nefela teze biçêre.

Qederekî xweş li wir rûniştin, axivîn, bîna wan derket. Westandina wan derbas bû, Xemê ew qevdikên giyyayê yên ku kalê hekîm dabû wan, deranî, şîrê bizina kej jî, ji meşkê vale kire nava gadoşekê û lihev xist, heta ku giya di nav şîr de heşifî. Li gorî şîretên kalê diviyabû ku lihev bixistana, heta ew giya bi temamî tê de biheliya. Xemgîn êdî westiya, milên wî qerimîn, nema dikarîbû lihev bixista. Gadoşê dirêjt Xemê kir. Xemê jî wek wî bi kevçiyê darîn lihev xist; bala xwe dayê, ku giyyayê wê di nav şîr de heliya, rabû gadoşê dirêjt Xemgîn kir. Xemgîn, jê vexwar û dîsan bi paş ve da wê, got:

– Tu jî, jê vexwe! Tilpa binî bibe, bi ser devê mehîne da bike.

Roj êdî li ber ava bû, zeraqiyên tavê dabûn camên xaniyê Tûran Çawîş. Ji dût ve wek eynikê dibiriqîn. Çavên Xemê û Xemgîn lahzekê çûn ser wê şewqê; bû piste pista wan bi hev re qise kirin.

Tûran Çawîş yekî reşikî qambocîk bû. Bêvila wî ya wek pişkuleke bizinan di nivê serçavê wî yê reş û qermitî de, ku weka tarra rêxê xuya dikir; nedihîşt bala mirov bikişe ser devê wî yê çaroxî. Çavên kuskokî, mîna yên mirdarên newala kuştîyan li ser bûn, li ber tava havîne venedibûn. Tarika şewqa xwe daxistibû ser bêvila xwe. Bi wî ser û sinçê gemarî, bi wê qamkoka xwe tişteki nedîtî dianî serê feqîran. Xelk lê heyirî dima. Agir ji devê wî dibariya. Tu kesî nizanîbû kî ye, ji kur e û kurê kê ye. Bi her kesî re xayin bû, digot qê her hes jî bi wî re xayin e. Mirov digot qê wan gundiyan bi destên xwe, li ber çavên wî, serê bavê wî jê kirine, ewqas ji wan aciz bû.

Ne ji mirovan tenê, ji heywanetên wê derê, jigil û giyyayê, ji bax û botanan jî

aciz bû, bi wan re dijminayerî dikir. Baxçeyekî darên mêwe nêzikî xaniyê Tûran Çawîş bû. Serbazên xwe berdabû nav wî baxçê wek behîştê, darên xox, zerdel û incasan birrîbûn, biribûn, şewitandibûn. Di nav de ji Tûran re xaniyekî bi kevirên spî, ava kiribûn. Xemgîn, bîstikekê çavên xwe ji xaniyê wî neniqand, zoq bû lê nihêrî; heta ku çavên wî qerimîn. Çavên xwe miz da, kesereke kûr kişand, berê xwe da Xemê û got:

– Ka tu bala xwe bidê, vî hovî ev baxçe xistiye çi halî? Baş tê bîra min, ez hê zarû bûm, bi zarokan re diçûme nav û me ji xwe re kerrikan jê diçinî. Wek baxê Mîr Bedirxan bû, xweş û şên bû. Te mirî bî-bira nav, sax vedigerand. Lê niha? Di dema zarokayetiya min de kalek li ber bû, jê re digotin: "Hecî Qemer" yekî kej î pozberan, bi qerebalix û bi herîkerî bû. Tu kes ji tîrsa wî newêrbû eşkere daketa nava baxçe, em bi dizî diketinê. Xemê, tu baş bala xwe bidê, wan, ew dar jî qurmê ve, ji bo şewatê hilkirine. De ka Tûran tu ji bo çi bi van daran re neyartiyê dikî? Welleh şeytan dibibêje rojekê...

Xemê serê xwe hejand, ew jî bû şîrkê gotina Xemgîn. Paşê got:

– Ma tu dibêjtî qê ez bi vî nizanîm? Ax, ax... Ez baş dizanim, ku ev çi mirov in!

Xemê keserek kişand, berê xwe ji Xemgîn zivirand û hêsir ji çavên wê hatin xwar. Paşê sekînî, xebirdan hew jê çêbû. Xemgîn bala xwe dayê, ku xebirdan ji Xemê çênabe, meraq kir ji bo çi Xemê

ji nişka ve hêsiran dibarîne, got:

– Xemê, Xemê... Dîsan çi bû? Tu çima digirî? Ka bibêje çima dilê te dîsan wek keleka Emerê Gebro bi ser pêlan ketiye!

Ji îskînê Xemê nikarîbû bersiva wî bigra, paşê got:

– Çi gava bahsa vî kûçikbavî dibe...

Lê, gotinên xwe temam nekir, girîn ket qirikê, gotin di qirikê de man. Xemgîn ji xwe re şaş mabû, nizanîbû Xemê ji bo çi hêsiran dibarîne. Ew xwe bi xwe fikirî, ku wî tu xebereka ne xweş jê re negotiye. Careke din jê pirsî:

– Xemê, rihmet li dê û bavê te, ka bibêje tu ji bo çi digirî?

Xemê berê xwe da wî û got:

– Te bahsa Tûrano kir loma ez girîyam. Çi cara bahsa vî segî dibe, dilê min diêşe, hêsirên min tèn...

Xemgîn şaş bû, nizanîbû ji bo çi ew pirs kir, got:

– Belê ji bo çi?

Xemê got:

– Xemgîn, temenê min di ser yazdehan re bû, rojekê, ez û çend hevalan ji qirşikan dihatin. Dema ku ez nêzikî malan bûm, çi bibînin! Serbazên Tûran Çawîş dora gund girtine. Qudûm bi min ve neman, lê min xwe li nav wan xist, derbas bûm, çûme malê. Ez çûm, lê çi bibînim...! Ku diya min û jinapa min Perîşan, bi werîsekî, bi dara li ber derî ve girêdayî ne û îşkê didine wan, ew dane ber şivên terr... Pêre– pêre janekê avîte ser dilê min.

Digotin, ku diya min û jinapa min ji qaçaxan re xwarin pahtine. Diya min êdf ketibû rewşa mirinê; parsûyên wê şikan-dibûn, nalenal jê dihat. Di pey wê lêdanê re, qederê çend heftiyan diya min... Diya min kuştiya destê Tûran û berdestiyê wî, Oxiz e!

Çi cara ku ez navê Tûran dibihîzim yan jî wî dibînim, ew kûçikbavê Oxiz jî tê bîra min. Ew lêdana diya min û jinapa min tu carî ji ber çavên min naçe. Zalimê Oxiz bi şivan li diya min ya jar dixist; ew jî kûçikekê mîna Tûrano bû. Van kûçik-bavan serê gelek mêrxas di tûrên mûyîn de, şandine bal siltanên xwe! Xwedêyo, tu ji neheqan re nehêl!

Berêvarkî bû, Xemê û Xemgîn karê çûna malê dikirin. Lê hê ji serê gir dane- ketibûn, dengê teperepa lingan bihîstin. Gava zivirîn, nihêrtin, ku serbazên Tû- ran çawan bi gir ve hildikişin, ber bi wan tèn. Herdu bi hev re rabûn piya û li wan mêze kirin. Herdu jî şaqiz man. Zefiyan hêdf hêde dor li wan teng kir. Xemgîn bala xwe dayê, ku mirûzê Xemê zer bû- ye, ditirse. Lêvên wê rihilîn; laşê wê wek şiva nav avê çû- hat, ricifî. Di ber xwe de got:

– Tu girek, tu kort û mesilek, tu bax û bostanek, tu parêzek ji ber lingên van çe- pelên bîngemar xelas nabe, diçin her derî diherimîn! De ka çi karê we li serê vî girî heye? Heyla gerdena we bixele, çapi- liya serê sibê li kezeba we bikeve!

Hawîrdor li wan hatibû girtin. Ji wan,

pirsa sebebî hatina wan ya wir kirin. Ji Tûran wetirê Xemê û Xemgîn ji bo ku li wan notirvaniyê bikin, hatine wir, lew di- tirsîya. Wan zanibûn ew bi darê zorê ha- tine û tu kes ji wan hes nake. Tîrsa wan ji ber wê yekê bû. Tûran û serbazên xwe ne tenê ji zindiyan, lê ji miriyan jî ditirsi- yan. Ji wan re hatibû gotin: “Kuştiyên destê Romê namirin, sax in û di tengasi- yê de tèn hewara zindiyan!”. Serbazên ku dor li Xemê û Xemgîn girtibûn, ditirsi- yan, ji tirsan diricifîn. Xemê bi dizî ji Xemgîn pirsî, got:

– Xemgîno, ev jî weka min diricifîn?

Xemgîn jî weke wê bi dizî bersiv da, got:

– Dengê xwe bilind neke! Yên ku zilm û talanbiriye dikin, bi xwe dizanîn. Ev jî dizanin, ku ew zilm û neheqiyê li me di- kin û ev yek ji wan re namîne. Lê belê ta- lan û zilmê çavên wan kor kiriye; ew ber bi talanên din ve diçin. Sebebekî din ji tîrsa wan ew e, ku ez û tu bi hev re ne. Ji yên bi hev re ditirsîn. Keysa wan li yên bi tenê tê. Ew dixwazin, ku em ne bi hev re bin, li gorî dilê wan, tim yeko yeko, ji hev belav bin.

Tûran êdf gihabû cem wan, berê xwe da Xemgîn û got:

– Tu ji bo çi hatî vir?

Xemgîn got:

– Hatina me ne ji bo tiştê xerab e, axa me ye, ava me ye. Bîna me li mal teng bû, em ji xwe re derketin der, hatine vir. Em ji mala xwe dûr neketine, lê hinek ji

malên xwe, ji welatê xwe dûr ketine, heta vir hatine, hatine ser av û axa me.

Tûran bi van gotinên Xemgîn hêrs bû.

Xemgîn bala xwe dayê ku Tûran li sebebekî digere, ku lê bixe, hebekî dengê xwe nizim kir, got:

– Tu çima xwe dixeyidînî, Tûran qumandar? Ma tu ne ji Anadolê heta vir hatiyî? Helbet tu ji bo karekê hatiyî, ma morîkên diya te li vir qetiyane? Yê sebebê hatina te bipirse ez im. Çi karê te li vir heye?

Tûran pirrtir hêrs bû, madê xwe tîrşkir, diranên xwe sîqirand, got:

Ez dizanim, ku ez ji bo çî harime, yê fêm nekiriye, ku ez ji bo çî li vir im, tu î, reben! Hatina min ne ji bo kêfa serê gir û rakerina li ser çayirê ye! Careke din ez, we li serê Girêmiradan nebînim! Hûn mirazê xwe bi dest naxin!

Xemgîn, bi van gotinên Tûran Çawîş gelek êşiya, di dilê xwe de got:

“Tûrano, ez ji te baştir dizanim, ku tu ji bo çî hatî vir, lê mala felekê bişewite, felek bi min re xayin e. Tu tiştê ji dest min nayê, lê dê rojekê liç hilweşe, ava tê de dê biherike!”. Welleh şeytan dibêje rojekê...

Tûran berê xwe ji Xemgîn zivirand, hew jê pirs kirin. Vêca berê xwe bi aliyê Xemê ve da, got:

– Pîrê, tu li vir çî dikî? Hûn ji bo çî ev mehîna ciwan bi xwe re digerin?

Xemgîn hebekî bişirî, got:

– Mala te xera be, ma çav bi te ve nîn

in? Çi ciwaniya vê kulekê heye, ma tu halê wê nabînî? Ew hem pîr e û hem jî, ji qelsî dike bimire. Me, ew aniye ku li vir, li çêra teze biçêre.

Lê Tûran Çawîş, dengê Xemgîn nebire xwe û berê xwe da bi aliyê Xemê ve, jê wê pirsî:

– De ka bibêje, tu ji bo çî hatiyî vir?

Xemê xayinî, bedbextî û dilkurmiya wî ji berê ve bihîstibû. Lê dizanibû, ku li Tûran bi kîn e. Wê jî bi hêrs bersiva wî da, got:

– Hero Tûrano, tu sebebê hatina min dipirsî! Tu baş dizanî, ku yê sebebê hatina te ji te dipirsin hindik in, ev torîtiya te ji ber wê yekê ye. Ka tu bibêje, çî karê te û van bînmirarên te li vir heye? Diya min bi destê we hat kuştin!

Tûran gotinên Xemê baş fêm kir û zanibû Xemê çî dide fêm kirin. Lê, wî nedixwest li ser maniya gotinên Xemê bifikire. Wî bi xwe jî dizanibû, şirovekirina gotinên Xemê dîrokeka dûr û dirêj e, lew li ser maneya wan nesekinî.

Tûran, bê sebeb xeberdanê dirêj dikir, da di dawiyê de mehîne ji wan bistîne, bi xwe re bibe.

Bêyî ku bibêjine wan, hevsarê mehîne ji kema gûniyê vekirin, xwastin ku bi xwe re bibin. Xemê bazda hefsar ji destên wan kişkişand, lê pirraniyê mêranî betal kir. Çend heban bi hev re rahiştibûn hefsar û dikişkişandin. Serbazên Tûran mehîne birin û çûn.

Zeftiyekî şerpeze û bêmirêz li dawiyê

ma. Ew jî yekî mîna Tûran qambocîk bû. Guhên wî dişibiyên yên kûçikan. Pêlavên qetiyayî di lîngan de, şalê lê sedpîneyî bû. Pîsekî bîngenî, bîna kelaxan jê dihat. Berê xwe da Xemê, ber bi pê çû. Xemê ji bîna wî ya pîs çarîka xwe ya çivtkirî da ber bêvila xwe, nehişt bîn here bêvila wê. Serbaz, sirûyê xwe xwar kir û got:

– Ji bo Xwedê, ez ji nêza dikim bimirim, xalîkê...! Bi we re hebe, xêra xwe gebek nan bidine min?

Gunê Xemê pê hat, dilê wê pê şewitî, berê xwe da Xemgîn, got:

– Ev reben dişibe dilên ber Gola Şêx Xelîl. Ka, digotin ev paqij in, lê xuya ye, ev gû bi mîzê dişo! Ev çî bîn e, ji vî tê?

Li yê serbaz fitilî, got:

– Ma ev xwarinê nadin te?

Serbaz bi halekî perîşan bersiva wê da, got:

– Xwedê ji te razî, çî xwarin û çî hall! Dema qerwanê Tûran Çawîş tê metbexê, hemî gotştê nav, rûnê ser ji xwe re hildide, dibe mala xwe. Paşê jî dor tê yên bi qewet, halê me ev e... Binê niqrê, yê tev bi kevir û xîçir ji yên weke min re dimîne.

Xemgîn, bi Xemê re guhdarî kir, bê hemdê xwe got:

– Hûn miletekî seresker têr, serbaz birçî ne! Ma ew ji wan hêk û mirîşkên hûn berhev dikin, tu tiştî nade we? Tu bi çawîş bî, tu ê jî weka wî bikî?

Serbaz bê bersiv ma, stûyê xwe xwar kir

û li gotinên wî guhdarî kir. Xemê, weka yeka bê hemdê, xwe desteyek bastêq ji tûrê mûyîn deranî, da dest serbaz. Serbaz, bastêqê xwe girt, da ber gezan û xwe ji serê gir ve berda xwar, çû, di nivê palê de sekinî û ji wan re dijûn da, got:

– Ev bastêqê xweş ne layiqê devê we ye!

Tûran mehîna wan ji bo kevirkişandinê biribû, lew di xwest di kêleka ya kevin de, qereqoleka nû lêbike. Ji ber vê yekê, bi zorê bi gundiyan kevir didan kişandin. Bi sedan gundiyan jar bi heywanên xwe ve, ji Tûran re kevir dikişandin.

Temenê Xemgîn ne yê suxrê bû. Heke ne wisan bûya, dê wî jî bibirana kevirkişandinê. Lê ew bi saya emrê xwe ji dest Romiyên xelas bûbû

Nêzî çend sed mêran li rasta ber derê qereqolê civandî bûn. Hevsarên heywanên wan di dest wan de, li pawîka fermânê Tûran Çawîş bûn. Bala xwe danê Tûran Çawîş di navbera çend serbazan de, ji derê qereqolê ve derket, ber bi rastê, bi aliyê alemê ve hat. Ew timî bi serbaz bû, tu carî newêrbû bi tenê derketa, ditirsîya. Jê re hatibû gotin, ku keys lê were, dê derbekê lê bixin...

Serbazên li dorê, ew alem ji hev dane alî, Tûran Çawîş derkete ser kevirêkî bilind da ji alemê re şor bike. Berdevkê wî jî li kêlekê sekinî bû. Tûran, ji nişka ve dest bi axaftinê kir:

– Hûn dizanîn..., hûn ji bo çî li vir civiyane. Ez naxwazim zêde dirêj bikim. Niha serbazên min dê bi we re bîn nava

şikêran, ez keviran şekirî dixwazim! Xwarin û vexwarina xwe ji bîr mekin, tedari-ka xwe bikin. Yê bê tedarik bê... We te-va nav û dengê min bihîstiye, ez zexelî û tiralîyê naxwazim, baş bixebitin! Nîvroki-yan jî betlane tune. Kerratiya xwe di ber karê xwe de bixwin! Bila ji her gundekî yek, êvaran here xwarina hemîyan bîne, tenê yek. Piştê nebêjin filan û bêvan... Ez vê jî, ji we re bêjim, girantirîn tawan ji bo yên ku li hember serbazên min radi-bin, e.

Dema ku ev gotin ji aliyê berdevkê Tû-ran ve hatine wergerandin, her kesî fêm kir, ku çî hatiye gotin. Berdevk, çêr û pê-çariyên wî nedigot. Wî ferman tenê pêş-kêş dikirin. Xeberdana wî li ber xelaskiri-nê bû, yekî cilqetiyayî, pêxwas î jar bi lez, ber bi aliyê deriyê qereqolê ve çû. Yekî, ji nav komê xwest bi milê wî bigire, nehêle ber bi Tûran û serbazên wî ve here, lê pê re negihîşt, mêrik çû. Ew çû, ku pîrsekê ji Tûran bike. Lê, serbazan nehişt, ku ew bigihîje cem Tûran. Mêrik xwe di nav lepên serbazan de bir- anî, qerebalixî kir, lê ew bernedan.

Tûran ji repe repa lîngan û ji qerebali-xiyê ditirsiya, ricif dikete nava wî. Timî sil bû, destê wî li ser şexderba wî bû. Mê-rik xwe di nav lepên serbazan de, kişki-şand û Tûran bi xwe da hesandin. Gava Tûran bi dengê wan hesiya, got:

– Ew kî ye? Jê bigerin, kalê çî dixwaze!

Hecî Ahmo gotinên xwe berê hazir ki-ribû, got:

– Tûran qumandar, te got: "Navarojê betlana tune!", lê limêja min?

Pîrsê Tûran qumandar gelek êşand, hêrs bû û got:

– Himm... Hûn û limêj? Hûn ne doza limêjê, hûn doza betlana navrojê dikin! Kî te şand, bibêje min? Hûn dixwazin li min înkilabê bikin? Ma ez nizanim, ku hûn êvaran agir dadidîn û di dorê re di-çin- tîn, jê re dua dikin! Hûn ne yên li-mêj û rojiyê ne, herin hurmizgeh û lala-şan! Zû biqêşte hê min tu neavîtiye bin lingên xwe!

Hecî Ahmo jî gelek hêrs bûbû, lê ne-wêribû êskere bikira. Belê di dilê xwe de got: "Heywax! Ew dînê di bin zilma Tû-ran Çawîş de be, dê çî xêr jê were? Gava ku ew destûr bide limêj serbest e, gava nexwaze limêj qedexe ye! Ma ev îslamî ye, birano?"

Paşê Hecî Ahmo parestûya xwe xu-rand, çû, giha hevalên xwe.

Xemê û Xemgîn, ew meh bi zor û zah-metî bihurandin. Meheke nû dest pê kir. Diviyabû, ku wan di destpêka wê mehê de dermanê xwe bikar biniya. Weke ku pîremêr gotibû, diviyabû ji derman bida-na mehîna xwe jî, lê mehîn ne li cem wan bû, di suxra Tûran Çawîş de bû.

Xemê û Xemgîn ne diwêribûn herin cem Tûran Çawîş û ne jî herin mehînê jê bixwazin. Herdu jî salmezin bûn, raqet jî tunebû û ditirsiyan. Wan nedixwest ji tu kesî re bahsa derman bikin, şerm dikirin.

Rabûn biryar girtin, ku bi dizî herin me-
hîna xwe bibînin, li wir dermanê wê bi-
din wê.

Êvarekê Xemê, sêl avîte ser kuçik, heta
şeveqa serê sibê nanê sêlê pijand. Berî ta-
vavîtinê nanê xwe xiste nava şalikekê,
guşên wê li hev girêda û şalika xwe avîte
milê xwe, ji malê derketin. Xemgîn jî
derman di dest de, bi aliyê şikêran ve, bi
lez çûn heta ku ji ber çavan winda bûn.
Xemgîn qederê çend gavan di pêşiya Xe-
mê de dikîşiya. Piştî qederek rêveçûn, nê-
zîkayî li cîhê ku ew dê biçûnaye kirin.

Tûran bi serbazên xwe, li ser riyana no-
bet dida girtin. Ji ber vê yekê gava Xemê
û Xemgîn nêzîkî li şikêran kirin, bi himet
çûn. Serbazek li ser rîya wan sekinî bû, ji
dûr ve dît û bi dengê bilind qîrekê da
wan da di cîhê xwe de rawestin. Fermana
Tûran bû, ku tu kes xwe negihîjîne cem
kevirkêşan. Lê guh nedan lêvarqilandina
serbaz, raste rast bi ser wî ve çûn. Serbaz
tirsiya, tivinga xwe ji milê xwe daxist û
berê wê da wan. Gava Xemê dît, ku ser-
baz berik ajote ber, tirsiya, gav lê sist bûn,
çok lê rihilîn. Xemgîn lê nihêrî û bişîrî,
got:

—Xemê, yê ku nizanibe, dê bibêje qê tu
Romîyan nas nakî. Ev yek ji wan yên
ku timî tên li hêk, nîsk û mirîşkan dige-
rin, e. Ev doza bertîlekê dike.

Xemgîn çû, çend nanên sêlê ji şalika li
milê Xemê deranî, wek mirov biavîje ber
qolo, avîte ser serbaz. Dema serbaz çav bi
nanê sêlê ket, devê tivinga xwe berjêr kir,

got:

—Bibexşînin, min nizanibû, ku hûn rê-
wî ne, Welleh min got qê çete ne, werin,
werin kerem bikin, derbas bin! Lê, qu-
mandarê min we nebîne.

Wî bertîla xwe girt, ew jî derbas bûn,
çûn. Piştî ji serbaz derbas bûn, Xemgîn li
Xemê fitilî, got:

—Xemê, min ji te re nedigot: “Ev birç-
iyên destê Tûran in, Tûran zilmê li wî,
ew jî li feqîran dike.

Bi axaftin, lê bi tirs çûn, gihane nav şî-
kêran. Bi zor û zahmetî mehîna xwe nas
kirin. Naskirinê nas kirin, lê li dîtina
xwe poşman bûn, mehîn bûbû çerm û
hestî, parsûyên wê yek bi yek dihatin hej-
martin. Cendirman dêla wê kurisandi-
bûn, bijîyan dabûn zarûkên Tûran Çawîş
da zivistanê dafîkan deynin; pê kewên
gozel bigirin.

Qesela kurtanê mehînê jê rijiyabû,
merşikeka mûyî mabû, di birînen pişta
wê de diçû. Ji békurtanî pişta wê lê xisti-
bû, çerm herîşt bû, di herdu alîyan de ha-
tibû xwar. Xwîn û edab jê diherikî. Gunê
wan bi halê wê heywaneta bêzar û ziman
hat, li Tûrano nîfir kirin. Xemgîn ber pê
çû, got:

—Hey heywana bêzar û ziman, xezala
çiyayê Şengalê, kêvrûşka Beriya Mêrdînê,
kî ev zilm li te kiriye? Ma tu ya kevirki-
şandinê yî? Xwedê vî Tûran Çawîşt di zil-
ma wî de bixeniqîne! Welleh şeytan dibi-
bêje rojekê...

Xemê milên xwe avîte ser sitûyê wê û ji

halê wê re giriya.

Ew xortê ku pê kevir dikişand, pîrr ecele dikir, got:

– Apê Xemgîn, li min dereng e, divê ez heta êvarê keviran bikişînim. Erkene tu bi Tûran Çawîş dizanî, yekî dînîk e.

Xemgîn, ji giliyê wî fêr kir, ku dixwaze derengmayîna xwe bide nîşandan û nebe sebebê lêdana wî. Xemê got:

–Lawo, Welleh Tûrano ne bi hetîkerî ye, lê em bêzar û bê xwedî ne.

Xemgîn ji zû ve dermanê xwe xistibû nav şîr, tê de heşifandibû. Şîr kir du beş, nivî ji wî û xemê re, nivê din jî, ji mehî-nê re. Peyayê ku bi mehî-nê kevir dikişand şaş bû got:

– Xwedê hebîna, ka ji min re jî bibêjin ev çi ye? Ev çi ye hûn bi ser devê vê mehî-nê ve da dikin? Ma hewce ye, ji xwe dê di nêz de bimire!

Xemgîn nedixwest rastiye jê re bibêje, got:

– Ev dermanê nexweşiyê ye. Tu halê vê jarê dibînî?

Xemê çend nanên sêlê da wî jî. Mêrik rahişte hefsarê mehî-nê, xatir ji wan xwest, kişiya, çû. Nanê mayî li yên li wir belav kirin, xatir ji wan xwestin, dane rê bi paş ve, ber bi gund ve çûn.

Her tişt li gorî şîretên pîremêrê Gurdilî hatibû kirin. Ew şîretên kalê yek bi yek bi cî anîn.

Êdî payiza paşîn bû. Pelên daran zer bûbûn, bi çiqilan ve pel nemabûn, dar bi hemû eyb û arên xwe ve li aziyê, rût ma-

bûn. Ji sir û seqemê, ji berfê xelk perîşan bû. Berf li erdê bû, pîrr tê neçû berfeke din jî kete ser ya li erdê, eyb û arên wê veşart. Rê û dirb tev bi carekê hatine girtin. Şîkêr jî di bin berfê de man. Tûran mecbûr ma, ku gundiyan bişîne malên wan. Gava gundî vegeyriyane gund, mehî-na wî jî bi xwe re anîn.

Wan, ew zivistsan pîrr baş li mehîna xwe nihêrt. Kayê bi ceh, giyayê paqij, rê-siyên mêrgê dane wê. Herroj ew mehes dikirin; nedihîştin, ku afirê wê ji ka û ceh vale bimîne.

Mehîn jî hêdî hêdî bi xwe ve hat, goşt girt. Di şûna pirça kevin de, pirçeka nû hat, bû mîna xezalekê.

Xemê jî hatibû guhartin. Serçavê wê delaltir bûbû, dêrê lê bûbûn mîna sifra sor, şewq jê diçû. Made û mirûzê wê ji yê berê pîrr xweştir bû. Hêdî hêdî giran bi rê ve diçû, serê sibana dilê wê lihev diket, vedireşiya û dilbijokî bûbû, lê eyb dikir, ku ji mêrê xwe re bibêje.

Pîremêrê Gurdilî ji wan re gotibû, "Heke mehîna we avis bû, dê Xwedê bedena Xemê jî terr bike" û yên zana digotin: "Mehîn avis e!".

Şevêkê, nivê şevê bû, Xemê ji xewê veciniqî, bi lez rabû di nav cîhê xwe de rûnişt. Ew cara yekem bû, ku Xemê di nava xwe de li tişteki vardiqilî. Destên xwe da ber rûyên xwe, hinek bi tirs û hinek jî bi kêf, bala xwe da wê livê. Hêviya ku sist bûbû dîsan xurt bû, lê ku rast bûya?

Belê Xemê bawer kir, ku ew bi du rihan e. Ji kêfa nizanîbî çî bikira, destê xwe li Xemgîn gerand, girmilka wî kete ber destê wê, hejand ew ji xew şiyar kir. Xemgîn bala xwe dayê, ku Xemê pirt bi kêf e, got:

—Xêr e, Xemê? Çi bûye, tu vê şevê ji xew şiyar bûyî?

Xemê ji kêfa nikarîbû bersiva wî bida, qasek ma, got:

—Xemgîn, ka guhê xwe bidê, tu jî bibihîze...!

Bi van gotinan re, Xemgîn ji kêfa xwe şaş kir, cîh lê teng bû, rabû ku cilên xwe li xwe bike û here derva, ji hinekan re bibêje. Lê Xemê hişk pê girt, nehişt. Wî dixwest here mizgîniyê bide heval, dost, cînar û gundiyan. Dev ji çûna derva berda, hat hêdfika li kêleka Xemê rûnişt, bi ser Xemê de giriya. Paşê wek zarûkekî papûçîkê, li ser milê wê di xew ve çû.

Kêfa wan êdî gelek li cîh bû, ji kurdûndetiyê xelas dibûn. Xemgîn êdî bi dilekî şa li kêleka Xemê radiza.

Wext û zeman derbas bûn. Rojekê serê sibê zû rabûn, çûne tewlê ku em bidine mehîne. Bi derîvekirinê re şaş man, ji çavên xwe bawer nekirin. Caniyek mîna karxezalek li ber mehîne bû. Xemê xwe avîte sitûyê mehîne bi ser ve giriya, got:

—Em heval in xezala min, te caniyek wek karek xezalan aniye, aqûbeta te li serê min be jî... Xwedê bedena te berî ya min terr kir, va li te hatiye rehmê!

Xemgîn baz da, çû ji navmalê lihêfekê

anî bi ser cahnî de werkir da totmeyî nebe, bala xwe dayê nêr e. Xemê jî bi lez vegeriya navmalê, çend tas dims ji kûp derxist, vala kire dîzikê û dîzik danî ser kûçîk, germ kir. Piştî tînegermî bû, bir da mehîne. Lê qedere heskekê ji bo rojeka din ji ber hişt.

Pêşt nedixwestin ku kes pê bihese, lê paşê eşkere bû. Tirs a wan ji nezerê bû. Xemgîn di ber xwe de hêdî got:

—Xemê, tu ji nezerê ditirsî, lê tu dê ji bo xwe çî bikî? Ma tu dikarî xwe ji gundiyan veşêrî? Ew nezera tu jê ditirsî ji xwe berê li me daye û em xistine vî halî. Ma tu nezer ji zilma Tûran xerabtir hene?

Xemê tu bersiv neda, lê di dilê xwe de got: "xweziya min bi wê rojê be!". □

Dewama wê û beşa dawî di hejmara bê de

Azad û Bapîrê xwe



M. Dehsiwar

Azad xortekî 12 salî bû û li xwendegeha Şêx Seîd, sinifa Apêncan dixwend. Ew di sinifê de yek ji wan şagirtên herî jîr û şareze bû. Hevalên wî ji ber jîrbûn û şarezatiya wî, ew berpirsiyarê sinifê hîlbijartibûn. Ew her wiha endamê komîteya birêvebirin a xwendegehê bû jî. Hem di nav hevalên xwe yên sinifê de û hem jî di nav pîrraniya şagirtên xwendegehê de jê dihat hezkirin.

Bavê wî Dewran di belediyeya bajêr de weke kartmend kar dikir û diya wî jî rojê niv danî li cem daîreya polîs kar dikir. Piştî şoreşê, rewşa welêt a abortî bi giştî xera bûbû û mala wan jî weke pîrraniya malbatên kurd para xwe ji vê rewşê girtibû. Xwişka wî Evîn li Unîversîteya Amedê, beşê îdareya civakî dixwend û di dawiyên heftiyan de dihat malê. Roja ku Evîn dihat malê, di malê de xwarinên xweş çêdibûn û endamên malbatê bi kêf li hev diciviyên, xwarina xweş dixwarin û diketin suhbeteke xweş. Piştî xwarinê jî diya wî Sêvê şêrnahiyekê dida ber wan ku di malê de bûbû edet. Bapîrê Azad, Mîrze jî li cem wan di- ma û bi hatina Evînê û civandina malbatê pîrr kêfxweş dibû.

Rojên şemiyên li otomobîla bavê xwe ya kevn siwar dibûn û diçûn gerê; êvarê jî ku filîmekî nû û xweş hebûya, diçûn sînemayê. Bavê Azad ji bilî karê xwe, weke endamê komîteya ewlekariya bajêr kar dikir. Serokkomar û serokwezîr ji tevahiya hevweletiyên xwe daxwaz kiribûn ku herkes beşdarî pêşdeçûn û ji nû ve avakirina welêt bibin û ji bo serkeftinê jî di komîteyên kar û xebatan de cîh bigrin. Ev her wiha ji bo demokratîkbûneke berfireh jî pêwîst bû, gotibûn serokên birêvebirina welêt.

Ji lewre jî kesên ku kar ji destên wan dihatin, di rêxistinên li gora întresseya xwe de cîh girtibûn û ji bo pêşdeçûna welêt bi dil û can dişixulîn. Di nav gel de ji bilî îdareya resmî, bi van ve girêdayî komîteyên cuda yên weke ewlekariyê, xwendegehan, çand û edebiyatê û yên din hatibûn damezrandin. Van komîteyan jî li gora babetên xwe, bi alîkariya dewletê înstîtuyên lêkolînê ava kiribûn û bi awayekî zanistî kar dikirin.

Bajarê wan Hezhar, bajarekî ne zêde mezin bû; nêzî 60 hezar şênîyên wê hebûn û rûniştevanên bajêr ji bo pêşdeçûna bajêr û ya welêt, bi dil û can xebat dikirin. Hezhar bi qasî 250 kîlometreyan dikete başûrê paytexta welêt, Amedê. Riyên bajêr, di şerê rizgariyê de ji teref dijmin ve bi tevayî hatibûn xerakirin, lê niha ji teref dewleta Kurd ve ji nuh ve hatibûn çêkirin. Her wiha hesinên trenê jî bi alîkariya şîrketên derve û hundir ve, ji nuh ve hatibûn raxistin. Gelê Kurd ji bo avakirina welêt, bi dil û can dişixulî. Tevî ku meaşê wan û rewşa wan î aborî ne zêde baş bû jî, kesî xwe ji kar û xebatê bi paş ve ne dida.

Piştî rizgariyê weke tevahiya navên gund û bajêran, pîrrianiya navên xwendegehan ên bi tirkî jî hatibûn guhartin. Xwendegeha Azad jî ku navê "Xwendegeha Aratürk" bû, ji ber serhildana wî ya sala 1925-an, navê Şêx Seîd girtibû. Ev biryar ji hêla komîteya birêvebirin a belediyeyê ve hatibû wergirtin.

Xwendegeha Şêx Seîd dikete rexê çepê bajêr. Xwendegeh ji nuh ve hatibû tamîrkin, boyaxkirin û dora wê bi darên gul û çîçekan ve hatibû xemilandin. Xwendegeh, şagirtan heta şeş salî li vir dida xwendin û pişt re ew dişandin xwendegeha navîn ku dikete hêla din î bajêr. Xwendegeha Şêx Seîd ji du avahiyan pêk dihat; ya her sê sinifên pêşîn û ya her sê sinifên dawî. Di nava herdu avahiyan de korîdereke dirêj hebû ku şagirt û mamoste karibûn derbasî avahiya din bibin an jî herin xwarîngê û xwarin bixwin.

Di her sinifekê de nêzî 25 şagirtan ders didîtin. Hewşa xwendegehê mezin bû; şagirt û mamosteyên xwe têde dikaribûn futbolê bileyîzin an jî dersên cîmnastîkê çêkin. Ev alî her wiha ji bo civînên şagirtan ji dihat bikaranîn. Aliyê din î hewşê, ji voleybol û basketbolê re hatibû veqetandin. Wekî din jî ev der cîhê leystikên din û gera şagirtan bû. Hem şagirt û hem jî mamoste ji xwendegeha xwe pîr razî bûn û guh didan rehetî û paqijîya wê. Ji lewre jî baxçeyê hewşa dibistanê pîr paqij bû; dar û gulên ku tê de hatibûn danîn, ji ber guhdanê ji niha ve mezin bûbûn.

Di nava şagirtên xwendegehê de, tevî ku hinekan şemûzî û nerehetiyê dikirin jî, harmoniyeke baş hebû. Mamoste ji şagirtên xwe û ew jî ji mamosteyên xwe dilxweş bûn. Ger di nav şagirtan de hinek pîrsgirêkên biçûk derketina, pêşî ew di nav

komîteya şagirtan de dihat nîqaşkirin; lê heke ev komîte nikaribûna van pirsgirêkan hel bikirna, wê çaxê ew dibirin îdareya xwendegehê.

*

Bihar bû, dar û berên hewşa dibistanê şîn bûbûn, gulên daran çiçekên xwe vekiribûn. Bi tewabûna zivistanê û hatina biharê re, bevzê mirovan jî vebûbû; rûyên wan dikeniya. Şagirtên xwendegeha Şêx Seîd, bi kêf û eşq li dersên xwe dişixulîn. Ji ber ku di rojên pêş de azmûna (îmtîhan) wan hebû, mamoste Bahoz di derheqê dersên borî de ji şagirtan pirsan dikir. Şagirtan jî li gora zanebûn û têgihîştina xwe bersîva pirsên mamoste didan.

Lê van çend rojên dawî, hişê mamoste ji bersîvan bêtir li Azad bû. Hêviyê ku berî tevan ji bo bersîvê destê xwe bilind dikir û bi hêsayî bersîva pirsan dida, ev çend rojên dawî bêdeng û bêbersîv mabû. Qey derdekî wî hebû, fikirî mamoste Bahoz. Di dersxaneyê de jê re tişteki negot; nedixwest ku Azad di nav hevalên wî de, bi pirsên xwe bide şermê.

Ger şagirtêkî din bû ya, wê wî ew bida ber pirsan; lê Azad xortekî hêja û diltenik bû. Di dersên xwe de jîr bû, hay ji dora xwe û hevalên xwe hebû û ji lewre jî jê gelek dihat hezkirin. Bi kesî re şer nedikir, lê çaxê ku neheqiyek li yekî bibûna, ew bêdeng nedima û bi ser neheqiyê ve hêrs dibû. Ji ber wê jî cîhê ku ew lê bû ya, kêm neheqî dibûn. Bi tevaya hevalên xwe re, bi awayekî harmonîk xebatê dikir û di dersan de jî alîkariya hevalên xwe yên bi paşdemayî dikir.

Ev rewşa wî, ew di nava tevahiya heval û mamosteyên wî de kiribû xwedî cîheki bi taybet. Her wiha ehlaqê wî jî pîrr xweş bû, dilê kesî nedihîşt û kesî nerehet nedikir. Mamoste ji ber jîrbûna wî, ehlaqê wî yî nerm û harmoniya bi der-dora xwe re, gelek jê hez dikir û rûmet dida Azad. Wî ew di hinek awayan de, dişiband dema xortaniya xwe ya berî rizgariyê. Ew bi xwe jî gelek jîr bû û ji teref der-dora xwe gelek dihat hezkirin. Her çiqas wî tu xêrê jî şagirtî û xortaniya xwe nedîtibû jî, di nav hevalên xwe yên siyasî û di nav gel de bûbû xwedî cîheki girîng.

Piştî navbirê şagirt derketin derva, hewşa dibistanê. Mamoste Bahoz jî piştî ku di odeya mamosteyan de qehweya xwe vewxar, derket derva ku li Azad bigere. Azad ne di nava şagirtên ku bi futbolê dileyîstin de bû; li hêla din çend şagirtan bi voleybolê dileyîstin, ew ne di nava wan de bû jî. Mamoste bi meraq çû hêla din, hewşa biçûk a li dawiya dibistanê ku lê bigere. Lê Azad li wir jî ne xwanê bû. Berî ku ji wir vegere, reşikek di ber deriyê dawî de bi ber çavên wî ket. Nêzikayî lê kir û dît ku Azad di quncikê derî de rûniştiye û dirame.

Mamoste çû li kêleka wî, li ser erdê rûnişt û qasekî xweş bêdeng ma. Pişt re destê xwe bi dîqqet danî ser milên wî û jê pirsî:

– Azad, tu van rojên dawî pirr bêdeng î, gelo derdekî te heye?

Azad kesereke dirêj kişand lê bi carekê re jî bersîv neda; destên xwe ji ber rûyê xwe da alî û bêyî ku berê xwe bide mamoste, jê pirsî:

– Apê mamoste ez dixwazim fêr bibim, gelo em dê çi bikin ji kal û pîrên xwe?

Mamoste ji ber vê pirsê wî şaş ma; gelo Azad dixwest çi bibêje?

– Azad herkes weke te jî nîne ku ji tiştên mîna pêderxistinokan fêr bike; heke tu ji min re meseleyê nevekî, ez ê nikaribim bersîva te bidim.

– Yanî çaxê bavê te pîr bibe û nexweş bikeve, dê tu ji bo wî çi bikî?

Mamoste dîsa fêr nekir bê mesele çi ye. Hinek fikirî û bersîv da:

– Tu jî baş dizanî ku keda dêûbavan bêsînor e; ger em bi salan wan li ser milên xwe bigerînin jî, em dê nikaribin heqê wê kedê bidin. Îcar çaxê ew jî pîr bûn, bêhal an jî nexweş ketin, pêwîst e ku em jî li wan xwedîtî bikin û bi her awayî alîkariya wan bikin û bibin cem doktoran ku zû baş bibin.

Azad serê xwe xiste ber xwe, gotin ji devê wî çenebûn; çend hêsir ji çavên wî hatin xwarê. Mamoste destê xwe di ser serê wî de bir û anî û pişt re jê pirsî:

– Bapîrê te nexweş e?

Azad ji dêliva bersîvê ve tenê serê xwe bi maneya “erê” hejand. Demeke xweş herdu jî bêdeng man. Zengilê ketina hundir bêdengiyê xera kir; mamoste bi milê Azad girt, ew rakir piya û wiha got:

– De ka em niha herin têkevin dersa xwe, piştî dersê em dikarin dûvedirêj xeber bidin.

*

Azad di wê dersê de û di dersên mayîn de dîsa bêdeng bû. Dinyaya wî tevlihev bû-bû. Wî qet bîr ne dibirê ku bapîrê wî nexweş bikeve û kes di malê de, li halê wî pirs neke yan jî ew nebe cem doktor. Tiliya wî yan jî ya dêûbavên wî biêşiyana, bangî doktorekî dikirin an jî ew dibirin cem doktor. Fêr nedikir ku bavê wî yan jî diya wî, çima li bapîrê wî xweyîtî nakin; tu mane jî ne didayê. Kijan civatê kal û pîrên xwe avêtibûn derva û ew bêxwedî hiştibû? Yê ku bavê wî, herdu apên wî û metên wî xwedî kiribû û mezin kiribû ne bapîrê wî bû? Ew dabûn xwendin, mezin kiribûn û zewicandibûn. Ev keda wî çi zû hatibû jibîrkirin? Çawa çêdibû ku mirov pîr bibe û ji ber wê jî bêxwedî bimîne?

Dema dersa dawî tewa bû, şagirt rabûn û çûn malên xwe. Azad jî bi van pirs û

xemên xwe rabû ku here, lê mamoste Bahoz nehîşt ku ew here malê. Mamoste ew bir odeya mamosteyan û da rûniştandin. Ji dolaba cemedê du colayên cemidî derxist, yekê ji wan dirêjî Azad kir û pê re jî jê pirsî:

– Azad, ez van rojên dawî li halê te dinihêrim û gelek pê diêşim. Ez dizanim derdekî te heye lê tu ji kesekî ji me re nabêjî. Ger mirov derdê xwe nebêje, derman jî nabîne. Ka ji apê xwe re bêje, çi ye ku wisan te dixe xem û xeyalan?

Azad devê şûşeya colayê vekir, qulpeke dirêj bi ser devê xwe ve berda û pişt re ew danî ser maseyê. Pêşî berê xwe da mamoste, hinek li dora xwe mêze kir û dîsa berê xwe da şûşeya xwe. Gotin ji lêvên wî dernedikerin; dixwest derd û xemên xwe bi-bêje, lê zimanê wî li hev ne digeriya. Bêdengiyek ketibû nav odeyê. Mamoste ne dixwest pirsê xwe dubare bike, wî dizanibû ku Azad ew bêbersîv nahêle. Bêdengî bi derî vekirinê re qut bû; midûrê xwendegê serê xwe xiste hundir û Mamoste Bahoz û Azad di odeyê de dît. Berê xwe da Bahoz û jê pirsî:

– Kek Bahoz dê hun zêde biminin?

Mamoste Bahoz serê xwe bi maneya “na” hejand û bersîv da:

– Hinek karê me heye, lê ez ne bawer im wê ku zêde dom bike. Belkî em niv se-etekê rawestin.

– Baş e, ne xwe ez jî li odeya xwe me, çaxê hun derketin, min ji çûyina xwe hayî-dar bikin ku em bi hev re derkevin.

Mamoste Bahoz serê xwe bi maneya “erê” hejand û piştî ku midur derket û derî li pey xwe girt, dîsan jî Azad pirsî:

– Tu jî baş dizanî ku zêde wextê me tune ye; ger tu bixwazî, em dikarin li ser derdê ku serê te diêşîne rawestin.

Azad bêyî ku serê xwe ji ber xwe rake, bi çend gotinan mamoste bersivand:

– Bapîrê min pirr nexweş e.

Mamoste çû li kêleka wî rûnişt û bi ber dilê wî da:

– Azad, herkes dikare nexweş bikeve; ew tiştekî normal e û însanî ye. Lê derma-nên pîraniya nexweşiyên jî hene. Bira wî bibin cem doktor, helbet wê dermanekî li gora nexweşîna wî hebe.

Azad serê xwe di ber xwe de bir û anî û bi hêrseke tevî girînê bersîv da:

– Ji xwe mesele jî ew e; kes wî nabe cem doktorekî!

Mamoste şaş û heyirî mabû:

– Çawa bapîrê te nexweş e û kes wî nabe cem doktor! Bavê te yan jî diya te nika-rin wî bibin cem doktorekî?

Azad êdî digiriya, bi destê xwe çavên xwe ziwa kir û berê xwe da mamoste:

– Bavê min heta evarê kar dike û pirr diweste; diya min jî niv dan kar dike û pişt re jî heta êvarê nayê malê. Min çend caran ji diya xwe re got ku bira wî bibe cem doktor lê her car jî bersîva wê “ne hewce ye; ew cimidiye, wê di çend rojan de baş bibe û rabe ser xwe” bû. Ya herf xirab jî kes naçe li halê wî napirse! Ev çend roj in baş û baş xwarin jî naxwo.

– Bapîrê te çend salî ye? pirsî mamoste ji Azad.

– Ez baş nizanîm lê ez bawer im temenê wî di dor şêstan de ye, bersiv da Azad.

Mamoste Bahoz ji kêleka wî rabû, hinek di nav odayê de geriya û pişt re berê xwe da Azad:

– Hêviyê min, kal û pîrên me tacên serên me ne; pêwîst e em li wan xweyîtf bikin ku bi vî awayî hinek be jî, heqê keda wan bi şûnde vegeftin. Tu niha rabe here malê. Doktorekî dostê min heye, ez ê îşev jê re tîlefon bikim û li ser navê te wextekî li cem wî veqetînim. Bira ber bi êvarê dema ku tu jî li mal bî, ew ziyaret bike û kontrol bike.

Azad hinek kêfxweş bû lê dîsa jî dudil bû. Berî ku derkeve ji mamosteyê xwe pirsî:

– Baş e, ez ê ji dêûbavê xwe re çi bibêjim?

Mamoste li pey wî ji odayê derket û ew bersivand:

– Tu bersîva xwe ji min çêtir dizanî. Tenê ji wan re nebêje ku min doktor şiyandiye.

Azad spasî mamosteyê xwe kir, xatir jê xwest û bi kêf ji xwendegehê çû malê.

*

Wê êvarê kêfa Azad hinek ketibû cîh. Bavê wî hê nû ji kar hatibû û li balkonê li ser sedrê dirêjkirî, rojnameya xwe dixwend. Bi hatina Azad nehisiya, rabû rûnişt û hê çav bi Azad ket. Rojnameya xwe li ser hev qat kir û danî ser maseya xwarinê û bêyî ku bixêrhatin bide wî, jê re got:

– Lawê min, ka ji diya xwe bipirse xwarina me hazir nebû?

Azad xeber neda, bêdeng ji wir çû jorê cem bapîrê xwe ku li halê wî bipirse. Bapîrê wî, jê ber êşa xwe hê jî di xew de bû. Azad çû li ber serê wî rûnişt, destê xwe bir ser eniya wî û hinek miz da. Bapîrê wî bi destê Azad hisiya û çavê xwe vekir:

– Azad, tu yî kurê min?

– Belê kalo ez im.

– Tu bi xêr hatî berxê min, dersên te îro çawa çûn?

– Qet nepirse, heta tu baş nebî dersên min jî baş nabin. Ka bixêr tu zû baş bibe,

dersên min rehet in.

– Lawê min tu tişteki min tune ye, ez tenê hinek bêhal im. Çend roj şûnde ez dîsan li ser piyan im. Lê heyrana kurê xwe bim, tu xwe ji dersên xwe bi şûnde nehêlî.

– Baş e bavo, baş e.

Bapîrê Azad piştî van gotinan dîsa bêdeng bû û kete xewa bêhaliyê. Azad matmayî li bapîrê xwe nihêrt û sitûxwarî ji ber serê wî rabû. Deriyê odeyê vekir û li pey xwe hêdî girt.

Li xwarê, diya wî xwarinê datanî ser maseyê. Çaxê dît ku Azad bêdeng û sitûxwarî ji qata jorîn tê, bangî wî kir:

– Azad, lawê min çi halê te ye? Tu nexweş î?

Azad qet bersîva diya xwe neda. Çû li ser sendelî rûnişt û berê xwe da derva. Diya wî, ji halê kurê xwe ne razî bû. Çi bûbû bi vî kurî? Van çend rojên dawî qet xeber nedida û baş xwarin jî nedixwar. Derdeki wî hebû gelo?

– Lawê min, ez halê te qet na ecibînim; derdeki te heye gelo?

Azad bêmad li diya xwe nihêrt û kurt bersîv da:

– Dayê ez baş im û ne nexweş im. Ji dêliva min, tu li halê yê nexweş bipirse.

Diya wî hineki bi ber xwe ket. Xwarin xiste firaqê û dirêjî Azad kir:

– Ha vê xwarinê ji bapîrê xwe re bibe, bira bixwo û bi ser xwe ve were. Du rojên din tişteki bapîrê te namîne.

Azad ji vê bersîva wê hê bêtir hêrs bû:

– Her roj ez dibim îro jî tu bibe û here halê wî bibîne. Kes tenê bi xwarinê jî rehet nabe. Divê doktorek ew kontrol bike, yan na halê wî pirt xerab e.

Diya wî li mêrê xwe nihêrt û hê bersîva kurê xwe da:

– Bapîrê te tenê westiya ye, ne nexweş e. Heke heta sibê, dusiban baş nebe, em dikarin wî bibin cem doktoreki. De rabe here xwarina wî bidê, heta sibê Xwedê kerîm e.

Azad li bavê xwe nihêrt, lê tu gotin ji devê wî dernediketin. Qet guhê xwe jî nedabû axaftina dê û kur. Ji hêlekê ve xwarina xwe dixwar û ji hêla din ve jî rojnameya xwe dixwend. Azad bêdil rabû piya, teyfika ku diya wî ji bapîrê wî re bi xwarinê dagirtibû ji ser maseyê girt û derket qata banî.

*

Roja din Azad hinek bi kêftir bû. Lê dîsa jî hişê wî li tiştên din bû; ji hêlekê ve bapîrê xwe difikirî ku wê îro doktor bihatina û ew kontrol bikirina û ji hêla din ve jî dê û bavê xwe difikirî. Herdu jî ketibûn dinyeyeke guhertî û ji berpirsiyariyên xwe

ji bîr kiribûn. Tu mane ne dida vê rewşa wan. Ji ber ku bûyereke wiha nehatibû serê wî û rewşeke wiha ne jiya bû, nizanibû çî bike. Bapîrê wî mirovekî qenc û hêja bû. Kesekî nerihet nedikir û ji her kesî re alîkar bû. Gelek çaran bi destê wî gir-tibû û bi xwe re biribû gerê. Jê re xwarin, şekir û şêrînahî dikirî û wî fêrî tiştên nû û hêja dikir. Ya herî girîng, ji zarokan gelek hez dikir.

Carekê bavê wî li ser kar nehiş ketibû û li malê tenê bapîrê Azad pê hisiya bû. Zû zûka bi ser ve çûbû û ev rakiribû cem doktor. Piştî rojeke dirêj û bi westan, ber êvarê bav û kur bi hev re bi kêf ketibûn hundir. Hê jî kesî ji malê rewşa bavê wî nebihîstibû. Piştî xwarinê bavê Azad serpêhatiya xwe ji wan re gotibû û hê tev pê hisiyabûn ku çî hatibû serê bav.

Pêwendiyên di nav bav û bapîr de pirr baş bû berê. Lê niha bavê wî zêde kar di-kir û wextê wî tune bû ku bi kesî re hayidar bibe. Baş û baş bi Azad re jî ne diaxift; ji kar westandî dihat û xwe dirêj dikir ta ku xwarin were ber wî. Ger êvarê civînek hebûna jî qasekî çavên xwe germ dikir û pişt re diçû civîna xwe. Derengê şevê di-hat û wê hingê jî tev di xew de bûn.

Çaxê serê salan an jî di cejnayan de malbar li hev kom dibû, teva rûmeta bapîrê wî digirtin û jê gelek hez dikirin. Wî jî ji tevan hez dikir û ferq nedixist nava zarokên xwe. Ji nebiyên xwe re diyariyên sipehî dikirî û dilên wan xweş dikir. Zarokan li dora xwe dida civandin û ji wan re çîrok û destanên kurdan ên kevn digot. Carinan jî serpêhatiyên xwe ji wan re digot. Azad û zarokên din, çîrokên wî bi diqer guhdarî dikirin û ji kêfa mest dibûn. Carinan jî zarokan dida leyistandin û ew jî beşdarî leystikên wan dibû. Keç û kurên wî, ji ber van kiryarên bavê xwe pirr kêfxweş bûn û bi bavê xwe serbilind bûn.

Carinan apekî Azad an jî meteke wî ew dibirin cem xwe û bi rojan li cem xwe dihiştin. Lê sebra bapîrê wî, zêdetir li cem Azad dihat; vê yekê jî bêtir kêfa wî di-anî. Her wiha sebra Azad jî nedihat çaxê ku bapîrê wî ne li mal bû. Ji lewra jî ew rojên ku bapîrê wî vedigeriya malê, ji Azad re mîna cejnê bû. Bavê wî jî bêyî bavê xwe tebat nedikir; her roj ji Azad dipirsî ka ew hay ji bapîrê xwe heye. Ger tu-nebûya, ew dişand cem bapîrê wî û rewşa wî dida pirskirin û pirsî ka wê kinge ve-gere malê, dida pirsîn.

Lê niha qet hay ji bavê xwe tune bû; lê pirs nedikir û ew ne dibir cem doktor. Xerîbiyek di halê wî de hebû; lê ka çî bû, Azad wê fêm nedikir. Lê ne xem bû, wê îro doktor bihatina û bapîrê wî kontrol bikirina. Piştî ku derman jî bigirtina, wê bi carekê re rehet bibûna.

Mamoste ferq kir ku îro hinekî rewşa Azad çêtir bû. Rewşa Azad îro hinek çêtir bû, ferq kir Mamoste. Bi hevalên xwe re xeber dida û carinan jî beşdarî nîqaşan dibû. Her wiha bi hevalê xwe Rêzan ku li kêleka hev dirûniştin, re jî diaxîfî û pê re dikeniya. Ev elamerê başiyê bû, ramiya mamoste Bahoz. Pê re kêfa wî jî hat ku karibû alîkariya wî bike. Li ser wê rewşê hê bi eşqîr li ser dersa xwe rawestiya.

Dema ku zengilê dersa dawî lê ket, Azad pirtûk û pênivîsên xwe xiste çenteyê xwe û li mamosteyê xwe nihêrî. Ew jî bi çenteyê xwe ve mijûl dibû û xwe amade dikir ku here malê. Piştî ku şagirtan bi carekê xatir ji mamoste xwestin, çavên Azad û mamoste hatin pêşberî hev. Çavên mamoste jê re dikenyan; serê xwe bi hêdîka ji Azad re weke ku bêje "hay ji bapîrê xwe hebe" hejand. Azad jî devliken serî jê re hejand û ji sinifê derket.

Bêsebir xwe li nav hevalên xwe da û ji deriyê dibistanê derket. Çenteyê wî li milê wî, bi lez xwe gihand ber deriyê hewşê û dest bi bazdanê kir ku zû bigihîje malê. Di rê de qet nesekinî; kesên ku ew nas dikirin, ji ber bazdana wî li halê wî dipirsîn, lê Azad tenê devliken destê xwe ji wan re bilind dikir û baz dida. Dema gihîştibû malê, di xwîdanê de mabû. Zû çû odeya xwe, cilên xwe yên dibistanê ji xwe kir û piştî ku dest û rûyê xwe şûst, cilên xwe yên din li xwe kir. Piştî re hat li kêleka bavê xwe ku rojnameya xwe dixwend, rûnişt.

Diya wî tu maneyekê ne da halê kurê xwe. Hêviyê ku van çend rojên dawî bêmad û xeydokî bû, niha bi kêf bû. Çi qewimî bû gelo? Ecêbmayî derbasî mitbaxê bû ku şîvê bîne ber wan. Hê dest bi xwarina xwe nekiribûn, zengilê derî lê da. Azad bêsebir ji cihê xwe rabû û çû derî vekir. Zilamekî navsere, çenteyek di destê wî de kete hundir û silav da Azad û xwediyê malê.

Bavê Azad doktor Zerdeşt nas dikir; lê tu mane nedayê ku vê berêvarê çima hati-bû mala wan. Tevî pirsên di serê xwe de silava wî vegerand û bixêrhatin da doktor:

– Li ser seran û çavan ezbenî, tu bi xêr hatî. Kerem ke danîşe. Wa şîva me jî hazir e, em bi hev re bixwin.

Doktor jî fêm kir ku bavê Azad şaş maye, lê di mahdê xwe de dernexist:

– Spas kek Bahoz, lê pêşî divê ez li nexweşê xwe mêze bikim. Bi destûra we be.

Bahoz hê bêtir şaş bû; kî nexweş bû di vê malê de û haya wî jê tune bû!

Doktor berê xwe da Azad û :

– Azad, ka bide pêşiya min ku em herin li halê nexweşê xwe pirs bikin, got.

Azad bêyî ku tişteki bibêje û berê xwe bide bavê xwe, kete pêşiya doktor û herdu çûn jorê, odeya bapîrê wî.

Bahoz û jina xwe li xwarê bi hev ketibûn. Bavê Azad bi ser diya wî ve hêrs dibû ku çima jê re behsa nexweşîna bavê wî nekiribû. Her wiha bi ber xwe jî ketibû ku ne wî, lê kurê wî doktor anîbû malê.

Diya wî bê bersîv mabû, lê wê bawer nedikir ku bapîr pîr nexweş bû. Li gorî baweriya wê, ew cemidîbû û ji bo her sermayê jî meriv bangî doktor ne dikir.

Wan hê nîqaşa xwe didomand, doktor xwe berda xwarê û li pêşberî Bahoz rûnişt. Herduyan bi meraq li doktor dinihêrtin û li hêviya bersîvekê bûn. Doktor dermanê nexweş nivisand û kaxezekî jî da bavê Azad:

– Baş bû ku min îro ew kontrol kir. Çend rojên din bimana, nexweşîna bavê te lê giran dibû û belkî tu dermanan jî lê feyde nekirina.

Bavê Azad bêsebir ji doktor pirsî:

– Bavê min nexweş e? Çi ye nexweşîna wî?

– Ezbenî, ez bawer im ew ji cegera xwe nerihet e. Divê hun wî hima sibê bibin rontgen bikin û filîmê cegera wî bikşînin. Min niha hebekê da wî, wê heb heta sibê êşa wî bide rawestandî. Piştî ku we filîmê wî kişand, bînin cem min da ku ez dikaribim dermanekî li gora wî bidimê.

Bahoz ji şerma û ji hêrsa nizanibû çî bibêje; pîr bi ber xwe diket. Doktor ji halê wî fêhm kir û xwest ew tesellî bike:

– Tişteki ku meriv niha jê bitirse tune ye, em dereng jî nemane. Dermanê her nexweşînê jî heye, qet meraqan nekin.

Pişt re jî biken li Hêviyê ku hê hat cem wan û rûnişt nihêrt û berê xwe dîsa da bavê wî:

– De ka em şîva xwe bixwin, heta sibê jî Xwedê mezin e.

Piştî şîvê, doktor du qedeh çay jî vexwar û ji wan xatir xwest. Çawa doktor ji malê derket bavî wî jî Azad pirsî:

– Lawê min, te çima ji me re nedigot ku bapîrê te nexweş e? Tu çima me wisan didî şermê?

Azad pêşî li diya xwe nihêrt û dûv re bersîva bavê xwe da:

– Bavo, ev çend roj in ku ez dibêjim bapîrê min nerihete û nexweş e, lê kes min guhdarî nake.

– Te ji kî rê gotiye? bi hêrs bavê wî pirsî.

– Min ji diya xwe re jî got û tu jî li vir bû yî! bêxeyd bersîv da Azad.

Bavê wî bi hêrs berê xwe da diya wî lê tişteki negot. Diya wî ji ber van awirên mêrê xwe û rewşa îro pîr bi ber xwe ket:

– Tu çima hêrs dibî û van awiran didî min! Gelo ev çend roj in tu vale bûyî ku li

bavê xwe bipirsî? Tu ji kar têyî û xwe dirêj dikî yan jî dikevî xewê! Min jî nizanibû ku ew hewqas nexweş e. Em tev bi rojan diwestin û xîret nakin ku li halê wî bipirsin. Min di got belkî weke her car serma girtiye; ez ji kur zanim ku nexweşîna wî wisa giran e?

Bavê Azad ji hêrsa û ji fediyên nizanibû çî bike. Dixwest here cem bavê xwe lê şerm dikir. Li Azad dinihêrt, fedî dikir û nedixwest çavên wan werin pêşperî hev. Li jîna xwe dinihêrt, hîn bêtir hêrs dibû:

– Malmîratê, tu nizanî ku ez ji halê xwe dikevim! Madem Azad digot, te çima rojekê li halê wî nepirsî? Em ê çawa li nav çavên hev binihêrin piştî vê yekê. Em ê çî bersîva kurê xwe bidin?

Diya Azad dengê xwe nedikir, tenê bi destmala destê xwe, hêsirên çavên xwe ziwa dikir. Bavê wî di nav hewşê de diçû— dihat û difikirî. Ji nişka ve ji hewşê derket derva û bi lez kete nava kuçeyan. Piştî demeke xweş, vejeriya û li kêleka kurê xwe rûnişt. Destê xwe avêt ser serê wî, rûyê wî maçî kir û ew himêz kir. Bav û kur demeke xweş wisa di himêza hev de man. Azad fêm kir ku bavê pîr bi ber xwe ketibû û hêsir ji çavên wî dihatin. Piştî bav hinek bêhna xwe berda, berê xwe da kurê xwe û bi awayekî sûcdar:

– Kurê min, li min bibore, got. Me sûcekî mezin kiriye lê ne bi zanebûn. Ger min zanibûna, ma min bavê xwe nedibir cem doktor? Lê çavên min kor bin, ma ez çawa li bavê xwe napirsim! Lawê min, sûcê me pîr mezin e... Min bibexşîne. Ez ê ji bavo re çî bêjim û çawa li rûçikê wî mêze bikim niha?

Azad jî nikaribû zêde xeber bide; ew jî digiriya. Piştî ku hinek rehet bûn, bavê wî jê pirsî:

– Hêviyê min, ka em çî bikin? Ez fedî dikim ku herim cem bavo. Tu bide pêşiya me, belkî me ji bo xatirê te efû bike.

Azad serê xwe bi maneya “na” hejand:

– Hûn bi xwe herin çêtir e. Bavo ji kesî nexeyidî ye û ji kesî jî aciz ne bûye. Herin li halê wî bipirsin û sibê jî wî bibin cem doktorê rontgenê.

Bavê wî stûxwarî rabû piya û berê xwe da qata jor, odeya bavê xwe. Pişt re dîsa bi hêrs li jîna xwe mêze kir û hêdî hêdî ber bi odeya bapîrê Azad ve kişiya. Sêvêya diya wî jî stûxwar û şermezar da pey mêtê xwe.

Azad li halê wan mêze kir, girîn kete qirika wî. Çavên wî tije hêsir bûbûn. Meriv çawa kal û pîrên xwe ji bîr dikir, bi temenê xwe yê biçûk fikirî. □

Çend gotin di derheqa zimanê Rojan Hazim de

Laleş Qaso

Di hejmeta Nûdemê ya 19'an de nivîseke Rojan Hazim di bin sernavê "Ronakbîr û ronakbîrî" de hatibû weşandin. Li gor nerîna min, Rojan Hazim di vê nivîsa xwe de gelek şaşiyên rêzimanî kirine. Ez dixwazim bi kurtî li ser hin şaşiyên wî rawestim.

Hazim bi rêz û tertîp wilo nivîsandiyê:

"Pirsa întellektualiyê **anjî ronakbîriyê di her demî û her civatê** da hatiye axivtin û **riberizên** kûr û fireh li ser hatine kirin. Lê belê, **her kesê anjî aliyekê** li gorî xwe mana kiriye û çu caran konsensusek jî pêk nehate li ser vê pirsê ronakbîriyê! Gelo çu ye ronakbîr? **Anjî kî ye ronakbîr?..**"

Di vir de pir vekiriye ku hevok xwar saz bûne. "Di her demî û her civatê da" ne vêl e gelo? Dem û civat wek bêje çawa mirov dikare berhev bike? "Her kesê anjî aliyekê" ahenga zimên xera nake gelo? Nivîskar ji bilî ku hevokan xwar lêke, "Kesê-aliyekê" her du jî mê

xebitandine. Di vir de li gor tekstê gelo ne vekiriye ku nivîskar divabû bigota, her kesî an jî aliyekî? Heta derekê belkî mirov karibe pronava kesê, *mê* qebûl bike; belê bêjeya *aliyekê* wê mirov çawa bi nav bike?

Lêkera *raberzîn* kiriye "riberiz" Ji -ri- (prefîks-pêşkî) û lêkereke sade, lêkereke hevdudanî pêk nayê. *Ri-* ya ku nivîskar bi kar aniyê ji *ra* pêve ne tutişt e. Yanî *ra-berzîn*. Di vî warî de bi sedan lêker hene.

"Ravekirina vê bêjeyê relatîv e û li gorî her dîtin û her kesê tete guhartin." Hevok ne xwar e gelo?

Nivîskar, "Ev bêjeye şaş bi kar têt." dibêje.

Mirov, ev bêjeya ha ... dibêje; daku zayenda wê bê naskirin. Di vir de "bêjeye" bêzayend pêşkêşî me kiriye. Bêje navdêreke mê ye. Belê di cihekî din de jî gotinê, *mê* raberî me dide. Wek ku mînak: "Demê em bêjeya rewşenbîr..."

Di teksta Hazim de navdêrên bêzayend pir in. Wek mînak:

"Berheme, ev kare, ev kategoriye, ev bizave, ev aksiyone, ev rewşe, ev kese, ev bêjene" û hwd.

Hazim li gor formê "berheme" diçe û dibêje:

"...Eve jî herweha helwesta ronakbîriyê ye. Eve ji bo rojnamevan jî derbaz dibe... Eve bi temamî... Gerçê eve..." û hwd.

Berî her tiştî di kurdî de pronaveke "eve" tune ye. Xwediyê wî zimanê Celadet problema "ev kare... ev berheme... eve..." û hwd. wilo dide zanîn:

"Ha. Ev bêje ji texlîtek pronaveke îşarkî ye. Ev pronav dikeve paşîya pronavên îşarkî ên pîvene û bi veqetandekê digihê wan û fikira îşaretkirinê xurt dike:

Evê ha Eva ha Evên ha

Ewê ha Ewa ha Ewên ha

Ji milê din ev pironava ha dide pey navdêran jî û bi veqetandekê bi wan ve dibe:

Mirovê ha Mirovên ha

Jinika ha Jinikên ha"

Hewar. Bîngêhên gramera kurdmançî, bend, 98.

Nivîskar, "eve" di şûna eva/evê ha... de bi kar anîye. Ji dêvla ku bigora, ev berhema ha... "ev berheme..." gotiye. Belê ne Celadet vê yekê wek qayide qebûl dike û ne jî pirên kurdan vê pronava ha wek ku nivîskar nivîsiye dixebitî-

nin. Îcar mirov bide dû kê wê baştir be gelo?

"Di bîngêhê da, 'Rewşen' forma xirabbûyî ya 'Roşen'ê ye."

Nivîskar ji bo ku hevokeke pevgirtî saz bike zor daye zimên. Yanî ziman ne xweş kiriye. Bêjeya bîngêh wek rengdêr xebitandiye. Belê ji bîr kiriye ku daçek (propozisyon) nayê pêşîya rengdêrê. Daçek dikevin pêşîya navdêran. Wek mînak:

Mirov di bîngêhê xwe de... an di bîngêhê de... an di esasê xwe de... û hwd. dibêje. Mirov nikare di sor de, di şîn de, di reş de, belê mirov dikare di sorayê de, di şînayê de, di reşayê de bibêje. Wek rengdêr tu ferqa bîngêhî û sor, reş û şîn û hwd. ji hev tune.

Hazim vê carê jî tam pê de diçe:

"Di xwezayê û sîstemên peywendiyên hebûnên jînde da her kiryar xwudan maneyek e û beramberî wê kiryara xwe bi bêjeyekê ve tete binavkirin. Di mirovi da navenda aksiyona hiş, bîr û ramanî, organê mejî ye."

Hevok xwar e û ziman dîsa bi ser hev de guvaştîye. "Di mirovi da" çi ye? Gotinek wilo di kurdî de tune ye. Di vir de eger nivîskar xwestibe *di mirovi da* ... bibêje, wî çaxî jî wê çewtiyeke dualî derkeve pêşîya me. Belê a herî balkêş îcar ku nivîskar, ji me re, hiş, bîr û ramanê wek organ rave dike. Gerek bigota, mejî organê hiş, bîr û ramanê ye. Mixabin wilo nabêje; berevajî hev dike

û dibêje. Bi zimanekî bê vir de û wir de: Hewa çi be, hiş, bîr û raman jî ew e. Mîrov hewê nabîne heta ku mirov wê wek organ binirxîne. Belê mirov tesîra wê dibîne. Ew bû tiştekiî din. Hiş, bîr û raman jî wilo ne. Di vî tewî de ez bawar dikim ku nivîskar jî wê wek min bifikirre. Birêz Hazim bêjeyên pir ecêb pêşkêşî me xwendevanan dike. Wîlo:

"Di dîroka mirovahiyê da li ser hemû branşan, bi sedan'zana û alim' derketîne ku bi zanîn û kiryarên xwe **bûyne** asteng li ber pêşveçûna mirovahiyê. Îro jî hene û karê wan ne xizmeta **ronakiyê** ye, xizmeta **tarikiyê** ye. Ev **kese** çawa dibin ronakbîr! Eve bi timamî **tarîkbîr in!** Belê, **tarîkbîr!**

...Ronakbîr gava gihîşte ideala xwe, ideal dîsa jê dûr dikeve û vêca divê bo wê idealê têbikoşe. Anku ideal bêtixub e û divê ronakbîr **her di bizavê da** be bo wê ideala bêtixub. Îdeala baş ew e ku gava mirov nêzîk bû dîsa dûr bikeve... Eve ji xwe prosesek e û bi têkilbûn û aktîvbûna kedkarên **bîrî û ramanî** dê bikeve xizmeta mirovahiyê û timamî **jîndehiyê** li cihanê. **Li kî derê** neheqî, bêdadî, nerewayî hebe, ronakbîr divê bi dîtî, gotin û **helwestê**, xwe nişan bide û bo **dadî**, rehetî, serfirazî û rûmeriya mirovahiyê û pêşketin û xweşiya xwezayê têbikoşe.

...Nişan kirina vê rewşê, têce wê manayê ku; Kurdistanê û bizava gelê Kurd hewcehiyeke mezin bi ronakbîran heye.

Hem bi **kesînî**, hem jî bi **rêxistinî**"

Naveroka tekstê li dera ha bihêlin, ji aliyê zimên de mirov êdî heq jê dernayê ku çawa birukubîne! Ziman pir selixandî ye!

"**Bûyne**" dibêje nivîskar. Di vî warî de du form hene:

a) Bûyin

b) Bûn. Xuya ye ku ew li gor formê kevn çûye. Belê mixabin ew jî çewt nivîsiye.

Nivîskar "**Ronakiyê**" dibêje.

Ro navdêreke konkret e. Ji vê navdêra konkret Ronak/ronahî/ronayî/ronatî veketiye. Ji rengdêra ronak ku abstrakt e, bêku mirov ro-n-ahî/ayî/atî bibîne, mirov çawa dîsa dikare bi navê "ronakiyê" navdêreke abstrakt biafirîne? Min nebihîstiye ku kurdekî ji ronahiyê an ronatiyê re, "**ronakiyê**" gotiye. Ji ber hindê, bi gramerî, sirê vê çi ye? dixwazim hîn bibim.

Nivîskar dîsa li gor formê, "**ronakiyê**" çûye û ji tarîtiyê re "**tarîkiyê**" dibêje. Belê bi rastî wek xwendevanekî min fêm nekir bê ev **tarîkbîr** çi ye? Eger tarî rengdêr û tarîfî jî navdêr be îcar ev **tarîkbîr** çi tişt e gelo? Dixwazim ku nivîskar vê yekê ji me xwendevanan re rave bike.

Mîrov ji dêvla "**li kî derê** neheqî...hebe" li kuderê neheqî... hebe dibêje. Li gor Celadet, **kî** pronaveke pirsyarkî ye; di şûna **cih** de nayê xebitandin.

Nivîskar, "**bîrî**" dibêje. Bîr -ewer -î

heye. Bîr navdêreke konkret e, bîrewer rengdêr û bîrewerî jî navdêreke abstrakt e. Îcar ev "bîrî" çi ye gelo? Eger "bîrî" navdêr an rengdêr be, baş e, em ê bêjeya bîrewer û bîreweriya ku kurd bi sed salan dixebitînin, bi ku de şeg bikin?

Di gramera kurdî de, kes -î -ê -ên— a/ha... heye. Belê gava mirov bixwaze ji bêjeya -kes- rengdêrekê biafirîne, *kesîn* dibe (yanî pronava kesîn). Gelo wî, "kesîni" bi awayê pronav, navdêr, rengdêr an jî gelo bi navê tiştekî din kar aniye? Ez ji birêz Hazim pişteka *kes*, bê çawa dibe "kesîni" dixwazim hîn bibim.

Rojan Hazim di cihêkî din ê nivîsa xwe de wilo didomîne:

"...Belê mî dîsa ronakbîr, di bîr û helwesta xwe da heke î girêdayî be, hingê nikare erkên xwe yê ronakbîriyê bi dilê xwe bîne cih.

...Herweha ronakbîr, di helwesta xwe da divê ne î hişk, asê, agresîv û negatîv be, lê herwisa divê ne î nermo, pasîf belêgo jî be! Divê teraziya bîrî û helwesta xwe di pratîkê da baş ragire.

...Helbet ronakbîrê ku di van şertan da gihiştî dê î çawan be?"

Ez ê li ser ku hevok çendî vêl in tiştekî nebêjim. Çimkî pir belawela ye. Dema ku navdêrek an pronavek bi rengdêrekê an bi du rengdêran hat wesifandin, eger navdêr nêr be (î) an jî ji dêvla(î), belkî fitû hebe ku mirov karibe bi, (ê)yekê jî vê wesifdanê bike. Îcar gava navdêr mê

be (î) dibe (e) û pirhejmariya her du zayendan jî dibe (en).

Wek mînak:

Serê me î hişk-serê me ê hişk. Di esasê xwe de li gor Celadet a rast gerek me jî dêvla, (Serê me î hişk-Serê me ê hişk) binivîsanda.

Heso dolemendekî merd î bi cesaret e. Gulnaz qîzeke delal e lihevhatî ye. Ji bilî (î) bi (û) jî mirov vê yeka ha dikare vepejilîne:

Heso dolemendekî merd û bi cesaret e. Gulnaz qîzeke delal û lihevhatî ye. Pirhejmariya wê: Kurd mirovine mêrxas en dilkeçikî ne û hwd.

Birêz Hazim dibêje ku:

"Jiyan ne rawestek e. Jiyan bi serê xwe bizav e, têkoşîn e. Ronakbîr **kedkarê mejî ye**. Ew bi **karê mejiyî ve mijûl e**. **Berhemên mejiyî...**" û "...belê mî rewşa gel û welatê xwe ya li ber çawa jî bila **birêjin ser kaxezê**"

Li gor ferhengên kurdî bêjeya "rawestek," frênê terempêlê ye. Hin gotinza nên me jî mîna kemalîstên tirk ên wextekê ku ji aşxanê re (otlangaç), ji qedemgehê re (siçtirgaç), ji frên re (dûrdûrûcû) û hwd. digotin, bêjeya frên wek (dûrdûrûcû) xistin zimanê me. Nebaş kirin. Li zimên nayê. Bi zimanekî vekirî:

Gelo mirov ji jiyanê re dikare, *jiyan ne frên e* bibêje. Eger nivîskar "rawestek" bi hesabê rawestgeh (yanî dûrak) xebitandibe, dîsa jî çewt e. Mirov nika-

re bibêje, *jiyan ne rawestgeh e*.

Ya din:

"**Ronakbîr kedkarê mejî ye**" bi kur-mancî nabe. "**Ew bi karê mejiyî ve mijûl e**" li kurmancî nayê. Ez fêm nakim bê çima tu nabêjî, ew bi karekî întellektuelî dadikeve an mijûl dibe. "**Berhemên mejiyî**" di kurdî de nabe. Ji dêvla a te mirov wilo dibêje; berhemên zanistî, berhemên edebî, berhemên kulturî û hwd.

"...belêm rewşa gel û welatê xwe ya li ber çava jî bila **birêjin** ser kaxezê"

Rijandin lêkereke negatîv e. Bi kurtî, rewş nayê rijandin; tê ber çavan, tê fikirandin û hwd.

Hazim di gelek cihan de zayenda gotinê geh kiriye mê û geh jî kiriye nêr. Hingî ku ewqas in, tenê hema ez ê du-duyan bibêjim:

"Rewşa gel û welatê xwe... Li milê dî..." û gava hatiye hesabê wî, "...Wela-tekê bi dest diêxe. Ew li milêkê..." dibêje.

Mirov di nivîsa Hazim de pêrgî gelek şaşiyên rêzimanî dibe. Ev şaşî û kêmaniyên rêzimanî mixabin nivîsa Rojan Hazim ya balkêş lawaz dike. Hêvîdar im ku birêz Hazim li ser şaşiyên destnî-şankirî raweste û ji me re gelek nivîsên wilo balkêş binivîsîne. □

Helepçe

Roj reş e

Ewran bi ser me de girtiye

Berf û şilf nabare

16'ê adarê ye tu zanî

Enfal mêvanê me ye

Kîmyayiya nebixêr.

Roj

Li pişt Araratê ro çû ava

Rûpelê rojekê dîsa hate girtin

Dîsa şeva xemgîn û kesertijî

Dîsa ronahî çû tarî hat

Gul çilmisîn şevrevînk firê ketin

Rûbiken çûn bi mirûz hatin

Azadî ji bîr bû zîndan bi bîr hat

Jiyan paş de ma, xewnên xerab em
girtin

Mustafa Aladag

Qedera Celadet Bedir-Xan di "Bîra Qederê" de


Maruf Yilmaz

Di vê dema dawiyê de romaneke bi navê "Bîra Qederê" derket. Nivîskarê wê Mehmed Uzun e. Wî bi romana "Bîra Qederê" hêjayiyeke nûh li edebiyatê zêde kir û kurd kirine hevparê edebiyata cihanê. Romana "Bîra Qederê" ji aliyê Weşanên Avestayê ve li Stambûlê hatiye weşandin. Tê de şanzdeh fotograf dipeyvin û bi temamiya xwe 260 rûpel e.

Min romana "Bîra Qederê" bi eşq û ji dil xwend, kêfa min lê zêde bû, pirtûkê ez birim nav cihana xwe ya mirovane; min dawî lê hanî, lê dîsan ez lê vegeyriyam, min ew xwend û xwend, ez ketim nav cihaneke xweş, di nava wê cihanê de gul û sosinên rengîn û serpêhatiyên jîbîrvebûnê...

Bi çi hawayî û bi çi rengî dibê, bila bibê, em dikarin bibêjin; Mehmed Uzun hîmdarê romana kurdî ya li bakûrê Kurdistanê ye.

Di romanê de gava qala eşqa Canan û Celadet dibê,



M. Uzun/Bîra Qederê
Weşanên: Avesta

peyv û gotinên folklorî; nîve-rokîtk in, tam û lezeta folklorê kurdî kêr jê tê. Ev tişt li qalîteya romanê hîkarî nake, lê ji aliyên erotîka folklorî ya gunditîyê ve jî romanê bi goşt û xwîn jî nake. Yanê Mehmed Uzun bi zanebûn gotinên mîr û began bi kar anîye; peyvên folklorî yê mîna memikên yarê, baxçê gulên, xal û xetê memikan, çavên reş û belek, sîng û berê yarê, şewq û şemalê dida bejn û bala Celadet,

nexwestiyê ku bi kar bîne. Ji ber ku li ba Mîr û Begana gotinên sivik şûna xwe didin gotinên giran; bejna Cananê zirav û dirêj e, ango porreş û dirêj e. Mîr û beg giran in û gotinên giran bi kar ûnin.

Digel vê yekê jî, romaneke modern û xweş e.

Nivîskarê "Bîra Qederê" mîna kameravan û wênêkêşekî pîralî berê xwe dide kok û bingeha bûyeran...

Ji serî ta dawiyê "Bîra Qederê" jîyan û berxwedaneke Celadet û malbata wî li ber çavan radixe. Jîyan û berxwedaneke pîralî û birûmet. Ji navê jîyan û berxwedana kurdan e, bala min çû ser weşandina kovara Hawarê û bela-welakîrîna malbata Bedir-Xaniyan.

"Bîra Qederê" bersiva van pîrsan dide:

1. Celadet Alî Bedir-Xan kî bû?
2. Piştî mirina Celadet, kar û xebatên wî jî mirin?
3. Hawar û Ronahî ku bi hezar diwariyan derdixistin,

dê di nav rûpelên dîrokê de birizin, herin?

4. Dîrok dê her tiştî înkâr bike, bêyî ku li pey xwe şopekê bihêle?

Lehengê "Bîra Qederê" Celadet Alî Bedir-Xan e. Malbata wî di dîroka Kurdistanê de roleke sereke leyistiye, heger mirov vê yekê nizanibe, mirov nikare dîroka Kurdistanê hîn bibe. Bapîrê Celadet Mîr Bedir-Xan Paşa, di destpêka 1840î de li dijî Osmaniyan serî hilda. Lê serhildan bi ser nakeve, têk diçe, Mîrê herî mezin yê Cizîra Botan hat jicîhrakirî-nê (sûrgûnkerin). Ji bêçarebû-nê berê xwe da Sûriyê, li Şamê bi çîh bû. Di sala 1868an de Mîr Bedir-Xan, ji welatê xwe dûr, li Şamê çû ser dilovaniya xwe. Celadet di sala 1893an de li Stambûlê ji dayîk bûye. Ew kurê Emîn Alî Bedir-Xan bû ku(1851-1926), tevî birayê xwe, li dijî Osmaniyan serî rakir(1889). Piştî têkçûna serhildanê reviyar, berê xwe dane xeribiyê.

Bi hatina Komara Tirkîyê ve, rewşa kurdan xirabtir dibe, Xelîl Ramî ji Tirkîyê hate dûrxistin. Mîr Celadet Bedir-Xan ji malbateke wisan dihat. Ew û birayê xwe Kamuran, di sala 1922an de çûn Almaniyayê û li wir bi çîh bûn; dest bi zaningeha bilind kirin. Celadet xwest ku vegere welatê xwe, lê

dewleta Tirk rê li ber wî û malbata wî girt, berê xwe dan Misirê, ji wê derê jî çû Sûriyê; li Şamê bi çîh bû. Dîsan 1932an de dest bi weşandina "HAWARÊ" kir. Wekî tê zanîn, Hawar di nav kovarên kurd de çîhekî taybetî û girîng digire. Di warê weşanê de Hawar berhema Celadet ya herî giranbiha û hêja ye. Bi Bîrû-baweriyên min, Hawar kovara herî jîndan û bikêr ku piştî damezrandina Komara Tirkîyê, ji aliyê Celadet, tevî bira û hevalên xwe, Qedîrî Can, Osman Sebrî, Cemilpaşa, Rewşen Bedir-Xan û hwd ve. diweşandin. Bîra Qederê bi taybetî li ser van kar û xebatên Celadetî radiweste û wan bi hostayî dramatîze dike.

"Celadet Beg dizane ku êdî dereng e, yan na, di esasê xwe de, wî romanekê diviya. Romanekê nûh ku wext, dewr, dewran û kesên mirî û çûyî bigihanda hev, ecêbiya hatin û çûyî-nê, jiyîn û mirinê vebigota."

"Bîra Qederê", ew bi xwe kameraya dema Bedir-Xaniyan e, ku hemû rengên jiyana wan, di nav xwe de civandiye, yanê ew jiyar bi xwe ye, dikare hêstirên di çavên sêwiyar de bide bişirandin û kenê şerîn.

Nişên nû bi ronahî û şopên Celadetî, bi evîn û tekoşîna

wî, agirê azadî û serxwebûnê, di qonaxeke nû û nûjen de didin domandin, dibêje Bîra Qederê.

Piştî mirina Celadet êdî fotograf û tabloyên dîrokî dipeyvin. Fotograf bi xwe vejan-dina miriyan e, yanê vegera miriyan e; nemiriya mirov û mirovahiyê...

Di wî warê de wisan hatiye nivîsîn;" Jiyana jicîhrakirî-nê(sîrgûnê) ya Emîn Alî Beg û mala wî, piştî rêwîtiyeke dijwar, di kêleka bajarê Akkayê de dest pê kir. Bedir-Xanî her yek bi derekê de hatin şandin. Keştiyan ew, mîna pêlên payîzê ku yek bi yek ji darê diweşin, li dever û bajarên nenas peya kirin; Evdilrezak Beg Alî Şamil Paşa, Osman Paşa, Mithed, Hesen, Xelîl Beg li Trablusgarbê hatin peya kirin û zindankirin. Yên din jî li Rodos, Nabblus, Şam, Akka, Yemen, Tayîfê û hin bajarên din hatin belavkirin".

"Bîra Qederê", vegera miriyan û dengê wê demê ye. Mirov tê de hemû aliyên jiyane, rojên sîrgûnê, li welatê xeribî û biyanistanê, Xoybûn û hêviyên rewşenbîrên kurd ên wê demê dibîne. Li milê din, bêbext û zilma Osmanî û Mista-fa Kemal jî di nav beşên "Bîra Qederê" de xuya dikin. Di rûpelên "Bîra Qederê" de em bûyerên mezin dibînin, ên ku

romannivîs in, dikarin bibêjin, ev e romana giran û bilind a ku mêjiyê mirov diçeliqîne û nêrînen xwe dike nav xwîn û hesiyên xwendevanan, bi serê xwe şoreş e, ji nû ve zayîn û vegera miriyan e. "Emîn Alî...Welê dixuye, kalitî êdî zora min dibe, bi ken, ji civatê re dibêje. Em çawan bikin, halê dinyayê ye... Lê tîrsa min ew tîrs e ku ez nikaribim herim welatê bav û kalan û ez serbest û azadiya axa bav û kalan nebînim...çavvekirî, bi vê hesreta kambax, herim diyarê rehmetê... Civat li ber van gotinan dikeve, ji kesî deng dernakeve. Ew, bêdeng, li hev dinêhêrin. Haya wan ji zehmetî û aloziyên li ber kurdan heye. Kurd ne dewlet in, nebûne dewlet û tu dewlet jî, bi dil û can, xwe nade ber doza kurdan."

Dişan em dibînin ku tenê navên dewlet û bajarên biyanistan; Munixê(bajarê Almanayê), Stambûl, Rodos, Nabbulus, Akka, Yemen, Tayif, Şam, Misirê derbas dibin, lê ne bajarên Kurdistanê, yanê ew li sirgûnê dijîyan).

Em bi temamî li ser nave-roka vê romanê rabiwestin, baş bihizirin, em dê bêne ser vê hizirê, ku berhema "Bîra Qederê" bi naveroka xwe ve kom dibin ser van xalan:

1) Celadet û malbata wî, di

dîroka de roleke sereke leyistîne; 2) destpêka sedsalê, seraya Osmanîyan, Stambûla kevn, pîra Galatayê, Kadiköyê, Stambûl ; 3) têkçûna serhildanên kurdan, sirgûn, bela-welakirin û fermana Bedir-Xaniyan; sirgûna Emîn Alî Beg, Evdîlazzak Beg, Mîthed, Hesen, Xelîl, Alî Şamil Paşa û yên din li Trablusgarê hatin peya kirin û zindankirin; 4) Xoybûn, kar û xebatên siyasî (rêberên nûh ên partiya Xoybûnê; 5) nakokî bi dewleta tirkî re, efûya giştî ya Mistafa Kemal, ji bo ku quweta li dijî dewletên derveyî kom bike, piştî serketinê, zimanê kurdî qedexa dibe; 6) pîrsa Kurdistanê, serhildanên Bedir-Xaniyan, 1840, 1878, 1889...

7) piştî Şerê cihanê yê yekemîn ku împaratoriya Osmanî hilweşî û li cîyê wê komara Tirkîyê saz bû, rewşa Kurdan hîn bêhtir xerab bû. Kurdan dijî zilma hukumeta Ankarayê di salên 1925-1927-28an de sê serhildanên mezin nîşan dan, lê ew jî, ên din ji hemû hatin pelixandin; 8) herdu şerên cihanê yên yekemîn û duhemîn; 8) awayê xebata edebî; Hawar Ronahî, Alfabeya Latînî...

Heger peyva romana dukomenter rast û durist be, ez dikarim bibêjim "Bîra Qederê" romaneke dukomenter e. Di romanê de, tiştek bala min di-

kişîne, warê teknik û raxistina temaya romanê ye. Lewre ji xala giring, ku romanê ji romana klasîk û kurteçîrokê cihê dike, kûrahî, berfirehbûn û teknik e. Ev yek di "Bîra Qederê" de xurt e. Bi gotîneke din, "Bîra Qederê" bi form û teknîka xwe ve, di romana kurdî de radeyeke nû ye. Roman weke kok û gevde darê, ji cîyekî dest pê dike derdihê, vedibe, şax dide û ji hev dûr dikeve, dawiyê jî li cîyê xwe digihê ser hev.

Li gorî min du hindavên "Bîra Qederê" yên giring hene, ew ji ev in:

1. Naverok

2. rastîn/rastego

Zimanê Mehmed Uzunî, zimanekî zelal, sivik û xweş e, weke çemên Dijlê û Firatê diherike, nahêle yek xwe bispêre ferhengan. Di warê honandinê de, bilind e, di warê bihev-xistina hevokan de, bilind e. Ji ber vê yekê, ez dibêjim "Bîra Qederê" radeyeke nûh e, berhemeke nûjen e, forma wê ya wêjeyî bilind e û bi zimanê xwe ve dewlemend e. Heger em gotinê binin ser hizir û temaya vê romanê, em tiştekî nû, kûr û fireh dibînin, rewşa ronakbîrên kurd ên berê, bi rengê berfireh û pîralî hatine honandin û xemilandin. □

Ji Stenbolê sê kovarên kurdî

Piştî weşandina kovara Nûdemê, bi zaravayê kurmançî û dimilî gelek kovarên kurdî derketin. Piraniya van kovaran ji bi giranî li ser kultur û edebiyatê ne. Em bawer dikin, wê kultur, ziman û edebiyata kurdî li ser milên van kovaran û herweha li ser milên kovarên kurdî yê pêşerojê bilind bibin û cihê xwe yê pêwîst bigirin. Kovar, hem ji bo gihandina nivîskarên nû, hem ji bo aktuelhiştina edebiyata kurdî û hem jî ji bo geşkirina zimanê kurdî navgînên herî baş û berbiçav in. Hevkarî, dostanî û piştgiriya kovarên kurdî; hevkarî, dostanî û piştgiriya kultur, ziman û edebiyata kurdî ye. Loma, em di vê hejmarê de bixêrhatinî û pîrozbahiya kovarên kurdî ku li Tirkîyeyê derdikevin dikin û hejmara wan ya dawî, bi xwendevanên Nûdemê didin naskirin.



Yek ji kovarên kurdî ku ev çar sal in bê navbir li Stenbolê derdikeve, Nûbihar e. Nûbihara ku navê xwe ji berhema Ehmédê Xanî "Nûbar" girtiye kovareke çandî, hunerî û edebî ye û mehê carekê, ango salê donzdeh hejmar derdikeve. Herçiqas kovar bi kovareke îslamî jî tê naskirin, lê ji nivîsên îdeolojîk yê îslamî wêdetir, li gora navê xwe ye; yanî çandî, edebî û hunerî ye. Ji bilî zaravayê kurmançî, mirov carinan pêrgî ni-


visên dimilî jî tê, ku ev jî bi a me ji bo geşkirina zaravayê dimilî tişteki erdnî ye. Di Nûbiharê de digel nivîsên edebî hin şiroveyên felsefî jî li ber çavan dikevin. Ji destpêkê û heta niha berpirsiyartiya giştî ji aliyê Sabah Kara ve tê kirin. Em Sabah Kara berî weşandina kovara Nûbiharê bi şairtiya wî nas dikin. Lê mîna piraniya nivîskar û şairên bakurê welêt, Sabah Kara jî şairên xwe bi tirkî dinivîsînd û wî di destpêka salên 80 de pirtûka xwe ya şîran li Tirkîyeyê bi tirkî çap kir. Em dibînin ku piştî weşandina kovara Nûbiharê Sabah Kara derbasî nivîsandina kurdî bûye û heta niha di nava rûpelên Nûbiharê de li ser gelek mijarên cihê nivîsandiyê.

Xwedî û berpirsiyarê nivîsaran yê Nûbiharê jî Süleyman Çevîk e. Çi bigire di her hejmarê de nivîseke Süleyman Çevîk cih digire. Süleyman Çevîk di vê hejmarê de jî bi

nivîsa xwe ya bi navê "Tarîx qenc û neqencan eşkere dike" beşdarî li hejmra Nûbiharê ya 47'an kiriye. Wekî din bi rêzê ev nivîsên ha di vê hejmara Nûbiharê de hene: Bavê Xecê "Nogina Şerê", Raîf Bêçare "Şiyar Nabim", Seyda Dilkantî "Ji bo we", Alî Karadenîz "Mirina Rindekî", Aqîl Miha-cir "Ji nivîsên çav bi hêstir re", Memê Alan "mebest", Xwecş-bêj "Nûbihar guleke bêxar", M. Zakir Sarimurat "Em û doza me", Fehmî Şennawî "Nameyeke ji gelê Kurdistanê re", Tehsîn Îbrahîm Doskî "Bi Reşîd Findî re hevpeyvîn", Suleyman Şoreş "Şopa gel", Diljar Zeynulabîdîn "Mu-hemmed Kerbelayî", Mele Se-îdê Meşhûr "Kurd dîsa muh-tac in", Newzat Nurullah "Der heqê meala Qurana pî-roz", Meryemxana Muksi "Azadiya Kevokistanê", Bavê Selman "Nûbihara narîn", Ömer Faruk Çetinkaplan "Dehîfî", Ferîd Îzolî "Azadî û jiyân", Bager "Welatê çirto virto", û Xelîl Amed "Zarok-name".

Navnîşana Nûbiharê:

*Kızıtaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3,
Fatih-Istanbul, Turkiyet*
Tel: 212-533 75 88, Faks: 524 00 38



Kovareke din ku bi cidiye-
ra çap û naverokê xwe
avêtiya meydana kultur û ede-
biyata kurdî jî Jiyana Rewşen
e. Mîna tê zanîn berê bi navê
"Rewşen" li Ewrûpayê kovare-
ke hunerî, edebî û çandî der-
diket. Piştî çend salan vê kovare
barkirî Tirkiyeyê û li Tirki-
yeyê nêvî bi tirkî û nêvî bi
kurdî derket. Piştî demekê jî
weşana kovare hate rawestan-
din. Herçiqas Jiyana Rewşen
mîna berdewama kovara Rew-
şenê were dîtin jî, ew ji aliyê
form û naverok, ji aliyê kadro-
ya nivîskarên ve ji kovara
Rewşenê cûda ye. Jiyana Rew-
şen bi forma xwe ji Rewşena
kevin biçûktir e.

Jiyana Rewşen jî mîna Nû-
biharê li Stenbolê derdikeve.

Ew ji mehê carekê û çî bigire
hemû bi kurdî derdikeve. Li
ser navê Mezopotamya, xwe-
diyê wê Yıldız Gültekin e.
Berpirsiyarê nivîsaran Murat
Batgı ye. Redaksiyon Cemil
Denli û Lijneya weşanê jî ji
M. Zahir Kayan, Cemil Denli
û Hasan Kaya pêk tê. Ev hersê
navên dawî ji nivîskarên Jiya-
na Rewşen yê berdewam jî
têne hesêb.

Di vê hejmara 5'an de He-
sen Zinar bi nivîsa xwe "Çi-
roknivîsîna dinyayê û ya He-
lîm Yusuf" beşdarî kiriye. Bi
rêzê: : Huseyn Sagnuç "Wêje û
Ehmedê Xanî", Müslüm
Yücel "Steinbeck", Zana Far-
qînî "Ritmên di muzîka kurdî
de", M. Zahir Kayan "Lavijê-
ke Gultêr ya li pey janê", He-
lîm Yusuf "Jînenîgariya Sole-
kê", Bi Ahmed Aras re hev-
peyvîn, Cemil Denli "Az-
mûn", Adnan Alp "Sibat,
bend û jiyân", Resûl Riza "Ji
destê min bihata", Dilaver Ze-
raq "Dilên ku hiş nabin", M.
Zahir Kayan "Zimanê huner
Îmge ye", Düzgün Deniz
"Gelo edebiyata ziman an ci-
vakê", M. Muhammed "Yadî-
gar", Mîrza Semed "Bernamê",
Kemal Orgun "Di xeba-
ta şanoyê de Azîn û Rêzkarî",

Girê Dêrsilê “Miho û Çûçê”. Wekî din di dawiya her hejmarê de bernameya çalakiyên Navenda Çanda Mezopotamayê ya mehekê cih digire. Ew jî ji bo hunerhez û edebiyathezên kurd îmkanekê baş e.

Navnişana Jiyana Rewşen:
Istiklal Cad. Turhol Han,
No: 373 Daire: 2, Beyoglu-Istanbul, Turkiet
Tel: 251 85 06-07, Faks: 251 86 06

Kovara Zendê jî mîna Jiyana Rewşen berhemekê Navenda Çanda Mezopotamayê ye. Xwediyê wê Yıldız Gültekin e. Berpirsiyarê giştî yê Zendê Raif Yaman e û lijna weşanê jî ji M. Şefik Beyaz, F. Huseyn Sagnıç, Felat Dilgeş û Edibe Şahin pêk tê.

Mîna tê zanin berî bi çend salan li ser navê Enstîtuya kurdî ya Stenbolê hejmareke Zendê derketibû. Li gorî agahdariyên ku kovar dide, du hejmarên kovara Zendê derketine, lê herdu hejmar jî mîna prov derketine. Karbidestên kovarê, vê hejmarê mîna hejmara yekem dihesibînin û ji ber pêşeroja kovarê bi hevî ne. Li gorî hejmarên xwe yê provê, Zendê jî aliyê estetîkê ve gaveke



baş avêtîye. Taybetmendiya kovara Zendê jî ew e, ku wê bêtir meyla xwe berdaye ser lêgerîn û lêkolînê. Gava mirov rewşa kurdan û rewşa zimanê kurdî dide ber çavan, hebûna kovareke bi vî babetî valahiyeke dîrokî dadigire. Ji ber ku heta van salên dawiyê jî, dîroka kurdan, folklorê wan, kultura wan, edebiyata wan, zimanê wan ji aliyê lêger û lêkolînerên biyani ve dihatin nivîsandin. Hebûna platformeke weha, wê rê li ber lêger û lêkolînerên kurdan veke û wê berê întellektuelên kurdan ber bi vê beşa jibîrbûyî veke.

Hejmara Zendê ya r'ê bi kurtî jî van mijaran pêk hatîye: Medenî Ferho “Xeureka Dojehî”, Şareza Aver “Dîrok û

serpêhatiya laşê mirov”, Ehmed Şerîfî “Karnamaya Babekani”, F. Huseyn Sagnıç “Nêrînek li salname”, J. Espar “Çend nûsteyî û kirêbê kirêkî”, Zeynelabêdin Zinar “Bingeha çiroka kurdî”, Zana Farqînî “Dahûrîna li ser parkîtên di kurmançî de”, Mehmet Bayrak “Di derbarê Mezopotamayê de Bibliyografya Germanên Ewropîyan”, Süleyman Danişman “Di hunerê de teşe û naverok”, Cemil Gündogan “Derheqê rastnûştina kirêkî de kombiyayîşê Stockholmî”.

Zend ji sê mehan carekê û li Stenbolê derdikeve.
 Navnişana xwestinê:
Zend, Istiklal Cad. Turhol Han, No: 373 Daire: 2, Beyoglu-Istanbul, Turkey

Ji çîrokên kurdî metirsin

Jürgen M. Berth

Berî bi çend mehan, antolojîyêke çîrokên kurdî bi navê "Zehn kurdische Erzähler" ji aliyê Husên Düzen ve, bi almanî di nava weşanên Araratê de derket. Pirtûk ji deh çîrokan û deh çîroknivîsan pêk hatiye. Deh çîroknivîsên li gorî rêza antolojîyê ev in: Redwanê Alî, Şahîne B. Soreklî, M. Emîn Bozarslan, Hesenê Metê, Firat Cewerî, Mehmet Alî Kut, Kurdo Husên, Bavê Nazê, Rojen Barnas û Jemal Nebez.

Ev danasîna li jêr, di rojnâmeya almanî *Volksstimme* de derketiye. Em wê bi kurdiya Zerdest Haco pêşkêşî xwendevanên Nûdemê dikin.



Husên Düzen
Zehn kurdische Erzähler
Verlag: Ararat

Bê dirêjkirin em dixwazin raste rast bînin ser navero-ka mijarê:

Hûn Firat Cewerî yan Jemal Nebez, Bavê Nazê yan Kurdo Husên dinasin? Belê, wek mirovine evîndarê xwendinê wê Karl May û serpêhatiyên li Kurdîstana kovî hê di

bîra we de bin?

Ji bo mythosa li ser sîwarê qelaçan yê kurd were serrastkirin, ji îlona 1996'an vir de bi nîya weşanxaneyê Araratê ya li Swîsrê pirtûka Husên Düzen "Deh Bêjerên Kurd", ya ku pîr hêjayî xwendinê ye -bi wergera almanî- derketiye ber destan.

Berhevkarê vê pirtûkê, yê ku li Hamburgê dijî, ne sentîmental, lê bi awayekî nazdar û ziravbîhîstyar bi vê pirtûka prosa ya kurteçîrokên kurdî balê dikêşîne ser wêjeyêke surgûnê, ya ku heya niha li Almaniyayê hema bêje -yekcartu nîrx nedîtibû. Husên Düzenê kurd, bi hesteke naz, van çîrokên ku ji rêzaniyê bê-tir xwedî motîvasyoneke mirovanî-çandî ne, pêşkêşî dîke.

Her deh edibên kurd yên surgûnê bi dilovanî û gelek caran bi wêneyên rastiyeke diljarkirî-nê biranînên xwe yên ji welatekî ku weke dewlet hebûna wî nîne, vedibêjin.

Gava mirov mînakên ji vê pirtûkê bîne ser zimên, mirov dibîne ku Kurdo Husên li dijî bêhavîzebûna hemwelatîyên xwe ya dirokî dinivîse û gazi wan dike, ji bo ew çanda geşbûyî ya welatê xwe bîne bîra xwe. Wîlo jî em di şexsiyeta diljariya Lalo Karîm de, yê ku Jemal Nebez qal dike, dibînin, ciwanmêrekî bêtirs ku li dijî diravkirina Xwedê derdikeve, belê ew jî di xebata xwe de bê serketin dimîne weke Don Quijote de la Mancha ku li dijî aşên bê derdiket, yê ku Cervantes Saavedra li ser dibêje. Em jî S. B. Sorekî Xidirê kurd dinasin yê ku li surgûna Australyayê bi rengêkî seyr, bê ziman, ji nû ve li zimanê xwe vedigere û xwe nas dike. Em di kurteçîroka Firat Cewerî de dibin şîrkê qîçqîça êşa ruhê kalekî 35 salî yê ku ji bo parastina namûsa malbatê ji mec-bûrî xuşka xwe dikuje. Em bi

Mele Restûlê Redwanê Alî re dikevin nav xewnên wî yên bextewarî û dilçûyîyê, û dibin şahidê şerê wî yê bêdeng li dijî azabdûna xwe wek oldarekî mînak.

Em di nav rêzên van çîrokan ku her yek ji wan bi marîfet hatiye ristîn de, keserên mirovên ku li tiştêkî digerin, dixwînin. Em di mînak û wêneyên çîrokan de his û ramanên wan mirovên ku li ser riwê vê cîhanê mala wan bi dest wan nakeve dibînin.

Her deh nivîskarên kurd, yên vê pirtûka bi agahdariyên dewlemend, bi prosayeke nûjen ya ku ew pê ji hunera vegotina çîroka bi dîr neketine, tradisyona dirêj ya helbestvaniya kurdî ji sedsala 16'an berfireh dikin. Ew bi zimanê xwe yê hêsan lê jîndar rastiya xemgîn ya rewşa nêzîkî 20 milyon kurdên ku bê dewlet lê ne bê çand in, tînin bîra mirov.

Ji rojnameya Volksstimme, 20.1.1997

**Wergera ji almanî:
Zerdeşt Haco**

Zeynelabidîn Zinar

Xwençe cild IX

Weşanên Pencînar

Ev cilda IX'an jî ya Xwençeyê mîna cildên berê dewlemend e. Mîna tê zanîn, Zeynelabidîn Zinar berê jî heyst cildên Xwençe weşandîne. "Xwençe" yanî "Xezîne" ye; bi rastî jî gava mirov li edebiyata kurdî ya devkî dinihêre, gava mirov guhê xwe dide stran û kilaman, gava mirov li destan û çîrokên kurdî guhdarî dike, bi rastî jî xezîneyeke çanda mirovatîyê ye.

Di van neh cildan de, heta niha Zeynelabidîn Zinar bi sedan çîrok, meselok, pêkenok, xweşbêje, mamik û hwd. danc hev. Ev cilda IX'an jî ku bi van şûre babetan xemilandiye, jî 289 rûpelan pêk hatiye. □

Ji Nav Weşanên Nû

Ferhad Shakely

*Mem û Zîn'ê Kürt
Milliyetçiliği
Weşanên Doz*

Pirtûka Ferhad Shakely ku berê bi kurdî û îngilîzî derketibû, vê carê jî bi wergera Ş. Süer bi tirkî li Stenbolê derket. Mîna tê zanîn sala 1996'an ji aliyê kurdan ve weke sala Ehmedê Xanî û Mem û Zîna wî hatibû îlankirin. Kurdan di sala 96'an de li seranserê dinyayê bi çalakî mezinê xwe bi bir anîn û li ser Mem û Zînê û girîngiya Mem û Zînê peyivîn. Berhemên sala 96'an bû bi çendan gotar û pirtûk. Herçî ev pirtûka Shakely ye, berî 96'an hatiye nivîsandin û herweha berî 96'an jî bi îngilîzî hatiye çapkirin. Ferhad Shakely di vê lêkolîna xwe de nêzikî aliyekî Ehmedê Xanî dibe, ew jî neteweperestiya Xanî ye. Ferhad Shakely di nava beytên Mem û Zînê de îspat dike ku Ehmedê Xanî bavê nasyonîzma kurdî ye. □

Mahmûd Lewendî

*Computera ber dilê min
Weşanên APEC*

Civata kurdî ya gundî ku ji Çaliyê mîzahê ve xurt û

bêminak e, bi pêşketina bajarvanîyê re, bi rewşa siyasî ya kambax re, hêdî hêdî ji navê radibe; ken mîna sûc tê dîtin û civat di nava girî û hiznê de dimîne. Kenandin, hunereke mezin e. Di rewşên ne xweş û reş de, derketina mîzahê, dilşahiya civatê ye. Ev e, Mahmûd Lewendî, bi mîzaha xwe dixwaze tîrêjên şahiyê bera nav civata kurdan bide. Ev pirtûka ku ji nivîsên wî yên Armançê pêk hatine, bêşik wê we bike-nîne. □

Malmîsanîj

*Kird, Kirmanc, Dimilî veya
Zaza Kürtleri
Weşanên Deng*

Malmîsanîj yek ji kurdên Zaza yê pêşî ye ku dest bi nivîsandina zazakî kiriye û heta niha nivîsandina zazakî dewam kiriye. Mîna zazakî, ew li ser zaravên kurmançî û soranî jî rawestiyaye û hersê zaravayan hem bi xwendin, hem jî bi nivîsandin dizane. Bi a me ji bo bikaranîna zimankî standart û yekgirtî, zanebûna hersê zaravayên kurdî pêwîstiyek e.

Malmîsanîj di vê pirtûka xwe de li ser kok û maneyên

"kird", "kirmanc", "dimilî" û "zaza" radiweste û nezelaliya ku heye bi şiroveyên xwe zelal dike. □

Helîm Yûsif

*Mirî Ranazîn
Weşanên Avesta*

Van demên dawî di warê edebiyatê de ji nava kurdên Sûriyê gelek navên nû derketin. Helîm Yûsif yek ji van nava e. Ew di warê nivîsandina çîrokan de hêvîtiyê ye. Çîrokên wî bi zimanekî nû, bi formeke nû û bi fantazyên xurt pêçayî ne.

Pirtûka Helîm Yûsif bi kurdî ji van çîrokan pêk hatiye: Guhê jêkirî, Ava Şin, Bêhna qedexê, Gula Omeriyan, Keldûman, Li Şermola, Reşikê şevê, Dilê bêderî, Komara dînan û Çîroka dawî. □

Dr. Celadet Çelîker

*Çend pirsên alfabeja kurdî
Weşanên Roja Nû*

Pirtûka Celadet Çelîker bi gelemperî li ser pirsgirêkên zimanê kurdî û bi taybetî jî li ser tîpên "î" û "i" an jî "î" û "i" ye. Ji mêj ve ye li ser van

herdu tîpan munaqêşe heyê û nêrînen cûda têne pêşkêşkirin. Nivîskar di pirtûkê de behsa nêrînen hin nivîskarên kurdî dîke û parastina wan ya "î" û "î"yê ne rast dibîne. Herçî Celadet Çelîker e, di vê lêkolîna xwe de, mîna alfabe ya tirkî "î" û "i"yê diparêze. □

Amadekar: Lokman Polat
Rewşa edebiyata kurdî
 Weşanên Çanda Nûjen

Lokman Polat di vê berhe-
 ma xwe de bi nivîskarên
 kurdî; Şahîne B. Soreklî, Aram
 Gernas, Hesenê Metê, Felat
 Dilgeş, Suleyman Demir, Mi-
 hemed Dehsîwar, Gabar Çi-
 yan, Dawê Xanê, Laleş Qaso,
 Marûf Yilmaz, Zeynelabidin
 Zinar û Ehmed Şerîfî re li ser
 edebiyata kurdî, zimanê kurdî
 û pirsgrêkên edebiyata kurdî
 bi riya pirs û bersivan muna-
 qêşe dîke. □

Mehmet Aktaş
Sesime Gel
 Weşanên Avesta

Sesime Gel pirtûka Meh-
 met Aktaş ya pêşî ye. Pir-
 tûk ji nivîsên Aktaş yê cihê
 cihê pêk hatiye û hemû li ser
 kurdan, li ser rewşa Kurdistana,
 kultura kurdî û folklorê
 kurdî ye.

Mehmet Aktaşê ku di sala
 1966'an de li Igdirê hatiye din-


ayê, di kovar û rojnameyên
 wek Yeni Gündem, Tempo,
 Yeni Ülke û Özgür Ülkeyê de
 xebitiye. Ew niha jî, digel karê
 xwe yê rojnamevanîyê, di
 MED TV'yê de birêvebiriya
 programa "Ronahî" dîke. □

Mele Yûnisê Helqetî
Terkîb û Zurûf
 Tîpguhêz: Emîn Narozî
 Weşanên Sarayê

Di van demên dawî de,
 bi riya tîpguhêziya jî
 tîpên erebî û kirîlî hem di
 warê agahdariya edebiyata
 perçeyên welêt yê din de,
 hem di warê nasîna edebi-
 yata kurdî ya klasîk de,
 hem jî di warê dewlemen-
 diya edebiyata kurdî ya
 standart de gavên baş têne
 avêtin. "Terkîb û Zurûf yek
 jî wan berheman e ku jî tî-
 pên erebî hatiye guhaztin.
 Lê belê gava mirov çavekî li
 Terkîb û Zurûfê digêrîne,
 mirov dibîne ku Emîn Na-
 rozî çiqasî zehmetî kişandi-
 ye. Herçiqas ev berhema
 han bi kurdî be jî, ji ber ku
 ew li ser rêzimana erebî ye,
 gelek termên rêzimana ere-
 bî tê de hene. Narozî, li ber
 her termeke erebî, notek
 daniye û bi kurdî şiroveya
 notê kiriye. Wî li ser hev, di
 vê pirtûka sedrûpelî de 1163
 not digel şiroveyên bi kurdî




daniye. Herweha, wî bi qasî
 deh rûpelan jî ferhengoke
 termên rêzimanî çêkiriye.

Emîn Narozî di pêşgotina wê
 berhemê de, berhemê wilo
 dide naskirin: "Zurûf û Ter-
 kîb" du pirtûk jî wanên kur-
 dî ne ku beşek jî rêzimana
 erebî şirove dikin. Ji ber ku
 herdu timî bi hev re bûn, li
 pey hev dihatin xwendin û ji-
 berkirin, bi hev re dihatin ni-
 vîsîn û bi hev re jî çap bûne.
 Min jî ew li vir jî hev veneq-
 tandin. Zurûf bi xwe, li ser
 hokerên erebî radiweste û
 wan jî şagirtên nû yê rêzi-
 mana erebî re rave dîke. Her-
 weha bi kurtayî be jî, ew
 rewşa hevokên zimanê erebî,
 rewşa tewange û netewange-
 ya bêjeyan û rewşa dawiya
 wan jî tîne ber çavên şagirt û
 feqiyên rêzimana erebî. Lê
 Terkîb bi tenê rûpelê pêşî yê
Ewamîla 'Ebd el-Qahîr el-
 Curcanî bi awayekî gelekî fi-
 reh analîz û şirove dîke û pê
 re jî li ser rêzimana erebî, li
 gor cih û rewşê, geleg agah-
 dariyên din yê berfireh û
 hêja dide xwendevanan." □



Cemşid Bender

dîroka kurdan ya tarî
rohnî dike, bi pirtûkên
xwe bersiva îdeolojiya
resmî ya Tirkiyeyê di-
de; ew li dijî înkarkiri-
nê dengê hebûnê ye.



Êdî gazina nebûna berhemên kurdî neke, Weşanên Nûdemê bixwîne!

BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI Celadet Alî Bedir-Xan / Gramer (1993)

DÊ Û DÊMARÎ Egîdê Xudo / Roman (1995)

KESKESOR Nûredîn Zaza / Çîrok (1995)

DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lêkolîn (1993)

HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin (1993)

MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman (1995)

MILKÊ EVINÊ Rojen Barnas / Şiir (1995)

ZAROKA ŞEVÊ Jack London Werger: Mustafa Aydoğan / Çîrok (1995)

BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Husên / Roman (1995)

MÎRZAYÊ BIÇÛK A. de Saint-Exupéry Werger: Fawaz Husên / Çîrok (1995)

GOTIN Yazar Kaya / Ceribandin (1996)

ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCEN BAŞÛR Xelîl Duhokî (1995)

ŞEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî / Roman (1993)

MÎŞK Û MIROV John Steinbeck Werger: Firat Cewerî / Roman (1993)

BEXÇEYÊ VIŞNE Çexov Werger: Firat Cewerî / Piyes (1995)

LI BENDA GODOT Samuel Beckett Werger: Firat Cewerî / Piyes (1995)

GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: Firat Cewerî / Aforîzma (1995)

GIRTÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996)

KEVOKA SPÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996)

KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT Firat Cewerî / Ceribandin, hevpeyvîn (1996)

XEZAL Sîma Semend / Çîrok (1996)

DERWARÎ, Yusûfî Cerihî / Şiir (1996)

EVINA REBEN Derwêş M. Ferho / Şiir (1996)

BANGA HAWARÊ Medenî Ferho / Şiir (1996)

KULTUR Û RAMAN Şerefxan Cizîrî / Ceribandin (1996)

KURÊ ZINARÊ SERBILIND Sidqî Hirofî / Roman (1996)

ŞIIRÊN BIJARTE Mayakovskî Werger: Süleyman Demir Şiir (1996)

PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ Mustafa Aydoğan (1997)

ŞEREF WENDABÛYÎ YA KATHARINA BLUM

Heinrich Böll Werger: Şahîne Bekirê Sorekî / Roman (1997)

HINGÊ Rojen Barnas / Çîrok (1997)

Nûdem Werger

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER HEWESA TE LI SER HELBEST, ÇIROK, ROMAN, HEVPEYVÎN, LÊKOLÎN, HUNER, SÎNEMA Û HWD. HEBE, PÊŞNIYAZEKE ME HEYE, BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER TU DIXWAZÎ JI TEVGERA HUNER Û EDEBIYATÊ YA HER ÇAR PERÇEYÊN WELÊT HAYDAR BIBÎ Û EDEBIYATA DINYAYÊ YA KEVNAZ Û NÛJEN BI ZIMANÊ KURDÎ BIXWÊNÎ, DÎSAN BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

NÛDEM DIXWAZE JI AVAKIRINA EDEBIYATA KURDÎ RE BIBE ALÏKAR, TU JI ALÏKARIYA WÊ BIKE, BIBE ABONE!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê/aboneya Nûdemê.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek, Skandinavya 280 Sek, Ewropa 100 DM, Amerîka, Australya û Kanada 50 \$.

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê kartê dagirin û kopya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiye ji we re bişînin.



INDÉ